Şêx Evdirehmanê Axtepî

# REWDNEÎM

Institut kurde de Paris

Stockholm 1991

Institut kurde de Paris

LIV. N.L. 5057
30/11/2017
922 AGT REW

**Şêx Evdirehmanê Axtepî**

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# REWDNEÎM

Ji bo Enstituya Kurd
ya li Parîsê re
4/9 1991
Zeynelabidîn

Institut kurde de Paris

Stockholm 1991

Çapa Pêşî 1991

Navnîşana xwestinê:
Yekîtiya Nivîskarên Kurd
Box 45 205
104 30 Stockholm - SWEDEN

Institut kurde de Paris

© Zeynelabidîn
Rewdneîm 1991

ISBN 91 830 0620 0

# PÊŞGOTIN

Ev yek eşkera ye heta ku neteweyek zimanê xwe biparêze, herweha xwedîçand û torre û dîrok be, hebûna wî li dinê tê vehonandin û bi serfîrazî ew li jiyana xwe didomîne. Bêguman ev karê han jî bi zana, rewşenbîr û dûrbînên wî neteweyî tête meşandin. Belam heta ku li nav neteweyekî kesên wisa hebin û ew kes berpirsyariya xwe ya milî zanibin, ew netewe jî hebûna xwe diparêze. Lê çaxê ku nebin yan berpirsyariya xwe bi cih neynin, ew netewe bêgav dimîne û hin bi hin di navbera cîranên xwe yên biyanî de dihele û dê demek bi ser ve bê, ku nav û nîşana wî neteweyî di gerîneka dîrokê de binixure û ji dinê wenda bibe.

Her çiqasî ev 65 sal in, ku Neteweyê Kurd xistine binê nigên çar dêwên bêserî yên hov û xwînxwir, û welatê wî kirine çar beş; herweha heyînên wî yên pîroz tev taromar kirine û ji hev rûçikandine, zimanê wî qedexe kirine û navên wargeh, cih û hemû kevnewarên kevin guhartine, lê dîsan jî Neteweyê Kurd bê rawestin serhildana bi çek û wekî din bi her awayî ber xwe daye û dide, li pêşberî dijminan timî bo azadiya xwe amade ye. Herweha rewşenbîr, zana û dûrbînên wî jî di warê nivîs û çapemeniyê de, ger bi hindikî be jî, li gorî destdana birî û çaretiya xwe berpirsyariya xwe bi cih anîne bi zimanê xwe gelek pirtûk, kovar, rojname û hwd nivîsîne, dinivîsin, diweşînin û deynê xwe yê neteweyî ji stuyên xwe derdixin. Ha yek ji wan rewşenbîran jî Şêx Evdirehmanê Axtepî ye, ku bi zimanê kurdî -zaravayê kurmancî- du pirtûk nivîsîne.

Şêx Evdirehmanê Axtepî di 127O yê (185O) Zayinê de li Axtepe, şeva Êvara Înê, roja 3O ê meha Rebî'ulewelê hatiye dinê. Lê ji dilovaniya wî re, du tarîxên cihê hene. Yek, li gorî beyana pêşgotina bi zimanê Erebî ya pirtûka wî Rewdunneîmê, ew di 16 ê Adara Romî 1326 an, 29 ê Adara mîladî 1910 an de çûye dilovanîya xwe. Lê belê li gorî beyana Kovara Xortên Şoreşger Ên Demoqrat (Devrimci Demokrat Gençlik Dergisi, jimar: 5-6, Heziran: 1978, rûpel:14), wî di pêncê Sibata 19O5 an de li Diyarbekir wefat kiriye. Niha gora wî ya pîroz li Axtepe, li kêleka ya bavê wî dimîne. Şêx Evdirehman, kurê Şêx Hesê Nûranî ye û bi koka xwe ji Koxê ye. Ew gund, niha li navruwa Xerzan dimîne.

Institut kurde de Paris

Lê sedemê koçkirina malbata wî ji wir û dema hatina Axtepeyê, ne kifş e.

Şêxê Axtepî despêka xwendina xwe, pêşî li cem bavê xwe di xwendegeha wî de li Axtepê kiriye. Piştre ew çûye Başûrê Kurdistanê û di hin xwendegehan de xwendiye, heta ku xwendina xwe kuta kiriye û piştî dilovaniya bavê wî, ew şûnde vegeriyaye Axtepe, li şûna wî di Xwendegehê de ders daye feqiyan. Heta ku birayê wî Mihemed Can li Şamê xwendina xwe kuta kiriye û hatiye wir. Îcar Axtepî piştre dersdanê spartiye birayê xwe M.Can û wî xwe bi temamî daye ser nivîsandina pirtûkan.

Axtepî, di helbestên xwe de nasnavê xwe bi RÛHÎ aniye. Hin caran jî xwe bi Şemseddîn navdar kiriye. Ev nav jî, eynî weke Ebdurrehman navekî wî bixwe ye.

Niha agahdariya me bi çar pirtûkên Şêx Evdirehmanê Axtepî heye. Ji wan didu bi zimanê Kurdî ne û didu jî bi zimanê Erebî ne. Ji her çar pirtûkên wî, heta niha tenê "Rewdinne'în" û "Dîwan" çap bûne. Lê herduyên bi zimanê Erebî, neçapkirî mane. Pirtûkên wî ev in ku me li jêr nivîsîn:

REWDNEÎM: Pirtûka herî mezin e, ku bi zaravayê kurmancî û bi helbestkî hatiye nivîsandin. Tev, rîwayetên kevnare ne. Piraniya helbestên wê, li ser jiyana Mihemed pêxember hatine ristin. Ew, bitaybetî rewşa çûn û hatina Mî'racê bi awayekî vekirî eşkera dikin. Lê belê Axtepî tê de hin bûyerên dîrokî jî beyan kirine û mesela kurdî aniye zimên. Xasma wî di nava van helbestên xwe yên "Mesnewî" de pir caran qelema xwe kiriye mîna şûr û pê êrîş biriye ser dijminên Kurd û Kurdistanê.

Di pirtûkê de 35 beş hene, babeta her beşekê ji ya din cihê ye. Çewa ku Axtepî bixwe di paşiya pirtûkê de nivîsiye, tê de 4531 beyt hene. Tev, mînane kêş û nikla Mewlûda Melê Bateyî û malik hemû bi yazde kiteyan dikişin, her du rêz jî bi eynî tîp qafiye ne.

Şêxê Axtepî nivîsandina vê pirtûka xwe, di 1302 (1884) ê Zayinê de kuta kiriye. Û heta niha du caran li çapê ketiye:

Cara pêşî, di 1381 (1966) ê Romî de bi destên mele Ehmedê Qoxî li çapê ketiye. Lê bi derketinê re, dewleta Tirk dest daniye ser pirtûkê û nehiştiye ku li nava xelkê belav bibe. Ev çap, 240

Institut Kurde de Paris

rûpel e.
Cara din, di 12.O3.1986 an de bi destên mele Zeynulabidîn Amedî li çapê ketiye. Herweha Amedî li serê şerheke bi zimanê Erebî jî nivîsiye û malikên wê mane kirine. Lê mixabin wî di şerha xwe de gelek bêjeyên kurmancî, bi Farisî daye nasandin! Çapa Amedî, 534 rûpel e. De lê belê herdu çap jî ne kifş in, ku li kîjan çapxanê û li kû hatine çapkirin.

Di 1986 an de, ji herdu çapên Rewdneîmê, her yekê nusxeyek bi alîkariya hin dostên dilovan gihane min. Û di 1988 an de jî, ez û heval E.Narozî, me bi hev re piraniya rûpelên wê ji tîpên Erebî wergerande tîpên Latênî. Û me li hin deveran, hin têbinî jî nivîsîn. Xebata me; geh wî dixwend û min bi qelemê dinivîsî, yan geh min dixwend û wî dinivîsî. Herweha piştre jî, me nivîsa xwe berçav radikir. Lê mixabin ji ber tuneyî û nebûna îmkanan, pirtûk ewçax nehate çapkirin û bi wî awayî heta niha mabû. Ji ber wê alîkariya heval Narozî, ez spasiyên xwe bo wî pêşkêş dikim û bidilgermî dostanî û biratî divêm.

Ew nusxa Rewdneîmê ya ku Şêx Evdirehman bixwe nivîsiye, min ew di salên 1967-69 an de li cem neviyê wî Evdirehman dîtibû. Rûpelên wê ji sê cûre kaxez, yanî ji rengê kesk û sor û zer hatine amadekirine. Çaxê mirov ji dûr ve lê dinihêre, mîna rengê Alaya Kurdistanê tête xwuyakirin. Li hawîdorê nivîsa ser rûpelan, du çixêzên zirav û pir nêzî hev, di nêvî de seranser valahiyeke 5 c. û li herdu kêlekên wê valahiyê du çixêzên zirav seranser hene. Kaxezê rûpelan hemû mîna hevrîşim in û tev 302 rûpel e. Destnivîsa Axtepî, di rengê destnivîsa nivîsarên Farisî yên kevn de ye. Wî hemû sernavên pirtûkê, bi "Bend"ê navdar kirine. Yanî "Bendê Ewel, Bendê Sanî.." û heta ku dawî lê aniye. Lê belê min li ser hemû bendan, "Beş" û jimara wê bendê reqem nivîsîne. Herweha ji bo nimûne, min rûpelê destnivîsa Axtepî yê paşiya Rewdneîmê jî li vir daye çapkirin. Reqema vî rûpelê destnivîs, 302 ye û yê herî paşî ye. Li kêleka rastê ya vî rûpelî, mora Axtepî jî tê xwiyakirin. Erda morê reş e û nivîsa lê, yanî nasnavê wî "Rûhî" sipî ye.

DÎWAN: Bi "Dîwana Rûhî" tê nasîn. Çewa ku me li jor jî gotiye, "Rûhî" nasnavê Şêx Evdirehmanê Axtepî ye, ku wî ew nav ji

Institut Kurde de Paris

xwe re di helbestan de bi kar dianî. Axtepî, vê Dîwanê di 1293 (1876) yê Zayînê de nivîsiye. Pirtûk 28 beş e û tê de 471 malik hene. Hemû bi kêş û qafiye ne û kiteyên wan bi jimar in. Her beşek li ser jimareke kifş bi kiteyan dikişe û hin pêncok jî tê de hene.

Ev pirtûk cara pêşî di yazdê Gulana 198O yî de bi destê mele Zeynulabidîn Amedî, herweha bi tîpên Erebî hatiye çapkirin. Piştre me jî (Ez û E.Narozî) ew di 1988 an de ji tîpên Erebî wergerande tîpên Latênî û bi "Dîwana Rûhî" navdar kir. Herweha di eyni salê de, weşanxaneya JÎNA NÛ di meha Êlûnê de li Ûppsalayê (Swêd) çap kiriye.

KÎTABÛ KEŞFÎZ'ZELAM: Ev pirtûk xwerû bi zmanê Erebî ye; li ser fikrên baweriya cuda yên di ola îslamê de hatiye nivîsandin û 35 rûpel e. Lê heta niha jî nehatiye çapkirin. Fotoqopiyê orijînala pirtûkê, yanî destnivîsa Şêx Evdirehman bixwe, di dest me de nusxeyek heye.

KÎTAB-ÛL EBRÎZ: Şêx Evdirehman, vê jî bi zimanê Erebî nivîsîye. Axtepî li ser eyişandin û îsbata Quranê, ku pirtûkeke asîmanî ye û ku ji aliyê Xwedê ve ji Mihemed pêxember re hatiye hinartin nivîsiye. Pirtûk 81 rûpel e û heta niha li çapê jî neketiye. Fotoqopiyê vê jî ya destnivîsa Axtepî, nusxeyek di dest me de heye.

Me nivîsandina Rewdneîmê bi tîpên Latênî, li ber du çapên cihê nivîsiye. Çewa ku me li pêş jî got yek Çapa Qoxê ye, ya din jî Çapa Amedî ye. Belam di mabeyna bêjeyên herduyan de hinek guhartin û cudatî têne dîtin. Ew jî, xasma di warê daçekan û tîpên dengane de guhartinine piçûk peyda dibin. Me hin ji wan li têbiniyê nivîsîne, ku kîjan çap çewa nivîsiye.

Bêguman balkêşiya herî mezin ku ji mirov re çêdibe ev e ku, Rewdneîma Şêx Evdirehmanê Axtepî di warê ziman, bêjeyên kevnare û di awayê bikaranîna daçekan de li gorî rewşa rêzkirina bêjeyan di hevokan de û li gorî bikaranîna zemanê wan di bilêvkirina birastî de, gencîneyeke herî dewlemend e ji zaravayê kurmancî re. Pirtûk di giranbihatiya xwe de, piştî "Mem û Zîn"a Ehmedê Xanî û "Dîwan"a Melayê Cizîrî li Kurdistanê rada sisiyan vedigire. Çimkî tê de gelek babet û rewşên cihê hene. Her çi-

qasî di nava xwendevanên nû de naveroka wê bi "olî" hatiye zanîn, lê ji ber sedemê heta niha ku ji wan re pêşber nebûbû, rind nehatiye naskirin. Îcar ez di vê baweriyê de me; ku ev pirtûk di warê çand û vêjeya kurdî de piştî MEM û ZÎNê li rada diduyan cih digire.

Helbestvanê nemir Axtepî, sedemên herî girîng ku ev pirtûk nivîsîne, hin jê ev in ku li layêt welatparêzî bi hin helbestên xwe eşkera gotiye:

......
*Ji van qesdê min nîne 'erzê huner*
*Welê da li dunya bimînit eser*

*Ku Turk û Ecem qet nebên careкê*
*"Nehin Kurdî sa'ir di misra'ekê"*

*Bizanin ku ṣa'ir ji Kurdan hene*
*Ji 'uṣṣaqê Turk û Ecem zêde ne*

Binêrin li şi'ran heçî zaniye
*Çi terkîbekî serfê kurmancî ye*

*Ji kurmanciya xwe me anî nîzam*
*Mu'ella û sêrîn û efseh kelam*

Ji tenzîmê kurdî sual û cewab
*Me bînane nezmê hezaran kîtab*

*Welê îktîfa kir ji nezmê hemîn*
*Çiku kes nehin bêje min "aferîn"*

Axtepî li ser koledaran jî, di Dîwana xwe de weha gotiye:
*Da çêbitin der dil tereb*
*Turk û Ecem, Rom û Ereb*
*Guh din bi qanûnê edeb*
*Ser ah û kovan û keser*

Institut kurde de Paris

Herweha Axtepî li hember şêxên kedxwir gelekî şer kiriye, ruyê wan yê reş bi helbestên xwe raxistiye holê û gotiye:
*Terîqet niha bûye yek damê seyd*
*Ku pê malê dunya bikin bend û qeyd*

Axtepî ji felekê pir gazin û lome kirine, herweha derd û kula kêmketina nivîsandina pirtûkên xwe bi zimanê kurdî jî weha aniye zimên:
*Ne metbû' û ṣêrîn e lefz û eda*
*Çiku sirfî kurmancî ye naseza*

Herweha Axtepî li ser cefa û westandina xwe digel ya qelemê bi nivîsan re weha gotiye:
*Min û xameyê pir emek dîtine*
*Gelek zewq û keyf û henek dîtine*

Gelek caran jî Axtepî li ser vexwarina meyê û daketina meyxaneyê, herweha li ser evîna xwe ev gotine:
*Were ey qelem ser siyaqa ewil*
*Tu jî saqiya bîne cama çu gul*

*Ku seccade û xerqe û sebheyê*
*Bikim rehnê bade di meyxaneyê*

Axtepî li ser evînê di Dîwana xwe de jî weha gotiye:
*Ji dil daxwazê yarê me*
*Qewî mexmûrê badê me*
*Murîdê saz û badê me*
*Bi îxlasê temennayê*
......
*Bi qurban bim ji bona çeṣmê ṣehla qameta yekta*
*Di her wext û di her gavan di nîva sar û sermayê*

Şêxê nemir bikaranîna nivîsandina hin bêjeyên pirane, li gorî devoka xwe ya Dîyarbekir nivîsîye. Lewra di paşiya gelek bêjey-

Institut kurde de Paris

ên pirane de tîpa "n" nenivîsiye, ew bi "ê", "î" û "a"yê nivîsine. Çimkî ev awa, niha jî di kurmancî de tê bikaranîn. Axtepî paşdaçekên hin bêjeyan jî li gorî devokên cihê-cihê bikaranîne. Çawa ku tê dîtin ew bi "de-da", "re-ra" û "ve-va" nivîsîne. Zayendeya hin bêjeyên Erebê û Farisî jî, li gorî bêjeyên di zaravayê kurmancî de nivîsîne. Ji bo temamkirina qafiye, di nav hin bêjeyan de hin tîpên zêde nivîsine. Wek bêjeya "dostî" ku bi "dositî" nivîsiye. Û hin caran ger di deverekê de çaxê bêjeyeke Farisî yan ya Erebî nivîsîbe, di eynî malikê de yan di ya li pey de kurmanciya wê jî nivîsiye, da ku ji xwendevanan re bête zanîn. Herweha gelek bêje û peyvik ji zaravayê soranî û hin ji yê dimilî jî girtine.

Di pirtûkê de gelek bêje û hevokên Erebî û yên Farisî têne xwiyakirin. Axtepî piraniya wan, li gorî xwendina wan zimanan nivîsiye. Lê belê ev yek eşkera ye, çaxê ku hin bêjeyên biyanî dikevine kurmancî, pêre-pêre daçeka zayendeya kurmancî digirin. Îcar ji bo lêhaybûna xwendevanan me hin guhartin xist zayendeya hin bêjeyên wek "suhbet", "perwane", "lutf", "behr", "îlham", "meqsed", "dewr", "îhsan" û hin weha yên din, ku di kurmancî de zayendeya wan mê ye. Hin dengên ku di Alfeba Kurdî de nînin û di ya Erebî de hene, me ew bi du tîpan nivîsîne. Herweha ew tîpên şidiyayî yên di Erebê de jî, bi du tîpan nivîsîne. Û hin tîpên kurmancî hene û ku qalind têne xwendin, piranî ew jî bi du tîpan hatine nivîsandin.

Ez gelekî dilxwş û şad im, ku Rewdneîma Şêx Evdirehmanê Axtepî ji mirina timî filitî û bi tîpên Latênî ji xwendevanên Kurd re pêşkêş bû. Herweha bi vê xebata me, ger hindik be jî dê hin tîrêjên ruhnî bidin ziman û çanda kurdî û pê dewlemendiya zimanê me yê qedexekirî zêdetir bibe. Rewdneîm li Pirtûkxana Kurdistanê pîroz be û giyana Şêx Evdirehmanê Axtepî şad be.

19 12 1990
**Zeynelabidîn Zinar**

Institut kurde de Paris

بیبیژن الهی تو ڤی شاعری ۞ نسو زی دناڤ دوزخو آڤری

ژبو ناظمو کاتبو ناظران ۞ ژبو قاریو سامعو حاضران

ژبو داو بابدە جملشان ۞ ژبو عالمان بعزو نشان

ژبو جملە صالحو صالحە ۞ ژبو روحی زار الفاتحە

بیسم اللە بو ابتداء کلام ۞ بحمد اللە دیسا بکم اختتام

ژ بی تو روح نکە شرمسار ۞ ژ وا لو کرە تو نیز مدار

تمت

## تتمة لكتاب روض النعيم

بسم الله الرحمن الرحيم الحمد لله الذی اغرق سفائن آمال سکان بحار النظم فی تموج استغراق حردایته والشعراء يتبعهم الغاوون ۞ ثم حرك سلسلة استثناء فلاح الا الذین آمنوا فاخرج سفينة الشعر الاسلامی الی ساحل النجاة و سلمهم من تیه ظلام و ہم فی کل واد یہیمون ۞ ہو الله الذی انطق طوطی ناطقة الانسان فی محاذات مرآت عرائس المعانی بلسان ان من البیان لسحرا فاعتبروا یا اولی الابصار ۞ وہو الحکیم الذی جعل عنادلیب الالسنة مترنما فی نیق قفص الأفواه من قوة الاذہان المستقیمة بفصاحة ان من الشعر لحکمة فانتبہوا یا ایہا الاحیاء ۞ والصلاة والسلام علی قافیة نظم الأنبیا ۞ قصیدة الاصفیا ۞ جوہر تاج الرسالة والسیادة ۞ و اسم البلاغة و الفتوة ۞ محمد الذی شنف بقوله الکریم العرب والعجم مسامع مجامع الحاضرین والغائبین ۞ المؤید

عدد یکون جمیع ابیات کتاب روض النعیم
٤٥٣١

بلغ التصحیح من اوله الی آخره بحسب اه‍ ناظمه وکاتبه ع‍ الرحمن الفقیر مع الدقة فی حر کاته والفاظه بقد الوسع والطاقة الامانیست او سهیت وصلی الله وسلم علی النبی الامی محمد وعلی اله وصحبه اجمعین

روحی

انا افصح

طرعرایس الکلام

Institut kurde de Paris

# HAZA KÎTABÛ REWDINNE'ÎM
## Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm
## We Bîhî Neste'în

# BEŞ 1

### BENDÊ EWEL
### DER MEBHESÊ BESMELE

Institut kurde de Paris

Bi namê xudawendê herdu sera
'Efû û xefûr û kerîm û Xweda

Şehînşahê bê 'ezl û fewt û zewal
Ezel her hebûye ebed layezal

Ji 'erşan heta ferş û însan û cin
Xwedaya te anîn wucûdê bi "Kun"

Di gel mar û mûr û nebat û tuyûr
Ji lutfa 'emîm a te hatin zuhûr (1)

Hemî hûtê behran û murxê hewa
Hemî şah û sultan û pay û geda (2)

Telebdarê rûzî ji xizna te ne
Ricadar û milxwarê babê te ne (3)

Munezzeh ji neqş û niqûşê Xweda
Muberra ji 'eyb û qusûrê Xweda

Te anîn wicûdê ji qudret felek
Muzeyyen bi kewkeb tijî ez melek

Kewakib teherruk dikin rûz û şeb
Melaîk îbadet dikin ba edeb

Te da çerx û eflakî her yek cuda
Bi new'ek teherruk ji 'erşê 'ula

Te çêkir ji emrê xwe dwazdeh burûc
Dikit şems-î tê da duxûl û xurûc (4)

Heman menzilan ttey dikit qursê mah
Elamet şeb û rûz e bê îştîbah

Ku ehlê cîhanê bizanin nîsab
Îbadet bikin bê sual û cewab

Te anî wucûdê ji kenza 'edem
Sehîh îstîdara kurra pir heşem (5)

Wedi' kir di nêv westê 'alem te erd
Evî cismê xakî digel ttûl û 'erd (6)

Te rakir ji erdê bixara xefîf
Mumezzec bi cismê hewayê letîf

Digel cuz-ê hûr î reşîşatê ma
Musexxer di mabeynê erd û sema

Institut kurde de Paris

Murekkeb ji wî cismê ebrê seqîl
Ji bo xeys û baranê eqwa delîl (7)

Nizûlê dikit abê pak î temîz
Ji wî cismê ebrê letîf î 'ezîz

Zemîn şeq dikit qadirê layemût
Ji hubbê nebatê ji bo zexr û qût (8)

Tedabîr û hikmet te da alemê
Ji "Qal û Bela"yê heta vê demê

Tu zanî hemî neqs û tamê di me
Hemî kizbê mehdd e kelamê di me (9)

Bi îsmê te qaîm sema û zemîn
Bi îsmê te her aşîkar û nehîn

Qiyam û qu'ûdê dikin cumle kes
Rutûb û yubûsê dikin xar û xes (10)

Ji îsmê te peyda ne kewn û mekan
Bi îsmê te ye gerr û fetlê zeman

Bi îsmê te dewran dikin neh felek
Bi îsmê te quddûsiyanê melek:

"Subbûhun, quddûsun" dibêjin mudam
Dikin ta'etê te hemî xas û 'am

Bi îsmê te xurşîdê nûrînşu'a'
Ji 'erşê di burcan dikit îrtîfa'

Nîhayet hemî cuz û kullê wucûd
Bi îsmê te ye wan qiyam û qu'ûd



Institut kurde de Paris

Medara hemî aşîkar û nihan
Li ser îsmê pak ê te ye her zeman

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

---

1- Di çapa Qoxî de "mar û mûran" nivîsiye.
2- Murx: Teyr.
Pay: Dewlemend.
Geda: Feqîr, belengaz.
3- Rûzî: Rizq, qût.
Bab: Der, derî.
4- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Dikit şems-î tê da duxûl û 'urûc"
5- Kenza 'edem: Xizneya nebûyî.
6- Wedi' kir: Bi cih kir, lê da rûniştandin.
Tûl: Dirêj.
'Erdd: Pahn, pan, fireh û rast.
7- Ebrê seqîl: Ewrê giran.
8- Layemût: Bêmirin, nemir.
9- Kizbê mehdd: Vira xalis, derewa bêxwê.
10- Rutb: Terrayî (ne hişk).
Yubûsî: Hişkayî.
Xar û xes: (Dirrî û mirrî) amac, şînayiya erdê ye.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 2

## BENDÊ SANÎ

## DER MEBHESÊ HEMDÊ XWEDA

Me hemd û sena kir hezaran hezar
Ji bo xaliqê heyy ê perwerdîgar (1)

Xwedayê ku îman û îslamê tam
Bi rehma xwe da me nekir telxîkam (2)

Wedi' kir Xweda musteqîmî terîq
Heçî muhtedî bû bi rehma heqîq

Welê herçî daser sebîlê xîlaf
Mu'ezzab dibit ew bi narê xîlaf

Hinarî ji bo ummet Ûmm-ul Kîtab
Ku pê ferq bibîtin xeta û sewab (3)

Ewî cennetê şad û xurrem heme
Xwedayê me peyda kir û daye me

Şukur bo te ya Reb te anîm wucûd
'Edem bûm mûqeddem kî nîşan nebûd

Bozurgî te da min ji lutfa 'emîm
Di nêv naz û nî'met xerîq û muqîm

Institut kurde de Paris

Mûşerref kirim ez bi dînê mubîn
Kirim peyrewê Seyyîd-il Murselîn

Şukur bo te ya Reb li ser herdu çav
Te da min ji rehma xwe ev herdu çav (4)

Ku pê kim nezer ez li sun'ê Xweda
Beser ez nekim serfê men'ê Xweda

Şukur bo te ra Reb te da min lîsan
Te pê xelqî kir nutqê şêrîn beyan

Evî nutqê pakê fesîh î delal
Te bexşî ji bo min eya Zelcelal!

Tîlawet bikim pê kelamê qedîm
Digel hemd û tesbîhê şahê kerîm

Bikî hifzzê ya Reb zebanê feqîr
Nekit serfê nehyê te heyyê qedîr!

Şukur bo te ya Reb li ser herdu dest
Şukur bo te ya Reb te ev neqşê best

Te best in li min ev du destê temîz
Muzeyyen te pê kir wucûda 'ezîz

Te lê çêkirin deh esabi 'temam
Ji bo meslîhet her yekê der meqam

Ku pê xeyr û sedqe bidim sailan
Bidim ser serê sêwî û bê dilan

Ricayê dikim ez ji te her nefes
Ku betş û te'edda nekim pê li kes (5)

Institut kurde de Paris

Şukurbo te ya Reb li ser herdu pa
Şukur bo te her dem Xwedaya Xweda!

Te da min ji rehma xwe du payê pak
Ku se'yê nekim pê "îla ma sîwak" (6)

Bikim se'y û meşya 'îbadet bi wan
Nekim cehdê zulm û xiyanet bi wan

Şukur bo te ya Reb te da min 'eqil
Digel xemseyê batîne, qelb û dil

Ku van cem'î kim ez bi însaniyet
Binasim sebîlê li wehdaniyet

Xerabî û qencî bi wan ferqî kim
Ne ku wan di zenban bitun xerqî kim (7)

Nekim serfê efkarê batil heme
Negêrim ji hukmê te xalif heme

Eger destegîrî nekî her zeman
Ji dest nefs û şeytan eman sed eman

Nîhayet me 'icz e ji hemd û sena
Nizanim edakim senayê Xweda

Wekî Şeyxê Se'dî ji fikrê ezîz
Deranî evê beyta pak î temîz

Ji bo yumnê anî me danî li ha
Ku tehqîqê 'icze ji hemdê Xweda

'Ettaîstî her mû ez û ber tenem
çikûna bi her muyî şukrê kunem (8)

Institut kurde de Paris

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

---

1- Bêjeya "heyy", di çapa Qoxî de "heqq" nivîsiye.
2- Telxîkam: Kêmaqil, sefîl.
3- Ûmm-ul Kîtab: Qur'an.
4- Ev malik û ya li pey wê, tenê di çapa Qoxî de hene.
5- Di çapa Qoxî de ev nîvmalik weha nivîsiye:
"Ku betş û te'edda nekim ez li kes"
6- "Îla ma sîwa": Ji te pêve, ji xeynî te.
7- Bitun: Bêjeyeke Tirkî ye û eslê wê "butun" e,
bi mana "tev, hemû, hemî" tê.
8- Ettaîst: Dan, dayin.
Ber tenem: Ser laşê min.
Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"çiku nabe her mûyî şukrê kunem"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 3

## BENDÊ SALIS
## DER TEWHÎDÊ BARÎ Û ÎMANA
## BI WACÎBAT

Bi ezman didim şahidî dil teba
Ku me'bûdê bîl heq nehin cuz Xweda (1)

Ji 'erşan heta muntehayê zemîn
çi me'bûdê bit aşîkar û nehîn

Hemî battil in xeyrê zatê Xweda
Îbadet ji wî ra terîqê huda

Yek e bê heval û şerîk e yeqîn
Ne muhtac e bo piştîban û mu'în

Bi zatê xwe ew qaim e bê guman
Munezzeh ji xewt û cîhat û mekan

Muqeddes ji manend û misl û zzehîr
Xenî ew ji ceyş û sîlah û wezîr



Institut kurde de Paris

Di fi'la xwe de ew ne muhtacê kes
Nehin hacib û pasîpan û 'eses

Heçî ew îrade bikit dê bibit
Neşin hîçî kes fi'lê wî men'î kit

Ne da û ne bab û ne ewlad e wî
Ne zewc û ne zewcet ne ehfad e wî

Ne xwab û ne xwûr ne lîbas û fîraş
Ne rast û ne çep wî ne pêş û ne paş

Ne jêr û ne jor e ji bo zatê pak
Ne ez bad û ateş ne ez ab û xak

Li ser wî neborîne ezman û hîn
Ne mazî ne hal û mudari' çunîn

Bizan wacib e her wucûda Xweda
Şerîk mumteni' mumkine masîwa

Li wî newm û hidsan û mewt in 'edîm
Qedîm e, qedîm e, qedîm e, qedîm

Elîm e, kerîm e, murîd û qedîr
Hemîd e, mecîd e, semî' û bessîr

Heyat û kelam e ji bo wî sîfat
Ewî xelqî kir cumleyê mumkînat

Ew e cami' e bo sîfatê kemal
Sîmatê neqis nîne bo Zulcelal

Eger haşa cuz wî hebûna îlah
Dibû erd û esman bi yekser tebah?

Institut kurde de Paris

Ji bo wî re me'dûm e hemta û zid
Di hukmeş nehin hîçî enbaz û nid (2)

çi humkî muqedder bikîtin Xweda
Ji kes ra tune zehre çûn û çira!

Li ferdiyeta wî Xwedayê semed
Guwah e ewî "Qulhuwellah Ehed"

Mûsellem li nik cumle heyy û cemad
Bîlaşek wucûda Xweda yê 'îbad

Ji bo xeyrê wî re bozurgî çunan
Mecaz e, mecaz e, mecazî bizan (3)

Ew e şahê mutleq di hukmê xwe yek
Di ferdiyyeta wî nehin reyb û şek

Wehareng e me'bûdê heq e kerîm
Ew e malîk-ul mulkê îhsan'emîm

Bi cuz zatê wî nisbeta padîşah
Wekî çopê şetrenc û esmayê şah

Ewî padîşahê 'ezîz î mecîd (4)
Qerîbtir bizane ji hebl-îl werîd

Xebîr e bi eqwal û fi'lan heme
Bi sirr û 'elaniyyetê 'alim e

Henuz nebwe niyet di dil de wucûd
Xebîr e, ewî padîşahê Wedûd

Kuşade mûqîm babê 'efwa Xweda
Ela ey gunehkarê heyy û hela!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE
Institut kurde de Paris

Bi 'isyan û zenban li ser hîçî kes
Muxelleq nekir babê xwe yek nefes

Di "Kun"hê Xweda de teheyyur heme
Nikarin bikêşin tesewwur heme

Qiyas û tesewwur 'uqûl û xiyal
Li ser zatê Barî bettal in, bettal

Hemî cin û heywan û ins û melek (5)
Di kunheş, ferûmande ne yek bi yek

Zi ma medhetê zatê Mewla çunan
Kî mûrî mîsahe kuned asîman

Ne hedd û wezîfe ji bo hîçî xelq
Bizanin heqîqet li sultanê heq

Kefîl e ji bo rizqê însan û cin
Digel cumle heywan Xwedayê mezin

Mudebbir, muqeddir ew e her zeman
Wehareng e muhyî, mumît e çunan (6)

Dema bête 'efw û kerem ew Xwuda
Ji hev muznib û qenc ê nabin cuda

Me'azellah! ger bête qehr û xezeb
Resûl û nebî têne xewf û te'eb

Eger çi gunehkar û bednam im ez
Welê şukrulîllah ku îslam im ez

Muqîrr im bi wehdaniyet bil'lîsan
Museddiq bi qelb û bi dil hem çunan

Institut kurde de Paris

Muhemmed resûlê şehê layezal
Hinarî ji bo cinnû însan delal

Hemî enbiya û resûlê di wî
Heq in cumle meb'ûsê ba emrê wî

Ku teblîxê ehkamê Mewla bikin
Şerayi' li 'alem huweyda bikin

Bitûn butperestan û ateşperest
Bikin ew bi hukmê Xweda zîrê dest

Bi wan cumleşan mumin im sed sipas
Ji bo zatê Mewla bitin bê qiyas

Kîtab û Suhuf cumle heq in yeqîn
Xweda kirne nazil ji bo murselîn

Welê nasixê hukmê cumle kîtab
Bizane ku Qur'an e 'alîcenab

Kelamê qedîm e, çu durrê nefîs
Muweşşeh, muzeyyen bi nezma selîl

Ji bo me îmam e bi fedla Xweda
Ji bo cumle alem ew e muqteda

Li me ferz û hetm e, li me lazim e
Bikin î'tîqadê şerayi' heme

Melaîk ji bo Reb hene bê hîsab
Birûn in ji 'edda şomar û kîtab (7)

Zewî ecnîhe du û sê yû çîhar
Musexxer li ber emrê perwerdîgar

Institut kurde de Paris

Mûtî' in ji bo emrê Rebbê mezin
Ne akil, ne şarib, ne mêr in, ne jin

Ji wan re 'îbadet çu ekl û şerab
Musebbih, mûqeddis bedel xwurd û xwab

Ji bo meslîhet cumle memûr in ew
Ji ta'etê Mewla ra mecbûrin ew

Bi mewt û bi qebr û sûal û heşir
Bi cennet, bi dûzex, Sîrat û neşir

Wehareng e wezn û qeza û hîsab
Di nêv ehlî mehşer 'îqab û sewab

Şefa'et ji ewel ve bo Mustefa
Li dû wî, heçî ehlê sidq û sefa

Lîqaya Xwedayê xefûr û kerîm
Ji bo muminan der cînan û ne'îm

Bi van cumleşan mumin im lacerem
Nehin reyb û şek nik me, ey muhterem

Xwedaya bidî vî feqîrê nekes
Evê î'tîqadê di axirnefes

Li ser vê 'eqîdê me ez der heyat
Xwedaya bidî min di hîna memat

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

Institut kurde de Paris

1- Cuz Xweda: Ji xeynî Xwedê.
2- Enbaz û nid: Şirîk û ortax.
3- Bozurgî: Mezin, mezinatî.
4- Hebl-îl werîd: Reha mirinê.
5- Kunheş: Rastî, heqîqet.
Ferûmande: Mat, heyret.
6- Muhyî: Saxkirox, jîndar.
Mumît: Mirdar, kujek.
7- Di çapa Qoxî de, ev nîvmalik weha ye:
"Birûn im ji 'edd û şumara kîtab"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 4

## BENDÊ RABI'

## DER MEBHESÊ SELAT Û SELAM

Institut kurde de Paris

Ji qittrê di berf û metter zêdetir
Ji 'edda nebat û hecer zêdetir (1)

Bi 'edda hesat û sera û remil
Nicûmê di esman û zerr û nemil

Digel cumle ewraq û bergê dirext
Eded têk nebatan ji nerm û ji sext

Eded weznê seqla cîbal û qubab
Bi mil-ê bîhar û bi ewzanê ab

Şomara hemî şi'r û rîş û weber (2)
Li ser teyr û heywan û cinn û beşer

Bi 'edda cemî'ê hibûb û nebat
Digel cumle eşyayê der kaînat

Bi 'edda hemî terfet-îl'eyneha
Ku terfe bikin ehlê erd û sema

Hîsaba muhatî bi 'ilmê Xweda
Tijî 'erş û hem Sîdret-ul Munteha

Tijî asîman û zemîn bit çunan
Di mabeynê wan û bîharê giran

Bi mil-ê cînan û ne'îmê mezin
Bi 'edda hemî lefzê însan û cin

Jimara cemî'ê hurûf û kelam
Ji weqta ezel ta bi yewm-îl qiyam

Tîlawet bibit yan kîtabet bibit
Tesewwur bibit yan qîraet bibit

Digel cumle şey-ê di Lewhê kebîr
Ku pê xame gêraye şahê Qedîr

Hîsab û 'eded xerqî kit serteser
Ne axir ji wî re hebîtin ne ser

Digel têkde ne'ma û alayê heq
Ku pê fezlê kirye Xwedayî li xelq

Wehareng e medrûbî bit cumle 'ed
Di nefsa xwe de ba hîsab û 'eded

Muza'ef bitin ev 'eded her wusan
Riza Heq di wê da hebit her zeman

Mukerrer bitin ew peyapey mudam
Nebit munqetti' qet nebîtin temam

Di cumle zeman û di cumle mekan
Di cumle meh û lehze û hîn û an



Institut kurde de Paris

Digel cumleyê zerrehayê wucûd
'Eded lê dizanit Xwedayê wedûd

Bi 'edda me'anî kelamê qedîm
Bi mîqdarê cûda Xwedayê kerîm

Qeder 'efw û rehm û qeder qudretê
Muhattî bi sem' û besser bighetê

'Eded mewcê behran û neşrê hewa
Bi hijmarê nexmatê teyrê hewa

Heta qelbê aşiq bisûzit bi nar
Evî narê 'işqê şewat ê xedar

Şomarê cemî'ê sellat û selam
Ku hatine gotin li Fexr-îl Enam

Heçî bête gotin heta sa'etê
Ji bo padîşahê evê ummetê

Ne 'ed jê re peyda bitin ne hîsab
Ne mezbûttê xame ne hessra kîtab

Bi 'edda hubûba riyah û hewa
'Eded kullê eşya û daû, dewa

Muqarin bi hubb û rizayê Xwuda
Di heqqê ewî padîşahê huda

Heta bête roj û biçit leylê dac
Heta bête dergeh yedê ihtîyac

Mutehher, mukemmel sselatê kubar
Ji rebbê ssemed, heyyê perwerdîgar

Institut kurde de Paris

Muqarin bi hinde selamê şerîf
Bi hinde tehiyyatê pak ê zzerîf (3)

Mûbarek, mu'ezzem celîl-ul qedir
Muwafiq, mutabiq bitin ba emir

Sselatê ku razî bikit Girdîgar
Me jî pê 'efû kit kerîmê xefar

Muza'ef, mukerrem bitin ev qeder
'Eded cumle enfasê cinn û beşer

Bi miqdarê siqla zemîn û sema
Digel 'erş û Kursî yû ehcar û ma

Li ser zatê pak ê hebîbê Xwuda
Îmamê resûl, pêşîwayê huda

Şehê fexrê alem, nebîyyê kerîm
Şehînşahê ewreng ê xulqê 'ezzîm

Xwedawendê seyf û Kîtaba mubîn
Şefa'etkirê xelqê, şahê emîn

Îrade dema kir Xwedayê wedûd
Ku alem bikit serteser der wucûd

Sudûr bû kelamê muqeddes qewî
Ku -Zatê me, teşbîhê kenza xefî

- Me hezkir ku me'rûfî bit zatê pak
Me anî wucûd kir xelayiq ji xak! (4)

Ji ewwel ve yek qebze nûra 'ezîm
Ji nûra xwe girtî Xwedayê kerîm

Institut Kurde de Paris

Bi emrê Xweda nûrê pak î Xuda
Muhewwelşode bû îmamê huda

Di qendîla te'zîmê çendan hezar
Sinînê 'edîde bû tesbîhîdar

Heta weqtê xilqîyeta Adem-î (5)
Di qendîlê tesbîhî kirbû hemî

Mutehher, muqeddes, muzeyyen delal
Munewwer, muşe'şe' ji nûra zelal

Ji pertawê nûra wî cumle rusul
Digel enbiya bûne peyda çu gul

Ku Adem wucûd kir yedê qudretê
Ewê nûrê zahir kete cebhetê

Ji Adem bi pişt û zikê tahîre
Neqil bû heta Amîna faxîre

Şebê dewletefzûnê mewlûdê pak
Cîhan serteser rewşen û tabînak

Tezelzul ket Eywana Noşîrewan
Hedim bûn ji wê çarde burcê giran

Li Faris vemiryane ateşkede
Bi dev sernixwûn bûn hemî butkede

Li ser wechê erdê senem serteser
Di butxaneyan bûne zêr û zeber (6)

Hemî hûtê behran û wehş û tuyûr
Bi mizgîn û şahî bi ferh û surûr

Institut kurde de Paris

Cîhan pir ji tîrêjê nûra Xwuda
Ji yumna qudûmê nebiyê huda

Ku çil sal-î borî ji emrê Resûl
Bi Wehya Xweda sedrê sahib qebûl

Ssela da ji bo cinn û însan heme
Bû şahînşehê şah û sultan heme

Bi destek kîtaba mubîn î sedîd
Bi destek di şimşîrê tîj î şedîd

Bi nessa kîtabê şerayi' durest
Bi tîxê mûbarek ssenadîdî pest

Ji axir ve bû şahê axirzeman
Welê ez ezel serwerê serweran

Heçî hate ber payê şahê rusul
Bişod maşiyê rahê ehdes'subul

Heçî wechê bêyumnî gêrra ji heq
Serê pîs ê bêdewleteş bû du şeq

Bi şer'a mutehher huda bûn gelek
Bi şîrê mûbarek fena bûn gelek

Hezaran çu Neccaşî û Qeyserî
Vewestane xizmetguzarê derî (7)

Îmamê Herem weqtê rakir 'elem
Mutî' kir bitun şah û mulkê Ecem

Ewe fexrê ummet li herdu sera
Xusûsa şefa'et di rojê ceza

Institut Kurde de Paris

Wehareng e ser enbiya û rusul
Xusûsa Ûlul'ezmî nêv wan çu gul

Li ser al û eshabê wan cumleşan
Di nêv ehlê alem de sahibnîşan

Xusûsa li ser al û sehbê Nebî
Ruh û can û mal im fidayê ewî

Nucûm û mesabîhê rahê huda
Di ber dinê îslamê de canfida

Mûhacir digel cumle ensarê wî
Hemî tabi' û şî'e û yarê wî

Xusûsa Ebî Bekrê Siddîqê Xar
Şeqîqê refîq ê hebîbê kubar

Ew e çêtir û efzelê ummetê
Ew e "Sanî îsneyn"ê der Ayetê

Di sidqê qedem da di ber Mustefa
Heta ku qedem da devê ejderha

Wehareng e "Farûq"ê sahibhuner
Xwedan'edl û heybet Îmamê 'Ûmer

Ebî Hefssê Fariq di nêv kufr û dîn
Îmamê duwem, paşî Şahê Emîn

Îmamê ku xaif ji wî îns û cin
Li ser destê wî bûn fitûhê mezin

Û hem ser Îmamê Siyem bê riya
Ewî zatê 'Ûsmanê sahib heya

Institut kurde de Paris

Muşerref bi fezla şehadet kerîm
Li ser xwendina wî kelamê qedîm

Ji ber şiddeta şerma xwe ew mezin
Nego "Bo çi se'yê dikin qetla min?"

Îmamê çiharem Eliyyê kubar (8)
Hezebrê Xweda, şahê Duldul suwar

Derê beldeyê 'ilm û kerrarê sef
Îmamê bi heq şahê Textê Necef

Ji şimşîr-î xwûn barî wî der mesaf
Cîla daye dînê mubîn bê xîlaf

Û hem ser îmameynî pur ekremeyn
Îmamê Hesen ba Îmammê Huseyn

Şehîdê se'îdeynî, sibteynê pak
Ji bo Mustefa qurretê 'eynê pak

Û hem Hemze, Ebbasê 'emmê Nebî
Ewî zatê pak ê nebiyyê ummî

Û hem Ebdirrehman û Se'd û Seîd
Digel Telhe û Bo 'Ûbeyde Seîd

Zubeyrê mukenna bi Îbn-î 'Ewam
Ku "'Eşrê Mubeşşer" ev in bît'temam

Û hem cumleyê zewceyê tahîre
Digel duxteranê qewî faxîre

Rizaya Xweda bit li ser wan heme
Bi cah û bi teb'îyyetê wan li me



Institut kurde de Paris

Li da û li babê me û muminîn
Û hem cumleyê munînat 'ecmeîn.

Feqîrê gunehkar im ez bê umîd
Şefa'et bikî min di rojê şedîd

Dizanim tu şahînşeh, û ez geda
Terehhum ke ber bêkesê bê newa

Eger der bikî vî feqîrê zelîl
Bi cuz babê rehma te kor im 'elîl

Ji 'ussatê ev ummet im el eman
Me nespêrî nefsa me ya bedguman!

Nîgahê bi rehmet li min kî eman
Li ser min giran bûne isyan, giran

Di Roja Qiyamet ku rabim melûl
Min û dest û damenê alê Resûl

Li dunya û 'uqba di subh û mesa
Menem sailê babê Ehl-îl 'Eba (9)

Hezaran sselat û hezaran selam
Li Peyxember û al û sehban temam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

1- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Ji qetrayê berf û metter zêdetir"
2- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Şomara hemî şi're û rîş û per"
3- Muqarin: Nêzîkayî.
Hinde: Hindî...
4- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Me anî wucûdê xelayîq ji xak"
5- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Di qendîlê tesbîhîgo bû hemî"
6- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Hemî wechê erdê senem serteser"
7- Neccaşî, milûkê Hebeşîstanê bû. Wî bi Pêxember re peyman kiribû û pê bawerî anîbû.
Qeyser, bernavkê milûkê Romê (Bizans) bû.
8- Hezebrê Xweda: Şûrê Xwedê, fêris, egîd, qareman.
9- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Men în sailê bab ê Ehlê 'Eba"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 5

## BENDÊ XAMIS
## DER SEBEBÊ NEZMÊ KÎTAB

Ji paş Besmele, Hemdele, tesliye
Bizanin ji min herçî ev dîtiye

Dibêjit feqîrê gunehkar î jar
Zelîlê perîşanê pur zenbîdar

Geda ye bi deryûze ber babê heq
Nehêla di 'isyan ji kes ra sebeq

Rijandî bi zemb û guneh abê rû
Bi lehw û bi xeflet hemî 'umr ê çû

Sexîrê bi 'umr û bi 'isyan kebîr
Ji ta'et qelîl û ji zenban kesîr

Gunehkarê ruxzerdê pur xewf û bîm
Feqîrê li babê Xwedayê kerîm

Feqîrê bîharê gunahê mezin
'Emelpîstirê cumle yê îns û cin

Institut kurde de Paris

Evî Ebdurrehmanê jar ê melûl
Leqeb "Şemsuddîn"ê zelûm û cehûl

Cîger murte'ib Rûhiyê Şafi'î
Evê rûsiyahê weten Axtepî

Li ser i'tîqada Îmam Eş'erî
Terîqet bizan Nexşiyê Xalidî

Kemerbendê seccadeyê Nexşiyan
Ji xizmet guzaranê wan ewliyan

Evê mucrimê bê newa, cangudaz (1)
Bi vî terzî wî xame kir nexmesaz

Li min îqtîrah kir birayê 'ezîz
Hebîbê cîger, nazîdarê temîz

Exê nesbiyê min bi bab û bi da
Şêrîntir ji ewlad û ew reng bira

Di cismê mi de, naibê rûh e ew
Di tofanê xem, Keştiya Nûh e ew

Ji çeşmê mi re menzila merdumek
Bi wî ez dibînim zemîn û felek

Eceb hogir û hemneşîn der hezer
Hevalê qewî hem rîkabê sefer

Munewwer bi wî xan û manê di min
çiraxê dil û quwweta canê min

Ji qelbê mi re meyweyê nûbihar
Ji rûhê mi re qûtê sed rûzîgar

Institut kurde de Paris

Ji çeşmê mi re qurret-ul 'eynê 'eyn
Rica ew bikit zimmet e, deyn e, deyn

Mûtî'ê Xweda 'abidek bît'temam
Heşaş e, beşaş e, bi şêrînkelam

Bi her kes 'ezîz û zerîf û delal
Li nik min şêrîntir ji milk û menal

Xeberxweş yeqîn ehlê suhbet qewî
'Eceb niktedan, şubhê kenza xefî

Hebîbê min ê aşîkar û nîhan (2)
Bi îsmê "Muhemmed" welê "Can"ê can

Birayê bi vê teb'et û hey-etê
Teleb kir ji min, da bikim xîretê

Nezim kim kelamê selîs ê fesîh
Ku 'ed kim şemaîlê şahê melîh

Xusûsa birayê dîger pur şekûr
"Muhemmed" kî alem bidûşod bi "Nûr"

Birayê dîger an ke der leylê dac
"Muhemmed" kî efraşîten yê "Sîrac" (3)

Vemam ez teheyyur di vê gotinê
Nikarim cewab dim, neşim gotinê

Te'ellul me çendan kirin bê hîsab
Ku nayê ji destê me nezm û kîtab

XusûsaŞ hedîsa Resûlê kerîm
Digel rawiyan û rîwayet 'emîm



Institut Kurde de Paris

Ne zêde, ne kêm kim rîwayet ebed
Ji destê me nayêtî, min xeyrê hed!

Nîhayet xelasî nebû j'îqtîrah
Dirêj kir li min gotin û îltîhah

Cewaba 'ezîzî ezîyyet li min
"Ne'em" bêjim ez, zor û zehmet li min

çu axir cewabdan me rê tê nedî
Li nezma kîtaba xwe bûme xwedî

Bi fikrê di fikra xwe ya qasîre
Wekî şûşeya pare û kasîre (4)

Li zihna xwe min kir temaşa gelek
Tijî rexne ez cewr û zulma felek

Felek hey, felek hey, felek hey felek!
Te Rûhî be'îd kır ji çeşmê belek!

Cîger pare-pare ji hicra hebîb
Ziyade muellem ji cewra reqîb

'Ewayiq 'elayiq hemî sef bi sef (5)
Vewestan li min fikrê min kir telef

Hezar fikr û pansed hezar xayîle
Li fikra me bûn perde û haîle

Xusûsa nîgara min î nazîdar
Ji çeşmê xwe avêtime hey hewar!

Di vî haletê şiddetefzûn qewî
Perîşan û sergeştê hamûn qewî

Institut kurde de Paris

Jimin zêde bazarê evreng meta'
Ji ber qilleta mal û qisrê zîra'

Dizanim ne meydana rexşê min e!
Ne ser lewheyê xett û nexşê min e!

Kemalatê min nîne, bar e li min
Kîtaba wiha 'eyb û 'ar e li min

çiku zêdeyê hed û tewrê min e
Ne bostanê ezhar û newrê min e

Welêkin î'anet ji Rebê kerîm
Mededxwah im ez lutfa şahê 'ezîm

Me teşmîrî kir sa'idê hîmmetê
Nezim kim kelamê digel diqqetê (6)

Me destê xwe da ser serê xameyê
Ku pê nexşî kim sûretê Nameyê

Qelem hate cumbuş bi işqa giran
Bi ferqê serê xwe di emr im rewan

Heraret ji qelbê me kêşa qelem
Ji sûzê cîger xwîna reş hate dem

Muneqqed, muneqqa kelamê selîl
Nezim kim di silkê çu durrê nefîs

Binêrin li şi'ran heçî zaniye
çi terkîbekî serfê kurmancî ye

Ji kurmanciya xwe me anî nîzam
Mu'ella û şêrîn û efseh kelam



Institut kurde de Paris

Ji kurmanciyê zêde şêrîn niye
Welêkin xerîdarî çendîn niye

Eger min bidîta xerîdarî qet
Rewan dê me bikra bi teşbîhê şet

Kelamê di Kurdî bi nezm û wezin
Me bîna wucûdê kîtabê mezin

Ji tenzîmê Kurdî sual û cewab
Me bînane nezmê hezaran kîtab

Welê îktîfa kir ji nezmê hemîn
çiku kes nehin bêje min "aferîn"!

Me kêşa eziyet evan çendî rûz
Ji Kurdî kîtabek bi saz û bi sûz

Ku da Turk û Faris nebêjin tucar
"Nebûn Kurdî nîşanê işqa xedar!"

Wereng şairê Kurd ê şêrînkelam
Hene, şi're wan zêde ehsennîzam

Welêkin te'essub nemaye li me
Ji vê, Turk û Faris cuda ye li me!

Me ev çendî lefzê şêrîn çêkirin
Zebanê di Tirkan me pê jê kirin!

Me hêvî ji nezzareganê ezîz
Ku çavan bidin ser vê nezma temîz

Nekin herfigîrî li min şa'irî
çiku par e me battin û zahirî (7)

Institut Kurde de Paris

Ji hicrê tijî qelbê min rexne ne
Elamatê işqê eser lê hene

Û hem taze nûbarê baxê me ye
Ji ewel ve şûla çiraxê me ye

Ji pêşî niha min xeta û sewab
Nekêşaye nezm û nîzamê kîtab

Eger çi xezel min hebûn me'newî
Welê min nebû şi'rî qet mesnewî

Ji bo xatirê wî birayê 'ezîz
Me anî nîzam ev kelamê temîz

Me tesmîye kir ew bi "Rewdin'ne'îm"
Di 'edda şemaîlê şahê kerîm

Mebe muxttiê hîçî kes zînîhar!
Ku paşê nebî xattiyê payedar

'Emel kin bi qewlê şehê layenam (8)
"Îza merrû bîl'lexwî merrû kîram"

Du'a kin ji bo min gelî naziran
Qewî mam di bin barê zenbê giran

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

Institut kurde de Paris

1- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Bi vî terzî wî name kir nexmesaz"

2- Mihemed Can, Mihemed Nûr û Mihemed Sîrac hersê birayên Şêx Evdirehmanê Axtepîne. Îcar çewa ku ji helbestan tê zanîn, Evdirihmên li ser daxwaza wan ev pirtûk nivîsiye.

3- Ev nîvmalk di çapa Amedî de weha ye:
"Muhemmed kî efraşîteste Sîrac"

4- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Mi fikrî di fikra xwe ya qasîre"

5- 'Ewayiq: Zemanê biteşqele.
'Elayiq: Sergêjiya îş, bûyer, siqûmat, tifaq.

6- Teşmîr: Pêçana ûçik li zend (qevdetik).
Sa'id: Zend, mil, çeng.

7- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Nekin serfegîrî li min şa'irî"

8- Mana Ayetê weha ye: Dema ku bi xirabî bihurîn, bi qencî peyivîn.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 6

## BENDÊ SADIS

## DER TELEBÊ ÎMAN EZ SAQÎ Û MÛXENNÎ

Were saqiyê Camê Cem bê wuqûf
Li min cem'î bûne ji xem sed ulûf

Şerabek 'eqîq erxewanî bi cam
Du-sêkan bide min ku birjit kelam

Kerem ke meya nabî der Camê Cem
Cemi' bûne ser min hezar kûhê xem

Ji hicra hebîbê, ji cewra felek
Melûl û perîşan û zar im gelek

Bide min şerabê ku pur alî bî
Bi rengê xwe yaqûtê seyyalî bî

Ji ekdarê çerxê muqernes qewî
Hezîn mame bê yar û bê kes qewî

Institut kurde de Paris

Tu zanî çi agir di qelbê me da
Ji hicrê, li cerg û li dil şûle da?

Eman bûm ji hicra nîgarê kebar
Me ihya ke dîsan bi camek şerab

Me qesd e bikim şairî çend nefes
Ji xeyrî te nîne me feryadîres

Were saqiya bîne ritlê giran
Bide min ku nû bim şebab û cuwan

Elamatê pîrî ji min mehwî ke
Li şemsa me ewr e, were ehwî ke

Were hey were saqiyê sîmîsaq
Bide badeya nabî, şekermezaq

Bide saqiya cama safî şerab
Ku qelbê me dewran bikin wek hubab

Ji destê xwe bavê evan saxeran
Bide min bi ekwab û ritlê giran

Nizanim bi eqdah û saxer tu car!
Bi kûpê mezin ez dibim neş-edar!

Were saqiya badeya tazerû
Bide min ku ez pê bibim surxerû

Bide saqiya camê lebrêzî pur
Welêkin şerabê neqî yî çu durr

Binêre di weqta ku sergermî bim
Di înşayê şi'ran çi bêşermî bim

Institut kurde de Paris

Were saqiya el 'ecel bê futûr
Meke sistekarî neyim ez sebûr

Bide satekînê museffa ji durd
Dikin îştiyaqî Ereb, Rom û Kurd

Ji ekdarê dunya nema taqet im
Perîşan û sergeşteyê firqet im

Eger 'ewneta min nekî tu bi can
Neşim nezmê kim beyt û şi'r û kelam

Vekuj ateşê min bi camek şerab
Çiku dil ji hicrê pur ez îltîhab

Were saqiya zû bike himmetê
Huner min nemaye ji dest firqetê

Dilê pirelem b'ateş û pêt e min
Bide camê mey da tereb bête min

Hezar xar û şewk in ji hicrê di dil
Mumezzec bike bade ba abê gul

Bide min ku merhem be bo cerhê min
Sebeb bit ji bo cunbuş û ferhê min

Xiyala nîgarê ku teswîrî kim
Binêre kelamê ku teqrîrî kim

Ku îhsan kî bo min bi çend camê mey
Xefîf bin hinik zexm û ekdar û key

Tereb bête qelb im pes ez qîl û qal
Nezim kim çi ebyatê sahibkemal

Institut kurde de Paris

Were saqiya qet meke xewf û bîm
Bide badeyê wek tîba'ê selîm

Ji bo min xumûm û humûm in refîq
Ji meyxaneyê bîne abê 'eqîq

Li ser qelbê min barî xem bê 'eded
Bide saxera badeyê el meded!

Ji firqet nema min quwa û hewas
Peyapey bide camê mey bê heras

çu îmşeb şebê 'işreta dîlber e
Ji exyarî xalê hebîb rehber e (1)

Munexess megêre evî weqtê xweş
Mukerrer ke saxer bi penc û bi şeş

Nizanim ku subhê wuha bête dest
Weyaxud perîşan bibim zar û mest

Şevê me hemî hamil in serteser
Hela çi wîladet dikin der seher?

Were saqiya ateşê zewqîdar
Bide min ku ez pê bikim îftîxar

Suwar bim li Rexşê wekî Rostem-î
Beyan kim hinek halê vê alemê

Wekî pehlewan rû bi meydan bikim
Ji keyfa dilê xwe çi cewlan bikim

Muqabil nebin hîçî şair bi min
Hesed kin bi batin, bi zahir ji min

Institut kurde de Paris

Were saqiya bîne camê şerab
Mi jî pir hewa ke bi mislê hebab

Ku seccade û xerqe û sebheyê
Bikim rehnê bade di meyxaneyê

Ji ekdarê dunya me kêşa eman
Bi lez min xwe avête dêra mûxan

Kerem ke bi min çendî camê kebîr
Bikim serfê bade qelîl û kesîr

Bikim keşfê esrarrê dil bêxwedî
Kesê mestî bit nîne şerm û fedî

Elemdar im ez hicrê yara zerîf
Bike destegîrî bi camek şerîf

Bide saqiya abê ateşsîfet
Di dil da vekit dergehê me'rîfet

Di dil da hene rexne û zexm û rîş
Bi teşbîhê suraxê zenbûrê nîş

Bike seddê van rexneyan ez şerab
Ku nezmê dirêj kim bi mislê tenab

Bi camê tu min laubalî bike
Ji 'eql û xired cumle xalî bike

Bide saqiya badeyê pur fitûh
Ji tofanê xem min xelaske çu Nûh

Kuşade bibit bo me dergahê raz
Nezim kim çi eş'arê durr ê diraz

Institut kurde de Paris

Bide saqiya erxuwanî qedeh (2)
Ji bo dil bibit keyf û 'eql û fereh

Ku çend cur'eyan ez ji saxer çeşem
Li e'layê gerdûn 'elem berkeşem

Bide saqiya mey ku derman e ew
Ji bo qelbê xeste wekî can e ew

Bide da bi yumneş xelas bim ji xem
Xeberdim ji ser sedhê çerxa Nehem

Bide saqiya bikrê mestê mudam
Di meyxaneyê da dikit ew meqam

Dixwazim di alem de bednamî bim
Murîdê mey û saqî û camê bim

Ku bîxod bim ez cama bê xil û xeş
Bibêjim ji bo te kelamê di xweş

Bidim dest-î ser xameya bê ziman
Ku nalende kim aşîkar û 'eyan

Bixûrek ji işqê di ateş bikim
Dîmaxê xired ta ebed xweş bikim

Derînim zebanek wekî Zulfeqar
Zebit kim mesafê kelam aşîkar

Bide saxerek (be'de kullî hîsab) (3)
Ku sergermî bim nû bi cama şerab

Binoşim bi işqê hebîba ezîz
Ku goyende bim şubhê tûtî temîz

Institut kurde de Paris

Ji bo min vebit babê fexr û kemal
Xeberdim ji enwa'ê behsê delal

Şeraba kuhen bit li cerh im dewa
Lezet bê dîmaxa minê bê newa

Li meydan zenem ne're şubhê esed
Birêjim durrê muntezem bê 'eded

Eger mey nedî nabe înşa kelam
Bide camê mey, camê mey wes'selam!

Muxennî tu jî çend meqamê surûd
Nezim ke li ahengê tenbûr û 'ûd

Muxennî were hem bi sûz û bi saz
Nezim ke ji perdan Îraq û Hîcaz

Ji hicra hebîbê elemdar im ez
Bi işqa nîgarê 'elemdar im ez

Eger pir dirêj bit li min ev fîraq
Dibim serteser ateş ez îştiyaq

Muxennî were sazî ke nexmeyê
Ku bavêjim ez xerqe û sebheyê

Ji eş'arê min gotî weqtê şebab
Bibêje li awazê 'ûd û ribab

Ku bêt fikrê min halê borî li min
Sehil bit hinik narê dûrî li min

Were saqiya camê bîne bi kef
Muxennî tu lê de li çeng û li def

Institut kurde de Paris

Ji barê xeman pir giran im eman
Di fikrê mi de yara min her zeman

Di weqtê cuwanî ji eş'arê min
Nezim ke ji lûlûyê efkarê min

Dirêj ke kelamê li ahengê 'ûd
Bisûzim li ber te bi manendê 'ûd

Bide dest-î ser sazê awazîdar
Ku em jî binalin wekî mûsîqar

Tu bestta me bîne bi awazê çeng
Muşerref ke goş im bi awaz û deng

çiku qelbî meqbûdd e ez hicra yar
Surûr û ttereb tê de nîne tu car

Bide qelbê keyfek ji awazê xweş
Bibêje ji ewsafê halê di reş

Ku bêt qelbê min keyf û bestt û surûr
Beyan kim ji bo te nikatê di hûr

Bikim 'erzî bo te bi terz û liyaq
Ecêbê ku anîne ser min fîraq

Muxennî were derd ê bê çare ye
Dilê min wekî xerqe sed pare ye

Evan pareyan her yekê bê hîsab
Tijî rexne ez cewrê yara şebab

çi bêjim ji maşûqê pir dûr im ez
Bi qelb û bi ruh û cesed hûr im ez

Institut kurde de Paris

Bizane ku yara ezîz î şefaf
Xezeb girt û avêtime Kohê Qaf

Ji hîcranê xûban dilim pare ye
Ji qelbê mi re sazê te çare ye

Mixennî kuca yî, kuca yî, kuca?
Tedarek bike çend meqamê newa!

Muxennî newayê ttereb sazî ke
Ji dil dest bi nexmat û awazî ke

Bide cergê min be'zî asayişê
Bişoyî ji qelbê me alayişê

Muxennî ezan sazê nexşî bi yar
Ku awazê me ez ji yar û diyar

Newayek tu bikşîne ez enderûn
Defi' ke ji min fikrê dunyaya dûn

Di erdê de maye ji xem herdu pa
Bi sazek derîne usûl im ji ca

Muxennî evan cerhê min çare ke
Bi awazê xweş cergê min pare ke

Meqamek bibêje meqamek çunan
Tereb bête sofî û zahid heman

Bide dest-î ser sazê awazîdar
Teselî bide min ji awazê tar

Ji wan tarê kîsûyê 'enberfişan
Li dil min hene sedhezaran nîşan

Institut kurde de Paris

Muxennî kuca yî, ku wextê gul e
Ji bulbul çîmenha tijî xulxule

Mi jî gul heye, lê be'îd e ji min
Gelek narê dûrî şedîd e li min

Wekî bulbulan nexme bîne zuhûr
Bide qelbê min keyf û ferh û surûr

Li aşiq wekî xem bibîtin seqîl
Bi cuz nexme û saz ê nîne delîl

Demek xwîna min bîne coş û kelîn
Bi awazê çeng û meqamê şêrîn

Gelek bê ttereb bûme ez hicra yar
Cîgersûz im ez daxê 'işqa xedar

Muxennî tu 'ûdê deraxûşî ke
Ji xumê mezin cur'eyek noşî ke

Xwe wenda ke dîsan me bîne tereb
Ji min def'î ke êş û derd û te'eb

Ji eş'arê wextê cuwanî ku min
Nezim kir ji asarê işqa mezin

Tu jê bîne îro li ahengê 'ûd
Muzeyen bike ez meqamê surûd

Bi ewsafê çeşmê reş î nîmîmest
Bide sazê nalende enguştê dest

Bi işqa ewê qameta fitneweş
Hilîne hinik deng û awazê xweş

Institut kurde de Paris

Ji zulf û ji egrîce û kakulan
Ji purçem ji kîsûyê nava kilan

Hezim ke li ahengê 'ûd û ribab
Metirse ji gazinde, lewm û itab

Tu zanî ji işqê wekî bulbul im?
Tu dîsan fereh bîne qelb û dil im

Texennum, terennum bikim bê hîsab
Ku înşa bikim şi'r û beyt û kîtab

Bi reqs û ttereb bêm ji awazê saz
Feramûşî kim cumle şîb û firaz

Keder cumle wenda bikim nû bi nû
Bibêjim kelamê eceb rû bi rû

Bikeş nexmeyek lê de sazek hela
Bikit rûhê min meylê "Qal û Bela"

Heta nête goş im meqamatê saz
Neşim nezmî kim beyt û şi'ran diraz

Bide dest-î ser tarê qanûnê xweş
Bi cumbuş be qelbê hezîn ê nexweş

Bikeş nexmeyek aşîkar es'sela!
Tereb bête sofî û şeyx û mela

Zemanê ku axazî meqsûdî kim
Kelamê guherbarî mensûrî kim

Bibêjim kelamê mu'etter çu gul
Beyan kim şemaîlê şahê rusul

Institut kurde de Paris

Heta goşê min pir nebit ez meqam
çisan nezmê kim ez mucewher kelam?

Werin mutrib û saqiyê pir eser
Digel sazê nalende û camê zer

Lebaleb ke camê binalîne saz
Ku înşa kim ez beytê şêrîn bi naz

Ji rawî neqil kim muselsel hedîs
Beyan kim hinik gotinê pur nefîs

Me ev qudretê beyt û şi'ran heye
Welê hîcra dîlber hîcaba me ye

Eger ev hîcaba nebuya li min
Me keyfek bida cumleyê îns û cin

Heçî şairê vî zemanî temam
Me bednamî bikra di nêv xas û 'am

Welê dil ji cewra nîgara şêrîn
Bi ah û fîxan û girîn û enîn

Teselî bidin vî dilê ahîdar
Bi camê şerab û bi awazê tar

Ku teskîn bibit qelbê min yek zeman
Bikim îbtida nezmê alîmeqam

Xwedaya î'anet bidî ev feqîr
Di înşayê şi'ran de destim bigir

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

1- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Ji exyarî xalê hebîb hember e" zêdetir ber bi rastiyê ve ye.

2- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Ji bo dil bibit keyf û bo dil fereh"

3- "Be'de kullî hîsab": Piştî her hisabê.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 7

## BENDÊ SABI’

## DER BEYANÊ EŞKALÊ FEXRÊ ALEMÎNA

Ji ustadê neqqad ê îsnadîgo
Rewan bû rîwayet bi teşbîhê co

Rîwayatê pakîze, ehsen-delal
Şemaîlê sultanê sahibkemal

Rîwayet ji şeyxê rîwatan qewî
Xwedanê sened, rawiyê Tirmizî

Ku tehdîsî kir ev hedîsa refî’
Ji bo mi re Sufyanê Îbnî Wekî’

Ji Sufyan wiha bû rîwayet eser
Bi tehdîsa Ehmed, bi neqla xeber

Ji Îsa b’nî Yûnus rîwayet ewî
Neqil kir bi îsnad û lefzê qewî

’Ûmer-ubnî Ebdullahê pur kemal
Sened daye Îsa bi neqla delal

’Ûmer neqlî kir ev rîwayet’ezîm
Ji Îbnî Muhemmed ku nav Îbrahîm

Institut Kurde de Paris

Sened girtî rawî ji neqla Elî
Leqeb "Murteza" ew Eliyê welî

Ku wesfê Resûlê Xwedayê kebîr
Dikir Murtezayî ji hikmet xebîr

Wuha dê bigota ji ewel meqal
Di wesfê ewî ssedrê sahibkemal:

Nebû fexrê alem dirêjek çunan
Ku bain bitin ew ji ehlê zeman

Ne çendan ttewîl bû ji 'adet birûn
Ku da nifretê jê nekin nazzîrûn

çiku her dirêjan hemaqet heye
Li nik ehlê dil wan sefahet heye

Muqeddes bû zatê hebîbê Xweda
Ji ewsafê reng û 'uyûb û rida

Ne kurt e ji her kes qesîrek 'eyan
Ku da nête ser 'eyb û neqsê zeman

çiku her kesê kin bi fetlan e ew
Ji bo zatê bêmisl ê duşman e ew (1)

Xweda ew hebîbê xwe yê nazîdar
Ji bo zatê pak ê xwe kir ixtîyar

Nehêla çu kes 'eyb û neqsan bifaş
Li sultanê alem bikin haşe haş!

Welê reb'e û ewsset û çakî bû
Ji ttûl û qesîr herduwan pakî bû

Institut kurde de Paris

Welê fexrê alem temam bû ji nûr
Li wî îxtiyar bûye "Xeyr-ul Ûmûr"

Muyê taze, tahir ne reş bû wekî
Ku ce'dê qetet bête gotin li wî (2)

Ne kej bû, ne sor bû muyê sade nûr
Muyê taze xumrî dihatin zuhûr

Dihat nav milê tahîre muyê ser
Ji menkîb neborî muyê pur eser

Muyê pêşenî ger bi teb'ê xwe ew
Bibûna muferreq li wechê bedew

Du firqe dikir ew muyê naddiye
Yekî rast û yek çep, me jê zaniye

Û ger ew bi teb'ê xwe nebwa du şeq
Museddel digêra li wechê şefeq

Eger şane nekra muyê ser, gelek
Li dor nermê uznê dibûye helek

Li wechê mûnewwer lehim pir nebû
Welê sêfîl û qor û bê sur nebû

Ne "muntefîx-ul wechî" metthûmî bû
Mudewwer bibêjî, ne kelsûmî bû (3)

Bi me'na wuha tête gotin celî
Nebû wechî wek sûretê cedwelî

çiku sahîbanê ttîba'ê selîm
Bi vî terzî danîn qiyafet qedîm

Institut kurde de Paris

Heçî wechê tedwîrî bit çun direm
Dîlalet li cehlê dikit lacerem!

çisan ew delalet bibit qaîme
Li zatê ku alem bi 'ilman heme

Nebû xeddê enwer bilindtir ji rû.
Rîwayet wuha têtе gotin bi rû

Di behsa şemaîlê şahê cemîl
Hebû fexrê alem du xeddê esîl

Li nik ehlê teb'ê selîm ê selîm
Melîhtir dizanin esîlê 'ezzîm

Welê wechê şahê cîhanê, yeqîn
Hebû tê de tedwîrê cuz-ê hemîn

Nîhayet di husn û melahet wusan
Xweda çêkir ew sedrê alînîşan

Ne wechê mûnewwer sipî bû gelek
Ne boşnaq û bêçaşinî û gelek (4)

Ku bêxwûnî bit emheqê pir sipî
Li vî terzî rû na lezîz e qewî

Ne kejkî sebbit bû, ne reşkî qemer
çiku nîne wechê wusan qet eser

Tehaşa ji rengê Resûlî qidem
Ku çêbit li şiklê sewad û 'ecem

Ne lewnê ku pir sor û ehmer bitin
Ne rengê ku girtî û esmer bitin



Institut Kurde de Paris

Welê rûyê pakîze yê Mustefa
Sipî bû bi surxê muşerreb hema

Ne mexfî li nik zî tîba'ê mecîd
çi lezzet didit surxiyê ba sefîd

Tele-lû dikir wechê pak ê sedir
Wekî qursa heyvê di Leylê Bedir

Şu'a'ê di nûrîn diçû jê çunan
Bi teşbîhê rojê di nêv asîman

Heçî ehlê îman bidîta hebîb
Bi 'işqê dibû cergî yekser kebîb

Du çeşmê di şehla bi şubhê xezal
Şedîd û sewadî sewadê delal

Şedîd û beyad-îl beyadî wusan
Şêrîntir ji çeşmê cemî'ê kesan

Belek çav û reş merdemek pir weqûr
Du çeşmê di şehla mukehhel bi nûr

Dirêjdûçik e çeşmê şahê huda
Gir û ed'ec û nişmî çêkir Xwuda

Tijî bû ji mujganê ettwel du çav
Ji nûra ezel bû mukehhel du çav

Ji pêş ve ji paş ve bizane jidil
Wekî hev didî padîşahê rusil

Bi roj û bi şev her wusa yek didî
çiku nûr û zulmet wekî hev didî

Institut kurde de Paris

Eger yek ji ehlê şeqa w mihnetê
Bikit new'ê înkara xasiyetê

Ji bêyumniya wî zebanê xedar
Serê pîs ê wî layiqê Zulfeqar

Du burwê mûbarek ezecc û 'ezîz
Fesil bû muyanê du burwê temîz

Ku yanî reş û nazik û dûvzirav
Diborîn ji herdu şeqê herdu çav

Bixwe hem zirav û qeren tê nebû
Di nêv herdu burwan de mû tê nebû

çiku sahibê teb'ê qewmê Ereb
Ji burwê belec ra dikêşin ttereb

Di nêv herdu burwan demarek hebû
Ji bo qehr û hêrsa wî nîşane bû

Dema qehr-î behta Resûlê kebîr
Li nêv ebruwan radibû mislê tîr

Tijî xwûn dibû ew demara yeqîn
Xezeb çun bigirta ji qewmê le'în

Xwedaya negêrî ji min qehrîdar
Hebîbê xwe yê ekremê nazîdar

Bi heqê ewî zatê bêçûn ê tu (5)
Nekî Ebdurrehman ê mehzûnî tu

Bi bu'da Resûlê kerîmê huda
Di wê rûzê dilsaz ê heşr û ceza

Institut kurde de Paris

Eger ew nebit destegîrê feqîr
Vemam ez di bin barê 'issyan esîr

Welê min umîd e ji şahê Herem
Şefa'et bikit Rûhiyê pur elem

Were ey qelem biçne ser qissetê
Beyan kim bi şêrînî xasiyetê

çu ewel qelem bit rewan serserî
Wesif kim ewê cebheta enwerî

Wuha hate gotin rîwayet 'emîm:
Ku cebhet bû teşbîhê yek lewhê sîm

Weyaxud wekî qit'eyek mahîtab
Eşi'ê di nûrîn li ser bê hîsar

Ne nizm û bilind û ne teng e enî
Wesî' û sipî bû ewî ehsenî

Ewî cebhetê pak ê berraqî bû
Wekî berqê xatif bi îşraqî bû

Wuqû' bûbû cebhet di nêv du cebîn
Cebînê museffa çu ayîne bîn

Wesî' bûn cebîne mûbarek zuhûr
'Eyan lê telelû dikir berqê nûr

Ji cebhet heta şaribê tahîre
Ji nûra Xweda enfî bû zahîre

Dirêj û zirav enfê naziknîhad
Muzeyyen bi nûra Xwedayê 'îbad

Institut kurde de Paris

Qewî rastekî cedwelî bû temam
Ewî enfê nûrîn ê pir îhtîşam

Welêkin nebû cumleeş mustewî
Ji nêv hindî cuz-ek bilind bû ewî

Li nik ehlê 'ilmê qiyafet 'eyan
Dîlalet li medhê dikit herzeman

Rîwayet ji rawî me zanî yeqîn:
Ku ser enfê nûrîn ê şahê emîn

Hebû nûrekî multemi' şûledar
Sutû' lê dikir aşîkar, aşîkar

Ji nêzîk û dûrî temaşageran
Muşe'şe' didîtin wê nûra giran

Mûbarek femê tahîr ê wî ddelî'
Mûnewwer tijî ez kelamê bedî'

Dîlalet dikîtin dihanê mezin
Li ser lefzê efseh li nik îns û cin

Lîsanê mûbarek ji hemd û şukur
Fîraxet neborî li wî ba zikir

Diran ferq û saf û 'ecaîb sefîd
Mûsewwex ji nûra Xwedayê mecid

Felec bû di tenzîma esnanê pak
Heçî ew bidîta dibû derdînak

Bi vî terzî fermaye rawî xeber
Rîwayet bi îsnadê sahib-eser:

Institut kurde de Paris

Ku weqta hebîbê şehê layenam
Diket nêv xeberdan û behs û kelam

Musulman û kafir didîtin hemî
Şu'a'ê di nûrîn ji enwar femî

Wekî şûleyê xwûr lehebsazî bû
'Ecaîb di nişmî û purnazî bû

Heçî naziran lê didîtin 'eyan
Ku tîrêjê nûrê ji nîva diran

Telelu dikir weqtê bed-ê kelam
Di tarîkê û rewşenê subh û şam

Ewî lihye taze munewwer hebû
Kesîf û siyah û mudewwer hebû (6)

Reş û pur şe'ernerm û taze delal
Mudewwer, musawî ji nûra Celal

Ewî lihyeyê nûrîdar ê hebîb
Ji gerden neborî bizan, ey edîb!

çiku lihye ettwel bitin bê misil
Dîlalet dikit ew li neqsa 'eqil

Munezzeh kir ew zatê Rebbê kerîm
Ji neqs û 'uyûban ji tiştê zemîm

Were ey qelem wesfê gerden bikin
Ji nûra li gerden dil enwer bidin

Ji rawî wuha hate goş im xeber
Kelamê bi îsnad û pur ez eser:

Institut kurde de Paris

Ne qalind, ne barîke 'unqê Resûl
Nîhayet bi îşraq û husn û qebûl

Qewî mustewî, mu'tedil gerdeneş
Bi hey-et 'eceb gerdenê ehseneş

Ji rawî wuha bû rîwayet rewac:
Ku 'unqê şerîfeş bi teşbîhê 'ac

Neku haşa teşbîhê sûret bibit
Welêkin musebbeh bi hey-et dibit

Sipîd û museffa wekî sîmê pak
Ji nûra Xweda bû, ne ez ab û xak

Sipî şubhê sîmê ku xalis bitin
Ne mexşûş û kêmwezn û naqis bitin

'Erîddussedir wesfê pak ê nebî
Wesî' û fire sedrê pak ê nebî

'Eceb rewşen û nerm e mislê herîr
Welêkin çi ferq e ji wî ta herîr

Heçî sedrê wus'et îraet bikit
Dîlalet li cûd û şeca'et dikit

çiku xalî ez xişş û weswasî bû
Ewî wesfê lê eşce'unnasî bû (7)

Bettin mustewî bû digel sedrê ew
Sewaulbetin bû digel sedrê ew

Ne sîne beledtir ji bettnê şerîf
Ne zik zêdetir bû ji singê letîf



Institut kurde de Paris

E'alîyê sedrê bi mû bû temam
Welê 'ariyus'sedyî hate nîzam

Ji sîne heta navê ber yek nemet
Muwessel bi mûyê mûnewwer çu xet

Li bettnê mûbarek ebed mû nebû
Bi cuz xettê mewsûf-î mû lê nebû

Dirêj bû milê tahîre pur durest
Ttewîlek şêrîn bû heta herdu dest

Xusûsa ku zendê hebîbê 'ezîz
Dirêj û bi mû bû wî zendê temîz

çiku rengê saf û sipî bû zîra'
Muweşşeh, muzeyyen bi mû bû zîra'

Dirêjî dîlalet dikîtin li cûd
Hemî cûdê alem ji wî der wucûd

Ji dîbacê nermtir kefê destê wî
'Eceb lîn û nerm û fireh destê wî

Mulehhem kefê destê fexrê Rusul
Sipîd û delal û letîf bû çu gul

Fire, mustewî kefê şahê huda
Kefê wasî'e xasseyê wî sexa

Esabi' dirêj û mulehhem leyîn
Zirav bûne enguştê Şahê Emîn

Enes Îbnî Malik sehabê kubar
Rîwayet wuha kir ewê 'ilmîdar:



Institut kurde de Paris

Ku min mes nekirye çi xezz û herîr
Nerimtir ji destê Resûlê kebîr

Heçî husnê Barî deranî ji xeyb
Hemî da hebîbê xwe bê neqs û 'eyb

Ji enguştê mu'cîz numayî Kerîm
Li nîva felek qursê meh bû du nîm

Îşaret bi enguştê da qursê mah
Ewî şahê pur nûrê nûrînkulah

Du şeq bû li nêv asîman bedra tam
Li cergê kufaran hezar cerh û zam

Ewan herdu pare vegeryan 'eyan
Ketin bin lîbasê şehînşahê can

Yek ez destê rast û yek ez destê çep
Biderketne derve bi 'izz û edeb

Belend bû li ser ferqê şahê Rusul
Ewê qursa meh muttesil bû çu gul

Bi tewhîdê Barî bi tesdiqê şah
'Eceb kir tekellum ewê qursê mah

Wekî dîse rabû li çerxa felek
Ji mu'ciz teheyyur hem îns û melek

Rîwayet wuha tête xasîyyetê
Bi neqla tewatur kete sihhetê:

Di Xezwê ku 'esker hemî teşne bû
Ji ber teşnekî rah û çare nebû



Institut kurde de Paris

Vewestan li dor fexrê alem dexîl
Ku de'wet bixwazî ji Rebê celîl

Mûbarek yedê xwe dirêj kir kubar
Ji nêv pence derbûn cuh û cûyîbar

Ewî leşkerê zorê zehf î temam
Vexwarin hemî cumleşan xas û 'am

Wudû û teharet kirin pê durust
Nebû neb'ê abê ji enguştê sust

Heçî naqe û dabeyê leşkeran
Hemî têr vexwarin ji abê rewan

Wusa her diçû abê nûrîn zelal
Ev e mûcîza heq, ne xewn û xeyal!

Were ey qelem (Sewqî ma nehnû fîh)
Ku înşa bikim beyt û şi'ran bedîh (8)

Deheşxur dibim ez bi cama şerab
Binalin ez û tu bi mislê ribab (9)

Bikêşim ji 'işqê herariyyetê
Bidim bo te asarê germiyyetê

Suwar bî li espê enamil bi lez
Ji tesîrê qelbê me bî çerx û bez

Hezar berqê 'işqê bidim te bi xweş
Ji cergê te bêtin evê xwîna reş

Hezar nexme bêjî wekî mûsîqar
Ji hukmê evê 'işqa zor î xedar



Institut Kurde de Paris

Xusûsa ku furset bikim wesla yar
Bibarim ji bo te çu ebrê bihar

Di qelbê mi de şi'r û ebyat û bend
Ji 'işqê hene zêde ez çend û çend

Eger emrî kim ser te hemyan bi zor
Muheqqeq dibî pareyek narê sor

Di destê mi de dê bibî nar û dû
Eger ez bibêjim hemî rû bi rû

Welê em nedin te eziyet çunan
Medara bi te em bikin yek zeman

Bi te nezmê kin çendî bendê di pak
Ditirsim ku dîsa bibî şûlenak

Seqin! megre agir ji 'işqa feqîr
Ku bijmêrî çend wesfê şahê kebîr

Bed-kim bi menkib pes-ez qîl û qal
Muheqqeq bikim kewnê sihra helal

Ji rawî rîwayet me zanî wusan
Ku da em jî bêjin ji bo her kesan:

Be'îd bû mîyanê du menkîb yeqîn
Ji nav mil mezin ew hebîbê emîn

Li wî wesfî bû "Eş'er-ul menkîbeyn"
Ji mûyê di reş bû tijî menkîbeyn (10)

Bi mûyê di reş nav milê tahîre
Muweşşeh, muzeyyen dibû faxîre

Institut Kurde de Paris

Dîlalet dikit menkibî wasî'e
Li cur'et digel quwweta rafî'e

Heçî nav milê ku fire bit, mezin
Şecî' e, qewî ye, bizane ji min

Cemî'ê wucûda Resûlê Xweda
Mucerred bû, bê mû, ji van ma'eda

Heçî ku ji pêş, min mu'eyyen kirî
Bi mûyê mûnewwer, muzeyyen kirî

Ji xeyrî cihê min ji pêş kir beyan
Wucûda mutehher, mucerred bizan

Heçî ku mucerred, mûnewwer bibîn
Wekî pareyek bedra enwer yeqîn

Sipî, nazik û nerm û pak û delal
Cemî'ê wucûda şehê pur kemal

Ne xurt û qelew pur ne qor û nehîf
Semînek wesset bû wucûda şerîf

Cemî'ê di e'zayê pak ê Resûl
Hemî mu'tedil bûn, şêrîn û qebûl

Temasuk dikir cumle e'za bi hev
Terecrec ebed nedkirin wan ji hev

Teraxî nebû der wucûda bi tab
Heta sinnê şeybî çu lawê şebab

Serê movik û mefselê wî heman
Mezin bûn bi quwwet bizane 'eyan



Institut kurde de Paris

Qewî heybetek pur li ser bû temam
Mu'ezzem li nik cumleyê xas û 'am

Heçî ku bidîta Resûlê bi nûr
Diket qelbê wî xewf û heybet ji dûr

çi mumkin hebîbê Xwedayê mezin
Ku jê xewf û re'bê nekin îns û cin?

Eger yek 'enîdê munafiqniyet
Bikîtin nekit 'izzet û mekremet

Xwedayê kerîmê 'ezîz î menî'
Dikir men'ê kafir ji qesda şenî'

Nikarî çi kes aşîkar û nîhan
Îhane bikin şahê axirzeman

Tehaşa ji zatê Resûlê kerîm
Ku kes bîne ser wesf û xulqê zemîn!

Me qesd kir ku bendê li vir kim xîtam
Dirêj ez nekim şi'r û beyt û kelam

Ne teb' e ji bo aşiq û şa'iran
Ku 'icz û melalê bidin naziran!

Welêkin qelem gote bo min: Mecal!
- 'Ecêb nutqekî pak ê şêrîn-delal!

- çi sewda ye pê ketî, ey fulan?
Dibêjî melalet bibîtin ji van?

- çisan dê melalê bikin ehlê teb'
Ji vê nutqa şêrîn î ba wezn û sem'

Institut Kurde de Paris

- Te şêrîn beyan kir bi nezmê qebûl
Kîtabet bi min şiklê xulq ê Resûl

- Bikeş, barê xîret bibe kullebaz
Were, cîlweger be bi fexr û bi naz

- Beyan ke hinik wesfê xeyr-îl enam
Ku da pê bibit meqseda me temam

- Ji hey-atê sultanê 'alem hinik
Beyan ke bi asarê mehkem hinik!

Me dî gotina xameyê rastî bû
Welê dil ji 'iczê kem û kastî bû

Me anî qelem kir serê xameyê
Ku cumbuş bidim vê siyehnameyê (11)

Bizane ji min ey hebîbê cîger
Wuha bû ji rawî rîwayet eser:

Wekî meşyê bikra şehê namîdar
Bi şubhê ji cîkî bilind bête xwar

Teqellu' dikir ew bi quwwet diçû
Ne ba nazî û fexr û nexwet diçû

Bi rê ve diçû xuttwe-xuttwe wesî'
Dikêşa ewî şahê pak î refî'

Sehabê di kubar ê sahibnezer
Ji wan bû rîwayet bi neqlê xeber:

Bi teb'ê xwe sultanê sahibcemal
Bi rê ve diçû hewn û nerm û delal



Institut Kurde de Paris

Me techîdê nefsê dikir em diçûn
Bi şahê Rusul hîçî lahiq nebûn

Bi teb' ew diçû, em bi pa û bi ser
Dibû tteyyê erdê bi xuttwe li ber

Bi vê cehd û se'yê diçûn em li rah
çi mumkin ku lahiq bibîne bi şah

Eger ku bimeşya bi eshabî çend
Şehînşeh ji hemyan xuyabû belend

Ji paş ve ku bikra ewî îltifat
Dikir îltîfatek bi terz û sîfat

Ne ku ser bi tenha digêra hebîb
Cemî'ê cesed wan digêra hebîb

Bi 'unq û bi ser îltîfat xiffet e
Resûlê Xwedê jî xwedansîfet e

Welê îltîfata wucûda temam
Mehabet dikin jê hemî xas û 'am

Hebîbê Xweda xafîdut'terfî bû
Di sun'ê Xweda cûmle wî serfî bû

Li erdê dikir wî nezer her zeman
Nezer pur nekir wî suyê asîman

"Heyaen mînel'lah" li çerxa felek
Beser serfî nedkir hebîbî gelek

Yemînen, yesaren temaşa nebû
çiku xewf û xeşyet ji Xaliq hebû

Institut kurde de Paris

Welê ger li şey-ek bidana nezer
Dikir qelbê nûrîn ê wî pê eser

Ne ku haşe bo lehw û le'bê dikir
Tefekkur li su'ê Xweda pê dikir

Ji wî cismê pakîze yê tabînak
Neket saye esla li ser rûyê xak

Wucûda ji nûrê Xweda çêkirî
Hezar serfirazî Xweda lê kirî

çisan saye jê çêbitin, ey heval?
Mehal e, mehal e, mehal e, mehal!

Welê da nebit xariqê 'adetê
Yekî pare ewrê sipî j'qudretê

Di seyf û rebî' û xerîf û şîta
Li texma serê pak ê şahê huda

Musexxer ewî ewrê taze mudam
Li sekn û li meşy û qu'ûd û qiyam

Li ser sengî, xara ku bikra murûr
Diçûn tê de payê hebîbê bi nûr

Dibû nermî ew ber bi şubhê xemîr
Ji ber heybeta şahê nikte'ebîr

Culûs çun dikir wî li bin darê hişk
Dibû şîn û taze wekî bîdê mişk!

Cemel kir şikayet li nik zatê pak
Digel kir tekellum ser û rû bi xak (12)

Institut kurde de Paris

Ku şekwa xwe bir nik Resûlê melîh
Selat û selam da bi lefzê fesîh

Hemî haziran cumle îbret kirin
Ji vê mu'cîza pakî hîret kirin

Selamê Hecer gotinê Zebyeyê
Bi neqla sehîh e, mekev şuheyê!

Eger şubhe kî vî kelamî ji min
Serê te bidim nav du ferşê mezin

Seqin! kes di wesfê şehê namîber
Mebin dudil û şubhegêr, el hezer!

Hebîbê ku Mewla bi zanînê xwe
Wucûd kir ji bo zatê bêçûnê xwe

çisan şubhe çêbit ji asarê wî?
Bizan heqq e heq cumle kirdarê wî.

Duşenbe Rebî-'ul ewel d'wanzde şeb
Murûr kir wucûd bûye fexrê 'Ereb

Heta weqtê çilsalî borî li wî (13)
Rîsalet, Nubuwwet xelat bû li wî

Di wî bîstusê salê mayî 'emîm
Ji bo hate erdan Kelamê Qedîm

Hemî hukm û ehkamê Şer'a mobîn
Nuzûl bû ji bo wî Hebîbê emîn

Li wî şêstusê salî bû 'umrê pak
Ji yumna wî 'alem hemî tabînak

Institut Kurde de Paris

Di lihye di re-sê mûbarek bizan
Nebû bîst-î tayê sipîde 'eyan.

Ji teqrîrê rawî rîwayet bûyî:
Di lihye heçî tayê ebyed bûyî

Bi hijmarê deh bûn, ne zêde, ne kêm
Heçî mane reş bûne bê keyf û kêm

Di re-sê mûbarek bizan tis'e bûn
Ji van nozde ta şeybî zêde nebûn!

Eman ey Resûlê Xwedayê kerîm
Me mehrûm negêrî ji lutfa 'emîm

Me çend hilye anî ji bo te wezin
'Efû kî qusûr, ey hebîbê mezin

Tu zanî di nav qelbê min da birîn
Ji hicrê hene zêde ah û enîn

'Efû kî qusûrê me ey padîşah
Bi her beytê kêşaye min sêsed ah!

Muşewweş ji hicrana yarim, eman!
Neşim nezmê kim ez kelam û beyan

Selaset nebit ger di şi'rê me da
Xeta ger zuhûr bit di fikrê me da

Li min negrî ey şahê axirzeman!
Gunehkar û bêçare me, el eman!

Bese ey qelem bes dirêj ke kelam
Te çend beyt-î anî sewad û nîzam

Institut kurde de Paris

Welêkin çi hedd e ku ewsafê şah
Tu 'ed kî bi vê fikra pîs î tebah?

Xîtam ke kelamî li vir hanihan
Cesaret li meydan meke el eman!

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"çiku her kesê kin be fettan e ew"
2- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Mûyê taze, tahir ne reş bû welê"
Ce'dê qetet: Porê xingalokî, porê gustîlokî.
3- Muntefîx-ul wechî: Devruyê gulpisî.
Methûm: Vêtik, lirû, goştê zêde.
Mudewwer: Grover, glover.
Kelsûm: Gurçikên rû yên gullpisî.
4- Boşnaq: Sipîçolkî, rûsar.
Bêçaşînî: Tamsar, bêtahm.
5- Bîçûnî: Bêhempa, tekane.
6- Ev malik di çapa Amedî de weha ye:
"Ewî lihye taze mudewwer hebû
Kesîf û siyah û mûnewwer hebû"
Kesîf: Qalind û gurr.
Sîyah: Reş, ttarî.
7- Eşce'unnas: Mêrtirînê mêra, fêris, egîd.
8- "Sewqî ma nehnû fîh": Hinartina tiştê ku em di nav de ne.
Amaca helbestvanî ev e ku, yanî em vegerin ser ramana xwe ya asasî.

9- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Deheşxurde bin em bi cama şerab"

Institut kurde de Paris

10- Eş'er-ul menkîbeyn: Girmilkên bi mû.

11- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Ku cumbuş bidim vê siyehcameyê"

12- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Digel kir tekellum sirûrî bi xak"

13- Ev nívmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Heta weqtê çil sal biwarî li wir"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 8

## BENDÊ SAMIN

## DER BEYANÊ XATEMÊ NÛBÛWWET

## KÎ BER KETFÊ RESÛLÊ XWEDA

Institut kurde de Paris

Rîwayet ji rawî me zanî sehîh
Îmam Tirmizî zî kelamê fesîh

Mu'en'en bi ruwwatê pak î sedîd
Nîhayet île Saibî-bnî Yezîd:

- Ku ez çûme pişt şahê axirzeman
Temaşa me kir muhrê nava milan

- Me dî şubhetê zerê hîcle yeqín
Ji wê nûr dirijya çu Dîcle yeqîn!

Di mana wuha tête gotin kelam
çu tuxmê kebûter ewê muhra tam

Ewê xatema nûrîdar ê hebîb
Li ser be'zê eqwalê Şeyxê edîb:

Yekê xeddeyê sor ê nûrînşu'a'
Welê murtefi' bû hinik irtîfa'

Mezin gah û geh xurdî bû muhrê pak
Geh eswed, gehî exder û tabînak

Welê gahî bû întîzar û resed
Diket xatemê rengê pak ê cesed

Dema ku sexîr bû wekî bindeqek
Li ser wê hebû zînet û rewneqek

Mezin çun dibû mîslê destek temam
Ewê xatema nûrî, nûrîn xîtam

Bi emrê Xweda xatema pur 'ezîz
Diket lewn û ewda' û şiklê temîz

Li wê îxtîlaf çêdibû her zeman
Evê îxtîlafê, tu mu'cîz bizan

Ne eynî li nêv ketfê bû muhra nûr
Welêkin li ketfê çepê bû zuhûr

Heçî enbiya û rusul bûn berî
Yekî şameê tahir ê enwerî

Li ser destê rastê hemî bû bizan
Ji xeyrî şehînşahê axirzeman

'Elamet ewê bû li ser ketfê çep
Beyan kim ji bo te bi terz û edeb

Evê hikmeta bî 'edîlê letîf
Muhazî bû xatem li qelbê şerîf

Institut kurde de Paris

Li etrafê wê xalê eswed şikil
Hebûn reş wekî misk û bînxweş çu gul

Muzeyyen bi yek daîre mûyê reş
Dibarî ji wê daîma bihnê xweş

Rîwayet wuha hate goş im yeqîn
Ji teqrîrê rawî bi lefzê mobîn

Bi îsnad û îsbat û lefzê durust
Nebû qet ji ruwwatî îsnadê sust

Ji Eshabê Kubbarî tehqîq ê bû
Welêkin ji wan zêde tedqîq ê bû

Li ser xatema tahirî bê bedel
Nivîsandî bû ew bi xettê ezel

Bi me'na "Muhemmed Resûlê Xwuda"
Mu'ellem bi wê padîşahê huda

Bidîta heçî ku ji nêzîk û dûr
Diçû çerxê Mîna ji wê berqê nûr

Telelû dikir her wekî afîtab
Ji muhra nubûwwet hezar berq û tab

Ji be'zê ruwatê dîger hate gcş
Ewan rawiyanê 'eceb tîzîhoş:

Ku ew sirr, eger çi hemî nûrî bû
Welê sirr "fe înneke menssûrî" bû

Ji min goşî ke vî kelamê selîs
Birêjim ji bo te çi durrê nefîs

Institut kurde de Paris

Mutabiq bikim ez bi terzek 'eceb
Evê îxtîlafê bi 'izz û edeb

Bizane ji Rûhî kelamê şêrîn
Mutabiq bikim îxtîlafê yeqîn

Ji deryayê fikra me ya hewlinak
Deranî ji qe'rê me ev durrê pak

Wuha hate qelbê me ev îxtîlac
Welê îxtîlacek dibîtin rewac:

Li muhra nubûwwet ewê xetê hûr
Newiştî bi teqdîrê sade ji nûr

Li dor wê hebû "La îlah, îllellah"
Digel wê "Muhemmed, Resûlê Îlah"

Li nêv daîra vî kelamê Celîl
Newişte hinik lefzê şêrîn-cemîl:

"Tebexbex fe înneke meysûrî" bû
Li dorê "Fe înneke mensûrî" bû (1)

Mutabiq me kir bo te ev îxtîlaf
Tekelluf nekêşa û bê î'tîsaf

Qelem bes dirêj ke, bese bê edeb
Di qelbê me da nîne keyf û tereb

çisan keyf ê bê qelbê meksûr ê min?
Ji min dûrî ket yarê pur nûr ê min!

Di nêv ateşê hicra yarê kerîm
Disûzim bi şêv û bi rojan muqîm



Institut kurde de Paris

Ji qelbê me te-sîra nîrana geş
Dide te, ji te tê evê xwîna reş

Dizanim ne xalî ji hîcran î tu
Mudamî bi şewqa neyistan î tu

Ez û tu, ku em herdu mehcûrî bûn
Ji yar û nîgarê xwe em dûrî bûn

Me anî birrî ev kelamê delal
Du'a kir ji Rebê xwe yê layezal

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Ev malik di çapa Amedî de weha ye:
"(Tebexbex fe înneke meusûrî) ew
Li dû sir (fe înneke mensûrî) ew"
Bexbex: Pesn.
Mana malikê weha ye: Bisekine, bê guman tu hêsan î
Bigerre, bê guman bi te re alîkarî hatiye kirin.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 9

## BENDÊ TASI' (1)

## DER BEYANÊ XÎDDAB

## Û KUHL Û DUHNÊ RESÛLÊ XWEDA

Ji rawî me seh kir rîwayet wuha
Bi îsnad û neql û dîrayet wuha

Mu'en'en ji ruwwatê sahibkerem
Bi îsbat û sihhet, ne zêde, ne kem

Li nik Bo Hureyre di meclis wusan
Sual bû ji texddîbê şahê cîhan:

"Ku yanî hebîbê bi fezl û huner
Muxeyyer dikir lihye û mûyê ser?"

Cewab da sehabê bi 'izz û 'elem
Ji bo sailî, wî bi lefzê: "Ne'em!

Bi ketm û bi henna hebîbê 'ezîm
Musebbex dikir mûyê pak ê kerîm

Heçî reş bi sebxê muzeyyen dibû
Heçî ku sipî bû, mulewwen dibû!"

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Wuha bû rîwayet ji Îbnî Weheb
Muqerrer bi îsbat û fexr û edeb:

"Ku ez çûme nik be'zê ezwacê pak
Bi 'ismet ji nûra Xweda tabînak

Deranî hinik mûyê şahê huda
Mi dî ew musebbex bi ketm û hena

Û hem emrî kir zatê pak ê Nebî
Bi texyîrê şeyba beyad ê sipî

Welê nehyê kir ez sewadî çunan
Ku fi'lek heram e bizane 'eyan!"

Ji be'zê ruwatan rîwayet bi cî
Me zanî di xedba Nebîyê umî

Bi neqla sehîheynî ket sihhetê
Binêre li fehwa bigir 'îbretê

Hebîbê ku Barî kirî ixtiyar
Bi rengê zerî sebxê kir çendî car

Heçî reş bi zerdî munewwer dibû
Heçî ku sipî bû bi wê zer dibû

Mudehhen digêra mûyê ser gelek
Mukehhel dikir herdu çavê belek

Bi zeyta neqî fexrê herdu cîhan
Mudehhen digêra mûyê ser çunan

Ku tedhîn dikir lihye û mûyê ferq
Ji nav mûyê eswed sipî nedbû ferq

Institut kurde de Paris

çiku cumle berraq û enwer dibû
Siyah û sipî têkde hember dibû (2)

Hebîbê Xweda rastî bo muminîn
Emir kir bi lefzê fesîh ê şêrîn:

"Ku tedhîn bikin mûyê xwe cumle tan
Welêkin muwazib nebin her zeman!"

Tewazub bi tedhînê pur zînet e
Bitûn terkîdan qeşfî û denset e (3)

Welê sunneta şahê axirzeman
Mudehhen bikî be'ddî, be'ddî çunan

Ewî rawiyê ku rîwayet lîbas (4)
Wuha gotî neqlek ji Îbnî 'Ebas:

- Di tehqîqa kuhla Resûlê Xwuda
Hebû mikhelek padîşahê huda

- Hemî şev di hingamê newmê, Resûl
Dikêşa di çeşmê xwe kuhlê qebûl

- Bi terz û usûl û bi naz û edeb
Sê kilçîvê rastê, sê kilçîvê çep (5)

- Bi terfê yemîn wî dikir îbtîda
Li çeşmê yesarî dikir intîha

- Di cumle mesalih qelîl û kesîr
Teyemmum dikir wî hebîbê kebîr

- Beyan kir şehînşahê kewn û mekan
Ku "xeyr-îl kuhul" îsmedê Esfehan (6)

Institut kurde de Paris

- Ewî wechê xeyriyyetê aşîkarŞ
Ku çavan dikit rewşen û nûrîdar

- Ew e çeşmê ruhnî û nûrîn dikit
Di ecfanê çavan mûje şîn dikit!

Ji rawî rîwayet muheqqeq bizan
Ku yek sindiqek şahê axirzeman

Hebû, tê de mîqrad û mîswak û şe
Digel mikhele, ayîne în heme

Qelem sistî bû qet'ê kir ev kelam
Mi jî bangî kir Xaliqê layenam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Ev beş di derheqê beyankirina hine, boyax, kil û dermankirina Mihemed Pêxember de ye, ku çewa û çi cûre boyax bikar dihanîn.

2- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Siyah û sipî têkde enwer dibû"

3- Mana malikê weha ye: Domandina bi boyaxê û dondayina por, delalî ye. Lê terikandina bi temamî, dibe sedemê qermiçandin û qirêjiya mirov.

4- Lîbas: Kinc. Amac ev e ku mirov di derheqê tiştekî de ji yekî din agahdarî wergirtibe.

5- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Sê qilçikê rastê, sê qilçikê çep"
Kilçîv, yan jî qilçik: Darikekî zirav ê di nav kilê de ye, ku mirov ew di ber çavan re dibihurîne û pê bijang reş dibin. Bi kurmancî jê re "kilçov", "kilçavik" û "darikê kilê" jî têne gotin.

6- Kila qenctirîn, ya subhanî ye ku li Esfehanê çêdibe.
Îsmed: Kevirê kilê. Li Esfehanê heye.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 10

## BENDÊ 'AŞIR

## DER BEYANÊ LÎBASÊ RESÛLÊ XWEDA

Ji teqrîrê rawî bi nutqê selîs
Nezim bû di silkê çu durrê nefîs

Di behsa lîbasê Resûlê melîh
Mu'en'en bi ruwwatê qenc î fesîh:

Ehebbê lîbasan li nik zatê wî
Ji hemyan qemîsek delalê sipî

Qemîs çun diposî Nebîyê çu gul
Heta kû'ê destan dihat herdu mil

Heta ke'bê payê dihat zeyla wî
Nebû ser lîbasê dirêj meyla wî

Di libsê dirêj kubr û xeyla heye
Di kibrê de 'isyana Mewla heye

Di teb'ê hebîbî tekebbur nebû
Li nik zatê wî her tekessur hebû

Institut kurde de Paris

Hedîsa Resûlî bi îzhar e ew (1)
Ku "esfel mîn-el ke'bî fînnar e" ew

Enes rawiyê rastego yê siqe
Rîwayet wuha kir bi mecd û miqe:

- Me dî hate der şahê Cibrîlî seyd
Welê muttekî bû li ser Îbnî Zeyd

- Yekî sewbê qetrî li ser wî hebû
Muxettet bi surxî xeşin tê hebû

- Welê Bo Cuheyfe wuha kir xeber:
"Li Bettha mi dî şahê sahibeser

Li wî hulleyek sorî ta nisfê saq
Hebû pak û nişmî bi terz û liyaq

Şêrîntir ji wî padîşahê bi nûr
Nedî min di libs û di hulle di sûr"

Rufa'î wuha go bi esl û bi cî:
- Du burdê di exder le ser wî mi dî

- Siyabê di xilqe hebîbê cîhan
Diposî li ser xwe di be'zê zeman

- Welê exlebî şahê gerdenfîraz
Telebbus dikir libsê pak ê beyaz

- Emir hem dikir bo sehabê kîram
"Siyabê sipî wergirin subh û şam"

çiku ehsenê sewb e, sewbê sipî
Muheqqeq ji qewlê Nebiyê umî

Institut kurde de Paris

'Emama hebîbî li ser dadina
Ne ewçend mezin bû, ne esxer wusa

Di ekser sipî bû 'emama hebîb
Heçî şey-ê ebyed bi husn e, necîb

Welêkin muheqqe bûye ev yeqînŞ
Di fetha Meke, şahê bettha zemîn

Ewî şaşekî reş li ser lef kirî
Ji 'ezban li nêva mila ref kirî

Me seh kir ji rawî bi şêrînkelam:
Di yewmê Meke dwazde 'ezbe temam

Dirêj kir ji wê şaşekî rengsiyah
Bi teşbîhê hale li etrafê mah

Û hem çendî caran ku xutbe dikir
'Emamê siyeh wî li ser lef dikir

'Emame çi weqta girêda çunan
Serê şaşikê berdida nav milan

Dikêşa ji wê 'ezbe şahê kebîr
Welê geh ttewîl û dîger geh qesîr

Dikir îstî'aze Nebiyê umî
Ji wê şaşa bê 'ezbe û xerze bî

Bizan ttûlê destarê xeyr-îl enam
Di ekser ewê heft-î gaz bû temam (2)

Welê be'zî şeş gaz li ser daniye
Ji teqrîrê rawî me ev zaniye

Institut kurde de Paris

Welêkin tu caran hebîbê emîn
Nekir zêde esla ji dwazde herîm

Zemanê me be'zê 'ewamê nekes
Mukebber dikin ser bi şaşê meles

Di ze'ma betalî ewan cahilan
Teessî dikin ew bi şahê cîhan

Hemî kizbê mehdd e bizane temam
Dikin damê seydê ji bo xas û 'am

Heçî ser mezin kit bi te'b û bi renc
Ew îsraf e, îsraf e, îsraf e qenc

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Mana Hedîsê weha ye: Divê ku dirêjiya kinc, ji gûzekan nebihure. Ekene, mirov di nava êgir de ye.
2- Mana malikê weha ye: Bizane ku, dirêjiya şaşika Pêxember piranî heft gaz bû.

Institut Kurde de Paris

# BEŞ 11

## BENDÊ HADÎ 'EŞER

## DER SÎFETÊ XÛFF Û NE'LÊ RESÛLÊ XWEDA

Muheqqeq bûye ev kelamê selîs
Ji rawî di îsbatê lefzê hedîs

Muxîre B'nî Şu'be rîwayet yeqîn
Dikir wî ji bo meclisê hazirîn:

- Ku xuffê Resûlê Xwedayê kerîm
Siyeh bûn qewî şubhê leylê dehîm

- Dehîyye B'nî Kelbî ji bo zatê wî
Du xuffê di reş wî hedîyye kirî

- Nebî libsî kir herdu xuffê temîz
Heta pare bûn, ew di payê 'ezîz

- Du ne'lê kerîme di payê Resûl
Hebûn, nûrîdar û mesûn û qebûl

Institut kurde de Paris

-Dirêjî li wan şibrek û du tilî
Bi dîqqet sehaban mesahe kirî

- Welê 'erzê wê ne'lê şahê emîn
Cihê paşîne heft-î esbu' yeqîn

- Ji pêş ve ewê şeş esabi' temam
Di bettnê qedem penc tilî, wes'selam.

- Li ser pozê ne'lê hebû du ziman
Serê wê dirêj û zirav bû temam

- 'Eceb sixtiyanek ji mûyan neqî
Musenne' ji wê ne'lê pak ê Nebî

- Ji cildê beqer ne'lî mesnû'î bû
Welê bê mû yû sade medbûxî bû

Xwedaya hezar şukrî bo te mudam
Nesîb kir ji bo min bi sed îhtîram

Digel cumle îxwan û yar û bira
Cemî'ê ehibba tevî hogira

Bi çav dîtina ne'lê pak î binaz
Bi teqbîla wê em kirin serfîraz (1)

Me teqbîlî kir ne'lê Peyxemberî
çi îhsan te da Rûhiyê kemterî

Hezar şukr û hemd û senayê 'emîm
Ji bo te Xwedayê xefûr û kerîm

Te da min feqîrî 'eyanen 'eyan
Teberruk bi ne'la hebîbê cîhan

Institut kurde de Paris

Me malî di çeşm û di rû ew nî'al
Mûnewwer me pê bû dil û ruh û bal (2)

Me hêvî heye rojê heşr û ceza
Xweda min bidit xatirê ne'lê pa

Wegerne qewîrûsiyah im, feqîr
Eya şahê "Lewlak"î destim bigîr

Were ey qelem bes dirêj ke suxen
Nikarim nezim kim kelamê 'elem

çiku pur melûl im ji hîcranê yar
Li min megrin ey meclisê goşîdar!

Me ev muxteser bendê şêrînkelam
Di ewsafê xuff û ne'il kir nîzam

Me danî ji destê xwe xame w kîtab
Me bakir Xweda, der cîger îltîhab

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- çewa ku ji helbestan tê zanîn, helbetvanê nemir Şêx Evdirehmanê Axtepî demekê çûye Hecê û li wir pêlava Mihemed Pêxember dîtiye. Wî ew pêlava pîroz girtiye û li serçavê xwe hesikandiye.
2- Bêjeya "bal" di zimanê Erebî de, navê "dil" e yanî qelb. Di Farisî de jî, navê "rû" ye, yanî serçav. Lê çewa ku di malikê de diyar e, amaca helbestvanî ruhnîkirina dilê wî ye.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 12

## BENDÊ SANÎ 'EŞER

## DER SÎFETÊ ENGÛŞTERIYÊ RESÛLÊ XWEDA

Institut kurde de Paris

Ji wî rawiyê pak ê şêrînnefes
Dirêj bû rîwayet heta ser Enes

Rîwayet dikir Îbnî Malik wuha
Di tarîfa enguşterê Mustefa:

- Hebîbê ku Mewla kirî îxtiyar
Hebû xatemek sîmê xalis'eyar

- Mu'eyyen ewî feddê xatem 'eqîq
Welêkin 'eqîqê Hebeş bû heqîq

- Ewê qaşekî saf û bêneqsî bû
"Muhemmed Resûl-ullah" lê neqşî bû

Sebeb ddewxê xatem, hemî rawiyan
Bi vî terzî gotin bi nutq û beyan:

Îrade ku kir sedrê 'alî himem
Bişînit kîtaban di mulkê 'ecem

Di emlakê Rom û di Furs û Hebeş
Niyet kir verêkit kîtabê di xweş

Ji bo wan milûkê 'unuqmulttewî
çu Neccaşî yû Qeyser û Xusrewî

Bettal da bibit hukm û ehkamê wan
Ku de'wet bikit dînê îslamê wan

Welê hate gotin ji bo Mustefa
Kî: -Ey tacê 'alem, şehê ba wefa

- Muheqqeq be nik zatê pak ê Nebî
Qebûl nabe mektûba bê muhrî bî!

- Emir ke ku yek xatemî çêbikin
Ku mektûbê şahan xetim pê bikin

- çiku teb'ê nik padîşahan qedîm
Tedawul dikin muhr û xatem muqîm

- Eger muhr ê tê da nebîtin kîtab
Ji wê tê dilê wan şek û îrtiyab

- Emir kir li Sewwaxî şahê emîn
Ku çêkit ji bo, hungulîskek hesin

- Ku çêbû ji ahin ew enguşterî
Libis kir di enguştê Peyxemberî

- Niyet kir ewê serwerê serweran
Ku pê xetmî kit name û defteran

Institut kurde de Paris

- Welê Cibreîl gote wî wê demê
"Ji destê xwe bavêje vê Xatemê

Ne laîq e bo serwerê namîdar
Hesin, çunkî libs e ji bo ehlê nar"

- Ji destê xwe avêt-î wî bê hiras
Welê emrî kir xatemek ez nuhas

- çun-an Cibreîl hat û gotê 'eyan
"Ji destê xwe bavê evan cumleyan

Ne terz e ji bo şahê sahibkerem
Nihas, çunkî jê têtî bihna senem"

- Tterih kir ji destê xwe şahê kerîm
Emir kir li Sewwaxî xatem ji sîm

- Yekî zîvê xalis wekî necmê geş
Nigîn lê durust kir 'eqîqê Hebeş!

Li ser qewlê be'zê şuyûxê kîram:
Ewê fess û helqe ji sîm bû temam

Dema libsî kir şahê ruyê zemîn
Riza da bi wê Cibreîlê Emîn

Ewî zatê pak ê hebîbê Xweda
Di xinssir ji destê yemîn exleba

Dikir libsê xatem, emir pê dikir
Teyemmum di her tiştî hez jê dikir

Ji bo ruxseta zatê peyxemberî
Di çep lebsî kir be'zê enguşterî

Institut kurde de Paris

Ewê xatema ku bi tewfîqî bû
Ji wî paş ve, der destê Siddîqî bû

Ji Şeyxan wuha bû rîwayet eser
Ji Siddîqê ekber giha nik 'Ûmer

'Ûmer çun rewan can bi canbexşî da
Giha destê 'Ûsmanê sahibheya

Welê heyfî ew xatema pur nefîs
Ji 'Ûsman suqût bû di Bîra Erîs

Ewî zatê 'Ûsman ê çend telbe kir
Di nav Bîrê Xatem qe peyda nekir

Îşaret heye tê de, ey canê can
Xîlafet bi wê xatemê bû 'eyan

Ne mexfî li nik her kesê dûrebîn
Ku esrarê Muhra Suleyman yeqîn

Di wê xatemê de hebû bê guman
Tu waqi' nebî şek û reybê, eman!

Ji feqda wê pê ve fiten bû zuhûr
Mezin bû heta qetla zatê bi nûr

Xîlafet bedel bû bi qetl û bi xwûn
Dirêj bû heta axirê dewrê dûn

Ji wê pê ve bû padîşahî tebah
Wegerne bi Xatem dibûn padîşah

Bese ey qelem ev kelamê giran
Dibit kerb û hesret li nik haziran

Institut kurde de Paris

Di feqda ewê Xatemê xamê bûn
'Ecaîb musîbet li îslamê bûn

Bese, bes dirêj ke kelamê bi kul
Yedê xwe dirêj ke, bibêje ji dil:

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 13

## BENDÊ SALIS 'EŞER

## DER SÎFETÊ SEYRÊ RESÛLÊ XWEDA

Ji rawî çi elfazê şêrîn, şêrîn
Giha zewqê min şubhetê engebîn

Ku ustad Îmam Tirmizî bê guman
Ji Neqla Enes Îbnî Malik 'eyan

Ewî Îbnî Malik rîwayet weha
Dikir wesfê seyfê hebîbê Xweda:

- Ku seyfek 'eceb qenc û pak û hedîd
Ji bo qetla qewmê kefûrê 'enîd

- Mudamî li nik bû şehê tacîdar
Li wî îsm ê danî ewî "Zulfeqar"!

Bi me'na bibêjim ji bo te jidil
Qebûl ke tu teqrîrê şêrîn bi dil

Di me'na wuha gotin ehlê luxet
Sebeb îsmê wî şêrîn sahibhumet:

Institut kurde de Paris

Ku tê de hebû çendî hifre yeqîn
Bi teşbîhê sûraxê zenbûrê bîn

Ewî şîrê min gotî, tê de kelam
Bi tîrêj û berraqî wek bedrê tam

Li ser gerdenê nadurust ê kufar
çu sukkînê e'la li taze xiyal

Ji wî hez dikir bê qiyas ey 'eceb
Di nêv cergê gebran bi mislê leheb

Rîwayet dikim ez ji Şeyxan yeqîn
Neku haşa mewdû'î bîtin hemîn

Heçî derçî kim ez di vê nameyê
Teheruk bikim pê serê xameyê

Bizane ku neql in hemî bê qusûr
Ji Şeyxan û ruwwatê sahib wuqûr

Teweccuh bike lê bi wechek ssefeq
Qebûl ke bi qelb û bi dil, bêje "heq"

Weger şubhe kî cuz-ekî el 'eyaz
Di nêv narê dojê dibî cangudaz

Temaşa bike bême ser sewqê pîş
Bikim tecrîbe teb' û hem zewqê xwîş

Ji min goşî ke nezma pak î hesen
Ji rawî, mi jê zaniye ev suxen:

Cihê destîdana şehê namîdar
Ji wî seyfê mehbûb ê nav "Zulfeqar"



Institut kurde de Paris

Qewî zîvekî saf û beyda bizan
Ji teqrîrê rawî Huweyda bizan

Digel balçiq û kabikan fidde bû
Li ser kêlê wî hinde zîv lê hebû

Welê zîvê wî seyfê ba feth û xêr
Bizane ji yuldûz muhella bi zêr

Bizan ruxset e reyb û şek tê nekî
Durust e ku şîrê xwe qapilme kî

Welê furce tê da hebit ew qeder
Ku îtlaq nebit pareyek zîv li ser

Eqellî-eqellî du esbe' hebit
Ji wê pê ve ba cumle qapilme bit

Weger abîzêr kî bi zêrê nefîs
Zerer nake ew jî bi neqla Hedîs

Welê abidanek wusa zînîhar!
Ku mal çênebit jê bi 'erdda li nar

Heçî eslehê herbê peyda bikî
Durust e ku wan cumle qapilme kî

Ji bo zînet û şuhreta weqtê ceng
Ku heybet bikin qewmê pîs ê bi zeng

Ku pê gerdenê kafiran bikne şeq
Dîlalet bikit quwweta dînê heq

Evî seyfî te'rîfê kir min heman
Di exleb li nik şahê axirzeman

Institut kurde de Paris

Di xezw û qîtalan li nik bû yeqîn
Welê be'zî ewqatê şahê emîn

Teqellud dikir be'zî şimşîrê dî
Binêre li ehkam û te-sîrê wî

Hebîbê Xweda çendî seyfê hedîd
Muheyya kirî wî li qewmê 'enîd

Bi 'edda sehaban ji seyfan 'eşer
Muheyya kirî cumle xeyr-îl beşer

Musemma hemî bûn bi îsmek cuda
Li wan îsmê danî hebîbê Xwuda

Yekî şîrê wî qenc û pur nûrî bû
Ewî navê şêrîn ê "Me-sûrî" bû

Yekî dî hebû zatê pak î hebîb
Musemma kirî ew bi îsmê "Qedîb"

Siyem îsmî "Qe'lî", çiharem "Tebar"
Beşincî ewî îsmê lê "Zulfeqar" (1)

Şeşem bû musemma bi îsmê "Hetef"
Heftem jê dibarî li qewmê telef

Yekê dî musemma bi "Mîxzem" bizan
Ji Mîxzem nebû bo kufaran eman

Ewê dî musemma bi îsmê "Resûb"
Ji ber xewfa wî murte'id bûn qulûb

Nehem îsmî "Ssemssame" lê bû yeqîn
Muhab û muxaf bû li qewmê le'în



Institut kurde de Paris

Dehem îsmê şêrîn li wî bû "Luheyf"
Ji wî dûr diçû gebrîdûn sed xureyf

Evan deh siyûfê mûbareknijad
Li nik şahî bûn abîdar û hidad

Ji bo qetla qewmê şeqî yê le'în
Kesê bikra înkara dinê mobîn

Serê wan 'enîdan dikir pê fesil
Demar jê dikêşa bi 'erq û esil

Ewî şahê "Lewlak" ê 'alîcenab
Di destek de seyf û di destek kîtab

Kîtaba munezzeh ji xelqîyyetê
Ji bo dîn û ehkamê vê ummetê

Welêkin evan seyfê tîj î giran
Ji bo re-sê bî dewletê kafiran

Hebîbê Xweda weqtê ceng û qîtal
Libis wî dikir zirh û mîxfer delal

Ewî heft-î dir'ê mûbarek hebûn
Ji bo cengê kuffarî amade bûn

Zubeyr Îbnî Ewwamî go ev suxen:
Di Xezwa Ûhud şahê cedd-îl Hesen

Du dir'ê giran wê li ser bû Nebî
Digel alet û eslihê herbê wî

Ku şeytanê pîsê şeqî yê le'în
"Sela" da li nêv ehlê îslam û dîn

Institut kurde de Paris

Di heqqê wefata Resûlê Xweda
Li nêv ehlê îslamê da "essela!"

Bi teşwîşî bû ehlê meydan gelek
Ji wan nale û ahî çû ta felek

Ewan dil hilanîn ji ceng û neberd
Li xezwa 'enîdan diman destîserd (2)

Dema goşî kir şahê xetmîr'rusul
Ji vê waqî'ê tengî bû qelb û dil

Teleb kir yekî sexre zatê Nebî
Niyet kir li ser sexre bit mustewî

Ji bo murtefi' bit cihê padîşah
Ku î'lam bikit ehlê îman û rah

Ku da bên li ser wî hemî racî'ûn
Bizanin ku kezzab e, mel'ûnê dûn

Xelase ji libsê du dir'ê giran
Ji ber cerhê lê şahê axirzeman (3)

Nikarî biçit ser hecer, wey li min!
Çi zehmet dîye wî hebîbê mezin

Ji bo dînê îslamê kêşa cefa
Bi dwazde birîn cerhî bû Mustefa

Welêkin serê cumle derdê mezin
Ku efxan û nale bikin îns û cin

Bibêjin ji derya wekî qitreyek
Bikêşim ji nêv hindî dil naleyek

Institut kurde de Paris

Dibit cumle 'alem muneqqeş bi xwûn
Zemîn û sema dê bibin wajîgûn

Sufûfê melaîk li çerxê felek
Bikin nale û ah û efxan gelek

Hemî hûrê Fîrdewsê Heftem Tebeq
Li cennet gerîban bikin cumle şeq

Bizane ku xilmanê baxê bihişt
Ji hesret bibin rihsipî, kûzîpişt

Ewan rewdeyê xuldê cayê ttereb
Muhewwel dibit dûzexek purleheb

Hemî murxê cewwê sema û zemîn
Ji teqrîrê vê sewqê endûhigîn

Disûzin biyek bariwan bal û perr
Ji me-tem hemî dê bibin lal û kerr

Digel hûtê derya û nehrê di kûr
Bibin cumle ateş di qe'rê bihûr (4)

Dibin cumle ewrê bihar û nîsan
Ji vê gotinê têkde ateşfişan

Kewakîb digel mah û xurşîdê xweş
Ji hesret dibin pareyek sengê reş

Li vê gotinê bûm ku ez muttefiq
Di nefsa xwe de ez dibim muhteriq

Di destê mi de xameya rûsiyah
Dibit pare agir ji efxan û ah

Institut Kurde de Paris

Duwatê me jê dê bibit sernigûn
Murekkeb dibit tê de yek qitre xwûn

Ji te-sîra ahê dilê derdîdar
Di destê me muswedde bit şûledar

Me niyet nebû em bibêjin kelam
Welêkin ji min xwestî bestta meqam

çiku derdekî pur kebîr e, kebîr
Şehîdbûna sinnê Beşîrê Nezîr

Di Xezwa Ûhud rawiyê ba eser
Wuha gotî bo Ehlê Sunet xeber:

Ku serdestî bûn cuz-ekî gebrê dûn
Cemi' bûn hemî eskerê muslîmûn

Xwe dan şu'bê Kûh-î bi emrê Resûl
Emir kir ewî sedrê sahibqebûl

Welê çendî gebrê şeqî yê le'în
Cemi' bûn li dor şahê betha zemîn

Ewî kafirê le'netî yê sexîf
Şehîd kir diranê mûbarek, şerîf

Xweda emrî kir Cibreîlê emîn
"Xwe bighîne xwîna hebîbê emîn

Wuqû' da nebit ser zemînê turab
çiku erd û esman dê bîtin kebab

Ne yek qetre baran ji ewrê giran
Dibarin, heta dewrê axirzeman

Institut kurde de Paris

Ne tayê giyayê ji erdê hişîn
Dibîtin, ku xwîna Nebiyê emîn

Wuqû' bit li ser rûyê vî cismê xak
Bigîjê eya hamilê Wehya pak!"

Di wê saetê murxê Sîdremekan
Bi te'cîl giha fexrê însan û can

Ewî xwîna pak a hebîbê 'ezîz
Sibik bir gihande bihişta temîz

Hilanî di nêv şûşeyê xwîna pak
Ji wê waqi'ê têk cîhan derdînak

Hewar e, hewar e werin hikmetê
çi zehmet kêşaye ji bo ummetê

Bi roj û bi şev her di wext û di hîn
Eziyet dîye padîşahê emîn

Ji bo xatirê ummeta pirgunah
Welê em ji wî daîma rûsiyah

Ji bo me kirin çendî xewxa û ceng
Li kuffarî dunya dikir telx û teng

Ne hêja ne em în çunîn ey Resûl
Ji bo me bibî ev qeder tu melûl

Welê tu şehînşah û lutfa te 'am
Em û dest û damanê te wes'selam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.



Institut kurde de Paris

1- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weya ye:
"Siyem îsmî (Qel'î) çiharem (Betar)"

2- Ev malik di çapa Qoxî de weha ye:
"Ewan dest hilanîn ji ceng û bized
Li xezwa 'enîdan diman dest sered"

3- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Ji cerhê li wî şahê axirzeman"

4- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Digel hût û heywanê deryayê kûr"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 14

## BENDÊ RABI' 'EŞER (1)

## DER SÎFETÊ NANÊ Û WE çÎZÊ KÎ BE NAN MÎXWÛRD

Ji rawî wuha hate goşim yeqîn
Ji teqrîrê lefzê 'Ûmmîlmuminîn

Diya muşfîqe 'Aîşa enwerî (2)
Ji ifkê bi Ayet Xweda kir berî

Bizane wuha gote bo rawiyan
Ji ehwalê Peyxemberê îns û can:

Nebûn têrî alê Resûlê kebîr
Du rojan li ser hev ji xubzê şe'îr

Bizan pur şevan radizan alê wî
Ne şîv û ne nanek bibîn halê wî

Dikir sebrê ber fiqrê pur Mustefa
Dikir îxtîyarê fiqir ser xina

çu bikra teleb, cumle kûhê cîhan
Dibûn zêrê xalis ji bo şahê can

Welêkin li ser halê şiddetfuzûn
Dikir sebrê kullî ji dunyaya dûn!

Ji Sehl Îbnî Se'dî mubarek eser
Sual kir Ebû Hazimî ba xeber

Ku: -Aya ekil kir Nebiyyê umî
Ji kapik museffa deqîqê neqî!

Deqîqê neqî kîjke? bêjim 'eyan
Di bêjingê werdayî ardek çunan

Cewab daye Sehlî xebergo li wî
Ku "Ardê neqî wî bi çavan nedî"

Ne bêjing û mînxel di weqta hebîb
Ne tenxil û tesfî, bizan ey lebîb

Sehaban deqîqê ceyî cumleşan
Nefix lê dikir wan bi dev ey fulan

Heçî kapikê zehf ê nefxê dibir
Heçî ku bima, paşê te'cîn dikir

çira? çunkî efkarê wan daîma
Li tehsîla ta'et, rizaya Xweda

Ne şehwatê nefsanî û lezzetan
Teqewwut ji bo wan behane bizan

Ji bo quwweta ta'etê eklê qût
Dikir wan, welê qûtekî layemût

Ne çendan dixwarin ji wan hîçî kes
Nema der beden wan terîqa nefes

Institut kurde de Paris

Hebîbê Xweda yê bi fexr û edeb
Dema wî bidîta ji cû'ê te'eb

Hecer dê bixista li ber bettnê xwe
Welêkin nihanî dikir şanê xwe

Di rojek Îmam Murtezayê Elî
Suwarê li Duldul Eliyyê welî

Li Mescid giha nik Nebiyyê umî
Hebîb dîtî asarê cû'ê li wî

Ji bo muttmeîn bête qelbê Îmam
Resûlê kerîm ê kebîrî, himan

Ji ber bettnê xwe anî wî sê hecer
Bizane ji cû'ê hebû lê eser

Nebû teb'î bo Mustefayê kerîm
Ku bikra ji met'ûmê şey-ek zemîm

Bi paş red nekir wî te'amek tu car
Heçî ku bihata li ber, ew dixwar

Welêkin ji şîr û ji qer' û 'esel
Dikir hez hebîbê şehê lemyezel

çisan em dibin nik Xwedayê 'ezîz
çu fikra me daîm li luqma lezîz?

Newarî me çaştê, di heyra 'eşa!
'Işa çun bibit, ketne fikra xeda (3)

Eya nefsê pîsê, xebîsê xebîs (4)
Tu guh de rîwayet û lefzê hedîs

Institut kurde de Paris

Meke fikra beyhûde çaşt û 'eşa (5)
çu "nehnû qesemna" emir kir Xweda

Ne pêşe ji rizqê xwe kêmtir dixwut
Ne 'enqa ji heqê xwe zêde dibit

Eger ku bi hukmê Ferîdûnî bî
Û ger ku bi malê xwe Qarûnî bî

çu Îskenderî serteser 'alemê
Bikî qebze û mulkê xwe tu hemî

Felatûnsîfet ger sema û zemîn
Misahe bikî cumle bê dûrebîn

çu axir tu bimrî qewî sifrîyed
Ji xeyrî du qatê kefen ser cesed

Nîhayet ku ev bit li ber cumlekan
Meke fikrê dunya li ser xwe giran

Bike tewbe carek ji fi'la herar
Tewekkul bide Raziqî, wes'selam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û qêj e tunîne medar.

1- Ev beş di derheqê nanxwarina Mihemed Pêxember û tiştên ku pê re dixwarin de ye.

2- Mana vê malikê weha ye: Ew Aîşeya ku Xwedê, bi beyankirina Ayetê ew ji nebûkariyê rizgar kir.

3- Mana vê malikê weha ye: Berî xwarina taştê, em di heyra şîvê de ne. Dema ku dibe êvar, em di fikra taştiya sibeya roja din de ne.

4- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Tu guhdêre ayat û lefzê hedîs"

5- "Nehnû qesemna": Me sond xwariye.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 15

## BENDÊ XAMIS 'EŞER

## DER SÎFETÊ FÎRAŞÊ KÎ BER AN MÎXWABÎD

Yeqîn ke rîwayet wuha hate goş
Ji wî rawiyê rastîgo tîzîhoş

Sual kir bizan 'Ûrwe Îbnî Zubeyr
Ji serdarê ezcaw-î ba fedl û xeyr

Ji şiklê fîraşa Hebîbê Xweda
Welê ew fîraşa li ser radiza!

Cewab da diya me bi fezl û huner
Ji bo sailî, nuttqekî pir eser:

- Fîraşa şehînşahê axirzeman
Yekî sixtiyanek qewî bû bizan

- Ewê herdu rû sixtiyan bû temam
Ji heşwê tijî belgê xurma mudam!

Welê Hefsete zewca pak a Nebî
Wuha gotî carek ji bo sehbê wî:

Institut kurde de Paris

- Fîraşa ewî şahê nûrînlîbas
Muheyya di hicra mi da yek palas

- Pelasa mûbarek me dutew dikir
Hebîbê Xweda wê li ser xew dikir

- Şevek hate qelbê me ev rengxiyal
Li nik min xiyalek zerîf û delal

- Ku çartew bikim vê pelasê, temîz
Nerimtir dibit bo Resûlê 'ezîz

- Me anî bi çar tew li hev wergerand
Şehînşahê ekber li ser danihand

- Dema bû sibe, gote min: "Laîhe
We bo min çi ferş kir şebê barîhe?"

- Me gotê: "Eya ruhniya herdu çav
Fîdayê te bîtin ez û da û bav

Fîraşa berê bû muheqqeq bizan
Welê zêde min çarîtew kir çunan!"

- Me go: "Nermîtir bit ji bo zatê te
Tene'uum bikit belkî pê zatê te!"

- Cewab da ji bo min re Peyxemberî
Ku "red ke fîraşê li halê berê

Ji ber nermiya vê fîraşa bi naz
Li min çûne îmşeb selat û nemaz

Selatê Teheccud li min fewtî bû
Gelek ferh û şahî li min fewtî bû!"

Institut kurde de Paris

Binêrin gelî yar û ehbabê min
Hemî ixtiyar û hemî şabê minŞ

Ji çartew pelas Şahê 'alîcenab
Tene'uum hesab kir kirî îctînab

Sebeb ku şehînşahê gerdenfîraz
Li wî fewtî bû çendî rek'et nemaz

Ji êvar de ser doşek û yastixan
Bi naz û bi ni'met bi fexrek çunan

Dikim xwabî nav van cihê nazîdar
Heta fecra sadiq bi şubhê mirar

Ne zikr û îbadet, ne ah û niyaz
Ne destê du'a, ne du rek'et nemaz

Digel van gunahê li min bê qiyas
Ji destê 'ezabê çisan bim xelas?

Eya fexrê 'alem dexîl im, dexîl
Tu mehrûm nekî vî feqîrê zelîl

Qewî bêkes im, min ne da û ne bab
Welê fexrê min şahê 'alîcenab

Eger tu nebî ey Resûlê kerîm
Qewî musteheq im 'ezabê elîm

Me destê xwe avête dawa hebîb
Bi zarî me gotî ji qelbê kebîb

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 16

## BENDÊ SADIS 'EŞER

## DER SÎFETÊ KELAM Û SÛXENGOFTENÊ RESÛLÊ XWEDA

Institut kurde de Paris

Ji rawî me zanî ku cedd-î Hesen
Ttewîlus'sukût bû, kesîr-ul hezen

Ku bikra tekellum ji bo hacetê
Dikir wî ne haşa ji bo dunyetê

Kelamê di zêde ebed wî nebû
Li sun'ê Xweda fikrê daîm hebû

Ji ber xaîla dînê îslam û cehd
Neket qelbê pak ê wî rahet, ebed

Dikir îftîtahê kelamê xwe wî
Bi îsmê Xweda, îxtîtam hem bi wî

Bizane ku zatê kerîm ê Resûl
Kelam wî fesil bûne haşa fuzûl

Fesil kîjke? bêjim ji bo te bi hal
Fesil bû di mabeyna heqq û bettal

Kelam wî dikir lefzî hem me'na pur
Welê lefzê şêrîn û enfes ji durr

Hebû wî çi exlaq û teb'ê leyîn
Ne fezz û xelîzz û ne cafî muhîn

Heçî xelqê meclis bikêşa li cem
Mu'ezzem dikir wî şehê pur kerem

Ji eşyayê dunya wî 'alîcenab
Kelam wî negotin ne qenc û xerab

Ne zemm û ne medhek li şey-ê cîhan
Ebed wî nekir şahê axirzeman

çira? çunkî efkarê wî zatê nûr (1)
Li sun'ê Xweda cumle tehtin zuhûr

Ji dunyaya dûn qet nekir xayile
Cîhan çunkî bo dil dibit hayile

Ji bo tiştê dunya tu caran xezeb
Nekir wî hebîbê bi 'izz û edeb

Tekellum ku bikra li nêv meclisan
Bi wechê tteliq ber dida cumleşan

Mukerrer dikir wî kelamê selîs
Ku qenc seh bikin sami'înê hedîs

Bizan mubttilê dînê Lat û Hebel
Bi dev wî nego qet kelamê hezel

Di subhet dikir wî tebessum gelek
Ji wê nûrê, xende diçû ta felek

Institut kurde de Paris

Welê be'zî ewqatê dehkê bi nûr
Dikir wî, ji ber keyf û ferh û surûr

Bizan nadirî dehk ê waqi' bûye
Yeqîn be'zê eshab ê sami' bûye

çira? purkenîn qelbê dimrînitin
Ji ezkarê Mewla qe naînitin

Meken pur, xeber pur mede, ey fulan!
Teessî bike şahê axirzeman

Bila nemritin qelbê te ey ceger
Ji girdabê xeflet were ber kener!

Feqîr û gunehkar im ez bê edeb
Mudam leqleqe w xeyb e min rûz û şeb

Di behra guneh mame zar û giran
Li dergahê te min dirêj kir fîxan

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

---

1- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Li sun'ê Xweda cumle têtin zuhûr", yanî dihatin holê.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# BEŞ 17

## BENDÊ SABI 'EŞER

## DER SÎFETÊ XWABKERDENÊ RESÛ-LÊ KÎBRÎYA

Bizan hate gotin ji rawî çunîn
Ji te'rîfa xwabê Resûlê emîn

Ji neqla bira Îbnî 'Azib wuha
Beyan bû Hedîsê qewî yê huda:

çu bikra îrada xewê, şahê dîn
Dikir îttîca' ser tenişta yemîn

Dida destê rastê li bin xeddê rast
Ev e wesfê newma wî bê kêm û kast

Digo "Rebbê min hifzî ke ez 'ezab
Di rojê cemi' kî kesan ser hîsab

(Emûtû we ehya bî îsmî ke)" hem
Digo padîşahê bi fedl û kerem (1)

Institut kurde de Paris

Cemi' wî dikir herdu destê şerîf
Ku pê meshî kit wê wucûda nezîf

Qîraet dikir "Qulhuwellah Ehed"
Ewî padîşahê bi muhr û sened

Digel "Qul e'ûzû bî Rebbîl feleq"
Digel "Sûretîn'nasî" şahê bi heq

Ji paş pif dikir herdu destan ewî
Dimalî bi destan wucûda xwe wî

Ji ewel dikir îbtîda wî bi ser (2)
Ji "mîn be'dî" wechê mûbarek eser

Zi pes herçî pêştir buwa ez wucûd
Dimalî ji bo def'a serrê hesûd

Welê her çi mudbir biwa ez cesed
Dikir meshê 'udwê ku yed pê resed

çu hişyar biwa ew ji xwabê şêrîn
Dikir hemdî bo Xaliqê 'alemîn

Bizan xasseyê wî Nebîyê zerîf
Ebed xew nekir qelbê pak ê şerîf

Eger çendî çavê mûbareknijad
Di xew de diçû pêş 'uyûnê 'îbad

Welêkin ewî serwerê enbiya
Ewê tacê fexrê serê esfiya

Bi qelbê xwe daîm tefekkur dikir
Ji xerqa menamê teneffur dikir

Institut Kurde de Paris

Bizane ku ew şahê 'alîsîmat
Ji xew radibû wî dibestî selat

Ewî şahê "Lewlakî" ba reng û rû
Bi newmê nebû întîqadê wudû

çiku siqleta newmê ser wî nebû
Mudam fikrê Mewla li nik wî hebû

Ne wek me dibû xerqê xwaba giran
Ewî zatê Peyxemberê îns û can

Mi nîne 'emelkî ku pê bim xelas (3)
Guneh ser mi bûn bê hed û bê qiyas

Eger çi ku min zêde lê ne gunah
Welê destbilind im li dergahê şah

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Mana vê nîvmalika bi zimanê Erebî weha ye:
Ez bi navê te dimrin û dijîm.
2- "Mîn be'dî": Ji piştî, li pey, dû re..
3- Ev malik di çapa Qoxî de weha ye:
"Min nîne 'emel ku bibim pê xelas
Guneh ser me bûne bê hed û qiyas"
Rêza pêşî bi awayê rastnivîsa dema hê bê, rastir e.
Lê di rêza diduyan de hin lengî heye.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 18

## BENDÊ SAMIN 'EŞER
## DER SÎFETÊ 'ÎBADETÊ RESÛLÊ
## XWEDA

Institut kurde de Paris

Ji rawî bizane hedîsa şewat
çi şêrînsiyaqek xeber bo te hat!

Mu'en'en bûye ev hedîsa qewî
Muxîrre-bnî Şu'be nîhayet li wê

Di tewsîfê ta'atê fexrê 'Ereb
Beyan kim ji bo te bi keyf û ttereb

çisan bû 'îbadet hebîbê bi nûr?
Ji vê sewqa bendê dibîtin zuhûr:

Di şêvan li ser yek qedem ta seher
'Îbadet dikir wî bi fezl û huner

Xweda wehyê kir bo hebîbê mezin
Kî "Ey şah û sultanê însan û cin!

Me Qur'an neda te, resûlê emîn
Ku te'bê bikî der 'îbadet çunîn

Welê da texelluq bikî xulqê min
Ji te muntefi' bin hemî îns û cin!"

Ku ev "Wehy" ê hat bo hebîbê Xweda
Ewê padîşahê terîqa huda

Li ser yek qedem wî 'îbadet nekir
Welêkin îta'et ewî zêde kir

'Îbadet dikir wî şehê purkerem
Heta herdu pa lê dibûn pur werem

Ewî padîşahî 'îbadet dikir
Welê çend bi xef û bi heybet dikir

Bi tirs û buka û bi ah û girî
'Îbadet şehê ewel û axirî

Dema secde bikra Resûlê Xwuda
Di secde dikir hinde ah û buka

Bizan carekê be'zî eshabê wî
Sual kir ji vê xewf û ta'atê wî:

"çira çendî ta'et dikî ey hebîb?
Ji vê ezyetê cergê min bû kebîb!

Gunah û xeta nîne ser te ebed
çira çendî te'bê didî bo cesed?

We ger zelleyek haşa waqi' bibit
Yeqîn 'efwê Ellahî cami' dibit

Institut kurde de Paris

Xweda emr-î kir der kelamê neqî
(Lî yexfîr leke-llahû) bo te wehî

Li me lazim e em 'îbadet bikin
Ku pê zenb û 'isyan teharet bikin

Li ser me hîsab e gunah û xeta
Li me ferz e ta'et bikin em eda!"

Cewab da ji bo wî, Resûlê bi nûr
"çira ez nebim 'ebdê qenc ê şekûr?

Eger çendî xufrandî şahê kebîr
Gunahê di min cumle kevn û exîr

Welêkin li min heqq e daîm - mudam
Bikim ta'etê Heq bi xewfek temam!"

Eman ey Xwedayê kerîm ê 'efû
Rijand min li dergahê te abê rû

Ne min ta'et û ne zebanê 'uzir
Li min nefs û şeytan kirin pur xedir

'Efû kî gunahê min ê bê 'eded
Mi nîne 'emel hîçî hîç, elmeded!

Bike destegîrî ji behra xeta
Rewan ke li ser min bîharê 'etta

Bikêşe qelem ser gunahê di min
Bide xatirê Mustefayê mezin

Li min bûne ahadî 'isyan ulûf
Ji enwa'ê qibhê hezaran sufûf



Institut kurde de Paris

Li ser min guneh bê 'eded, bê hîsab
Nizanim li nik te bidim ez cewab!

Welê ez dibêjim bi zarî, muqîm
Ku bim mezherê 'efwa Rebbê kerîm

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 19

## BENDÊ TASI 'EŞER
## DER BEYANÊ EXLAQÊ RESÛLÊ
## XWEDA

Wuha gotî rawî Îmam Tirmizî
Heta Xarîce Îbnî Zeydê neqî

Ewî Xarîce gotî lefzê 'eyan:
Ku cem'ek musulman cemi' bûn bizan

Li nik Zeydê Sabit hemî bûn culûs
Li meclis kirin zêde 'erzê xulûs

Welê wan sual kir ji Zeydê kerîm:
"Wesif ke ji bo me ji xulqê 'ezîm

Ji exlaqê zatê hebîbê mezin
Bibêje ji bo me kelamê hesen

Beyan ke tu exlaqê şêrîn beyan
Ku pê muntefi' bin li herdu cihan?"

Institut kurde de Paris

Cewab daye Zeydê mûbareknihad:
- Bidin guh hedîsa kîramê nijad

- Bizanin ku cîranê wî bûm gelek
Bi wî re refîq û heval bûm gelek

- Kîtabet dikir min hemî Wehyê wî
Di exleb bi min meşwere w re-yê wî

- Di lînê tebî'et wekî wî nebû
çi elfazê nerm û şêrîn wî hebû

- Dema ew bihata di nêv Mescidê
Dikir îbtîda wî bi îsmê Xwedê

- Eger me ji dunya bidana xeber
Digel me ji dunya digo pur huner

- Wegerne ji axret bigota wusan
Ji axret digotî di nêv meclisan

- Ku behsa te'amê me bikra li cem
Dikir behsê xwarin şehê purkerem

- Me bikra çi behsa mubah û helal
Digel me dikir şahê sahibcemal

- Di heddê nîhayet ji xulqê 'ezîm
Bizane hebîbî, ku îhsan'emîm!

Enes Îbnî Malik wuha go kelam
Di exlaqê wî şahê fexr-îl enam:

- Temam deh sene xizmeta wî mi kir
Di wî muddetî rû li min tirş nekir



Institut kurde de Paris

- Bizane ewî zatê pak î 'ezîz
Ji bo min nego wî kelamek xelîz

- çi tiştê me bikra nego wî tu car
"Te kir bo çi ev îş ê bê îstîşar?"

- Û ger terkî bikra me şey-ek çunan
Nego qet "ji bo çi tu nakî?" bizan

- Ji bo nefsê pak ê xwe der yek nefes
Xezeb wî nekir qet li ser hîçî kes

- Welê ger ji munker bihata zuhûr
Xezeb pur dikir wî hebîbê bi nûr

- Heta xayetê, kes newêra biçit
Li wechê mûbarek temaşa bikit

- Li ser emrê me'rûf û nehyê nekîr
Xezebkeş dibû ew hebîbê kebîr

- Bi cuz emr û nehyanê herçî hebû.
Li ser tiştê dunya xezeb wî nebû.

- Di sebr û di hilm û di exlaqê wî
Nebû hîçî kes, hîçî hemtaqê wî!"

Xwedaya bi heqqê Resûlê xwe kî
Di rojê qiyamet me şermî nekî

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 20

## BENDÊ 'IŞRÎN

## DER BEYANÊ HEYAÊ RESÛLÊ XWEDA

Institut kurde de Paris

Me tehqîqê kir ev muessir kelam
Ji rawî Îmam Tirmizîyê himam

Wuha gotî rawî ji neqla Ebî-
Se'îdê ku mensûbê bal Xudrewî (1)

Di behsa heyaya Resûlê Xwuda (2)
Welêkin ne şerm ê ji şer' bî cuda

Digotî ewî Bo Se'îdê delal
Ji bo mustefîdanê ehlê kemal:

Ku fexrê Rusul zêde pur şermî bû
Ne şerma ku pê qaîde hezmî bû

"Eşeddu heyaen" ji wê 'ezreyê
Ku mestûre bit ew di paş perdeyê

Ji qîza di paş perde bîtin tenê
Şerimtir dikir padîşahê henê (3)

çi kes 'ewretê wî nedî zahîre
Yeqîn ke heta zewceyê tahîre

Muheqqeq bizane ji ezwacê wî
Ku gotin: "Me qet 'ewretê wî nedî!"

Ne haşa wekî me bi terka heya
Dibin peyrewê mezh û keyf û hewa! (4)

Bi vê terka şermê hîlak im yeqîn
Meded sed meded ey hebîbê emîn

Şefa'et bikî Rûhiyê purxeter
Ji girdabê 'isyan bigir bîne der

Li vir qet'î ke Rûhiya bendê xwe
Ji fertta guneh be tu şermendê xwe

Me çêkir kelamek digel îhtîşam
Şemaîl xetim bûn li vir wes'selam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Se'îdê ku mensûbê bal Xudre bî"

2- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Welêkin ne şermî ji şer'ê cuda"

3- Mana vê malikê weha ye:
Pêxemberê me ji wê qîza piştperdeya bitenê şermtir dikir.
Hanê: Ewê han.

4- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Dibû peyrewê mezh û keyf û hewa"
Mezh: Henek, yarî, laqirdî.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 21

## BENDÊ ÎHDA WE 'IŞRÎN

## DER BEYANÊ NESEBA RESÛLÊ XWEDA

Institut kurde de Paris

Me seh kir ji ruwwatî, neqla hedîs
Qewî muntezem gotinê pur nefîs

Ji ddubattê ensabê tarîxê dan
Esanîdî bê reyb û şek cumleşan (1)

Beyanê neseb bo Resûlê 'ezîz
Bi vî terzî wan da nîzamê temîz:

Ku ew padîşahê bi 'izz û 'ula
Resûlê mu'ezzem Nebiyyê huda

Muhemmed ewî îsmê pak ê qebûl
Û hem Ehmed û Hamid û hem Resûl

Puder bû ewî Ebdullahê delal
Bizan ummê pak Amîne pur delal

Ewê hezreta Amîne ba neseb
Bi 'izzet bizan duxta pak a Weheb

Welê babê Ebdullahê nazîdar
Ku Ebdulmuttelib ewê ixtîyar

Û hem babê wî Haşim e bê xîlaf
Ewê îbnê yekta yê Ebdulmenaf

Ew e îbnê pak ê Quseyê şerîf
Kîlab e ebê pak ê wî, ey zerîf

Û hem îbnê Murre Kîlabê kerîm
Mûbarek be bo wan bihişt û ne'îm

Ebê Murre Ke'b e, Luwey bavê wî
Bi tehqîqê min zaniye navê wî

Bizan bavê wî Xalib e, lacerem
Ev in cumle sadatê Beyt û Herem

Îbîn Fehr e ew Xalibê pur temîz
Îbîn Malik e bê guman, ey 'ezîz

Nedir bavê Malik bizane yeqîn
Kenan e ebê wî kerîmê emîn

Xuzeyme ebê wî yeqîn bê şik e
Puder bo Xuzeyme bizan Mudrîke

Û hem Mudrîke îbnê Ilyas e ew
Ebê wî Muder çêtirê nas e ew

Bizan bavê wî hem Nezar e yeqîn
Ewê îbnê pak ê Me'id e çunîn

Me'id jî yeqîn îbnê 'Ednan bizan
Cihê van di Cennatê 'Ednan bizan

Ji 'Ednan heta Ebdullah bê guzaf
Hemî bîst û yek bab bizan bê xîlaf (2)

Di van bîst û yek babî de yek nuqet
Nebû îxtîlafek ji ruwwatî qet

Hemî muttefiq cumleyê rawiyan
Digel cumle eshab û tubba'ê wan

Ku navê evan bîst û yek bab-î rast
Muheqqeq ev in yek ne kêm û ne kast

Hemî bê hîsab û 'ezabê elîm
Yeqîn dê biçin nêv bihişt û ne'îm

çira? çunkî der ssulbê wan tahiran
Qerar girtî nûra şehê îns û can

Bi yumna wî sultanê 'alîcenab
Biçin cennetê bê hîsab û 'ezab

Welêkin ji 'Ednan heta Ademî
Heye tê de pur îxtîlafek hemî

çiku zebt ê nabin hemî navê wan
Bi vî terzî ebna û hem bavê wan

Rîwayatê pur tê de ye îttîfaq (3)
Nehin ta bi Adem bi terz û liyaq

Welê ez bibêjim hemûçkan li ser
Esehhê rîwayet bi neqla xeber



Institut kurde de Paris

Ku mehrûm nemînin ji enfasê wan
Teberruk bibin em bi enfasê wan

Nezim kim heçî min bihîstî 'eyan
Ji rawî di ensabê fexrê cîhan:

Bizane ku 'Ednan e îbnê Eded
Eded jî îbîn Elyese' pur meded

Hemîse' ebê wî muheqqeq bizan
Îbin Ye'rib e pakî ew bê guman

Îbin Yeşcer e, îbnê Qeydar e hem
Îbîn Îsmaîl e ewê muhterem

Zebîhê ku Mewla fîda kir kerîm
Ew e îbnê pak ê Xelîl Îbrehîm

Ewî Îbrehîmê bi cah û cemal
Bizan îbnê Tarûxê sahibkemal

Û hem îbnê Tahûr e, Tarûxê pak.
Yeqîn îbnê Sarûx e ew 'etrînak

Îbîn Erxewa îbnê Falix bizan
Îbîn 'Abir e îbnê Şalix heman

Binê Erfexşed Şalixê nîkînam
Muheqqeq bizane ewî îbnê Sam

Ewî Samê pak ê ji 'eyban berî
Bizane ewê îbnê Nûhê nebî

Musehheh bûye ev rîwayet gelek
Ku Nûhê Nebî îbnê pak ê Lemek

Institut kurde de Paris

Metûşelx e babê Lemek bê guman
Bin Idrîs e zatê ku çû asîman

Û hem babê Idrîsê sahibkerem
Bizan Berd e bîn Mehleîl laceren

Ew e îbnê Qeynanê îbnê Enoş
Qebûl ke bi qelb û tu bişnew bi goş

Enoş îbnê Şîsê bi fezl û huner
Îbin Adem e, babê cumle beşer

Ev in cumle ecdadê pak ê Nebî
Ji wan re fîda bit ummî û ebî

Seqin şek nekî wek cuhalê zeman
Di heqqê evan ceddê sahibnîşan

Bike î'tîqadek bi qelbê qebûl
Di heqqê evan ceddê pak ê Resûl

Nikaha ewan cumleşan bê guman
Bê şubhe nîkahê di îslam bizan

Muberra ye zatê hebîb ê bi nûr
Ji sefh û zîna haşa bîtin zuhûr

Yeqîn cumleyê van ku min 'ed kirin
Li ser î'tîqada sehîh e mirin

Tehaşa ji ensabê fexrê 'îbad
Ku telwîsî bit ew bi kufr û 'înad

Tereddî li van cumleşan lazim e
Yeqîn e li nik herçî pê 'alim e

Institut kurde de Paris

Ne wek cahilan bêjî babê hebîb
Di nêv narê dozex dê bîtin kebîb

Wuhareng e ceddatê wî lacerem
Heta zatê Hewa ya sahibkerem

Hemî dê biçin cennetê bê guman
Hîsab û 'ezabek tunîne li wan

Xwedaya bi heqqê Resûl û puder
Bi heqqê evê silsila şubhê zer

Bi bab û bi dayê Resûlê kerîm
Bi ensabê sultanê îhsan'emîm

Bixefrînî min bêkesê purgunah
Evî Rûhiyê mucrim ê rûsiyah

Bikêşe qelem ser gunahê di min
Setir ke li min van xetayê mezin

Musetter ke Rûhî bi setra cemîl
Meke Ebdurrehman melûl û zelîl

Di isyan û zenban gelek faiq im
Mu'ezzeb meke gerçî ez layiq im

Li dergahê 'efwa te ey bê niyaz
Belend kir me efxan ji cergê nesaz

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

1- Ev malik di çapa Amedî de weha ye:
"Ji ddubattê ensab ê tarîxê wan
Esatîzê bê reyb û şek cumleşan"
Ddubatt: Zevtkiroxê tiştan.
Ensab : Piraniya "neseb" e, sulale, azbat, famîle.
Esanîd : Piraniya "sened" e, belge, delîl.
Esatîz : Piraniya "ustad" e, dersdar, mamoste.
2- Ev nívmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Hemî bîst û yek bab e bê îxtîlaf"
3- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Rîwayet pur e tê de bê îttîfaq"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 22

## BENDÊ SANÎ WE 'IŞRÎN
## DER ÎBTÎDAÊ MÎ'RACÊ RESÛLÊ XWEDA

Institut kurde de Paris

Bi namê te ya Reb, me Name vekir
Hezar car, hezar şukr û hemdê te kir

Sselatê muqarin bi 'izz û 'izzem
Digel wan selamê te yê muhterem

Me hedye ji bo Mustefayê te kir
Digel al û sehban me pê hedye kir

"We be'do" were ey qelem guh bidêr
Di emrê me qaîm bibe şubhê şîr

Xwe pêk bîne qenc muntezir be li min
Neqil ke çi elfazê şêrîn ji min

Me tiştek mezin daye ber xwe yeqîn
Me qesd e ku Mî'racê şahê emîn

Nezim kim, wezin kim bi asarê qenc
Bikêşim di weznê çi te'b û çi renc

Eziyek bikêşim bidim te te'eb
Cîhan pur bikim keyf û ferh û ttereb

Ku coş bim ji asarê 'işqê gelek
Bidim bo te enwa'ê şewqê gelek

Kemerbeste be, qaímê emrê be
Bi teb' û bi hiddet wekî nemrê be

Neku cangiran bî di vê defterê
Ji dest im dixwî derbetê xencerê

Fewellahî, wellahî, wellah qesem
çi weqta ku serkorî bî ey qelem

Bibirrim serê te bi kêrê wisan
Biçî dengê zarîna te meclisan

Du şeq kim serê te heta sîneyê
Teeddub bike, neqşî ke Nameyê

Di vê behra fikrê ku xewasî bim
Bibîne li meydan çi reqasî bim

Derînim ji behra fikir cewheran
Welê cewherê zêde qîmetgiran

Ela ey suwarê enam-ul feres
Binale ji destê me şubhê ceres

Digel min mûqabil be ey şehsuwar
Ez û tu bikin ah û efxan hezar

Institut kurde de Paris

Li meydan li hev din hinik ssedmetan
Ji destê me bigrî tu çend derbetan

Bikin cengekî pehlewane gelek
Teheyur bimînin hem îns û melek

Tehemtensîfet bême meydanê ceng (1)
Li meydan dimînim çu sindan dereng

Bikim berqê seyfan li ser ferqê te
Di erdê biçit eslê te 'erqê te

Temaşa bikin cemleyê îns û can
Bikin aferîn şehsuwarê zeman

Peyapey li te derbetan rebtî kim
Ku meydanê şi'r û xezel zebtî kim

Ji nezmê bixim 'alemê zemzeme
Nebêjit li ber min çi kes "ez heme!"

Li nêv hindî meydan ku bêm cîlwe kim
Heçî şa'ir in, cumle yexterme kim

Bigurrjim wekî ewrê fesla buhar
Bi ser destiyê min hemî din qerar

Zemîn û sema pur bikim xulxule
Hemî wechê 'alem bibit meş'ele

Şev û rojê dunya wekî hev bibit
Ji hingê ji min berq û pertew biçit

Ji 'işqê çiqa ez heraret bikim
Li te zêde zor û eziyet bikim



Institut kurde de Paris

Bi qurbana canê te bim ey qelem
Nekî cangiranî tu, ey muhterem!

Me şermî nekî nêv hevalê di min
Nebin lafê mehz ev kelamê di min

Were ey qelem tîzîrew be çunan
Bikim îftîxar ez li ehlê zeman

Hezar car bi qurbana te xame bim
Tu xîret bikî da ku şermî nebim

Xwe bişdîne ey xame zûd û bi lez
Di emrê mi de ser serê xwe bibez

Heçî hate qelbê me ez 'işqê yar
Me hêja negotî, neqiş ke bi xar

Hilîn gurz û tîr û kemanê di xwe
Li Rexşî siwar be li meydanê xwe

Bike çerx û bazî li meydanê faş
Gerr û fetlê ke şubhê dolabê aş

Muheyya ke bo derbeta pur elem
Nebêje ku "bêbextî ye" ey qelem!

Bidim destî gurzê giranwezniye
Nezim kim ji bo şahê mî'raciye

Bikêşim ji nêv hende dil çendî ah!
Wezin kim kelamê di Mî'racê şah

Bizane ji ruwwatî hat bê hîsab
Di M'îraca sultanê 'alîcenab

Institut kurde de Paris

Yeqîn ke tewatur bûye ev kelam!
çi lazim rîwayet neqil kim temam?

Muheqqeq ji eshabê nûrîncemal
Hezar ten ziyade bizan, ey heval:

Duşenbe, şebê bîst û heftê Receb
çi şêvek tijî şahî yû pir ttereb

Hebîbê Xweda, şahê eflak ê Tûr
Li dewletseray Ûmmîhana bi nûr (2)

Di weqtê xewê kir du rek'et nemaz
Ewî kirbû 'adet hebîbê bi naz

Ji paş zikrê pur şahê nûrînşu'a'
Li ser cayê xwe wî kirî îddttîca'

Ewî xirmenî gulniha nêv cîyan
Mûnewwer bi nûra wî herdu cîhan

Mûbarek serê wî li balînê pak
Ji gêsûyê çîn-çîn cîhan 'etrînak

Rû yû cubheteş mezherê "Wedduha"
çu "Wel'leylî" ew gêsuyê muşkîsa (3)

Şeb û rûzê têk muttesil yek zeman
Ji zulf û bînagoşê şahê cîhan

Neqîddeyn cemi' bûn di yek sa'etê
Betal bûn usûlê xwedanhîkmetê

Xunuk ew fîraşê 'ezîz ê qebûl
Li ser xwabê kit Mustefayê resûl



Institut kurde de Paris

Evê kurreyê xakê mehda zemîn
Gelek fexrê kir wê li 'erşê berîn

çira? çunkî sultanê sahib'elem
Li rûyê zemîn dadida wî qedem

Şehînşahê însan û cinn û melek
Bi zikrê Xweda îştîxal kir gelek

Ji Xawer heta Baxîter serteser (4)
Mûnewwer bi wî zatê fexr-îl beşer

Fîraxet dema kir ji zikrê Xwuda
Ewî pêşîwayê terîqê huda

Du çav dane hev wî bi qesda menam
Welê qelbî zakir, ebed layenam

Bi dil zikrê Mewla û fikret dikir
Welê çavê reş xwabê rahet dikir

Di mabeyna newmê û yeqze bizan
Nebîyê 'elemdar ê axirzeman

Ku nagahî bû xulxul û şahînat
Li ser fexrê 'alem hezaran selat

Sefîrê cenahê melaîk 'eyan (5)
Cîhan bû lebaleb, keran ta keran

'Ecaîb ji wan têtî esswat û deng
Luxatê muxalif, kelamê bi reng

Welê şehperê murxê sîdremekan
Ji nav şehperê cumleşan bû 'eyan

Institut kurde de Paris

Ssefîrê cenahê ewî Cibreîl
'Eyan bû ji nav wan bi hukm û delîl

Ji ewwel ve Cibrîl û cumle melek
Gihan ber piyê Ehmedê çavbelek

Digel heryekî sedhezaran 'elem
Ji bo şahiya fexrê 'alîhimem

Digel xel'et û hedyeyê Kirdîgar
Ku kir ermexan bo hebîbê kubar

Bi tesbîh û xulxul sufûfê melek
Li dor şahê 'alem vebestin helek

Bi naz û delalî, bi terz û edeb
Vewestan furuşte li fexrê 'Ereb

Bi tenha ji nêv seffê wan cumleşan
Bi derkeftî Cibrîlê sahibnîşan

Bi ahiste çû ber serê Mustefa
Resûlê bi heq, şahê sahibwefa

Ji nûra ruxê şahî tabende bû
çu bulbul li gul çendî xwanende bû

Perr û balê xwe malî taze delal
Li wî wechê nûranî yê purcemal

Hilanî şehînşahê bettha zemîn
Serê xwe ji wê xwabê naz î şêrîn

çu xunçe ji xwabê seher ber şukuft
Ji cem'a ewan qudsiyan ma şukuft



Institut kurde de Paris

Temaşa dema kir hebîbê cîhan
Melaîk vewestan keran ta keran

Sual kir: "çi halê te ey pakê pak
Di ev nîmê şeb hatî ser ruyê xak?"

Cewab da ewî Cibreîlê emîn
Bi teşrîfa Taha şerîfî yeqîn:

"Temaşa ke ey padîşahê kerîm
çi îhsan li te kir Xwedayê 'ezîm

Hemî babê esman û 'erşê Xwuda
Vebûn bo te, ey şahê rahê huda

Sufûfê melaîk li çerxa felek
Dikin întîzara qudûmî gelek

Teberruk bibin ew bi payê hebîb
Bimalin bi rû xakîpayê hebîb

Bi şewqa resûl-î teherruk bibin
Bi pabûsê te da teberruk bibin

Ji bo te cîhan pur bûye ez kerem
Şehê tacîdar î tu, ey muhterem

Qedem deyne ser qursê xurşîd û mah
Muşerref bibin ew bi pabûsê şah

Hebîbê kerîm î tu, ey şehrîyar
Li te kirye îhsan, Xweda bê şumar

Murûrê bi Fîrdewsa etther bike
Bi nûra xwe cennet mûnewwer bike

Institut kurde de Paris

Ji hîcra te ew horiyê nazîdar
Li wan bûye cennet bi teşbîhê nar

Demek wan ji hicranê azad bike
Bi dîdara xwe qelbê wan şad bike

çi heyf e ku horî ji hîcra hebîb
Di nêv narê dojê bibin dilkebîb?

Xweda emrê kirye ku îmşeb 'elem
Firazî li ser ssethê çerxa Nehem

Ji ekwanê 'alem biborî delal
Biçî xelweta Xaliqê zîl celal

Îrade Xweda kir ku îmşeb temam
Nehî payê 'izzet li ser xas û 'am

"Tedessur" meke nav kilîma bi nûr
Tu xwestî hizûrê, Xwedayê xefûr

Kerem ke, tu rabe here hezretê
Şefa'et bikî da ji bo ummetê

Cihê kes bi çavan nedîtî ebed
Temaşa ke îmşeb bi emrê Ehed

Muheyya be bo Hezretê kîbrîya
Eya zatê şahînşehê bê rîya

Tu rabe temaşa ke quddûsiyan
Ji bo te lebaleb cemî'ê cîhan

Tu yî laîqê (Qabe Qewseynî) bes
Senayê te (Taha) û (Yasînî) bes!"



Institut kurde de Paris

Muhemmed ku seh kir kelamê melek
Li wî zêde bû keyf û şahî gelek

Wudû û teharet sebuk bestî tam
Resûlê mu'ezzem eleyhîs'selam

Zi pes Cibreîlê bi fezl û huner
Ji qudret deranî yekê teştê zer

Emir kir ji bo yek furuşte delal:
"Lebaleb ke teştê ji abê zelal

Tije ke ji wê Zemzema ba sefa
Ji bo xeslê qelb û dilê Mustefa!"

Ji bo emrê Cibrîlî wê peyka pak
Ji Zemzem tijî kir ewê teşta çak

Sebuk Cibreîlî vemalî du dest
Di xîzmet guzarî miyanê xwe best

Du şeq kir ewî sîneeş ta bi nav
Ewê ssedrê bê kînê pak î şifaf

Ne te'b û ne alet bi îsmê Xwuda
Du şeq kir ewê ssedra şahê huda

Dema şeq kir ew ssedra 'alîhimem
Nekêşa ji wê zerre te'b û elem

Deranî ji nêv sîne qelb û cîger
Ewî Cibraîlê qewî mu'teber

Du şeq kir li wî qelbê zîba yê pak
Ji nûra wî 'alem hemî tabînak

Institut kurde de Paris

Seraser mûnewwer bû 'alem temam
Ji nûra dilê Ehmedê nîkînam

Yekê nuqteya xwûna reş ew zeman
Deranî ji nav qelbê şahê cîhan

Ji wî girt û avêtî xwîna sîyah
Bi emrê Xwedayê kerîm ê îlah

Sual kir ji Cibrîlî bê xill û xeş:
"çi xwîn e evê nuqteya xwîna reş?"

Cewab da bi vê nutqa qenc î selîs
Ku "Ev cayê şaytanê pîs î xebîs

Cihê weswesa wî şeqîyê le'în
Ji qelbê te derket, eya şahê dîn

Yeqîn ke tu ey serwerê esfiya
Li nik te cihê weswesa wî nema!"

Ji ewpaş bi wê Zemzema pur temîz
Xesil kir dilê Mustefayê 'ezîz

Ewî qelbê Mewla mutehher kirî
Ji ewwel bi qudret mûnewwer kirî

"çi hacet bişoyî bi vê Zemzemê
Weya Kewserê lê birêjî hemê?"

"Welêkin ji bo cumle 'alem yeqîn
Bizanin ku ev Zemzema pur şêrîn

Ji her abê dunya û uxra temam
'Ezîztir li nik Xaliqê layenam

Institut kurde de Paris

Ji bo xesla qelbê şehê namîdar
Ji Zemzem Xwedayê me kir îxtîyar

Bizan efzelîyet heye bî-l delîl
Ji Zemzem re ser Kewser û Selsebîl"

Xesil kir dilê wî bi terz û edeb
Ji îman û hîkmet tijî kir bi leb

Tijî kir heçî 'ilm û hîkmet temam
Di qelbê Muhemmed eleyhîs'selam

Yekî muhrê mazim deranî delal
Ji nûra ewî Xaliqê Zîlcelal

Xetim kir bi wê muhra zîbayî pak
Ewî qelbê nûranî yê 'etrînak

Bi 'îzzet wedi' kir di cayê qedîm
Dilê nûrîdar ê hebîbê Kerîm

Bi "Bîsmîllah" Cibrîl-î malî cenah
Li ser ssedrê sultanê sahibfelah

Wekî dîse ew ssedrê 'alîmeqam
Ji bo xerqê 'adet bûye îltiyam

Rîwayet bûye ez sehabê di wî:
"Wekî cayê xeyttek me şeq lê didî"(6)

Zi pes ew şehînşahê gerdenfîraz
Ji şûkrane re kir du re'et nemaz

Ji ewpaş yekê tacekî mu'teber
Bi emrê Xweda hat û danî li ser

Institut kurde de Paris

Li ferqê xwe çun tacê danê hema
Muşe'şe' ji wê heft-î erd û sema

Lîbasê ku Mewla kirî ixtîyar
Hinarî ji bo Ehmedê namîdar

Libis kir ewî libsê 'izzet bi naz
Resûlê bi heq şahê gerdenfîraz

Hezar car mûbarek be ew hulleyat
Ku Mewla li nik xwe gerrand hedyeyat

Ji bo qedd û qamê te enceq bi heq
Gelek layiq in ew ne bo hîçî xelq

çi poşîde ew poşişê enwerî
Ewê taca 'izzet niha ser serî

Serapa muzeyyen bi nûr bû wucûd
Şehînşahê erbabê qurbê Wedûd

Ku tezyîn temam bû li wî ekremî
Ewê taca fexrê serê 'alemî

Digel Cibreîl û digel Mîkeîl
Li dor wî furuşte digel Isrefîl

Bi cem'ek mezin derketin ber derî
Li ber wan Muhemmed şehê enwerî

Fîxan dan furuştan bi ssewt û bi deng
Ji enwa'ê tesbîh û zikrê bi reng

Sseda kefte erd û semayan temam
Bi derket Muhemmed eleyhîs'selam

Furuşte tijî bûn keran ta keran
Di vê 'erseya teng a rûyê cîhan

Hemûçkan selamlix kêşan ba edeb
Ji bo îhtîrama Resûlê 'Ereb

Li wê dabetek bû muheyya 'ecîb
Hezaran hezaran melek der rekîb

Xweda kirye hazir li wê yek boraq
Serapa muweşşeh bi terz û lîyaq

Boraqa mûbarek sebuk seyrî bû
Sebuktir ji teyranê her teyrî bû

Evê dabeya pak î tahirnefes
Muyesser nebûye ji bo hîçî kes

Ji bexlê biçûktir, ji xer mestir e
Qubabê ji nûrê li ser zahir e (7)

Ewî wechê wê şubhê însan bizan
Welê pa wekî payê naqe 'eyan

Yeqîn goşê wê şubhetê goşê fîl
Bi vî terzî çêkir Xwedayê Celîl

Heman dûvê wê mislê dûvê hîmar
Temam porê wê porê espan kubar

Ji elmas û yaqût û zumrût û durr
Ji le'l û zuberced ji enwa'ê pur

Murekkeb di xelqiyeta ew Boraq
Cemî'ê xelaîq dikin îştîyaq



Institut kurde de Paris

Mûserrec bi yek sercekî mu'teber
Mukellel bi esnafê durr û gewher

Lucam û serefsar-î cewher heme
Rîkab cumle yaqûtê ehmer heme

Lucama Boraqê di dest Cibreîl
Rîkaba muresse' di dest Isrefîl

Bi vê sûret û zîneta bê şumar
Muhemmed meşî da bibîtin suwar

Ku ling da rikêbê Resûlê teqî
Boraqê nehêla bibit mustewî

Cumûh kir Boraqa delal ew zeman
Nehêla suwar bit hebîbê cîhan

Li wê ne're da Cibreîlî wuha:
Kî "ey bê edeb, dabeya bê heya

Nizanî Muhemmed Resûlê Xuda
Şehê îstîfa, pêşîwayê huda

Li te dê suwar bit, eya bê edeb
Çira pê didî hinde renc û te'eb?"

Weha gotî rawî ji bo min çunîn:
Ji şermî Boraqê 'ereq da cebîn

Ku qitrîne qetre ji xwîdana wê
Ji xwîdan hêşîn bûye werda sipî

Cewab da Boraqê kî: "Ey Cibreîl
Melam û 'itabê meke tu 'eecîl



Institut kurde de Paris

Bizane ku serhişkiya min nebû
Welêkin muradek di dil min hebû

Cumûhet nekir min ji bo zatê wî
Ku îlla rîcayek heye min ji wî

Bi dax e dilê min ji 'işqa hebîb
Cîgernarîdar im ji şewqa hebîb

Rîca min ji wî her ev e bê guman
Ku we'dê bidit bo me şahê cîhanŞ

Suwar bit li min rojê heşr û ceza
Şefa'et bikit ummeta purxeta

çu der baxê cennet hezaran hezar
Boraqê mukellel hene bê şumar

Nekit îxtiyar ew ji min pê ve hîç
Wegerne dilê min dibit pîçî-pîç!"

Resûl dane wê ehd û peyman gelek
Li ser 'eqdê wan bûne şahid melek

Ku rojê qîyamet bi cuz ev Boraq
Suwar nabitin şahê pur îttîfaq

Boraqê ku seh kir kelamê Resûl
Bi zahir bi battin kirî wê qebûl

Serê xwe niha ber piyê Mustefa
"Ku bûm ez ji daxê fîraqê cuda"

Muttî' hate ber padîşahê kubar
Bi sed îhtîram Mustefa bû suwar

Institut kurde de Paris

Serafîlî ragirtî zengî ji bo
Sufûfê furuştan bi hay û bi ho

Bi dor wî ketin seffê quddûsiyan
Ji xulxul tijî erd û heft asîman

Ji ber ssewtê tesbîhê wan qasida
Tezelzul kete Sîdret-ul Munteha!

Me seh kir ji wî rawiyê mu'teberŞ
Boraqê dikir xettwe medd-el besser (8)

Boraq berqê seyr ew li deşt û li kûh
Melaîk li dor cem'î ba sed şukûh

Wuha gote min rawî yî bê guzend:
"Ku behta li nêv rê mekanek belend

Dibû dest-î kutah û ling-î diraz
Ji bo raheta şahê gerdenfîraz

Nişîb ger bihata li nêv hinde rah
Dirêj dest, û pa kin, bi emrê Îlah

Bi vî terzî rast û fîraz û neşîb
Wekî hev diçû zatê pak ê Hebîb!"

Tu şahînşeh î, ez gedayê feqîr
Diçî hezreta Kîbriya bê nezîr

Di xelwet bibînî Xwedayê semed
Eya padîşahê bi muhr û sened

Feramûş nekî Rûhiyê purxeter
Şefa'et ke min muznibê bê mefer

Institut kurde de Paris

Evê musteheqqê 'ezabê cehîm
Şefa'et ke carek bi lutfa 'emîm

Rîca ke di wê hezreta bê nîyaz
Evî Rûhiyê mucrim ê cangudaz

Di girdabê 'isyan xerîq im, xerîq
Di narê guneh bûm serapa herîq

Vekuj narê zenb im bi yek rehmetê
Derîne ji derya bike hîmmetê

Ne bab û ne da min ne qewm û ne kes
Tu yî melceyê min gunehkarî bes

Bi deryûze hatim derê Mustefa
Ku bêjî tu der hezretê kîbriya:

"Bide xatirê min eya Kirdîgar
Gunehkarê bed Rûhiyê zenbîdar!"

Wegerne dizanim li nik xwe yeqîn
Qewî musteheq im 'ezabê muhîn

Li ser min guneh şubhê erd û sema
Şefa'et bike ey hebîbê Xweda!

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

---

1 - Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Li meydan çu sindan dimînim dereng"
Sindan: Coniyê hesin
Dereng: Zingîniya conî, deng.

2- Ûmmîhan: Navê keça Ebî Ttalibê apê Pêxember e. Şe-



Institut kurde de Paris

va ku Mihemed Pêxember çûbû Mî'racê da ku bi Xwedê re bipeyive, ji mala wê rabûbû û çûbû.

3- "Wedduha" bêjeya destpêka sûretekî Qur'anê ye. Bi mana xwe ya ferhengokí: serê sibê çaxê ku çend bejin roj bilind dibe, jê re "wedduha" tê gotin. Bi Kurdî ji vî çaxî re dibêjin "Wextê çêlekdana."

"Wel'leylî" û şevê. Ev herdu bêje, peyvikên sonda Xwedê ne.

4- Xawer: Rojhilat.

Baxîrter: Rojava.

5- Keran ta keran. Bi mana ji aliyekî heta aliyê din. Ev hevok di çapa Qoxî de "geran ta geran" nivîsîye.

6- Ev nívmalik di çapa Amedî de weha ye:

"Wekî cayê xeytek me ew şeq didî"

7- Bexl: Hêstir

Xer: Ker

Qubab: Peqpeqokên li ser riyê avê.

8- Xettwe medd-el besser: Avêtina her gavekî, bi qasê dîtina çavan..

Institut kurde de Paris

# BEŞ 23

## BENDÊ SALIS WE 'IŞRÎN

## DER BEYANÊ EŞYAYÊ KÎ DER RAHÊ BEDÎD KÎ EZ ALEMA BERZEX TEMSÎLPÊŞÊ Û AMED

Wuhagotî rawî bi neqla xeber
Di ewsafê rahê şehê namîwer:

çu pêşde hinik çû ewî Mustefa
Jinek hate pêş wî di cewwê sema

Muzeyyen bi enwa'ê zîwer gelek
Bi zêr û bi zîv û bi gewher gelek

Bi xezz û bi dîbac û etles temam
Serapa bi canfez mulebbes temam

Bi xelxal û gerdenlix û goşîwar
Ber û sîne rengîn çu baxê buhar

Institut kurde de Paris

Nîda da ji bo şahê fexrê Rusul:
"Nezer ke li rûyê min ê şubhê gul

Gelek xelq ê muştaqê dîdara min
Cîger dane şîşê li guftara min

Û lê qelbê min meyla kes qet niye
Ji şewqa hemî kes dilim xalî ye

Kerem ke were min bike tu qebûl
Ku mam ez ji bo întîzara Resûl

Were carekê min deraxûşî ke
Hemî fikrê alem feramûşî ke!"

Nekir îltîfatek hebîbê mezin
Bi îlhama Mewla li ew pîrejin

çiqa bangî kir ew jina pur mekir
Hebîbî ebed îltîfat pê nekir

Ji bo wî re got Cibreîlê emîn (1)
Kî: "Ehsente, ey şahê bettha zemîn

Bi zahir cuwanek bi tedbîr e ew
Welêkin heqîqet gelek pîr e ew

Te qenc kir nekir îltîfatek heqîq
Li vê pîra namehrîban û şefîq

Bizane ku dunya ye ev pîra pîs
Xwe kêşaye vî libsê han ê xebîs

Ku bikra te lê îltîfatek durust
Dibû ummet ez paş te dunyaperest"

Institut kurde de Paris

Şukur kir gelek Mustefa bo Xwuda:
Ku "Ya Reb te da min tterîqa huda"

çu pêştir ve çû be'dekî ew li rah
'Eyan Cibraîl go ji bo zatê şah:

"Peya be li vir ke du rek'etnemaz
Li dergahê Heq pê bibî serfîraz"

Du rek'et nemaz kir li wî erdê pak
Ewî zatê sultan liser rûyê xak

Suwar bû li ser wê Boraqa bi nûr
Niyet kir biçit ew li wê rahê dûr

Sual kir ji wî Cibreîlî bi naz:
"Tu zanî kuca bû du rek'et nemaz?"

Cewab da ji bo wî "Nizanim yeqîn
Fe qul lî, eya Cibreîlê emîn?" (2)

Ji bo wî re go Cibreîlî çunan: (3)
"Ku ev herdu rek'et li Medyen bizan"

çu pêştir hinik çû li rah ew hebîb
Ji paş û ji pêş hetê dengê 'ecîb:

"Kî qif ya Muhemmed! bike îltîfat
Li min, ey şehînşahê 'alîsîmat (4)

Sualek heye min ji zatê kerîm
Bide min cewab, ey hebîbê 'ezîm!"

Neseknî li deng û ebed ne heband
Boraqê çu berqê rîkab lê şidand

Institut Kurde de Paris

Ji Cibrîlî pirsî hebîbê mezin:
"Li vir çend-î dengê 'ecêb hate min!

Bibêje ji bo min, çi deng bû heman
Ji wî cuz-î xewfek li min bû 'eyan!"

Ji bo wî re go Cibreîlê emîn:
Ku "yek sewtê qewmê Nesara, yeqîn

Digel da'iyê pîs ê an qewmê bûd
Ku meşhûrî bûne bi îsmê Yehûd (5)

(Essebte, essebte) du car gote wî
Neda te cewabek ji bo ssewtê wî

Eger te cewab da ji bo wan bedan
Diket nav umet, miletê murtedan

Yehûd û Nesara dibûn paşî te
Bizan be'zekî ummeta pakî te!"

Gelek hemdê kir bo Xwedayê 'ezîm
Hebîbê mu'ezzem, Resûlê Kerîm:

"Îlahî te kir hifzza ummet li min
Ku murted nebin hîçîşan piştî min!"

Ku pêştir de çû padîşeh çendî gam
Ji bo wî re go Cibreîlî himam:

"Nizûl ke li vir ey kerîmus'sîfat
'Eqid ke der-înca du rek'et selat!"

Sibik hate xwar ew hebîbê bi naz
'Eqid kir bi dîqqet du rek'et nemaz

Institut kurde de Paris

Suwar bû dema ser Boraqê delal
Ji bo 'erzî kir, peykê sahibkemal:

Ku "Ev hedu rek'et li Beyt-îl Lehem
Te kir, ey şehînşahê 'alîhimem!"

Li Beyt-îl Lehem ew durek'et bûyî
Cihê ku Mesîh lê wîladet bûyî

Ji ewpaş murûr kir bi Qebra Kelîm
Kelîmê Xweda bû di merqed muqîm

Selam kir li Mûsa 'eleyhîs'selam
Cewab da selamek bi sed îhtîram

Hinik pêştirî de ku borî li rah
Yekî şexsê kamil giha pêşî şah

Di destê xwe de anî wî çar lîbas
Welêkin lîbasê mukemmel esas

Vegirtin li ber fexrê 'alem bedîd
Sîfet kesk û zerd û sîyah û sefîd

Wuha gotî bo Ehmedê nûrîdar:
"Bike du lîbasan ji van îxtiyar!"

Hebîbê Xweda îxtiyar kir çunîn
Ewê cameyê kesk û ebyedd yeqîn

Heman terkî kir wî Resûlê Îlah
Bi kullê ewan libsê zerd û sîyah

Ji bo wî re go Cibreîlî çunan:
"Ku îlhama te heq e, ey nûrîcan

Institut kurde de Paris

Sipîdî bizan rahê şer'a Resûl
Delîl e ku ummet bikin wê qebûl

Û lê cameyê kesk ê nûrîn-esas
Ji bo ehlê cennet bizane lîbas

Tefe'uul dikin em bi exder wusan
Di cennet bipoşin ummet cumleşan

Welêkin ewê zerd û eswed heman
Bizan libsê Gebran û Tersayiyan

Eger zerd û eswed te bikra qebûl
Dibû ummeta te ji paş te melûl

Diket qelbê wan fikrê battil hezar
Dikir dînê Tersa û Gebr îxtiyar!"

Hezaran hezar hemd û şukrê Îlah
Bi qelb û zeban kir ewî zatê şah

Messûn kir te ummet eya zelmînen
Nekeftin ji ser rahê şer'a hesen (6)

Ku pêştir de çû şahê ba sed şeref
Kesek hate pêş û du kase bi kef

Yekê şîr-î tê da, yekê engebîn
Wuha gotî bo sedrê sultanê dîn:

"Ji van herduwan yek bike îxtiyar
Welêkin yekê ber kefê min guzar"

Nebû mustemi' şahê 'alîmeqam
Hilanîne herdu vexwarin temam

Ji bo wî re go "pes" exê Cibreîl
Kî "Ey sedrê mehbûbê şahê Celîl

Bizane 'esel çendî şêrînî ye
Helawet Xweda hinde tê daniye

Te noşî ewê camê nûrîn temam
Dibit dînê te hinde şêrîn mudam

Vexwar te ewî şîrê saf î zelal
Yeqîn ke eya sedrê sahibcemal

Dibit qelbê ummet wuha rengesaf
Muneqqa û pak û delal û şefaf!"

Ku borî ji wan, dîtî qewmek cemi'
Ji wan berqê nûrîn diçû çun şemi'

Hesadê dikin zer'ekî qenc ê pak
Dikin cem'a zer'ê ji ser rûyê xak

Dema bû temam ew hesad û durûn
Vegerya (kema kane) şîn bû kunûn (7)

Dikin paleyî daîma subh û şam
Ji wê erdê ew zer'î nabit temam

Sual kir ji Cibrîlî sedrê cîhan:
"çi hal e dibînim li pêşber 'eyan?"

Cewab da ji bo wî re Cibrîlî în
Kî "Ey fexrê 'alem bizane hemîn

Heçî ku cîhadê bikit bê rîya
Ji bo wan re îhsan dikîtin Xweda

Institut kurde de Paris

Yekî xeyrekê wan bihefsed sewab
Xelas in ji ehwal û xewf û 'ezab!"

Bi teşbîhê vî zer'î hatî wucûd
Muselsel dibit Kirdigarê Wedûd

Ji wê Mustefa borî, xeyrî be'îd
Li nêv rahê şexsek 'eyan bû bedîd

Cemi' kirye ew şexsî hezmek hetteb
Dikit qesd-î da hilgirit bê te'eb

Nikarî ji cî rakitin hîzeman
Li ser wan ziyade dikit her zeman

Te'ecceb ji wî kir Resûlê Celîl
Sual kir "çi hal e, eya Cibreîl?"

Wuha got-î Cibrîlî bo zatê şah:
"Muşexxes bûye halê sahibgunah

Ku ye'nî heçî pirgunah û xeta
çu 'isyan dikin ew bi roj û şeva

Di jêr barê 'isyan dibin bê mefer
Îlawe dikin zêde 'isyan li ser!"

çu borî ji wan, dîtî qewmê dîgerŞ
Yekî goştê taze di qidra çu zer

Hinik lehmê dî pîsê mirdar ê reş
Mulewwes di nav çend qudûrê ne xweş

Ji wî goştê taze nexwarin ebed
Ji bo lehmê qeşmer dikêşan cehed



Institut kurde de Paris

’Ecebmande pirsî ji peykê Xwuda
Îmamê Rusul seyyîdê rehnuma

Exê Cibreîl gotî bo Mustefa:
"Bizane ev e halê ehlê zina

Nîsaê Xweda kir helal bît’temam
Dihêlin, dikin qesda fê’la heram!"

Ku pêşde hinik çû hebîbê Celîl
Bi çav dî hinik qewmê pîs ê seqîl

Qewî tazî û rût û ’uryan heme
Li nêv hev diçêrin çu heywan heme

Yekî xerqeyê pîs ê ber ’ewretê
Li pêş û li paş bû ji bo hurmetê

Ekil wan ji xarê muxeylan temam
Dikin bel’ê seng ê cehennem mudam

Sual kir ji Cibrîlî ba sed kemal:
"Beyan ke evî halê hîkmetmeal

çi qewm in di vî halî, wek halê sa?
Evan seng û şewkan dixwin her wusa!"

Wuha gotê Cibrîlê ’alîsîmat:
"Heçî men’î kit ew huqûqê zekat

Ev e halê wî der ’ezabê cehîm
Xweda bo te teşxîsî kir, ey kerîm!"

Ji ewpaş de dî qewmekî bê zeban
çi bihnek ne xweş tê ji wan her zeman

Institut Kurde de Paris

Bi ezyet bi te'bek mezin cildê ser
Musellex dibit wan kesan serteser

Ku bû selxê re-sê xebîsan temam
Dibû 'ewde çermê serî der meqam

Ev e halê wan daîma rûz û şeb
Dikêşin evî haletê pur te'eb

Sual kir "çi hal e eya Cibreîl?
Dikêşin evî qewmê pîs ê zelîl!"

Cewab da wuha Cibreîlê delal
Kî "Ey sedrê sultanê sahibcemal

Evî qewmê der haletê purceza
Tesaqul dikin ew ji ferza Xweda

(Tesaqul çi ye?) ey şehê pursîfat
Diborin li wan ferzê pak ê selat!

Muşexxes bûye halê wan der cîhan
Ku tenzîrê kî ummetê cumleşan!"

Ku borî ji wan şahê 'alî 'elem
Li nêv rahê dî darekê purkelem

Heçî ku murûrê bikit lê, ji nas
Dikit pare-pare li ser wan lîbas

Ji bo Mustefa gotî pes Cibreîl:
"Binase evê dara pîs î rezîl

Bi teşbîhê qati'tterîq in yeqîn
Ku te'b û meşeqqet didin muslimîn!"

Institut kurde de Paris

Ji Darê ku borî şehînşahê can
Li ber çeşmê nehrek ji xwîn bû 'eyan

Di nav de diçin-tên hinik qewmê pîs
Ji wan tê çi bihnek mirar î xebîs

Dikin luqme her lehze seng û kevir
Ji telqîma ehcar-î nakin sebir

Ji Cibrîlî pirsî di fexrê 'Ereb:
"çi ne ev di vî haletî ey 'eceb?"

Cewab da ji bo wî bi 'izz û şeref:
"Ev e halê ehlê riba û selef

'Eyan kir ji bo te Şehê layenam
Bikî nehyê ummet ji fi'la heram!"

çu borî ji wan jî, li nîva tterîq
'Eyan dî bi çavên xwe şahê şefîq

Ku qewmek cemi' bûne ser hev gelek
Di nav destê wan de meqes yek-biyek

Dibirrin bi wan ew zeban û leban
Ev e karê wan her bi roj û şeban

Wekî xwe dibin dîsa ezman û leb
Xweda daye wan ev sebîla te'eb

Te'eccub gelek kir hebîbê Celîl
Sual kir ji zatê exê Cibreîl

Ji bo wî re Namûsê Ekber, delal
Cewab da wî go: "Ey şehê purkemal

Institut kurde de Paris

Ev e halê wa'izz dibêjit we'izz
Bi we'zza xwe ew nabitin mute'izz

Xweda dê di roja sewab û 'îqab
Ji bo wan bidit ev meşeqqet 'ezab!"

Ji Rûhî tu seh ke kesê der huzûr
Ku çend şi'r ê bûn der dilê min xutûr

Beyan kim hinik haletê wa'izzan
Welêkin heçî wa'izzê ev zemanŞ

Hinik mudde'î vî zemanî hene
Bi telbîs û hîle çi amade ne!

Serê wan mezin pur bi şaşê sipî
Li ta'et bi zahir şedîd in qewî

Serapa dipoşin bi exder wucûd
Bi şiklek xerîb û 'ecêb tên şuhûd

Muserreh dikin lihyeî pirr mezin
Dikin qessê şarib heta koka bin

Diposin gelek teylesan û rida
Ji bo be'zê cahil dibin muqteda

Li ser kursiyê we'zzê daîm-mudam
Dikin we'zz û şîret ji bo xas û 'am

Hedîsê muttewwel, mufesser dikin
Ji wan herçî nadan e bawer dikin

Welêkin li we'zza xwe nabin xwedî
Ji çendan me ev reng û boyaxê dî

Institut kurde de Paris

Xwe qurmîş dikin ser kerasiyê 'ilm
Welêkin 'emel nakin ew qet bi 'ilm

Ji bo hîlekarî xwe tezyîn didin
Bi vî terz û rengî xwe ayîn didin

Bi cerrarî û hîlesazî gelek
Feqîran dikin rût û tazî gelek

Ne bo zatê Barî dibêjin we'izz
Ji bo cem'a mal ew dibêjin we'izz

'Îbadan dixapînin ew rûz û şeb
Dikin fi'l û ef'alê terkî edeb

Herîss in li cem'a derahîm çunîn
Bi şubhê zubabê li ser engebîn

Teherruk dikin ser bi we'zzê xwe re
Tekelluf dikêşin bi lefzzê xwe re

Muzexref dibêjin xeber bê hîsab
Ku ew cem'ê kin sîm û zêr bê hîsab

Îlahî me zarî li babê te kir
Terîqa rîcayê me pûyende kir

Me rû malî kir xakê ber asîtan
Tu Rûhî nekî der ji nav dositan

Nekêşî li nik xwe kîtaba mubîn
Ji zumra evan wa'izzan Şemsiddîn

Ne we'zzê didim bo kesê muntezir
Ne şermende bim ez di rojê heşir

Institut kurde de Paris

Bisûz e dilê min bi 'işqa giran
Ji 'işqê heyatek bide cawidan

Bide cama 'işqê binoşim temam
Li vir xetmî kim bendê reh wes'selam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

---

1- Ehsente: Te rind kir.
2- Fe qul lî: Ji min re bibêje.
3- Medyen: Li Şamê, gundek e.
4- Qif: bisekne.
5- Ev nivmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Dîger da'iyê qewmê an pîsî bûd"
6- Mesûn: Parast.
Zelmînen: xwedîminet.
7- Kema kane: Mîna berê.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 24

## BENDÊ RABI' WE 'IŞRÎN

## DER DÛXÛLÊ RESÛLÎ BI MESCIDÊ EQSSA

Institut kurde de Paris

Bide saqiya badeyê dilfurûz
Bi 'işret şeva me bike şubhê rûz

Lebaleb ke saxer ji abê rehîq
çu yaqûtê seyyale û çun 'eqîq

Ji durdê muneqqa bike camê min
Tu seh ke çi şêrîn kelamê di min

Ku sergermî bim ez bi vê badeyê
Bibêjim qisa Mescîd-îl Eqseyê

Wuha gotî rawî ji neqla sehab
Ku: Ew şahê serdar ê nûrînnîqab

Qedem çun niha wî der 'iqlîmê Şam
Ji xurşîdê 'alem mûnewwer temam

Ku çû mulkê Şam şahê axirzeman
Ji subhê se'adet bi nûr bû heman

Yeqîn ke li Şamê hezar roj helat
Peyapey tecellî ji zat û sîfat

Nizanî çi kes, roj e yan şêv e ew
Zi pes berq û enwar û tîrêj û ddew

Sûyê beldeyê Qudsê çun bû rewan
Mûddî bû cîhan ez keran ta keran

Dema hate ber Babê Quds-il Xelîl
Resûlê Xweda ba exê Cibreîl

'Eyan dî melayik çi cemmek xefîr
Hîsab nake îlla Xwedayê kebîr

çep û rastî bo şahê 'alîcenab
Selamlix kêşane melek bê hîsab

Hemî destê xîzmet kemerbeste ne
Ji bo xizmeta şahî amade ne

Yemînen, yesaren kişane sufûf
'Eded xaric ez hedd ulûf û ulûf

Hemî dengî dane selat û selam
Tezelzul kete ax û iqlîmê Şam

Ji Babê Yemanî duxûl kir hebîb
Heta ku bi Mescîd wusûl kir hebîb

Duxûl kir şehê serwerê namîber
Ji wî Babê lê, şiklê şems û qemer

Kerem ke bi lez ey Resûlê kubar
Sefê enbiya cumle der întîzar

Institut kurde de Paris

Hemî muntezzir bo qudûmê hebîb
Ji firqet hemî cergêşan bû kebîb

Bimeş Mescidê da hemî cem'i bûn
Li dor te çu perwaneyê şem'i bûn

Kerem ke tu ey şahê Beyt û Herem
Muşerref bike wan bi xakê qedem

Bike serfîraz ey şehê hemçugul
Bi teşrîfa xwe enbiya û rusul

Hemî arezûmendê dîdarê te
Hemî cergîsûz in li enwarê te.

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Wuha gotî rawî ji neqla Resûl:
Bi Beyt-îl Muqeddes dema bû wussûl

Nizûl kir hebîbê Xweda ez Boraq
Li ber Babê Mescîd bi terz û liyaq

Kevirkî mezin bû di ruknê cîdar
Ji bo rebttê merkûbê şahê kubar

Bi destê xwe Cibrîlî qul kir kevir
Serefsarî der suqbe derbasî kir

Girêda Boraq Cibreîlê emîn
'Elamet bibit da ji bo munkirîn

Bizan Cibreîlî xwe amade kir
Bi îsmê Xweda Babê Mescîd vekir

Dema bû derê Mescidê feth û baz
Duxûl bû Muhemmed bi sed 'izz û naz

Institut kurde de Paris

Ji ewwel hezaran ssefê enbiya
Gihan xakîpayê şehê esfiya

Kirin hedye bo wî selat û selam
Ku 'ed nake îlla şehê layenam

Hemî enbiya sef bi sef çarteref
Li dor fexrê 'alem girêdane sef

çu merkez di nêv girdişê daîre
çu şemsê li kewkeb bibit zahîre

Ji şewqê hemî dehş û bêsehwî bûn
Hemî enbîya nûrê wan mehwî bûn

Ûlul'ezzmî westane xizmet guzar
Rusul bûn hemî çakirê bendewar

Muşerref hemî enbîya lacerem
Bi rû malî wan xakîpayê qedem

çira? çunkî meqsûdê bîz'zat e ew
Ji bo nûrîzat safê mîr-at e ew

Hemî enbîya û cemî'ê rusul
Wekî xwunçe, û fexrê 'alem çu gul

Cemî'ê rusul pêkve destbeste bûn
Ji nêv narê hîcranê wareste bûn

Ji bo wî re go Ademî ba sefa:
Kî: - Ey nûra dîde şehê ba wefa

- Ji puşta min î, lêkin çêtir ji min
Nubûwwet Xweda da te bo îns û cin

Institut kurde de Paris

- Bi îsmê te bûm mezherê 'efwa Heq
Ji bo te vexwendim Xwedayê bi heq

- Tufeylê seraperde yê xîzmet im
Qewî arezûmendê bo hîmmet im!

Nebî Nûhî got: - Ey kerîmus'sîfat
Ji Tofan bi yumna te ez bûm necat

- Ku nebwa ji bo me tu feryadîres
Ji Tofan xelasî nebûbû çi kes!

Wuhagotî Yûnus kî: - Ey qurret im
Ji nav bettnê Hûtî bi te derketim!

Xelîl gotê: - Ey ruhniya çeşmê min
Bi te Narê Nemrûdî cennet li min

- Ji bo te Xweda da me ev pur kerem
Bi te serbilind in hemî lacerem!

çu Ye'qûbî hat nik hebîbê emîn
Ji bo 'erzî kir ev kelamê metîn:

- Bi yumna te ey şahê pur îttîfaq
Xelasî Xweda da ji narê fîraq!

çu Yûsuf giha nik hebîbê Xwuda
Şehê enbiya pêşîwayê huda

'Eriz kir kelamek bi dîqqet gelek:
- Ji îhsan li min bûne nî'met gelek

- Bi te bûm ji ber keydê îxwan xelas
Bi feddla te ez çahê Ken'an xelas

Institut kurde de Paris

- Bi te bûme faxir ji keyda nîsa
Ji Zîndan xelasî bi te da Xuda

- Li nik min muheqqeq heye ev fikir
Bi yumna te ez bûm 'ezîzê Misir

- Ku bûm muctemi' ez digel babê xwe
Vewestam li nêv yar û ehbabê xwe

- Xecil hatine nik me cumle bira
Ku ev çendî lutf û kerem da Xweda

- Dizanim hemî bû ji feddla hebîb
Li ser min musebbel ji lutfa hebîb!

Ji bo wî re Muse B'nî 'Îmran temam
Vewesta û kir 'erzê xizmet kelam

Kî: - Ey şahê "Lewlak"î, fexrê bi nûr
Tecellî li min bû li ser Kûhê Tûr

- Digel tis'î ayatê Mewla kerem
Li min kir ji îhsana te lacerem

- Bi yumna te bûme necat ez qisas
Bi rehma te ez mewcê Derya xelas

- Bi feddla te bû Behr duwazde tterîq
Necat bûm û Fîr'ewnî tê bû xerîq!

Ji paş wî Mesîh hate pêşê Resûl
Kî: - Ey sedrê dîn, şahê sahibqebûl

- Eger çi ku îhyayê mewta me kir
Welê min ji asarê lutfa te kir!

Institut kurde de Paris

Kirin tehnîe cumleyê enbiya
Li wî Qabîqewseyn û qurbê Xweda

Ji paş suhbetê pur bi wan re ku kir
Xelîl hat û sultan bi Mîhrabê kir

Kî: -Ey fexrê 'alem şehê esfiya
Kerem ke îmamet ji bo enbiya

- çu Mewla kirî şahê însan û can
Îmamet bike tu ji bo cumlekan

- Ji bo me tu îmşeb bibe muqteda
Ku roja heşir bin di jêrê Lîwa!

Muhemmed ku seh kir ji wî ev rîca
Muqeddem bi Mîhrabê çû Mustefa

'Eqid kir li ber zumreyê serfîraz
Resûlê Xweda wî du rek'et nemaz

Dema ku selam da şehê ba cemal
Bi tesbîhê Mewla kirî îştîxal

Di paş zikrê Barî şehê pur şu'a'
Ji cem'ê rusul têkde xwestî wîda'

Bi dor ketne têk enbiya û rusul
Senago li wî hemçû bulbul li gul

Hemî dest û pa bûse dan enbiya
Bi paşde vegeryan ji dû Mustefa

Xwedaya bi heqqê evan serweran
Bi Ehmed digel cumle peyxemberan

Institut kurde de Paris

Nekî rûsiyeh min di rojê qîyam
Di zumra Muhemmed eleyhîs'selam

Heşir ke minê pur guneh el eman
Bide xatirê şahê axirzeman

Muhemmed bişîne tu feryadîres
Ku rûh bête sîne di axirnefes

Dema têkevim haletê sekretê
Li min purxetayî bike rehmetê

Qewî rûreş im sifrîyed bê 'emel
Gunehkar û muznib di ttûlê emel

Li min nefs û şeytan musellet gelek
Gunah û xetayê me çûne felek

Bixefrîne min rûreşî zû bi zû
Kerîm î, rehîm î, xefûr î 'efû

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 25

## BENDÊ XAMIS WE 'IŞRÎN DER 'ÛRÛCÊ RESÛL BI ASÎMAN

Were ey qelem qenc e hişyarî be
Li emr û li nehyê me guhdarî be

Ku îlqa bikim ser te emrê şedîd
Di emrê me qaîm be şubhê 'ebîd

Me qesd e ku halê 'urûca Resûl
Beyan kim bi ebyat û şi'rê qebûl

Welêkin ji hîcrê cîger pare-par
Ji pêtê fîraqê cîger pir ji nar

Bizan ey qelem ketme halek xerab
Ji hîcra hebîbî cîger bû kebab

Eger cuz-î sistî bibînî ji min
Me hêvî-rîca ye ku negrî li min:

Ji nêv Babê Mescîd ku derket hebîb
Bi erd û sema ket fîxanek 'ecîb

Ji ber dengê tesbîhê quddûsiyan
Bi zelzel ketin erd û heft asîman

Institut Kurde de Paris

Hebîbê Xweda dîtî cuz-ek ji dûr
Yekî sexre têkde muzeyyen bi nûr

Ku Mî'raca nûr ez sema hate xwar
Serê wê li ser sexre girtî qerar

Bizane ku Mî'racê bo Mustefa
Yekî nerdewan bû ji nûra Xweda

Hemî sîm û zêr bû ewê Nerdewan
Muresse' bi yaqût û cewher çunan

Li rast û li çep sedhezaran sufûf
Melaîk bi tesbîhê Mewla wuqûf

Ji bo wî re go Cibreîlê emîn (1)
Kî "Îs'et 'eleyhî" eya sedrê dîn!

Dema pê niha wî li ser sexreyê
Ji ber şewqa wî sexre ket cezbeyê

Ji ber heybeta Mutefayê kebîr (2)
Nerim bû kevir, bû bi şubhê xemîr

Ku bû mustewî fexrê 'alem 'eyan
Qedem tê de çû xwarê lê bû nîşan

Qedem çun hilanî ji ser Mustefa
Tevî lingê wî sexre rabû hewa

Nikarî sebir kit ji zatê hebîb
Niyet kir ku pê ra bibit hemrikîb

Dema dîtî sultanê sahibxeber
Emir kir ji bo wî kî "qif ya hecer!"

Institut kurde de Paris

Hecer ma mu'elleq di cewwê sema
Ji bo mu'cîze ta bi rûzê ceza

Ji erdê ewî sexreyî bê gezend
Bi pîvanê yek qama însan belend

Ji ser sexre pê danî ser Nerdewan
Tezelzul kete Nerdewana giran

'Ûrûc kir heta babê esman bedîd
Welê dîtî dergahê esman kelîd

Nîda da ji bo dergevan Cibraîl
Kî: "Îfteh lenel babe, ya Îsmaîl!"

Sual kir ji wî Dergevan ba edeb:
"Digel te çi şexs e di ev nîmê şeb?"

Cewab da li wî Cibreîlî çunan:
"Muhemmed resûlê Xweda ye bizan

Xweda xwestiye dê biçit hezretê
Şefa'et bikit ew ji bo ummetê!"

Ku seh kir evê mujdeyê rûh û can
Bi te'cîlê qapî vekir Dergevan

Qedem da li ser asîmanê ewil
Muşerref gerrand asîmanê ewil

Dema kir hebîbî li esman wuqûf
Ji nûra wî bedra felek bû xusûf

Wusa maye reş-tarî û bê cemal
Giha ne'lê sultanê sahibkemal

Institut kurde de Paris

Ji pabûsê wî kesbê nûr kir gelek
Cemal daye erda, ji sethê felek

"Hezar ehl û pasend hezar merheba"
Simaîlî go bo hebîbê Xweda

Xwe avête dest û piyê padîşah:
- Nezer ke li min ey hebîbê Îlah

- Ji weqta ku Mewla ez anîm wucûd
Li ser Lewhê îsmê te min kir şuhûd

- Vemam walih û aşiqê îsmê te
Li vir muntezir bo lîqa cîsmê te!

Sufûfê melek bê 'eded bê hîsab
Qedem bûse dan şahê 'alîcenab

Hemî sefê quddûsiyanê felek
Ketin ber piyê Mustefayî gelek

Melaîk hemî ez keran ta keran
Bi rû malî ne'lê hebîbê cîhan

çu Peyxember ez wan hinik pêşîter
Qedem rence bû be'zê reh pêşîter

Yekî şexsê kamil Nîhadê muhab
Li nêv rahê dî şahê 'alîcenab

Li nêv rahê bû, lêkî yek pare dûr
Serapa bûye xerqê nûra Xefûr

Sual kir ji Cibrîlî bê xewf û bak:
- çi zat e evî şexsê nûrîn ê pak?

Institut kurde de Paris

Cewab da ku: -Ev rûhê Adem bizan,
Li vir daîma calis e her zeman!

Bi nik wê ve çû şahê Beyt-îl Heram
Bi terz û edeb jê re go "Esselam!"

"Eleyke" cewab da li wî Ademî:
- Şerîftir ji nesla benîadem î

- Sema û zemîn Kirdîgarê Wedûd
Ji bo zatê pakî te anî wucûd

- Ji bo te feriş kirye ferşê mehîd
Ji nûra te xelqandî 'erşî, Mecîd

- Eger çi bi zahir ji puşta min î
Welêkin heqîqet tu pişta min î

- Xweda daye te qurba hezret wuha
Nedaye ji bo hîçî kes enbiya

- Dema biçne pêş Xaliqê kirdîgar
Feramûş nekî ummetê, zînîhar!

- Evê dewleta tu gihştî mezin
Ne ez weslî bûme, ne kes xeyrî min!

"Ne'em" gotî sultanê sahibcemal
Welêkin ji Adem kirî yek sual:

- Der-înca çu hemwar e binşeste yî?
Dibînim ku yek pareyî xeste yî!

Ji bo wî re go Ademê nûrîdar
Kî: -Ey merhema qelbê mecrûhî zar

Institut kurde de Paris

- Li vir calis im her dem û saetê
Temaşa dikim rûhê zurîyetê

- Heçî ku se'îd e munewwer dibim
Heçî ku şeqî bit mukedder dibim

- Ne bîmar û rencûr im, ey nûrîcan
Mukedder dibim seb gunahê di wan

- Ji bo ummetê bêje ey dûrebîn
"'Îbadet bikin aşîkar û nehîn"

- Bi ta'atê wan şad û xurrem dibim
Ne ez zenbê wan zêde purxem dibim

Ji ewpaşî zatê kerîm ê Nebî
Wîda'ê puder kerd û borî ji wî

Ji wê çû, li rahê sema be'zî dûr
Quttarê cemel dîtî cumle ji nûr

Du sindoq ê der barê her yek be'îr
Muqedder wuha kirye şahê kebîr

Ji meşriq ve tên sûyê mexrib diçin
Peyapey mudam rûz û her şeb diçin

Ji hev naqetin ew deve rûz û şeb
Diçin her bi zewq û bi keyf û tereb

Li dû hev diçin ew cemel muttesil
Nebû rahî îlla di nava îbil

Vewesta Resûlê şehê layenam
Heta ku murûrê bikin ew temam

Institut kurde de Paris

Ku qett'ê qettî'e nekit ew li rê
Ji paş ku biborin biçit oxirê

Ji bo wî re go Cibreîlê mezin
Kî: -Ey nûra dil quwweta canê min

- Kerem ke li oxir bike tu 'ubûr
Temamê be'îran qewî dûredûr

- Kerem ke bibore di nîvê quttar
Nîhayet li axir meke întîzar

- Ji wexta ji qudret ku heyyê Celîl
Ji ketma 'edem xelqî kir Cibreîl

- Dibînim ji ewwel ve ta ev zeman
Deve her diçin bê 'eded bê guman

- Qeti' nabin ev uşturê bê 'eded
Ne ewwel ne axir me nedye ebed!

Ji Cibrîlî pursî: -çi ne ev deve?
çi sindoq in ew barê her yek deve?

- Ji kû tên, diçin kuderê, ey exî?
Beyan ke ji bo min vî sirrê xefî!

'Eriz kir ji bo xakîpayê hebîb:
- Bibêjim ji bo te kelamek 'ecîb!

- Bizan ev cemel ku li nava reh in
Hemî barê me'nayê "Bîsmîllah" in

- Ji cem Lewhîmehfûzzê tên her zeman
Dikêşin evan heml û barê giran

Institut kurde de Paris

- Ji wê bar dikin barî her yek bi yek
Diçin xizneya xeybê bê reyb û şek!

Murûr kir ji wan jî Resûlê bi naz
Biçit ew li rahê xwe pur serfîraz

Li wê dîtî sultanê 'alî'elem
Ku ceryan dikin abê pak ê du çem

'Eceb nazik û taze abê zelal
Ji qudret wucûd kir şehê layezal

Ji Cibrîlî pirsî hebîbê cîhan:
- çi nehr in wuha tên peyapey rewan?

Cewab da kî: -Ey şahê 'alîsîmat
Ev in herdu çem abê Nîl û Firat

- Ji nêv Sîdre tên abê pak î zelal
Murûrê dikin der bihiştê delal

- Di cennet bi Kewser murûrê dikin
Bi cumle semayan 'ubûrê dikin

- Heta ku ji vî asîmanê ewil
Nuzûl kit bi erdan bibit muttessil

- Bi quwwet nuzûlê dikit abê pak
Rewan dê bibit ew li ser rûyê xak

- Li her ca ku ev av ê bit muctemi'
Dibin ehlê dunya bi wê muntefi'!

Dibêjit gunehkarê Rûhiyê dûn
Evî şa'irê sahirê pir fusûn

Institut kurde de Paris

Ku be'zek ji ruwwatê vê qisseyê
Dikin zêde Ceyhûn û hem Dîcleyê

Ku ye'nî hebîbê Xweda çar-î çem
Bi çav dî li sethê semayê yekemŞ

Firat û dîger Nîlê pur îhtîşam
Û hem Dîcle, Ceyhûn û her çar temam

Sehîhtir li nik min ev e bê guman
Ku her çar çem in tên ji ser asîman

Û hem exlebê rawiyan bê henek
Qewîtir dikin ev rîwayet gelek (3)

Ji rawî me seh kir kelamek 'eceb
Tu jî guh bidê da bibî pur edebŞ

Zemanek ewil abê Nîl bû kesîr
Di nav hat hinarek bi mislê be'îr

Qerar dan heçî 'alimê an çunîn
Ku "Ev, eynî rummana cennet yeqîn"

Bi emrê Xweda ew ji bo hîkmetê
Di avê de derket ji nav cennetê

Bide saqiya saxerek muhteşem
Li meqsed bigêrrim qelem bîş û kem

Bikim 'ewde ser meqseda xwe hema
Beyan kim hinik halê sanî sema:

çu borî ji ser asîmanê yekem
Vewesta li babê sema yê duwem

Institut kurde de Paris

Nîda kerdî Cibrîlî bê xişş û xel
Ku qapî veke dergevan el 'ecel

Sual kir "digel te kî ye?" dergevan
"Ku te'cîlê hinde dikî ev zeman!"

Ji bo wî re go Cibreîlî çunan:
- Digel min Resûlê Xweda ye bizan!

Ku îsmê Resûlê Xweda goşî kir
Hemî fikrê 'alem feramûşî kir

Bi lez dergehê asîman bazî kir
Bi pabûsê sultan xwe pur nazî kir

çu daxil bû ew şahê 'alî'elem
Bi ne'lê, şerîf bû semayê duwem

Gelek fexrê kir wî di jêrê nî'al
Bi pabûsê Peyxemberê pur kemal

'Ettarid ji tedbîra xwe ma zelîl
Xwe avête ber lingê sultan "dexîl"

Debîrî nekir lê nema xettê dest
Li pêş wê duwat û qelem kir şikest

Xwe avête ber payê Ehmed gelek
Heta dîse ew bû xetattê felek

Bi mijgan hilanî turaba nî'al
Ji mehbet rijandin li ser eşkê al

Siyahî murekkeb bedel kir bi al
'Ettarid bi surxê nivîsî delal

Institut kurde de Paris

Li esmanê sanî çiqas bûn melek
Kirin bûse ne'lê Resûl yek bi yek

Dexîl bûne ber payê şahê huda:
"Qiyamet me bigre di jêrê lîwa

Sena û şukur bo qerîbê mûcîb
Ku pabûsê te bo me kirye nesîb!"

Li wê dîtî yek kursiyê sade zer
Mukellel bi yaqût û durr û guher

Mirovek mûnewwer li ser qa'id e
Ku şemsa felek ez cemal kasid e

Sual kir ji Cibrîlî: -Ev merdî kîst?
Cewab da ku: -Ew Yûsifê pakîzîst!

Bi nezdîkê Yûsuf xeraman ku çû
Ji ber nûra şeh, husna wî mehwî bû

Selam kir li Yûsuf bi terzek temam
Qîyam kir ji ber, go: -Eleykes'selam!

- Li ser çavê min hatî ey nûrîcan
Ji bo te hemî erd û tû asîman (4)

- Te teşrîfê da min bi xakê qedem
Hemî xeyl û tu şahê sahib'elem

- Xweda 'izzetek daye te ey emîn
Nedaye ji bo ewelîn, axerîn

- Tu îmşeb diçî Qabeqewseynê Heq
Te bir ez cemî'ê resûlan sebeq

Institut kurde de Paris

- Bizane tu mewlayê ummet yeqîn
Ji te pê ve kes nîne wan ey emîn

- Bixwaze li dîwana Heq, zînîhar!
Şefa'et ji bo ummeta zenbîdar!

Wîda' kir ji siddîqê Yûsuf hebîb
Li hîcrana wî kir teessuf hebîb

Bi rê ket ji ser asîmanê duyem
Xeraman suyê asîmanê siyem

Ji bewwabê esmanê salis çunan
Teleb kir ku dergeh veke ev zeman

Ji Cibrîlî kir dergevan ev sual:
- Digel te dibînim yekî pur cemal

- çi şexs e bi vê husn û hey-etmezin?
Meke xef li min, eşkera bêje min!

Ji bo wî re go hamilê Wehya Heq:
- Muhemmed ev e, şahê heftem tebeq!

- Diçit bo hezîra Qudus ew yeqîn
Xweda xwestiye ev hebîbê emîn!

Bi lez ket gelek Dergevan ew zeman
Vekir ew nefes qapiyê asîman

Qedem da li ser asîmanê siyem
Muşerref kir esman bi xakê qedem

Ji ewwel ve bewwabê salis sema
Xwe avête dest û piyê padîşa

Institut kurde de Paris

Ser û çeşm ê malî di jêrê nî'al
Bi xakê qedem kir gelek îktîhal

Bi reqs û tereb Zuhreya ba sefa
Vewesta ye destbeste pêş Mustefa

Ji destê xwe avêt-î çeng û ribab
Ku pa bûsî kit şahê 'alîcenab

Nekir mutribî Zuhreya dengîbêj
Li husna Resûl ma kerr û lal û gêj

Gelek Zuhreyê da surûd û xîna
Li wê husna bê misl a şahê huda

Melaîk li esmanê salis heme
Bi tesbîh û tehlîl û pur zemzeme

Qedem bûse dan lê hezaran hezar
Furuştan bi pabûsê kir îftîxar

Ji wan jî ku borî hebîbê emîn
Qedem da suyê ttarumê çaremîn

Li ber babê esmanê rabi' çunan
Seda daye Cibrîl ji bo dergevan:

- Veke babê esman di vê saetê
Bi te'cîlî fethê bike hîmmetê!

"Kî ye hemrehê te?" sual kir ji wî
Cewab da: -Digel min Nebiyyê Ûmmî!

Sivik dergehê asîman Dergevan
Bi te'cîl vekir wî di wext û zeman



Institut kurde de Paris

Ji ferh û surûra hebîbê Xweda
Serê Dergevanî bilind bû hewa

Digel ew bilindî serê xwe delal
Niha ber piyê şahê sahibcemal

Tedderru' gelek kir li ber Mustefa:
- Me bigre lîwa, ey şehê ba wefa

- Li min çûne ev sal û meh çend hezar
Li vir bo qedembûsê mam întîzar!

Ji nûra şehê îns û cinn û melek
Zuhûr bû siyahî li şemsa felek

Ji husna hebîbê Xwedayê semed
Şemis muxtefî bû di femmê esed

Zi pes berq û enwarê ba zîb û fer
Nebû ferqa şemsê ji hicmê hecer

Bi şubhê hecer ma sîyah û kesîf
Ji ber heybeta padîşahê şerîf

Giha jêrê ne'lê şehînşeh delal
Ku da kesbê kit be'zê nûra nî'al

Ji nûra nî'alê ku tenwîrî bû
Xwedanberq û tîrêj û te-sîrî bû

Furuşte ji ser çerxa çarem felek
Bi efxan û tesbîhê Mewla gelek

Bi cumle ji ser tarumê çaremîn
Qedem bûse dan lê hezaran yeqîn

Institut kurde de Paris

Turaba di jêrê nî'alê Resûl
Bi çeşm û bi rû cumleşan kir qebûl

Tedderru' çun an kirne zahir çunan
Felek bû lebaleb ji eşkê di wan

Kirin erzê xizmet ji bo xakê pak
Kî: "Ey serwerê cem' û şahê huda!

Hemî em bi rûmalî xakê der in
Ji vê em xwedanmertebe w rehber in!"

Li ser çerxa çarem şehê ba xeber
Kesek dî muşekkel li ser textê zer

Telelû dikir nûr ê jê în çunîn
Eşi'ee diçû tarumê pencemîn

Ji Cibrîlî pirsî: -Kî ye ev, bira!
Li ser kursiyê zêr culûs e li ha?

Ji bo wî re Namûsê Ekber çunan (5)
Cewab da kî: -Ey sedrê 'alîmekan

- Bizane ku Îse-bnî Meryem yeqîn
Li ha ye bi emrê Xweda canişîn

Dema ref'î bû ew bi emrê 'ezîz
Emir kir furuştan: "Binêrin temîz

Eger ku ji dunya digel wî niye
Refi' kin meqamek qewî 'alîye"

Ku teftêş kirin qudsiyan yek bi yek
Di nêv xerqeyê wî hebû derziyek

Institut kurde de Paris

Nîda hategoşê melaîk çunan:
"Bihêlin li ser çaremîn asîman

çu nebwa beraber ji dunyayê wî
Hezîra qudus min dikir cayê wî

Welê da bimînit li wê der gelek
Ku 'îbret bikin jê hem îns û melek"

Birastî dibêjim ne hezl û henek
Hîcaba reheş bû ji Heq sûzenek

Dîger malê dunya meta'ê di wê
Hîsab ke, qîyas ke hemûçkan li wê

Îlahî bi Ehmed şehê namîdar
Nexî qelbê min hubbê dunya tu car

Bi heqqê xwe kî ey Xwedayê mecîd
Nekêşî bi Rûhî 'ezabê şedîd

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

---

1- "Îs'et 'eleyhî": Nig deyne ser.

2- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Kevir nerm-î bû ew bi şubhê xemîr"
Xemîr: hevîr.

3- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Qewîtir dikin qewlê sanî gelek"
Sanî: duyemîn. Yanî gelek kes, qewlê diduyan qewîtir dikin.

4- "Tû" di zimanê Farisî de bi mana "bereket" û "xweşî" tê.
Mana malikê weha ye: Ji te, erd û asîman bi bereket û xweş bûn.

5- "Namûsê Ekber" xeysetnavekî Cibraîl e.

# BEŞ 26

## BENDÊ SADIS WE 'IŞRÎN

## DER DÎDENÊ RESÛLÎ 'EZRAÎLÎ RA

Ji rawî neqil bû bi elfazê pak
Ku borî ji wê serwerê tabînak

Li rê dîtî sultanê dîn yek melek
Li ser textê zer cadê çarem felek

Qewî heykel û sehmegîn û mexwûf
Ji qehra xwe çêkir Xwedayê reûf

Bi şiklê xwe xayet mehabetfeza
Yeqîn peyda bûye ji xeşma Xweda

Sual kir ji Cebrîlî şahê necîb:
- Kî ye ev furûşte ku hinde muhîb?

Cewab da kî: -Ey sedrê sahibqeran
Evî şexsê he 'Izraîl e bizan

- Ji ber wî xelas nabitin hîçî kes
Dikit qebza erwahê sahibnefes

Institut kurde de Paris

- Li vir calis e bo xîtab û emir
Ji bo qebddê rûhan ew e muntezir

- Dema xelqî kirye Xwedayê semed
Me nedye qîyam kir ji ber kes ebed!

Yekê lewhê mazin qewî exdderî
Zumerred seraser Xweda çêkirî

Li ber bû temaşa dikir lê çunan
Ji wê nedbû xafil ebed yek zeman

"Ev e Lewha hanê çi ye" kir sual
Ji Cibrîlî, sultanê sahibkemal

"Ev e Lewhîmehfûz e" wî da cewab
"Ter û hişkî tê de 'îqab û sewab"

- Nivîsandiye tê de 'umr û ecel
Şehê lemyezel ew ji roja ezel

- Mudam calis e lêre ba emrê Heq
çi saet bitin qebddê erwahê xelq

- Qebiz dê bikit ew di wê saetê
Ebed lehzeyek naditê muhletê

- Ev e karê wî ez ewil ta kunûn
Heta ku nîhayet be dunyaya dûn!

Emir kir Resûlê kebîr ê Celîl
Ji bo hemrehê xwe exê Cibreîl:

- Biçin da li nik wî bi sed îhtîram
Bikin îstîfade ji wî çend kelam!



Institut kurde de Paris

"Ne'm" gotî Cibrîlê pak î delal
"Heçî emr-î kî, lazim e îmtîsal"

Resûlî ji wê 'ezmê 'Izrîlî kir
Bîşaret ji bo wî re Cibrîlî kir:

- Li te mujde bîtin eya 'Izreîl
Ewê hate nik te Resûlê Celîl

- Muşerref bibî dê bi xakê qedem
Wekî Zemzem û Hicr û Beyt-il Herem!

Ku navê Resûlî bi guh wî ve çû
Ji cayê xwe rabû bi pêş wî ve çû

Digel cumle ə'wanê xwe bê hîsab
Meşîn pêşiya fexrê 'alîcenab

Vewestan li cayê selamê melek
Selat û selam dengê wan çû felek

Ji ewel ve 'Izrîlî ba sed sefa
Xwe kêşa etek bûsî yê Mustefa (1)

Melaîk hemî cumle ba sed şukûh
Xwe avêtine ber qedem şubhê kûh

Xeraman, xeraman di ber cem'ê wan
Furuştan diçû fexrê herdu cîhan

Heta ku gihîşte cihê textê wî
Şukuft ew zeman xwuçeya bextê wî

Culûs kir ewî şahê gerdenfîraz
Li ser cayê 'Izrîlî ba 'izz û naz



Institut kurde de Paris

Kemerbeste bûn Cibreîl, 'Izreîl
Digel qudsiyan pêşî şahê cemîl

Sena gotî 'Izrîlî bo wî çunîn
Kî: -Ey sedrê sultanê dunya û dîn

- Tu sultan î, û em geda muştê xeyl
Tu serdar î, û em ji bo te tufeyl

- Tu şahînşehê "Qabîqewseyn" tenê
Te ra wesfê "Lewlak" û "Yasîn" tenê!

Ji paş wê şehê mesnedê issttîfa
Ji bo qabizzê rûhê go ba sefa:

- çu ayed kesî ra ecel der kemîn (2)
çi zanî tu ez asîman der zemîn?

- Ku bêt wextê morden ji bo nefsekê
çira tê de nakî tu reyb û şekê?

Wuha 'Izriyaîlî go der 'ecel:
- Bi şek nakevim ez di weqta ecel

- Evê Lewha hanê Xweda daniye
Li wê îsmê her kes nivîsandiye

- Digel babê wî, dayê wî, eslê wî
Digel belde û mesken û feslê wî

- Dinasim hemûçkan bi da û bi bab
Xeta nabe fikra me îla sewab

- çi wexta ecel bê ji bo nefsekê
Li îsmeş dirrêjit yekî nuqtekê

Institut kurde de Paris

- Dizanim xetim bûye eyyamê wê
Ku qitre nuqutye li ser navê wê

- Eger qitreya wê sipî bit li nam
Bi rehmet didim ez li sahib selam

- Dizanim ku qenc e, xwedanxêr e, pak
Me navê bibit ew meriv derdînak

- Ez e'wanê rehmet dişînim li nikŞ
"Qebiz kin ji wî can bi nerm û sivik"

- Ezîyet ebed nagihîtê ji me
Bi cuz rahetî nagihîtê ji me

- Û ger qitre wek bextê wê reş bitin
Siyehbext e dê pur muşewweş bitin

- Dizanim xwedanfi'lê napak e pîs
Gunehkar û mewlanenas e, xebîs

- Pes e'wanê qehrê bişînim bi tabŞ
"Bikêşin ji wî can bi te'b û 'ezab

Bidin rûhê wî zehmetî bê şomar
Mu'ezzeb bikin ta bi rojê şomar!"

Nebî gotê: -Ey 'Izreîlê mezin
Se'îd û şeqî der cîhan bêje min

- Ku hal bit ecel bo kesê der cîhan
Se'îd be çisan e, şeqî be çisan?

Ewî 'Izreîlî bi terz û edeb
Cewab da ji bo şahê 'alîneseb:

Institut kurde de Paris

- Se'îdan 'elamet sisê ne yeqîn
Ji ewel ve carî bûye în çunîn:

- Yekî, wechê zerdî guşad e bizan
Duwem, çavê wî abîdad e bizan

- Siyem, laşê wî nerm û şêrîn dibit
Di hengamê nez'ê nefes xweş diçit

- Kesê ku şeqî bit, ewê purceza
'Elamet sisê ne, bizane wuha:

- Yekî, rengê wî pur muxeyer bitin
Siyehwech û pîs û mukedder bitin

- Duwem, xîrexîrê dikîtin gelek
Diçit sewta wî ta bi çerxa felek

- Siyem, laşê wî sert û hişk û qebîh
Nefes hişkî tê, ey Resûlê melîh!

Dirextek mezin sebz û xurrem hebû
Cihê 'Izreîlî di bin wê de bû

"çi dar e?" sual kir hebîbê mezin
Cewab da kî: -Ey ruhniya çavê min

- Bi belgê şecer jî dizanim heman
Kesê jê re bêtin dema qebza can

- Li dunya ku peyda bitin yek beşer
Bi darê ve tê yek wereq taze-terr

- Nivîsandiye ser wereq namê wî
Dimînit heta dewrê bê namê wî

Institut kurde de Paris

- Ku bîmarî morden bitin merdumek
Dibin zerdî ewraqê wî yek bi yek

- Dizanim ku yek dimritin ew zeman
Welêkin nizanim kî ye ba nîşan

- Heta qet'î bit yek wereq ez şecer
Diçit haletê nez'ê can ew beşer

- Dema bête xwarê ji takî xusûn
Diçin wê demê ew ji dunyaya dûn!

Emir kir ewî sedrê sahibsebeq
Kî: -Tefsîrê în ayetest în wereq

"We ma tesquttû" emrê kirye Kerîm
"Bi acalê mexlûqe Mewla 'elîm"

Îlahî dexîlê Resûl im dexîl
Bi heqê hebîb û bi heqê Xelîl

Tu nîşan nekî Ebdurehmanî, ah!
Di Lewhê mezin de bi nuqta sîyah

Dema bête wextê ecel Şemsiddîn
Bişînî meded Xatem-el Murselîn

Di e'wanê rehmet bikî nî'metê
Tehemmul neşim şiddeta sekretê

Eger çi xerîqê gunah im gelek
Bi setwet neşînî li ser min melek

Eger çi cesûr im li bêemriyan
Welêkin mûqîrr im dikim zariyan

Institut kurde de Paris

'Efû kî, setir kî minê purelem
Kî settar û xeffar î tu lacerem!

Di nîranê 'işqê mu'ezzeb bike
Bi narê mehebbet mueddeb bike

çi hacet ji bo aşiqan nar û pil?
Cehîm e li ser me evî narê dil!

Lehebsazî ke narê dil pey bi pey
Bisûze bi wî masîwa zatê hey

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Xwe kêşaye nig bûseyê Mustefa"

2- Mana vê nîvmalika bi Farisî weha ye:
Dema ku ecelê yekî/yekê ji xeybê hat...

Institut kurde de Paris

# BEŞ 27

## BENDÊ SABI' WE 'IŞRÎN

## DER DÎDENÊ RESÛL MALIKÊ DÛZEX RA

Ji rawî çunîn yadîdarem suxen
Kî sultanê dîn hemçû durrê 'Eden

çu bigzeştê zû dîdê şexsê 'ecîb
Qewî heykel û xeşmîdar û muhîb

Turuşrû, furûheşt e leb der bexel
'Eceb sehmegîn û 'ebûs û melel (1)

Bitursed zi rûyeş heme îns û cin
Ji xeşm aferîdeş Xwedayê mezin

Ji Cibrîlî pirsî di wê saetê:
- çi şexs e li vir ew bi vê heybetê?

- çira hinde bême'de ye, xeşmegîn?
Ji kî rence kêşaye wî în çunîn?

Institut kurde de Paris

çu Cibrîlî seh kir kelamê Nebî
Cewab da kî: -Rûhim fîdayê te bî

- Ev e Malikê dûzexê pur leheb
Ji qehra Xweda xelqî bûye 'eceb

- Ji kes rence nebwe, li wî adet e
Hemî tewr û etwarê wî heybet e

- Ji weqta wucûd bû ji ketma 'edem
Guşayîş neket wechê wî yek direm

- Ji hinga ku min dîtiye ev melek
Bi vî terzî ye ew li sethê felek

- Bi kes re kenîn wî nekirye tu car
Serapa wucûd bû ji qehra Qehar

- Li narê cehennem dikit hayeha
Cehennem dibînit çi heybet fiza

- Seqer ew qeder jê dikit xewf û bîm
Ji dengê wî ateş dibîtin elîm!

Nebî go: -Biçin da demek alê wî
Bizanin ji wî be'zê ehwalê wî

- Cehennem çewa ye? bipirsin demê
'Eyan kin hinik haletê cehnemê!

Bi fermana sultanê sahibxeber
Meşî hamilê Wehya Mewla li ber

Ji bo Malikî bir peyama hebîb
Ji şewqa Muhemmed helesta 'ecîb

Institut kurde de Paris

Terebdarî bû Malikî sehmegîn
Guşayiş kete qelbê wî în çunîn

'Eceb dehkekî taze kir bê hîsab
Ji ferha şehînşahê nûrînnîqab

Bi wechê tteliq go: -Selamun 'eleyk
Tu yî an kî rûhî û qelbî ledeyk!

- Ji ewel ve muştaqê dîdar im ez
Ji hîcrana te pur birîndar im ez!

Emir kir hebîbî ji bo Malikî:
- Ji bo min tu dergahê ateş vekî

- Tebeqha hilîne ji ser rûyê wê
Temaşa bikim narê wê, dûyê wê

- Hilîne ji ber min nîqab û hîcab
Bibînim di nêv ateş ehlê 'ezab!

Bi fermana sultanê Beyt-ul Hettîm
Hilanî tebeqha ji narê cehîm

Di Tehtessera dî cehennem sîyah
Eser daye ta saqê 'erşê Îlah

Lehîbê cehennem wusa radibin
Wekî mewcê behran di hev werdibin

Ji 'edd û hîsabê zîyade 'ezab
Muheyya ji bo ehlê kufr û 'îqab

Heyat û 'eqarib kelalîbê nar
Tijî semmê qatil ji bo qewmê zar

Institut kurde de Paris

Cîbal û we wadî ku tê de 'eceb
Ji ateş hemî pur ceza û te'eb

Senadîq û zencîr û exlalê pur
Muheyya ji bo ehlê zenb û kufur

Ji xewfa Xweda şahî nalende bû
Ji ber heybeta narî giryende bû

Ji ehwalê ummet sual kir Resûl
Ji Cibrîlî kî: -Ey peykê Wehya qebûl

- Bibêje ji ummet gunehkarê wan
çisan dê bibit halê der narê wan?

Wuha gotê Cibrîlî ba sed nîyaz
Ji bo padîşah: -Kay şehê serfîraz

- Bizan heft tebeq narê dûzex, Xwuda
Wucûd kir, eya padîşahê huda

- Heçî menzila bertirîn bit yeqîn
Sehiltir dibit ew ji ya esfelîn

- Serê heft tebeq cayê ummet bizan
Ji bo wan re fîl cumle rahet bizan!

Hebîb gotî dîsan ji bo Cibreîl
Kî: -Ey hamilê Wehyê pak î Celîl

- Evî narê ha bo çi hinde sîyah
Ji wî nûr-î kêşaye zatê Îlah?

Wuha go: -Ku Me'bûdê pak î Wedûd
Sê caran hezar sal-î kirye weqûd



Institut kurde de Paris

- Heta surxî bû ateşê lehbîdar
Di pê wê weqûd daye wî sê hezar

- Sipî bû ewî agirê pureser
Wuqûd kir furuştan sê elfê dîger

- Wuha bû sîyeh, maye tarî û reş
Îlahî ji wî selbê kir nûra geş

- 'Eceb bihnekî pîs ê da dûzexê
Ku ehlê 'ezabê bikin awuxê!

Li dûzex temaşa ku kir Mustefa
Bi dîde 'eyan dîtî ehlê ceza

Yekî dî, lebê wî bi miqrazê nar
Dibirrîn zebanî hezaran hezar

Ji ferqê serî ta bi rûyê qedem
Dikêşin hemî cildê wî lacerem

"Kî ye ev?" sual kir hebîbê Xweda
Cewab da: -Suxençînê naparîsa!

- Kesê ku nemamî bikit bê heya
Ev e haletê wî di rojê ceza

Yekê dî devê wî tijî xwûn-î bû
Zeban ez qefa hinde bîrûn-î bû

Sual kir: -Ki ye ev xebîsê yeûs?
Cewab da: -Xwedanê yemînê xemûs!

Yekê dî ku agir dixwit her zeman
Zikê wî didirrit bi agir çunan

Institut kurde de Paris

Sual kir: -Kî ye ev xebîsê mehîn?
Cewab da: -Ribaxwarê napakê dîn!

- Riba kî bixwit halê wî ev bitin
Eger roj biyîtin û ger şev bitin

Yekê dî devê wî tijî narê geş
Ji wî têtî wek cîfe bihna ne xweş

Sual kir: -Kî ye ev di narê cehîm?
Cewab da: -Kî xwurdestê malê yetîm!

Yekê dî serajêrî awîxite
Gelek zift û qetran li ser rîxite

Sual kir: -Kî ye ev di halê nepak?
Cewab da: -Gunehkarê bê xewf û bak!

Yekê dî tijî 'eqreb e'zayê wî
Dixwin têkde 'eqreb serapayê wî

Sual kir: -Kî ye cîfewarê xebîs?
Cewab da: -Ev e şaribê xemra pîs!

Yekê dî ku poşîde z-ateş lîbas
Şikem pur ji 'eqreb mezin wek pelas

Sual kir: -çi şexs e evê bê newa?
Cewab da: -Ku tarikzekat û ssela!

Jinek dîtî sultanê sahib'eqil
Hemî agir in kîsûyê nava mil

Ser û rû û pehlû tijî ne ji nar
Ku nar lê diçit şubhê pûşê beyar

Institut kurde de Paris

Sual kir: -Gunahê ewê qehpeyê
Mu'ezzeb dibit hinde der dojeyê?

Cewab daye Malik ji bo şahê can:
- Nepoşî ewê rû ji namehreman!

Jinek dî di nav agirê bêeman
Ku dîwane bû, leb wekî du heban

Sual kir: -Kî ye ev jina bê mefer?
Cewab da: -Li ser meytê bû newhegerr

- Mehasin dikir 'edd ji bo murdeyan
Digel newheyê, reş dipoşî çunan

- Bibîn halê wê qehpikê her ev e
Tijî narê dûzex di bettn û dev e!

Jinek dî di nav ateşê têzîdar
Li ser sîne û ber tijî nar û mar

Sual kir: -çira ev jina bê umîd
Dikêşit 'ezabî di narê şedîd?

Cewab da: -Ji bo tiflê xelqê xerîb
Rîdda' daye bê îzna zewcê hebîb!

Ji paş dîtî Peyxemberê nûrîdar
Du sindoqê mazin muzeyyen di nar

Di her sendoqek merdumek daniye
Li ber her yekê çend melek daniye

Dema lehbeyê ateşîn têtewan
Dikin def'ê agir melayik ji wan

Institut kurde de Paris

Ezîyet ji bo wan tunîne di nar
'Ezab zerreyek nagihê wan tu car

Ji Malik sual kir hebîbê mezin:
- Tu halê evan herdukan bêje min!

- çi şexs in, çira hinde der nî'met in?
Di nêv pêtiyê narî bê zehmet in?

Cewab da kî: -Ey fexrê herdu cîhan
Ji van yek bizane tu Noşîrewan

- Li ser hinde alem riyaset dikir
Di hukmê xwe de wî 'edalet dikir

- Xweda rehmê lê kir, nesûzî bi nar
çira? der cîhan 'edlê fermûdekar

- Refîqê dîger Hatemê Ttaî ye
Ku asasê cûd û sexa daniye

- Ji fertta sexa wî, Xweda rehmê kir
Bi narê cehennem mu'ezzeb nekir

- Bi kufra xwe çendan ku mexrûrî bûn
Bi 'edl û sexa herdu meşhûrî bûn

- Ketin narê dûzex, çiku kafir in
Welê çunkî qencî li dunya kirin

- çu zehmet ji bo wan tune der cehîm
Ji narê cehennem selîm in, selîm

- Musulman ku 'edl û sexakarî kit
Xweda dê li wî rehmê sed barî kit



Institut kurde de Paris

- Tene'uum bidit wî di Fîrdewsa pak
Di nêv hor û xîlman bibit ferhînak

Îlahî ne sultan im ez 'edlê kim
Ne maldar im ez sîm û zêr bezlê kim

Ne xîret di min de bikim tta'etê
Ne, qelbek ze'îf e, bikim xeşyetê

Tehî dest û zar û zelîl û leîm
Ûmîdim nehin xeyrî rehma Rehîm

Digel min bi rehma xwe kî ey Xwuda
Bide ber me îro tterîqa huda

Bide xatirê Seyîd-îl Essfîya
Mu'ezzeb meke min di roja ceza

Bike Ebdirrehmanê hêsîr ê zar
Muşerref bi wessla nîgarê kubar

Bi cuz rahê 'işqê mede ber feqîr
Giran ke li Rûhî tu 'işqa kebîr

Were Rûhiya bême ser qisseyê
Li awazê xame bikim nexmeyê

Ji paş dîtina wî 'ezabê seqer
Vegêrandî Malik tebeqha li ser

Ji ber şahê 'alem veşartin 'ezab
Zebanî, û zencîr û xill û 'îqab

Hebîbê Xweda çû digel hesretê
"çisan bit di nar halê vê ummetê?"

Institut kurde de Paris

Hinik çû ji wê Mustefayê Kerîm
Vegerya ku dîsan bibînit cehîm

Vekir Cibreîl şehperrê xwe li ber
Nehêla ku dîsan bibînit seqer

Ji bo wî re go şahê 'alîcenab:
- çira te nehêla bibînim 'ezab?

Bi zarî kire 'erzê xîzmet kelam:
Kî: -Ey serwer û mexferê xas û 'am

- Eger care dî tu bibînî cehîm
Mubeddel dibit ew bi baxê ne'îm

- Ji ber şûleya nûra wechê hebîb
Cehennem dê bîtin bihiştek 'ecîb

- Dema berqê nûra te da agirî
Ji agir ewê nîvê germê birî

- Eger ev sefer jî bibînî yeqîn
Dê bit eynî baxek ji Xulda Berîn!

Îlahî bi nûra ruxê Mustefa
Bi Rûhî nekêşî 'ezab û cefa

Ji ewel dema rabitin ez qubûr
Bihiştê bide ber ji wê rahê dûr

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

1- Turuşrû: rûtirş, rûsar.
Furûheşt: xwîypîs.
Bexel: Bi mana nîvê gewde ye. Lê xwedivê ku nîva singê be.
'Ebûs: rûtirş.
Melel: heyirî, melûl, aciz.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 28

## BENDÊ SAMIN WE 'IŞRÎN
## DER REFTENÊ RESÛL
## BI BEYT-ÎL ME'MÛRÊ ASÎMAN

Bide saqiya abê ateşmîsal
Ku yek cur'e nadim bi sed mulk û mal

Bide destê min jî hinik tas û cam
Ku sergermî bim ez birrêjim kelam

Heta aqilim ez neşim sazê kim
çu medhûşî bim dest bi awazê kim

Bide şerbetek, dil ji min hey bikit
Hemî fikrê 'alem li min ttey bikit

Bidim destê xwe xameya serteraş
Bikim çerx û bazî çu dolaba aş

Qelem ey qelem, ey qelem, ey qelem
Bizane di dil de min zehf in eıem

Cuda mame ez dîlbera nazîdar
Dikêşim di her dem hezar ah û zar

Me dîlber bûye eynî sîmurxê Qaf
Wuqûf girtî weslet li ser 'Ilmê Kaf



Institut Kurde de Paris

Fereh çun nebîtin di qelbê hezîn
Çisan nezmê kim beyt û şi'rê şirîn?

Ji yek canibî keşmekeş ez fîraq
Ji yek canib îlhahê "malayuttaq"

Çi kim ez li min bûye çar û neçar
Nezim kim hinik beytî bê îxtiyat

Ji rawî bizan min rîwayet çunîn
Hilanî bi îsnad û lefzê mubîn:

Resûlê Xweda çun hinik dûrî çû
Suyê Mescidê Beytî-Me'mûrî çû

Kelamê fesîh min bihîstî bi goş
Ji wî rawiyê nuktedan tîzî hoş:

Ku 'isyan dema bû ji Adem zuhûr
Ji nav baxê cennet Xweda kerdî dûr

Li rûyê zemîn ma hezîn û melûl
Du'a kir ji Mewla bi heqqê Resûl.

'Efû bo hinarî Xwedayê rehîm
Ji bo hurmeta wî Nebiyê kerîm

Di rûyê zemîn maye Adem wehîd
Ji ber wehşetê kefte halê şedîd

Ji Mewla du'a kir bi pansed nîyaz:
"Derîne ji vê wehşetê cangudaz"

Du'a wî qebûl bû di wê saetê
Ji yek dane yaqûtê ez cennetê

Institut kurde de Paris

Deranî Xweda beytekê nazîdar
Murebbe' ji yaqûtê surx ê kubar

Emir kir nuzûl bû li ser 'alemê
Tesellî bi wê da dilê Ademî

Tewaf pê dikir Ademî her zeman
Digel seff û efwacê quddûsiyan

Li wî haletî xaneya purfutûh
Dewam kir heta wextê Tofana Nûh

Dema hate rûyê zemîn abê pir
Xweda ew hilanî bi esmanê bir

Di çarem sema cî dida xaneyê
Muhazî li setthê evê Ke'beyê

Wekî Ke'bet-ul'lah li ser rûyê erd
Misahe biçûk û mezin ttûl û 'erdd

Ji Cibrîlî pirsî şehê enwerî: (1)
- Li vir Beytê Me'mûr por e yan tehî?

Cewab da kî: -Ey şahê erd û felek
Tewafê dikin pê cemî'ê melek

- Welê rojê cum'e hezaran hezar
Furuşte dibin tê de cum'e guzar

- Muezzin Sirafîl, îmam Cibreîl
Welêkin xetîbê melek Mîkeîl

- Selat û selaman li ser Mustefa
Dixwazin hemî ez cenabê Xweda

Institut kurde de Paris

- Ev e karê wan her dem û saetê
Dibexşin sewabê ji bo ummetê!

Duxûl kir hebîbê Xweda der derûn
Hezar seffê quddûsiyan hazîrûn

Hemî muntezir bo şehê enbiya
Ku da bit îmam ew ji bo qudsiya

Du rek'et newafil di ber wan, hebîb
'Eqid kir bi erkan û şertê 'ecîb

Li Qudsê îmam bû ji bo enbiya
Li esman ji bo seffê quddûsiya

Zuhûr bûye fezla Resûlê Xweda
Temamen li ser ehlê erd û sema

Ji bo ehlê erd û sema şah e ew
Di dunya û 'uqba şehînşah e ew.

çira, Rûhiya dê bikêşî elem?
çu fexra me ye şahê 'alî'elem!

Ji mewca gunahan metirse çunan
çu Ehmed, Muhemmed heye keştîban

Li vir xetmî kim bendê beyta sema
Bikim bo xwe beytek nîyaz û du'a

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

-------------------------------

1- Por: tije, dagirtî.
Tehî: vala, valeyî.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 29

## BENDÊ TASI' WE 'IŞRÎN (1)
## DER NIŞISTENÊ RESÛL BER
## ŞEHPERRÊ CIBRÎL
## WE REFTEN
## BI BIHIŞTÊ BERÎN WE HERÇÎ
## MÛŞAHEDE KERD

Institut kurde de Paris

Bide saqiya badeyê kewserî
Di nav saxera ku mîzac'enberî

Ku farix bibim ez ji 'eqlê giran
Bikim cîlwe ser sethê heft asîman

Yekayek qusûrê di nav cennetê
'Eyanen bibînim bikim qissetê

Eger min hebûya ji weslet umîd
Me bikra li ser xame emrek şedîd

Gelek beyt û şi're nefîsê nefîs
Me bînane weznê bi nuttqê selîs

Teheyyur bimana 'Ereb ba 'Ecem
Dilê şa'iran têk bigirta elem

Welêkin ji hîcrana yara şepal
Nema min ne fikrek ne nuttqek delal

Eger destegîrî nekî saqiya
Bizane ku keftim ji qam û piya

Medekarê min be bi yek camê mey
Dilê purelem pê bibit dax û key

Rîwayet bikim ez ji çend rawiyan
Nezim kim hinik şi'rê şêrîn beyan:

Dema bu ji Beyta Sema ew cuda
Wuha gotê Cibrîl bi emrê Xwuda

- Li ser şehperê min suwar be temîz
Te dewran bikim der bihişta 'ezîz!

Suwar bû li ser şehperê Cibreîl
Şehê Zemzem û Qîblegaha Celîl

Bi perwazî hat Cibreîlê emîn
Bi şehper sûyê an bihişta berîn:

- Te îmşeb bibim nav bihiştê û hûr
Ku cennet ji rûyet bibit pur li nûr

- Ssefê hûr û xîlman hemî întîzar
Qedem bûsî kin Ehmedê şehrîyar

Institut kurde de Paris

- Ji nûra te ew dîde rewşen bikin
Ji 'eksa cemalê xwe gulşen bikin

- Ji pes îştiyaqa hebîbê kerîm
Li wan bûye cennet çu narê cehîm

- Wekî şemsê xawer ttulû' be li wan
Bi dîdarê îhya ke wan yek zeman

- Hemî hûrê cennet birîndarê te
Seraser bi muştaqê dîdarê te

- Ne muştaqê hûrê delal î yeqîn
Ji dîdara wan farix î în çunîn

- Welê bêşekîb in ji husna hebîb
Li derdê dilê wan tebîb î tebîb

- Ji nûra cemala te ew serteser
Mûnewwer bikin qelb û rewşenbesser

- Tu nebwa di 'alem eya padîşah
Ne dûzex dibû, ne bihişta Îlah

- Dema babê "Ehbebtu" Mewla vekir
Yekî kurre 'alem ewî xelq-î kir

- Ji 'erşan heta ferşê şahê Wedûd
Ji bo te hemî wî kirin der wucûd

- Ji bo cumle tu 'illetê xaiye
Ji bo te Xweda îns û cin daniye

- Tu meqsûdê ez "kaf" û "nûn" î tenê
Tu mewsûfê "Lewlak" û "Ttaha" tenê

Institut kurde de Paris

- Melaîk hemî bo te helqe bi goş
Digel seffê kerrûbîyan û suroş

- Tu sultanê xeylê rusul serteser
Mûheqqeq tu yî zatê xeyr-îl beşer!

Pes engahê Cibrîlî der cîlweşod
Sûyê an bihiştê por ez meyweşod (2)

Ji rawî me zanî bi neqla sehîh
Ji sultanê 'alem bi nessa sserîh:

Li ser heft tebeq asîman e bihişt
Ewê cenneta pak î zîbasirişt

Û lê hetf tebeq asîman û felek
Digel heft tebeq erd û behrê gelek

Tu bîlferzîê bavêjî dûzex temam
Wekî teyrekî ser cebel kit qîyam

Digel dûzexê cumle ezkûrê me
Ku borî nuha ew di mestûrê me

Hemî ferzikî, cî bibit der cînan
çu yek heb e gendom tu têxî dihan

çiku çêbû ez rehma Mewla çunan
Ji qehr û xezeb dûzex e hem çunan

'Eyan e ku rehma Xwedayê celîl
Ji qehrê gelek purtir e bîd'delîl

Metirse eya Rûhiyê purwebal
Di 'isyan telef kir te ev çendî sal



Institut kurde de Paris

Ku xeffarê zenb e Xwedayê mezin
Rehîm e li ser cumleyê îns û cin

Evê rehmeta bê qiyas û hîsab
Li nik Xaliqê erhem ez da û bab

Lebaleb hemî xizneya "kaf" û "nûn"
Muheyya ji bo zenbîdarê zebûn

Di xiznê de nahêlitin Kirdîgar
Dirrêjit li ser mucrimê zenbîdar

çu Rûhî ji 'ussatê ev ummet e
Ji Mewlayê xwe sailê rehmet e

Xweda dê bidit rehmetek bê hesîb
'Efû we, xefûr e, qerîb e, mucîb

Eger çi zunûbê te ne Rûhiya
Bi mislê bîhar û rîmal û çiya

Ji bo cumle zenban muhîtt e 'efû
Kelamê Qedîm e kî "Lateqnettû!..."

Were ey qelem qenc bike xizmetê
Ku dîsan biçine li ser qisetê:

Me'elqisse, şahînşehê îxtiyar
Li ser şehperê Cibreîl bû siwar

Bi perwazî çû qasidê serfiraz
Heta dergehê ew bihişta bi naz

Nîda daye Cibrîlî wê saetê
Li Ridwan: -Veke dergehê cennetê

Institut kurde de Paris

- Resûlê ku "Taha" ji bo xîl'et e
Ewî hate îmşeb bi mihmanê te!

Dema goşî kir xazinê heşt tebeq
Ewî namê pak ê Resûlê bi heq

Bi te'cîlî rabû digel qudsiyan
Vekir ew nefes dergehê ber cînan

Dema dîtî Ridwanî şahê huda
Xwe avête ber payê wî çun geda

Hezar carê malîn di xakê qedem
Ruxê xwe furuştan û Ridwanî, hem

Melek ez keran ta keran cem'î bûn
Bi can cumle perwaneyê şem'î bûn

Hemî hatin û lê qedem bûse dan
Mûşerref bi ne'leş hemî bê guman

Bi xulxul ketin qismê rewhaniyan
Tezelzul kete seffê kerrûbiyan

Di rast û di çep de melek bê hîsab
Selamlix kêşane hemî der rîkab

Bişaret giha hûr û xîlman heme
Di cennet de bû şahî yû zemzeme

Hemî horiyan xemlê taze lîbas
Vepoşîn hemî bergê nûrîn esas

Ji îstebreq û sundus in wan diber
Muresse' hemî text û tac û kemer

Institut kurde de Paris

Hemî horî zulfê xwe danîn di rah
Li ser da biçit ew hebîbê Îlah

Bihiştê xwe tezyînî da în çunîn (3)
Kî "Uzlîfet-îl cenne lîl mutteqîn"

Ji pêş ve meşîn cumleyê horiyan
Ji ewel ve keftin di ne'l û piyan

Muzeyyen ewê cumleyê cennetê
Ku şahê cîhan îltîfatê detê

Ji 'edda hîsab û kîtaban birûn
Melek, hûr û xîlman hemî hazîrûn

Ji dengê selat û selamê melek
Tezelzul kete cîsmê her neh felek

Bi can û bi dil ew dikin xizmetê
Bi tesbîh û tehlîlê çûn cennetê

Me umîd e ez Kirdîgarê Mecîd
Di wê rûzê dildoz ê heşrê şedîd

Di jêrê lîwaya hebîbê mezin
Tebayî heta nav bihiştê biçin

Dema çû duxûl kir bihiştê bi naz
Ewî padîşahê xwedansir û raz

Temaşa li cennet ku kir Mustefa
Nezer kir hemî hûr û xîlman wusa

Qusûrê di 'alî ji yaqût û durr
Wuharenge elmas û lûlûyê pur

Institut kurde de Paris

Evê mesned û bax û qesr û qusûr
Zerê surx ê xalis berî ez qusûr

Mûnewwer bi nûra şehê layezal
'Ecebnişmî û purzerîf û delal

Dirextanê dilkêş hemî le'l û durr
Ji enwa'ê şêrînî û meywe pur

Muweşşeh, muzeyyen ji nûra Xwuda
Ji bo serfîrazanê rahê huda

Ji hûran û xîlman giran ta giran
Vewestane muştaqê tta'etgerran (4)

Di wê cennetê şad û xurrem gelek
Temaşa kirin bax û hûr û melek

'Ecaîb, xeraîb hemî der bihişt
Gelek dîtî sultanê nîk û sirrişt

Eger ez beyan kim digel întîxab
Gerek nezmê kim ez hezaran kîtab

Welê min beyan kir gelek muxtesser
Ji ber xewfa tettwîlê te'cîz eser

Dirêj da nebit, çênebit jê melal
Me tenzîma wan muxtesser kir delal

Gelek qesr û bax û melaîk bedîd
Heta ku bibin darê Ttûba resîd

Yekê darê ttûba di baxê bihişt
Hemî esl û fer'eş ji 'enbersirişt



Institut kurde de Paris

Heçî xane ye şaxekê ew dirext
Heye lê hemî xurfe û qesr û text

Nîhayet heçî menzil e der cîhan
Ji ttûba heye tê de fer'ek çunan

Heçî muştehayê Xweda çêkirî
Di şaxek ji ttûba muheyya kirî

Li her şaxekê sedhezaran wereq
Li ser xelqê kirye Xwedayê bi heq

Dema bêt Nesîmê bihiştê bi naz
'Eceb ew wereq dê bibin dilnewaz

Ji wan têtî awazê çeng û ribab
Digel 'ud û tenbûr û ney bê hîsab

Li ser her wereq sed hezar mutriban
Terebsazegoya ji bo sami'an

Zemînzer û sîmestê xalis'eyar
Bi her çar teref cûyê Kewser guzar

Hessatê di nehran ji durr û guher
Rewancûyê tesnîmî her dem li ser

Gul û lale tê de hezaran hezara
Tuyûrin li ser şaxî nexmeguzar

Ji her murxekî têtî sed sewt û deng
Li her şaxekê meyweha rengereng

Giyahê ku lê şîn dibit ze'feran
Di etrafê wan, cûyê Kewser rewan

Institut kurde de Paris

Tijî horî nazdarê pak ê şêrîn
Bi qurbanê yek, sed hezaran Şêrîn

Di nêv cennetê Seyyidî muşkî bû
Rewan dê diborin temam çar-î cû

Yek ê şîr û yek ab û yek engebîn
Yek ê xemrê pakê ttehûr ê şêrîn

Di nêv hev de carî dibin rûz û şeb
Welê têkilî hev nebûn, ey 'eceb!

Binê wan hemî durr û yaqût û mas
Ji cinsê guher tê de ye bê qiyas

Di mecmû'ê cennet diborin heme
Bi ezkar û tesbîhê pur zemzeme

Sual kir hebîbî ji Rûh-îl Emîn:
- çi nehr in evan nehrê safî, şêrîn?

- Ji kû tên, diçin kû evan nehrê pak?
Qewî te'mîdar in 'eceb 'ettrînak!

- Ji bo min beyan ke, çi hal e evan?
Ku tên daîma ew bi cery û rewan!

Cewab daye Ruh-ul Emîn bo Resûl:
Kî: -Ey şahê Lewlak û sahibqebûl

- Diçin Hewzê Kewser bi emrê Ehed
Welêkin nizanim ji kû tên ebed!

- çu ênam wucûdê şehê layenam
Mi dîne evan nehrê carî, mudam

Institut kurde de Paris

- Ji serçeşmeyê wan xeber min niye
Ji Mewla sual ke ku pê zaniye!

Resûlî sual kir kî: -Ya Reb eman
Nîşan de bi min menbe'ê abê van!

Nîda hatî bo Cibreîlê emîn:
"Bi şehper hilîne hebîbê şêrîn"

Ji paş, Cibreîlî bi emrê xefî
Li şehper suwar kir şehê Ebttehî

Bi perwazî çû çendekê rahê dûr
Heta çûn gihan mûrxîzarek bi nûr

Hemî misk û 'enber zemîn serteser
Wekî rîkê rêjane durr û guher

Tijî ez dirextanê pak î sehî
Ji enwa'ê murxê muzeyyen tejî

Ji yek dane durra sipî wek cemed
Yekê qubbe pak û refî' û belend

Xweda daye nêv hindî wê rewzeyê
Çu der lacîwerdî tebeq bîddeyê

Ji yaqûtê ehmer derî qube bû
Muxelleq bi yek quflekê sebze bû

Ji erkanê qube evan çar-î co
Rewan têne derve bi hay û bi ho

Nebî gotî: -Ey Cibreîlê exî
Beyan ke li ser min vê sirra xefî

Institut kurde de Paris

- Bike babê vê qubeyê feth û baz
Bizanim evê remzê dûr û diraz!

Wuha gotî Cibrîlê naziknîhad
Kî: -Rûhim fîdayê şehînşahê bad

- Bi destê me nîne vê sirra nîhan
Neşim fethê kim qapiyê purgiran!

Emir kir li wî şahê vê ummetê:
- Tu rabe sivik qesdê ke hezretê

- Izin da bidit Kirdîgarê Mecîd
Li ber min vebit dergehî bê kilîd!

Demek Cibreîlî sivik bû nîhan
Vegerya li nik şahê axirzeman

Wuha gotî bo Ehmedê nûrîdar:
- Selamê Xweda ne li te bê şumar:

"Kilîdê evê qubbeyê tabînak
Bizane ku (Bîsmîllah) e pakî-pak"!

Fereh hate qelbê Resûlê kerîm
Giha babê ew qubbeyê pur 'ezîm

Yedê xwe dirêj kir bi sed îhtîram
Kî: "Bîsmîllah" amed kilîdeş temam

Vebû dergehê qubbeyê ew zeman
Dema gotî Bîsmîllah, şahê cîhan

Ku çû daxilê Qubbe şahê 'ezîz
Nivîsandî dî çar-î setrê temîz

Institut kurde de Paris

Li yek ruknî "Bîsmî" newişte yeqîn
Li yek lefzê "Ellah" kîtabet çunîn

Li yek lefzê "Rehman" û yê dî "Rehîm"
Newişte bi emrê Xwedayê kerîm

Evan çar-î co tên ji her çar setir
Xwedayê me ev rengî pê kir emir:

Yek ez "Mîmê Bîsmî" der-ayed rewan
Yek ez "Hayê Ellahî" ayed çunan

Yek ez "Mîmê Rehman" û yek ez "Rehîm"
Evan çar-î nehran ji wan tên muqîm

Nîda hate goşê Resûlê Xwuda
Kî: "Ey serwerê pak ê rahê huda

Kesê min zikir kit bi van çar-î nam
Ji van çar-î nehran bidim wî temam!"

Şukur kir hebîbî ji bo zatê pak
Vegerya ji wê şadîman, ferhînak

Bi nav cennetê ve ku çû yek qeder
Li reh dî du qesrê mezin sade zer

Welêkin ji nêv hinde wan qesrê pak
'Eceb têtî yek giryeyê sûzînak

Fixan û girîn e bi şubhê heşir
Muqîm tê ji nêv hendî herdu qesir

Sual kir: -çira hinde têtin qêrîn
Ji van qesrê pakê zerîf î şêrîn?



Institut kurde de Paris

Heman Cibreîlî girîn kir gelek
Cewab da: -Kî ey şahê erd û felek

- Huseyn û Hesen dê di rojê heşir
Bi emrê Xweda bêne herdu qesir

- Ewan herdu şehzadeyê pakîdîd
Ji paş te muheqqeq dê bin ew şehîd

- Yekî semmê qatil, yekî tîxê tîz
Şehîd bin bi wan şahîzadê 'ezîz!

---

Ev beşa ku tê, dewama vê beşa bihurî ye. çimkî Şêx Evdirehmanê Axtepî, nasnavê xwe "Rûhî" û ew malika tekrar di paşiya wê neaniye. Herweha vê beşê bi "Bend" jî nenivîsiye.

1- Beşa 29 an, di derheqê siwarbûna Mihemed Pêxember li perrên Cibraîl û çûna wî ya bihişta bilind ve ye û tiştên ku li wir dîtine.

2- Mana vê malikê weha ye: Piştî wê demê, Cibraîlê nazenîn bi aliyê bihişta tije fêkî ve çû.

3- Mana vê hevoka Erebî weha ye: Bihişt ji kesên qenc re hatiye amadekirin.

4- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Ji hûran û xîlman keran ta keran", diyar e ku tê de şaşî heye.

Institut kurde de Paris

# BENDÊ ECNEBÎ (1)

## DER MERSIYEYÊ ŞEHZADEGAN HE-SEN WE HÛSEYD

Bide saqiya badeyê pur elem
Di dil da me hilbû hezar narê xem

Ku xemgîn bibim ez bi vê cur'eyê
Qeti' kim bi hiddet serê xameyê

Wekî ney binalim ji qelbê hezîn
Bikêşim hezar def'e ah û enîn

Qelem germî bîtin di nezmê gelek
Binalin li ser çerxê 'alî melek

Nezim kim hinik me-temê matemî
Ku giryende kim îns û cinnan hemî

Eger çi ne meqsûdî bû ev kelam
Welêkin ji min xwestî bestta meqam

Ji bo hubbê şehzadeganê Nebî
Nezim kim li vir bendekê ecnebî

Institut kurde de Paris

Ji dewranê çerxê ku gazin bikim
Di 'alem de mersîye mazin bikim

çi tedbîrekî naseza kir felek
Şehîd ew şehê Kerbela kir felek

Di Sehrayê ker bû bela şeh Huseyn
Dihenxuşk û lebteşne bû şeh Huseyn

Ne da û ne bab û ne qewm û bira
Di xurbet şehîd bû şehê Kerbela

Li ssedrê wî şehzadeyê pir 'ezîz
Tte'in kirye mel'ûn yekî rimhê tîz

Huseyn xwunçeyê baxê alê 'eba
Şehîd kir ewî le'netê rûsiya

Ewî qurretê 'eyn ê şahê zeman
Bi feddla şehadet mûşerref çunan

Di nêv Kerbela çun Huseyn bû şehîd
Bi erd û sema ket fîxanek şedîd

Heçî sengekî bû li rûyê zemîn
Di bin de tijî xwûnê surx în çunîn

Ji bo matema şahê Deşta 'Îraq
Ket esman û erdan 'eceb îhtîraq

Qewî heq e ger çerxê gerdûnê dûn
Li erdan birêjit sirişkê di xwûn

Felek surxî bû ez ufuq ta ufuq
'Elamet heye şiklê xwûn in şefeq

Institut Kurde de Paris

Huseyn an kî reyhaneyê cennetê
Şehîd bû ji nav leşkerê ummetê

Ne efxan û gazî, ne dad û hewar
Ne feryadîres bo şehîdê kubar

Hewar e werin matemê bît'temam
Ji bo mersiya şeh bikin îhtîram

Bi matem hemî horiyê cennetê:
"Huseynim şehîd bû di nav xurbetê"

Muherrem dema taze bêtin hîlal
Cedîden bikin matemê pur delal

çu 'Aşûre bêtin di mahê hezîn
Dikin heft tebeq erd û esman enîn

Ku ecsamê camid bikin giryeyê
Li me heqtir e qesda Mersîyeyê

Huseyna, Huseyna şehê Kerbela
Bi 'işqa te xayet ez im mubtela

Dilê min kebab e ji ber firqetê
Ku tê fikrê min şiddeta dderbetê

Le'înê siyehbext ê murdarê pîs
Şeqîyê cehennemmekan ê xebîs

Dema te'ne da tîzeyê zehrîdar
Şehîd bû Huseyn im, hewar e hewar!

Derîxa Huseyn im! derîxa Huseyn!
Ji bo Mustefa qurretê herdu 'eyn

Institut kurde de Paris

Eger Murteza şahê merdan Elî
Li meydan bikêşa fîxanek celî

Weya be'zê eshabê nûrîncemal
Bihata di feryadê şahê delal

çi hed bû ji bo wî le'înê şedîd
Huseynê îmam ew bikîtin şehîd

Welêkin bi xurbet îmamê şebab
Şehîd bû cîgerteşne bo qitre ab

Huseyna, Huseyna, Huseyna, Huseyn!
Kuca Fatîme, Murteza eyne eyn?

Eya Fatîme ruhniya herdu çav
Huseynim şehîd bûye bê da û bav

Hewar e li cem'a sehaban temam
Hemî werne îmdada şahê îmam

Îmam-î binê Kerbelaya xerîb
Şehîd kirye zalim bi halek 'ecîb

Welêkin serê cumle derd û hezen
Bi semmê şehîd bûye Îmam Hesen

çi agir kete cergê min pur şedîd
Huseyn û Hesen herdu bûne şehîd

'Eceb qatilê herdu şêrîn bira
Dibêjin "em in ummeta Mustefa"?

Kesê ku Hueyn-î şehîd kit hezîn
Digel şeh Hesen, sem bidit în çunîn

Institut kurde de Paris

çisan dê şefa'et bibînit 'eceb
Ji ceddê ewan, şahê fexrê 'Ereb?

Ne razî me ez ey Rebê kirdîgar
Bi qetla evan şahîzadê kubar

Di mersîyeya wan 'ezîzan gelek
Ji min ah û efxan diçin ta felek

Ji destê me nayê bikim xîzmetê
Welê ser Yezîd-î dikim le'netê

Tehemmul nekir qelbê min ev xeber
Me matem birrî bendekê muxtesser

Xwedaya bi heqqê benî Fatîme
Kî ber qewlê îman kunem xatîme

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

-------------------------------

1- "Benda Biyanî" di derheqê şîna şehîdkirina Hesen û Huseyn de ye. Yezîd ew herdu li Deşta Kerbelayê bi jehriyê kuştine. Piştî wê yekê dijminatiyeke pir mezin kete nav ola îslamê û ew dijayetî heta niha jî didomîne. Lewra ku "Sunnî"tî û "Şê'î"tî derketin holê û bi hevdure neyartî dikin.

Institut kurde de Paris

# BAZGEŞTEN BI QISEYÊ PÊŞÎN (1)

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Were ey qelem bîne ser qisetê
Bibêjin heçî maye der cennetê

Nezim kim heçî tiştê dîtî 'eyan
Di nêv cennetê, şahê axirzeman

Xwe pêkbîne ey xameya rûsiyah
Di nav şa'iran de bibim şubhê şah

Welêkin ji hîcranê yarê şêrîn
Hezîn im, hezîn im, hezîn im, hezîn

Di narê fîraqê hebîba kerîm
Li min berze bû fikr û tteb'ê selîm

Ku saqî bikit destegîrî bi can
Digel mutribê pak ê şêrînkelam

Ji ber quweta saz û camê şerab
Bikit qelbê min cuz-ekî izdîrab

Dê bîtin ku çend şi'rê şêrîn beyan
Nezim kim ji îhsana pîrê muxan

Ji rawî wuha hate goşim kelam:
Ku sultan mirûr kir ji wê çendî gam

Institut Kurde de Paris

Li yek rêzê dî heft-î qesrê sipî
Ji wan heft-î qesran tele-lû diçî

Ji Cibrîlî pirsî: -Ji bo kî ne ev
Mûnewwer di yek şiklekî mislê hev?

Ji bo fexrê 'alem wuha da cewab:
Kî: -Ey şahê serdarê 'alîcenab

- Ji bo ew kes in ev qusûrê kebîr
Ku e'mayekî bê mecalê feqîr

- Li rê heft-î gavan bibit bê gezend
Di cennet de hinde dê bîtin belend!

Ku borî ji wan, dî qusûrê gelek
Li dor sef kêşane sufûfê melek

Ji wan dengê tekbîrê têtin çunan
Ku jê por bûye cumle baxê cînan

"çi qesr in, çi tekbîr e?" wî kir sual
Cewab da: -Cihê xaziyanê delal

- çiku der xeza xeyrîcûyende bûn
Di nav sef de tekbîrîgoyende bûn

- Nîşan in di cennet qusûrê di wan
Ji wan dengê tekbîrê têtin 'eyan!

Ji wan jî murûr kir hebîbê Îlah
Di cennet de meşyaye çendek li rah

Hinik qesrê dî pur sipî sade durr
Ji awazê "Lebbeyke, lebbeyke" pur

Institut Kurde de Paris

Mûnewwer bi nûra şehê layezal
Telelû dikin jê şu'a'ê cemal

Ji Cibrîlî pirsî: -çi ne ev qusûr
Ku hinde ji wan têne tîrêjê nûr?

Cewab da: -Qusûr in ji bo haciyan
Ku qett'ê dikin merhel û badiyan

- Xweda dê di roja heşir de evan
Qusûran bidit wan di nava cînan

Qusûrên gelek bax û bostan heme
Bi awaze û saz û pur demdeme

Por ez hor û xîlman hemî serteser
Diçû berqê enwarê Mewla ji ser

Diçû 'erşê 'alî ji wan berqê nûr
Seraser ji tîrêjê bû xerqê nûr

Ji enwa'ê bostan hezaran hezar
Di eşcarê emwa'ê murx û hezar

çep û rastê enharî nav rewzeyê
Wekî hellê sîmabê ser sefheyê

Muxalif diborîn di nav hev de çem
Ku tewsîfê nakit zebanê qelem

Dirext û qusûr û xuref bê hîsab
Tijî hûr û wîldan wekî durrê nab

Muheffef bi sseffê suroş û melek
Seraser por ez horiyê çavbelek



Institut kurde de Paris

Hemî zulf û tturre bi şubhê herîr
çu şemsê muddî û çu bedrê munîr

Qewî nazik û çavreş in wek xezal
Sîyahzulf û gerdenbeyaz û delal

Sehîqamet in şubhê serwîçîmen
Dirandurr û leble'l û şêrînziqen

Xet û xalê wan mislê muşkê Xeta
Li bergê sîmen bête nûsîn wuha

Dihenxwunçe, gîsûyî şebrengê tar
Di her ta meqerrê dilan sed hezar

Xeraman dema meş dikin nav bihişt
Ewan nazenînanê zîbasirişt

Dibin bendeyê wan hezar can û dil
'Eceb noşîdarû ne bo cerhê kul

Ji nûra yek enguştê wan bê gezaf
Xusûf têtê xurşîd û meh bê xîlaf

Neşim wesfê wan nazikan kim beyan
Bese ev qeder wesfê wan horiyan

Xweda çêkirin ew ji bo dosîtan
Wekî xwuçeyê surx ê nav bosîtan

Me'elqisse, pursî hebîbê bi nûr:
- Ji bo kî ne ev horî û ev qusûr?

- Ku hinde muzeyyen bi nûr û şû'a'
çi sinf in bi van ew bikin întîfa'?

Institut kurde de Paris

"Ji bo ew kes in" Cibreîl da cewab
- Ku punhan dikin qesdê xeyr û sewab!

Ji ummet heçî bigre rahê huda
Bi mexfî bidit wechê dil bo Xwuda

Bikit îctînaba gunahê zemîn
Bitirsit ji nar û 'ezabê cehîm

Xweda dê li ew kes bikit ni'metê
Bidit hinde emlakê ez cennetê

Qewî serbilind in di rojê heşir
çiku ser 'îbadet kêşane sebir

Meqamê hemî enbiya û rusul
Temaşa kirî wî şehê hemçû gul

Ji enwa'ê enwarê pur lewn û reng
Ji tesbîh û tehlîlê pur sewt û deng

Teheyyur ji sun'ê Xweda ma gelek
Ku hinde tijî bûn ji hûr û melek

Ji paş ew temaşaya der cennetê
Ji Cibrîlî pirsî şehê ummetê:

- Feqîrê di cennet ku efqer bitin
Ji bo wî re îhsan çi meqder bitin?

- Ji enwa'ê bax û qusûrê 'ezîm
çi în'am bikîtin Xwedayê kerîm?

Wuha gotê Cibrîlî ba 'eql û hûş
Kî: -Ey bendeet hem melek hem surûş



Institut kurde de Paris

- Ji meşriq heta xerbê yekser cîhan
Welêkin bizan heft-î par e çunan

- Digel hûr û xîlman û qesr û xulam
Bi enhar û eşcar û baxê 'îzzam

- Xweda dê bidit kêmtirê cennetê
Ji en'amê xwe ev qeder nî'metê!

Ji pes ew 'ecaîb, xeraîb temam
Di cennet ku dîtin şehê nîkînam

Li şehper suwar bû hebîbê emîn
Perende heta tarumê pencemîn

Qedem bazî da pencemîn asîman
Tereb hate cismê semayê giran

Ji bewwabî re gotî wî Cibreîl:
- Veke babê esman 'ecîlen 'ecîl!

Mehabet qewî ket dilê Dergevan
Ji Cibrîlî pirsî di wext û zeman:

- Digel te kî ye bêje, ey peykê pak?
Ku esman li min rewşen û 'ettrînak!

Cewab daye Cibrîlê pak î delal:
- Digel min Muhemmed şehê purkemal

- Dikit qesdê bo hezretê Kirdîgar
Xelas kit gunehkarê ummet ji nar!

Dema goşî kir namê fexrîr'rusul
Ji ferh û surûrê vebû hemçû gul

Institut kurde de Paris

Vekir dergehê asîman zû gelek
Selamlix kişandin sufûfê melek

Qedem wextê danî li pencem sema
Tezelzul kete cîsmê esman hema

Melaîk vewestane bê hedd û 'ed
Ku pabûsê kin wî hebîbê Semed

Dema îstîwa bû li ser asîman
Furuşte bi yekser digel Dergevan

Wuqû' bûn di xakê qedem ba kemal
Mûşerref hemî bûn bi jêrê nî'al

Li ber Mutefa hinde bûn ew zelîl
Kî: -Ey padîşeh, em dexîl in, dexîl

- Di rojê qîyamet nekî me jibîr
Me bigre di jêrê lîwayê kebîr

- Hemî em geda ne li ber babê te
Hemî teşne bo qettreyê abê te!

Bi rûmalî xakê qedem bûn heme
Selat û selam da sema zemzeme

Ji yumna şehînşahê axirzeman
Merîxê sema Se'd-î bû bê guman

Eger çendî nehsî hebû der wucûd
Welê nehsiyeş se'dî bû zûdî zûd

Hukum kir ttilismê mehebbet Merîx
Kirî terkê buxz û 'edawet Merîx

Institut kurde de Paris

Şukur se'dî bû ew Merîxa nehis
Terik dan hemî hukm û te-sîrê pîs

Xelas bû ji wê herçî muhbet hebû
çira? çunkî tteb'eş 'edawet hebû

Li wê dî furuşte hebîbê kubar
Yekê nîmî berf û dîger nîmî nar

Murekkeb ji ateş, ji berfê çunan
Melaîk Xweda çêkirin bê guman

Bi tesbîhê Mewla ne herdem muqîm
Muqeddes dikin padîşahê kerîm

Dibêjin: "Bi xeyr ez Xwedayê xefar
Kî ye mezcê kit nav du zid berf û nar?"

Ne ateş ji berfê dibit muntefî
Ne berf ez heraret muzab û xefî

Şukur bo Xwedayê 'ezîz ê qedîr
'Eqîde ku da Şemseddînê feqîr

Bi vî hukmê wî bawerî min heye
Ji vê zêdetir humkê mazin heye

Ji van mestir e xelqê esman û erd
Kesîf û lettîf in bi ttûl û bi 'erdd

Sema rakirî bê dîrek, bê sitûn
Evê kunbeda pur hewa wajîgûn

Tijî kewkeb in sakin û saîre
Zemîn muttmeîn, asîman daîre

Institut kurde de Paris

Dikit xelqa însan ji maê mehîn
Neqiş lê dikit şiklê zîba çunîn

Muweşşeh bi ezman û nutq û kelam
Muzeyyen bi çeşmê sîyeh, qedd û qam

Muselsel dikit zulf û purçem li rû
Vebestî hezar dil di yek tarê mû

Kî ye xeyrî Mewlayê pak ê berî
Ji av xelqî kit îns û cinn û perî?

Kî ye xelqî kit xelqê bê da û bav?
Kî ye neqş û sûret bikêşit li av?

Ew e xaliqê 'alem ê purkemal
Yek e her yek e her yek e bê zewal

'Eqîde ev e Rûhiyê dilbiderdŞ
Xweda bê şerîk e yeqîn ferd e ferd

Temaşa ke ey dil, ku dîsan qelem
Bigêrrim li ser qisetê bîş û kem

Ji saxer ku çend cur'eyan noşî kim
Hinik nexme û sazeha goşî kim

Bibêjim ji qelbê şewat ê hezîn
Hinik beyt û eş'ar û lefzê şêrîn

Vebîr bînim ez wextê wessla hebîb
Nezim kim kelamê fesîh ê 'ecîb:

Ji ser pencemîn asîman hem çunan
Vewesta li babê şeşem asîman



Institut kurde de Paris

Di wê saetê Cibreîlê emîn
Nîda da ji bo dergevan: -Kay guzîn

- Veke dergehê asîman bê dereng
Ku esman bibit por ji tesbîh û deng!

Ji Cibrîlî pirsî: -çira, ey kubar
Ji bo fetha qapî dikî întîzar?

- Digel te kî ye, bêje min ey xelîl?
Ji bo wî re go ew zeman Cibreîl:

- Digel min şehê îns û cin û melek
Hebîbê Xweda, Ehmedê çavbelek

- Ji bo 'alemê fezl û rehmet'emîm
Diçit hezreta padîşahê kerîm

- Xweda xwestiye ev hebîbê bi naz
Ji bo wî bibêjit hinik sirr û raz!

Vekir babê esman furuşte bi lez
Li quddûsiyan bû gelek cergebez

Melaîk hemî hatin û cem'î bûn
Li nûreş çu perwaneyê sem'î bûn

Vewestan li cayê edeb bît'temam
Kirin hedye bo wî selat û selam

Heta çûn hemî bo qedem bûseyê
Tezahur dikin şubhê perwaneyê

Bi xakê nî'alê hebîbê cîhan
Mûşerref surûşê şeşem asîman

Institut kurde de Paris

Bi teşbîhê derya ketin pêl û mewc
Gihan xakê bûse qedem fewcî-fewc

Li esmanê sadis ku bû mustewî
Surûşan ji muhbet hemî mestê wî

Ji tesîrê nûra şehê enwerî
Mehû bûn hemî pertewê Muşterî

Kirrîn û firotin nekir yek nefes
Ji destê xwe avêtî gaz û meqes

Ji tesîr û ehkamê xwe ma zelîl
Giha ne'lê sultan, feqîr û dexîl

Exiz kir hinik nûra safî nî'al
Bi wê Muşterî bû zerîf û delal

Nema hîçî sermaye der destê wê
Wekî muflisan maye destbestê wî

Teleb kir ji xakê qedem sermîyan
Ku bey' û şira kir bi wê her zeman

Ji xeyrî cemala Resûlê berî
Bizan Muşterî qet nebû muşterî

Eser girtî ez xakê ne'leş çunan
Hukumdarî bû ew di 'eqdê lîsan

Li ser asîmanê şeşem Mustefa
Bi çav ket yekê şexsekî ba sefa

Li ser textê zêr calis e ba tereb
Mirovek mehabetfîza ye 'eceb



Institut kurde de Paris

Telelû dikit berq û tîrêjê nûr
Ji wî şexsê ser textê zerîn ji dûr

Sual kir şehînşeh ji Cibrîlê pak:
- çi şexs e evî merdumê tabînak?

Cewab da kî: -Mûsa b'nî 'Imran e ew
Li ser Ttûrê Seyna bi nîşan e ew!

Bi bal ve meşî Ehmedê ixtîyar
Ji ser textî Mûsa xwe avête xwar

Bezî pêşiya şahê Beyt û Herem
Muşerref xwe gêrra bi kef û qedem

Ji bo wî re kir erzî ev çend xeber
Kî: -Ey padîşahê rusul serteser

- Tu yî Xusrewê mulkê axirzeman
Şehê îns û cin û melek bê guman

- Tu kêşayî bezma surûrê Xweda
Çiraxê hîdayet bi destê te da

- Xweda pur bite daye fezl û kerem
Şehê serfîrazan tu yî, lacerem

- Tu sultan û cumle rusul xeylê te
Hemî enbiya dest-î der zeylê te

- Şehînşah-î bûyî li textê huda
Ne Adem ne cennet ne 'erşê 'ula

- Ji Mewla bi zarî dikir min teleb
Li ser Ttûrê Seyna bi halek 'eceb



Institut kurde de Paris

- Ku min têxe nav ummeta Mustefa
Ku peyrew bibim ez di rojê ceza

- Şukur de'weta min Xweda kir qebûl
Bi zatê te yê enwerî bûm wusûl

- Tu îmşeb diçî qurbê zatê Xefûr
Muheyya ji bo te bîsattê ji nûr

- Welê çun biçî hezretê Kirdîgar
Feramûş nekî ummeta zenbîdar

- Dema der hezîra Qudûs kî hulûl
Du'a te hemî dê bibîtin qebûl

- Ji Mewla tu mehder bike ummetê
Di rojê heşir da biçin cennetê

- Di qebrê nekêşin cefa û 'îqab
Di nîranê-dûzex nebînin 'ezab

- Welê, îhtîmal e ku Mewlayê min
Li umet bikit barekî pur mezin

- Bi dîqet rica ke ji bo ummetê
Ku Ellah li wan ke hinik xîfetê

- çiku ummeta te zeîf in bizan
Neşin hemlî kin zêde barê giran

- Ji bo umet û peyrewanê zeîf
Rîca ke tu ehkamê şer'ê, xefîf

- Terehumke zêde bike mehderê
Ku şermî nebin ew di nav mehşerê

Institut Kurde de Paris

- Ji qewmê Benî Îsraîlî gelek
Me kir tecrîbe wek zerê ser mehek

- Nihayet, nîhayet nebûn musteqîm
Ji ber kerbê wan cergê min bû seqîm

- Ji bo te dikim erzî vê xizmetê
Bi texfîfî emrê bikî himmetê!

"Ne'em" gotê sultanê 'alîmeqam
Xetim bû li Mûsa B'nî 'Îmran kelam

Wîda' kir ji wî şahê gerdenfîraz
Helesta û çû rahê dûr û diraz

Were Rûhiya şad û xurrem be tu
Ne ba zarî, ba şîn û matem be tu

Ji fertta gunahan mekeş hesretê
Ji ber destê xalî mekev heybetê

çiku ummeta ekremê 'alem î
Resûlê me şah e li ruslan hemî

Resûl û nebî têk bi zarî medam
Ku bin peyrewê Ehmedê nîkînam

çu 'ussatê ev ummet î Rûhiya
Metirse ji zenbê mîsalê çiya

Dirêj ke yedê xwe li ber Mustefa
Bi zarî kî: Ey şahê sahibwefa

Eger çî ku keslan û bêta'et im
Welê yek gunehkarê ev ummet im

Institut kurde de Paris

Zelîl im, zebûn im, gunehkar û pîs
Xerîq im di deryayê zenb ê xebîs

Me defter gelek reş kirin el eman!
Ji 'isyan û zenb û gunahê giran

Bi ev rûreşî min rijand abê rû
Bi deryûze hatim li ber babê tu

Ku mehrûm nekî min feqîrê zelîl
Di axirnefes ey Resûlê Celîl

çu tu rehmê 'am î ji bo 'alemê
Li halê minê purguneh yek demê

Nezer ke bi şefqet eya padîşah
Şefa'et ke min muznibê rûsîyah

Bi ev pîsî yû ev xîssalê bedî
Nekî der ji nêv ummeta Ehmedî

Hezar şukrî bo xaliqê zulcelal
Ku da ber me rahê şerî'et delal

Ji vê ummeta Mustefa me, hezar
Şukur bo Xwedayê 'ezîz ê xefar

Eger çendî ez mucrim û rûreş im
Qewî muflis û zar û mîhnetkeş im

Welê ez bi vê gotinê ageh imŞ
Ku ez muflis im fî emanîlleh im

Şefa'et ke ey Ehmedê ixtîyar
Evî Ebdurrehmanê pur zenbîdar

Institut kurde de Paris

Ku şeytan nebêjit "Yekî ummetê
Sebeb zenb û 'iyan kete zehmetê!"

Îlahî me nespêrî nefsa xebîs
'Efû kî ji min van gunahê di pîs

Di destê mi de maye rehma Xwuda
Digel yek şefa'et ji şahê huda

Ebed nabim ez bê umîd û yeûs
Digel van gunahan xebîsê nufûs

çiku pêşrewê min Muhemmed Resûl
Gelek pêştir e der meqamê qebûl

Li nik hezretê Heq ew e serbelend
Şefa'et bikit Rûhiyê pir gezend

Were ey qelem dîse ser xizmetê
Beyan kim heçî maye ez qisetê

Binoşim yekî saxerê ateşî (2)
Beyan kim digel haletê serxweşî

Beqîye ji rahê hebîbê mezin
Ewî zatê peyxemberê îns û cin:

Ji esmanê sadis hebîbê emîn
Vewesta li ber tarumê heftemîn

Li ber dergehê heftemîn asîman
Seda daye Cibrîl ji bo dergevan:

- Veke babê esmanê sabi' bi xar
Li ber dergeh-î em dikin întîzar!

Institut kurde de Paris

Dema goşî kir ev xeber Dergevan
Ji Cibrîl sual kir di wext û zeman:

- Kî ye ew li nik te bibêje 'eyan
Eya hamilê Wehyê ez asîman?

"Digel min hebîbê Xwedayê kerîm
Muhemmed şehînşahê xulqê 'ezîm!"

Ku navê Muhemmed bihîstî hema
Bi lez wî vekir babê heftem sema

Qedem da hebîbî li heftem tebeq
Ji cumle Ûlûl'ezmî wî bir sebeq

çu bû mustewî ew li sabi' sema
Li ser asîman yek furuşte nema

Hemî cem'î bûn hatine nik hebîb
Ji wan tê fîxan û sedayê 'ecîb

Bişaret gerrandin li hev qudsiyan
Ku: "Hazir bûye şahê axirzeman!

Werin hey werin, em ziyaret bikin
Bi xakê qedem xwe mubarek bikin!"

Hemî leşkerê sefê subbûhiyan
Bi yekser xwe avêtine ber piyan

Qedem bûse dan Ehmedê Mustefa
Resûlê bi heq, şahê sahibwefa

Piyê Mustefa bûse dan cumleşan
Xwe rûmalî ne'lê kirin hemçunan

Institut kurde de Paris

Rîcaxwazî bûn ew ji zatê hebîb:
"Di rojê qiyamet negêrrê xerîb

Di jêrê lîwayê me bigre eman
Di rojê heşir em bibin şadîman"

Ji e'dadê bîrûn cemi' bûn melek
Tijî dengê tesbîh e her neh felek

Selat û selaman li ser şehriyar
Dibêjin ziyade ji 'edd û şumar

Zuhel hate cumbuş bi 'işqa giran
Giha jêrê ne'lê şehînşahê can

Siyeh bûye cismê Zuhel ew nefes
Gihîşte nî'alê ku bigrit qebes

Mûnewwer Zuhel bû bi xakê nî'al
Hukum kir bi tesîr û hukmê delal

Ttilismat û sa'atê wê zêde bûn
Ji bo muhbetê hukmê wê zêde bûn

çiku hub hilanî ji zatê hebîb
Eser kir di hubbê ttilismê 'ecîb

Li wê dîtî sultanê 'alî 'elem
Mirovek li ser textê zêr muhteşem

Yekî şexsekî enwer ê rihsipî
Ji wî berq û tîrêjê nûrîn diçî

Muşekkel, mûnewwer mirovek mezin
Mehabet dikin jê hemî îns û cin

Institut kurde de Paris

Bi teşbîhê xurşîdê ser asîman
Muşe'şe' ji wî berqê nûrîn 'eyan

Ji Cibrîlî pirsî hebîbê bi naz:
- çi şexs e evî merdumê serfîraz?

Cewab da kî: -Ey şahê axirzeman
Xelîlê Xweda Îbrahîm e bizan

- Ku ceddê te ye Îbrahîmê Xelîl
Xelîlê xwe xwendî Xwedayê celîl!

Bi nik wî ve çû Ehmedê nîkînam
Birahîmî rabû bi sed îhtîram

Deraxûşî kir Mustefayê kubar
Ser û çeşm-î lê bûse dan çendî car

Ji ber destê xwe da mekan û meqam
Ji bo wî re xwendin selat û selam (3)

Du'a kir ji bo wî gelek bê hîsab
Ku payende bit şahê 'alîcenab:

"Bi te îftîxarê dikim her zeman
Di nav enbiya û sefê qudsiyan

Bi te serbilind im eya şehrîyar
Ji nesla min e Ehmedê îxtîyar

Diçî hezreta xaliqê Kirdîgar
Rîca ke tu ummet bi dîqet ji nar

Feramûş nekî ummetê ey cîger
Bi cuz te nehin wan eman û mefer



Institut kurde de Paris

Şefa'et bikî ummetê ey resûl
Li ew der du'ayê te cumle qebûl

Hemî destê wan in bi damanê te
Ricayê dikin lutf û îhsanê te

Meqamê te bertir ji 'erşê Xwuda
Ji kewn û mekanan dibî tu cuda

Tu layiqê teşrîfa "Lewlak" î bes
Meqamê te ye hezreta pakî bes

Nebî xafil ez zenbê vê ummetê
Rîca ke hemî da biçin cennetê

Nehin taqetê wan di narê cehîm
Nikarin bikêşin 'ezabê elîm

Ji min goşî ke pendê min ey weled!
Rîca wan bike der huzûra Ehed"

Şefa'et ke ey Ehmedê Mustefa
Digel ummetê Rûhiyê pirxeta

Ku roja qiyamet ji nav muminan
Nesûzit bi wî ateşê pir giran

Digel ev xebîsî û bêta'etî
Bi ev rûsiyahî û kêmxîretî

Yeqîn musteheqqê ji bo ateş im
Çiku ez gunehkar û pir rûreş im

Welêkin me umîd e ez Mustefa
Nehêlit bibînim 'ezab û cefa

Institut kurde de Paris

Şefa’et bikit min feqîrê hezîn
Di wê hezreta xaliq-il ’alemîn

Xwedaya bi heqê Resûlê kerîm
Bi heqê Xelîlê te yê Îbrahîm

Bi heqê cemî’ê nebî û rusul
’Efû ke evî Rûhiyê dilbikul

Menêre li zenbê min ê pur ’ezzîm
Bide xatirê Mustefayê kerîm

Rîca min ev e her dem û saetê
Nesûzî bi ateş ji nav umetê

Vegeryam li ser qisetê ey heval
Binêre li elfaz û nutqê delal

Ku hevdengî bim ez digel bulbulan
Bidim asîman û zemîn xulxulan

Şonîdem ji wî rawiyê mu’teber
Ku guhdarî bû ew li nutqê puder

Ji bo wî re go Îbrehîmê Xelîl
Kî: "Ey nûrê dîde, Resûlê cemîl

Bibêje ji bo ummeta muhterem
Ku (La hewle) bêjin hemî wext û dem

Bi (La hewle) meşxûlî bin ew muqîm
Ku zehmet nebînin di rojê elîm

Ji vî zikrê (La hewle) qencî ’ezîz
Di cennet dê bin şîn dirextê temîz

Institut kurde de Paris

çiqas ew bi vî zikrî meşxûl-î bin
Li nik zatê Heq hinde meqbûl-î bin!"

"Ne'em" gotê sultanê Beyt û Herem
Helesta ji nik wî cedê muhterem

Wîda'ê puder kir şehê ba wefa
Ji wî re du'a kir Xelîl ba sefa

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Mana vî sernavî weha ye: Dîsa girêdayê bi mesela pêşî ve ye.
2- Ev malik di çapa Qoxî de weha ye:
"Beyan kim digel haletê serxweşî
Binoşim yekî saxerê ateşî"
3- Ev nîvmalik di çapa Amedî de weha ye:
"Ze ber destê xwe da mekan û meqam"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 30

## BENDÊ SELASÛN DER REFTENÊ RESÛL BE SÎDRET-ÛL MÛNTEHA WE BERTER EZ AN

Institut kurde de Paris

Bi "Bîsmîllah" min qeti' kir ev qelem
Bi "Hemdîllah" min zed li kaxez reqem

Were saqiya bîne camê xemir
Li ser min giran e, giran e emir

Ji hîcra hebîbî cîger multehîb
Ji cewra reqîbî rewan mudtterib

Dilê min hezîn e, kebab e, kebab
Dewayeş nehin xeyrî camê şerab

Dexîl im di darê şîfayê moxan
Ji min qet'î kit êş û derdê zeman

Me tehqîqî kirye bi cuz meykede
Ji bo derdê 'aşiq neda fayîde

Hemî fikrê 'alem hewa ye, hewa
Cihê def'ê ekdar e darûş'şîfa

Bide saqiya cama yaqûtîfam
Ku pê poxte kim carekê qelbê xam

Meya nabî bîne di cama belûr
Xeber dim ji bo te ji ehwalê jor

Eger çi li nik sofiyan ew cunah
Li ser mezhebê 'aşiqan e mubah

Bi fetwaya pîrê moxan çend-î cam
Bide min ku sergermî bim ez temam

Surahî bide saqiya zûdî-zûd
'Edem bûm ji hicrê, me bîne wucûd

Me îhya ke saqî bi cama rehîq
Welê abê yaqût û cama 'eqîq

Di iqlîmê 'işqê bizan şah im ez
Li textê mehebet şehînşah im ez

Mulûkane bo min bide camê mey (1)
Kî Cimşîdê Keybûd û Kawus û Key

Bi zerînsurahî bide min şerab
Li awazê tenbûr û 'ud û ribab

Di meyxaneyê şahê dewran im ez
Li nav 'aşiqan zêde sultan im ez

Meke xewfê ez qazî û muhtesîb
Peyapey bide dil bibit muzterîb



Institut kurde de Paris

Ji şurba mudamê nema îddttîbar
Bide muttesil camê mey aşîkar

Ji 'essas û qazî meke tirs û bak
Bide camê mey eşkera 'etrînak

Ji darûxe û şehne û padîşah
Metirse eya saqiyê keckulah

Li ser 'aşiqan nîne hukmê şehan
Yeqîn padîşahê me pîrê moxan

Muxennî, tu jî çend meqamê surûd
Nezim ke li awazê qanûn û 'ûd

Di dil beste ne tarê kîsû hezar
Tesellî bide min ji awazê tar

Welêkin ji ahengê nayê şêrîn
Terebnakî ke cuz-î qelbê hezîn

Bi teşbîhê sûraxê ney bê 'eded
Hene rexne min der dil û der kebed

Bi awazê sûraxehayê neyê
Bi camê mûbarek tijî ez meyê

Bikin destegîrî di wextê seba
çiku dilkul im saqiya, mutriba

Me'azellah yar ê ji 'eyban berî
Ji çeşmê me wunda ye şubhê perî

Ne esma musexxer dikin dîlberê
Ne efxan eser der dilê enwerî

Institut kurde de Paris

'Ezaîm û esma digel daîre
Ji bo zebta dîlber nebûn mû-sîre

Fîxanê peyapey bi şeb ta seher
Nekir der dilê dîlbera min eser

Di dil muşte'il bûye narê şewat
Eger bête der herq ê kit kaînat

Welêkin eger ne dilê min bitin
Sema û zemîn wê hemil nakitin

çiku ateşê 'işq e narê kebîr
Ji wî agirê pir, ditirsit se'îr

Ne 'aşiq tehemmul bikin ev 'ezab
Dixit asîman û zemîn îzdîrab

Di vî halê ku min hinik kir beyan
çisan ferhî tê qelbê 'aşiq, çisan?

Eger ne bi hukmê surahî û saz
Dilê 'aşiqan bête çerxê û saz

çisan nezmê kim şi'r û beyt û qesîd
Eger ne şerab û xîna bit bedîd?

Dema neş-e bigrim bi vê cur'eyê
Mûşerref be goşim bi vê nexmeyê

Emir kim li ser xameya rûsiyah
Sserîrî bikit ew ji ber derd û ah

Muheyya be ey xameya serteraş
Hesûdî bikin ez te cumle neqaş



Institut kurde de Paris

Neqiş ke li qirtasê safî, sipî
Ji 'işqê heçî der dilê min hebî

Ji 'işqê heçî bête qelbê hezîn
Newîsende ke ba sserîr û enîn

çisan 'işqê zehmet bikîtin li min
Tu teklîfê zêde bibînî ji min

Elemdarî be mislê Rûhî bi ah
Birêje ji dil xwîna tarî, siyah

Bibit behsê nav 'aşiq û şa'iran
Heçî ez bibêjim ji 'işqa giran

Digel min heval be di vê xizmetê
Ez û tu bikêşin hinik zehmetê

Hevalî çi ye? tu î'anet bikî!
Ji bo Şemsuddîn tu kîtabet bikî

Wegerne, ne muhtac im ez der nezim
Ne bo te, ne bo kes di ceng û rezim

Xwe pêkbîne ey xameya rûsiya
Nezim kim qisa Sîdret-ul Munteha:

Ji heftem sema çun bi rê ket hebîb
Bi heftem tebeq ket fîxanek 'ecîb

Li şehper suwar bû hebîbê Xweda
Qedem da li ser Sîdret-ul Munteha

Me seh kir ji rawî bi lefzê refî'
Ku Sîdre jî bê hed ttewîl e, wesî'

Institut kurde de Paris

Eger heft tebeq asîman û zemîn
Digel cennet û dûzexê în çunîn

Biçin Sîdret-ul Munteha nagîhan
çu yek helqe bavêjî sehra 'eyan

Bi xeyr ez Xweda kes nizanit ebed
Ji pehn û dirêjî, hîsab û 'eded

Lebaleb ji quddûsiyanê kerîm
Bi tesbîh û tehlîlê Mewla 'emîm

Bi teşbîhê tawûsê zîba, xeram
Xweda çêkirin ew melek bît'temam

Di nêv hinde Sîdre bi qeys û meqer
Xweda çêkirî pur mezin yek şecer

Hezaran hezar şax-î tê da gelek
Li ser her çiqek sedhezaran melek

Hemî ta'etê Heq dikin rûz û şeb
Selat û selaman dibên ba edeb

Yekê berg û ewraqê ser ew şecer
Dikit zzillê mexlûqeha serteser

Bi teswîrê azanê fîl, ew wereq
Wuha gotiye wî Resûlê bi heq:

"Ber û fêkiyê wê bi mislê qulal
'Eceb nerm û şêrîn û pak û delal"

Qedem wextê danî li Sîdre hebîb
Ji bo derdê subbûhiyan bû tebîb

Institut kurde de Paris

Di nav wan de bû şahî û xulxule
çu bulbul hemî, çunkî Ehmed gul e

Selat û selaman 'eceb zemzeme
Di 'erş û di kursî de bû demdeme

Hemî hatin û dest û pa bûse dan
Bi zarî ketin ber qedem cumleşan

'Elemhayê nûrîn li ser bû kuşad
Furuştan hemî ser li ber pê nihand

Li wan bûye mizgîn û ferh û surûr
Qedem daye Sîdre hebîbê bi nûr

Li hev mujde gêrran cemî'ê melek
Bi zelzel ketin Sîdre û neh felek

Temam cem'î bûn sefê quddûsiyan
Hemûçkan xwe avêtine ber piyan

Ji bo wî kirin 'erzî vê xizmetê:
"Me bigre tu ey şeh di nav ummetê

Bikî destegîrî di rojê qîyam
Di jêrê lîwayê heşir bin temam

Mûşerref tu bûyî bi Xelwetsera
Şehînşah û serdefterê enbiya

Rusul, enbiya ba melek cumleşan
Rîcadarê lutfa te ne bê guman

Di cem'a rusul de tu yî şahîbaz
Bi xakê nî'alê te em serfîraz

Institut kurde de Paris

Tu yî serwerê cem'ê peyxemberan
Li ser me şehînşah î, sahibqeran

Hemî bendeyê babê dewletsera
Surûşanê 'ulwî û suflî teba

Tu serxeylê têk enbiya û rusul
Tu yî rehberê rahê (ehdes'subul)"

Temamê melaîk li ser Sîdreyê
Cemi' bûn li ser wî çu perwaneyê

Kişan sef li dor padîşahê Rusul
Hemî xwunçewar û Muhemmed çu gul

Hemî nûrê wan mehwî bû ew zeman
Vewestan li pêşber hebîbê cîhan

Bi çeşm û bi dîde turaba nî'al
Vemalîn temamê melaîk delal

Qedem bûse dan hinde quddûsiyan
Ku te'rîfê nakin çi îns û çi can

Mûferreh melaîk li ser Sîdreyê
Ji bo şukrê Mewla dikin secdeyê:

"Ku ya Reb hezar şukr-î bo te hezar
Mûşerref kirin em te ey Kirdîgar

Bi pabûsê sultanê 'alîmeqam
Muhemmed 'eleyhîs'selat û selam

Li me dîde rewşen bi dîdarê wî
Hemî em mûnewwer bi enwarê wî"

Institut kurde de Paris

Ji ewpaş melaîk hemî sef bi sef
Kişandin sifûfê xwe ba sed şeref

Cema'et girêdan bi terz û edeb
Ku bin tabi'ê Ehmedî muntexeb

Muezzin li wê bûye Ruh-ul Emîn
Muhemmed îmam e, melek tabi'în

'Eqid kir li ber wan furuştanê pak
Yekî rek'etek "sunnetê wutr"ê çak

Bi erkan û şert û bi terzek 'ecîb
Temam kir ewî wutrê sunnet hebîb

Selam da ji wê sunnetê cumleşan
Ketin zikrê Mewla hemî bê guman

Bi tehlîl û teqdîsê Heq bê qiyas
Kirin îştîxal seffê nûrîn esas

Pes ez 'uhdeyê zikrê Mewla temam
Muhemmed ji nav seffê wan bû qiyam

Nîda hatê bo Sîdreyê pir mezin
Ji nik Xaliq û raziqê îns û cin

Kî: "Ey Sîdre îmşeb bi zat û sîfat
Li te hazir e efzelê kaînat

Nîsarê bike bo qudûmê hebîb
Welêkin nîsarek 'ecêb û xerîb!"

Ji vê gotinê şewq-î hat Sîdreyê
Yeqîn Sîdre ket cunbuş û cezbeyê

Institut kurde de Paris

Hemî şax û berg û wereq bît'temam
Teherrûk kirin bê meqal û kelam

Verêtin li ser şahê sahibhuner
Li şiklê ceradan welê sade zer

Temam Sîdret-ul Muntehayê mezin
Di wan de setir bû ji ser ta bi bin

Ku yanî nîsara şehê pur kemal
Ji destê me tên ev ceradê delal

Li ser wechê Sîdre qeder yek zîra'
Melexhayê zerîn kirin îrtîfa'

Li wan îltîfatek nekir padîşah
Li nik wî ceradê ji zer mislê kah

Emir bû kî "Ma zaxe" çeşmê hebîb
Nekir meylê ser ew nîsarê 'ecîb

Ji paş wê tecellî ji zatê Xwuda
Peyapey vewestan li şahê huda

Terebnakî bû Sîdre ket îzdîrab
Veda sewtê qanûn û 'ûd û ribab

Melaîk bi zelzel ketin serteser
Selat û selam dan li xeyr-îl beşer

"Îşaret ev e" gotî zatê Xweda
"Fe xeşşa" li ser Sîdreyê "ma xeşşa"

Ji pes padîşahê zemîn û felek
Li ser Sîdre dî çend sufûfê melek



Institut kurde de Paris

Li ser her yekî, tacekî sade durr
Ji enwa'ê tîrêj û enwarê pur

Bizan ttûlê her tacekî re-sê wan
Bi pîvanê, not gaz-î bû, ey fulan

Welêkin zîra'ê yedê Cibreîl
Ewan tacî hinde dirêj in, ttewîl

Di her tacê de lûlû in çarîsed
Mûrekkeb gerrandî Xwedayê semed

Bozorgî bi wan lûlûyê pir şîfaf
Bi miqdarê heftem zemîn bê xîlaf

Bi roj û bi şev, mah û salan mudam
Bi zikrê Xweda ew dikêşin qiyam

Du'ayê dikin ew ji bo ummetê
Ricadarê wan in ji nav hirqetê

Xwedaya mi jî tabi'ê musliman
Bixî nav du'a van furuştan, eman!

Qebûl kî ji bo Rûhî û ummetê
Du'a van furuştan di vê saetê

Ji wan wê de dî yek melek pur muhîb
Bi xelqîyet û sûretê pur 'ecîb

Ji bê hed 'ezîm û mezin ew melek
Qedem jêrî erdan û ser der felek

Eger cumle avê li rûyê zemîn
Birêjî li ser ferqê wî în çunîn

Institut kurde de Paris

Qeder qîtreyek nakevîtin ji ser
Tu dîger wucûdeş qiyas ke li ser

Li rast û li çep elf û elfê melek
Sufûfê xwe kêşane bê hed gelek

Bi meşxûlê zikrê Xweda ne heme
Bi awaze û demdem û zemzeme

Sewabê didin ummetê cumleşan
Ji bo ummetê tête nûsîn çunan

Ji Cibrîlî pirsî Resûlê kerîm:
- Kî ye ev furuşte ku hinde 'ezîm?

"Ev e rûhê ku Leyleyê Qedrî pak
Nuzûlê dikit ew li ser rûyê xak"

Ji bo Cibreîlî wuha go Resûl
Kî: -Ey hamilê Wehyê pak î qebûl

- Were da demek em biçin nezdê wî
Bizanin hinik halet û qesdê wî!

Resûlê Xweda çun bi nik wî ve çû
Ji cayê xwe rabû bi pêş wî ve çû

Ji bo wî re îkram û te'zîmê kir
Muhemmed hilanî bi cayê xwe bir

Furuşte digel tabi'ê nûrîdar
Selat û selam dan li ser şehriyar

Bi teşbîhê perwane cumle melek
Sufûfê xwe kêşan li dor wî gelek

Institut kurde de Paris

Bi dîde vemalîn turabê nî'al
Qedem bûse dan lê bi naz û delal

Di çeşmê xwe malîn bi sed hayîha
Turabê nî'aleş wekî "tûtiya"

Ji nav wan jî rabû Resûlê 'ezîz
Emir kir ji bo Cibreîlê temîz:

- Exê Cibreîla tu rabe bi naz
Biçin em li vê rahê dûr û diraz!

Dema goşî kir Cibreîl ev xîtab
Ji ahîna wî hatî bihna kebab

Ji nav cergê rahiştê ahek 'ecîb
Ewî sîne û cerg-î pê bûn kebîb

Dema germa wî serd-î bû ew zeman
Girînek 'eceb kir bi eşkê rewan

Girîn hinde kir Cibreîlî gelek
Ku pê ra girîn cumle sefê melek

Furuştan ji bo Cibreîlê emîn
Li ser Sîdre û asîman dan girîn

Welê zêde Cibrîlî ket hirqetê
Dikêşit fîxanan li ser firqetê

Resûlî sual kir sebeb ev buka:
- çira hinde ahan dikêşî, çira?

Ji bo wî re go Cibreîl aşîkar:
- Refîqê te nînim, eya şehriyar!



Institut kurde de Paris

- Refaqet ji vir pê ve nakim bi te
Here qurbê Îzed, mûbarek li te! (2)

Resûlî dema goşî kir ev cewab
Li Cibrîlî kir çendî lewm û 'îtab:

- çira gerden ez ulfetem tafit î
çu der suhbetem hem'înan yafit î? (3)

- Li cayê xerîbî ne şertê refîq
Bi tenha bihêlit refîqê şefîq?

- Xerîb û nenas im li ev cayê dûr
Ji hemsuhbeta min mebe, tu sebûr!

- Ne şertê di havalî û suhbetê
Bihêlî refîqî di nav xurbetê

- Ji vir pê ve nazanim ez biçme kû
Ji min başqe bûyî çira zû be zû?

- Ne cayê cuda mandenê yar e ev
Li min reh diraz e ne roj e ne şev

- Bimeş em bi hev ra biçin der 'ula
çira min bi tenha dihêlî, çira?

çu Cibrîlî seh kir kelamê hezîn
'Eceb ahî kêşa û pur da girîn

Kî: -Ey qurretê 'eyn û rûh û rewan
Mi jî arezû suhbet e her zeman

- Dixwazim şeb û rûzê der suhbetê
Vewestim bi çeşman bikim xizmetê

Institut kurde de Paris

- Dikêşim gelek zehmet û îhtîraq
Li qelbê min e hinde daxê fîraq

- Ji hîcrana zatê te qelbim kebîb
Ji fîrqet ketim nar û pêtê 'ecîb

- Ricayê dikim her zeman, her zeman
Ku xizmet bikim ez bi rûh û rewan

- Welê nîne ruxset ji bo Cibreîl
Qedem zêde kit yek qedem der sebîl

- Selamet ji bo te, here hezretê
Ku Mewla bibînî tu der xelwetê

- Ji bo min re nîne bi cuz Sîdre ca
Kerem ke, binih berter ez Sîdre pa

- Kerem ke here hezreta Kibriya
Bi tenha ji Cibrîl û kerrûbiya

- Nema taqetim zêde teyran bikim
Bimeş, da li te çendî seyran bikim

- Eger yek serê mû belendter perem
Furûxê tecellî bisûzit perem

- Ji teşwîşê balê xwe ey muhterem
Nikarim ku teyran bikim yek qedem

- Mebada tecellî perê Cibreîl
Bisûzit, bimînim feqîr û zelîl

- Selamet ji bo te eya serfîraz
Kerem ke bimeş hezreta bêniyaz

Institut kurde de Paris

- Li ser şehperê Mîkeîlê delal
Suwar be here tu bi fexr û kemal

- Welêkin dema tu biçî hezretê
Emanet feramûş nekî ummetê!

Ji bo Cibreîl gotî şahê cîhan:
Kî: -Ey Cibreîla bibêje 'eyan

- Heçî der dilê te hebîtin kelam
'Eriz ke li ber hezretê layenam

- Heçî hacetê te hebit bê guman
Li nik hezretê Heq bikim ez rewan

- çiqas hacetê te hebîtin bibêj
Ku da 'erzî kim ez di hezret dirêj!

Wuha gotê Cibrîlî: -Key şehriyar
Rîca min ev e j'heyyê perwerdîgar:

- Ku ruxset bidit ew di rojê qîyam
Dirêj kim perê xwe li dûzex temam

- Perê xwe dirêj kim ji bo ummetê
Li ser dûzexê da nekin dehşetê

- Biborin li ser narê cehnem selîm
Hifiz bin ji nîran û pêtê cehîm

- Ji vê pê ve hacet nehin min ebed
Ji wî hezretê bêniyaz ê semed!

"Ne'em" gotê Peyxemberê nîkînam
Wîda' kir ji Cibrîl eleyhis'selam



Institut kurde de Paris

Dema xwestî xatir ji Rûh-îl Emîn
Bi zelzel ketin asîman û zemîn

Ji bo giryeyê Cibreîlî ku kir
Girîn kir bi wî re nebat û kevir

Ku perwazî da şehperê Mîkeîl
Li ser Sîdre hêla exê Cibreîl

Wuharenge Mîkalî bir bê hîsab
Heta çûn gihan çend nîqab û hîcab.

Welê zaniye min ji rawî şumar
Ewan perdeyan cumle heftê hezar

Bizan xilzê heryek hîcaba ji wan
Bi tehqîqê pansed sene bê guman

Veborîn ji wan cumle perde w hîcab
Li ber wan sufûfê melek bê hîsab

Hemî xerqê enwarê Mewla temam
'Îbadet dikin ew qu'ûd û qîyam

Li teswîr û hey-at û şiklê 'ecîb
Bi tehlîl û tesbîh û lefzê xerîb

Muhellîl, musebbîh, muqeddis heme
Ji pêş û pesê wan hîcaban heme

Hemî cem'î bûn ser hebîbê bi nûr
Li wan zêde bû keyf û ferh û susûr

Hemûçkan ziyaret kirin şehriyar
Bi dest û piyê Mustefa bê şumar

Institut kurde de Paris

Mûnewwer hemî bûn bi nûra Resûl
Bi can û bi dil cumleşan kir qebûl

Wuha gotiye şahê sedrus'sudûr
Hîcabê me gotî "hemî sade nûr"

Ji wan jî ku borî şehê enbiya
Bi heftê hezar perdeyê dî giha

Wuha gotî şahînşehê esfiya:
"Ewan perdeyan têk hîcabê ddiya"

Bizane xelîzê li her yek hîcab
Bi hejmarê pansed sene ba hîsab

Di wan perdeyan seffê quddûsiyan
'Eded nakitin new'ê însan û can

Bi xeyr ez Xweda kes nizanit sufûf
Ne mîat û elf in, ne elf û ulûf (4)

Musebbeh bi elfazeha rengereng
Bi heybet ji wan tê gelek sewt û deng

Li eşkal û teswîrê pur muxtelif
Ji eczayê şeta bûne mu-telif

Gelek 'izzet û îhtîramê mezin
Vegirtin ji bo şahê însan û cin

Hemî hatin û pê ziyaret kirin
Turabê ni'aleş tîcaret birin

Bi vî terzî perde w hîcabû melek
Vehiştin ji paş ve hebîbî gelek

Institut kurde de Paris

Heta çûn gihan xizneya Mîkeîl
Tijî berf û baran di nava sebîl

Tijî zîpik û kîswet û rizqê xelq
Hezar car li dunya ziyade bi xelq

Ji wê pê ve Mîkalî per daweşand
Di şehper de nebrûyê teyran nemand

Nema ruxseta ku ferater biçit
Mebada pereş cumle sûzende bit

Ji dil Mîkeîlî kêşa çendî ah:
"Ku mam ez ji hemsuhbeta padîşah"

Ku taqet nema şehperê Mîkeîl
Hebîbê Xweda daye dest Isrefîl!

Serafîlî Ehmed bi perwazî bir
Li ser şehperê xwe bi efrazî bir

Gihîştin ufûfê melek bê hîsab
Ji nûr û ziya sed hezaran hîcab

Hemî dest û pê padîşeh bûse dan
Mûhebbet kete qelbê wan cumlekan

Mûferreh bi şahînşehê enbiya
Hemî xakê rû bi nî'alê piya

Ji bê hed selat û ji bê hed selam
Kirin hedye bo şahê 'alîmeqam

Îlahî qewî rûsiyah im, hezîn
Bide xatirê vî Resûlê emîn



Institut kurde de Paris

Feqîr im, gunehkar û jar û neçar
Me nespêrî nefsa me ya hukmîdar

Hîlak bûm ji destê gunahê di xwe
Li ber babê rehmet bikim ahê xwe

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Kawus û Key, yanî Keykawus. Hozanî ev ji bo nikla kêşê û dagirtina qafiyeya xwe wusa nivîsiye. Cimşîd, milûkekî Îranê bû, ku cara pêşî wî meyê (şerab) peyda kiriye. Keykawus jî, neviyê wî ye.
2- Qurb: Nêz, nêzîkayî.
Îzed: Xweda, Yezdan.
3- Mana vê malikê weha ye: Mihemed Pêxember gotiye Cibraîl "Min hogiriya xwe dabû hevaltî û suhbeta te. Îcar bo çi, tu ji min cuda dibî?"
4- Mîat: piraniya "mîet" e, yanî sed (100).
Elf: hezar (1000).
Ûlûf: piraniya "elf" e.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 31

## BENDÊ HADÎ WE SELASÛN
## DER REFTENÊ RESÛL BI KÛRSÎ

Institut kurde de Paris

Şunîdem ez an rawiyê tîzî hûş
Hemî lefzê şêrîn ê zîba bi gûş

Bi teyran Sirafîlî çû hin bi hin
Heta çûn gihan Kursiyê pur mezin.

Ji rawî me seh kir bi neqla ruwat
Digel Sîdret-ul Munteha, kaînat

Eger ferzî bit bîte Kursî hemîn
Wekî yek çiyayê li rûyê zemîn

Lebaleb ji kerrubî û qudsiyan
Hemî "Ayet-ul Kursî" ye zikrê wan

Hebîbî li ser Kursiyê sade nûr
Qedem çun niha bûye keyf û surûr

Li nav sefê kerrubiyan bû heşir
Hemûçkan cenahê xwe kir munteşir

Di nav wan de bû xulxul û şahînat
Li ser rûhê Ehmed hezaran selat

Hemî çûne pêşber şehînşeh melek
Bi îkram û te'zîmê sultan gelek

Bi teşbîhê merkez li nav wan nişest
Furuştan bi dor wî ve girdiş vebest

Bi teşbîhê hale li dora qemer
Vewestan melaîk li Xeyr-îl Beşer

Temamê melek mustemi' bûn qu'ûd
Wekî ku sifendê li şet kin wurûd

Dikin îstîma'a kelamê Resûl
Hebîbî kir axazê lefzê qebûl

Li wan "Ayet-ul Kursî" tefsîr-î kir
Dilê wan bi nutqa xwe te'mîr-î kir

Dema xetm-î kir gotinê pur fesîh
Ewî padîşahê 'ezîz ê melîh

Bi zemzem ketin ev furuşte heme
Di etrafê Kursî de bû demdeme

Ji ber dengê tesbîh û zikrê Kerîm
Tezelzul kete Kursiyê pur 'ezîm

Tecellî ji zatê Xwedayê 'ezîz
Peyapey rewan bûn di Kursî temíz

Melek cumle "Ellahu Ekber" kelam
'Eceb xulxule şubhê roja qiyam

Institut kurde de Paris

Qedem bûse dan şahê bettha zemîn
Mûferreh bi xakê nî'aleş cebîn

Ji nav wan helesta hebîbê Kerîm
Ji bo 'ezma dîdara 'erşê 'ezîm

Teessuf kirin cumle kerrubiya
Li ser hîcra şahînşehê enbiya.

Xwedaya bi heqqê Resûlê xwe kî
Tu Rûhî di mehşer de şermî nekî

'Efû ke gunahê min ê bê qiyas
Ji narê cehennem bike min xelas

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 32

## BENDÊ SANÎ WE SELASÛN DER REFTENÊ RESÛL BI 'ERŞÊ 'EZÎM

Bide saqiya bade der camê Cem
Li ser min berev bûne enwa'ê xem

Kederdar e ev qelbê zar ê hezîn
Bide badeya safî pak ê şêrîn

Ji xumxaneyê bîne çend camê mey
Li min, vî dilê murde ke taze hey

Ji hîcrana dîlber nema min mefer
Ku îlla di meyxaneyê kim meqer

Ku ez bême meyxaneyê nav muxan
Peyapey bide ritlehayê giran

Ji pîrê muxan ruxset e saqiya
Lebalek ke saxer, nema min heya



Institut kurde de Paris

Heya min nemaye ji 'işqa hebîb
Şerab e, şerab e li derdim tebîb

Eger min meni' kî ji şurba mudam
Li min radibit rojê heşr û qiyam

Dema bête coş agirê fîrqetê
Eger ne surahî sukûnê detê

Muheqqeq zemîn û sema herqî kit
Di ateş de 'alem hemî xerqî kit

Bide çendî ritlê giran el eman
Ji ateş xelas ke zemîn, asîman

Mebada evî narê qelbê şewat
Seraser bisûzînitin kaînat

Lehîbsazî bûye heraret di dil
Di nav dil vebûye hezar cerhê kul

Dewa nîne xeyrî kuûsê şerab
Bi xeyr ez meyê nakujit îltîhab

Gelek sal e dûr im ji yarê munîr
Dibarînim ez eşkê al ê xezîr

Tesellî bide ez xubûq û ssubûh
Wegerne, elem bûne Tofanê Nûh

Xerîq im di deryayê van dem'ê al
Herîq im ji hîcrana yara şepal

Bide saxerek wek sefîne bi nûr
Ku ez pê xelas bim ji vê behra kûr

Institut kurde de Paris

Bide badeya tabînak a sefî
Bike ateşê dil hinik muxtefî

Bide badeya wek 'eqîqî rewan
Di dil de ew e her me rûh û rewan

Bizan saqiya xeyrî pîrê moxan
Nehin dilşewatê feqîran eman

Yeqîn dexlê pîrê moxan im temam
Ku min jî hisab kit di sefê xulam

Ku xizmet bikim ez bi can û bi dil
Mucazatê min kafî ye camê mul

çiku min nehin zêr bidim bo şerab
Bikim xizmeta pîrê 'alîcenab

Ku der sayeyê hezreteş dem bi dem
Defi' kim bi şurba mudamî elem

Ku serxweş nebim ez bi cama rehîq
Nikarim nezim kim kelamê deqîq

Me sergermî ke saqiya ez şerab
Ku rabit ji ber min hîcab û nîqab

Dilê min mûnewwer be ez saxerê
Bi hal ez temaşa bikim dîlberê

Li min keşfî bit sirê 'alem temam
Bibînim bi hal yara horî xulam

Temaşa bikim qameta nazîdar
Bi keşf ez bibînim hebîba kubar

Institut kurde de Paris

Ku efxan bidit min hinik muhletê
Şêrîn be dihanim bi vê şerbetê

Bidim destê xwe xameya tîzîrew
Heram kim li ser xwe hinik xwird û xew

Beyan kim di musweddeya rûsiya
Heçî dîtiye serwerê esfiya

Ji bo şa'ir û 'aşiqanê selef
Di 'esra xwe de bim çi zîba xelef

Hesed kin ji min şa'irê ev 'esir
Nehêlim ji bo wan tu 'izz û fexir

Bi şubhê 'elem rabe nav 'alemê
Kelamê ku bêjim ji 'işqa hemê

Li min pur giran bûye hicra nîgar
Di dil de me rexne hene bê şumar

Bi çavan eger carekê dûredûr
Bidîta me ew dîlbera sade nûr

Me bînane nezmê kelamê selîs
Bi her beytekê şubhê durrê nefîs

Welêkin ji firqet me taqet nema
Dumû'an dibarînim ez her dema

Nezim kim heçî şahê her neh tebeq
Bi çavê xwe dîtî li ser 'erşê Heq

Di dil de hene min kelamê delal
Welêkin ji hîcrê zebanê me lal

Institut kurde de Paris

Eger neqsî bêtin kelamê feqîr
Li ser min mebe ey fulan herfegîr

çiku pur birîndarê hîcran im ez
Ji dunya û 'uqba ve nazan im ez

Ku îlla li min fikr e yara şepal
Ji taqet birandim hebîba delal

Bizane ji dunya û 'uqba çunîn
Li min fexr e 'işqa hebîb a şêrîn

Ne 'ilm û 'emel min ne sîm û ne zer
Tenê 'işq e fexra minê bê mefer

Ez im kîmiyager bi sin'et kubar
Me iksîrê e'zzem diye 'işqa yar (1)

Me dil bûte ye, sîne ye kûrenar
Li vî narî neffax e ahîn û zar (2)

Me neffaxê danî di nav kûreyê
Şerare didit zêde ez kûreyê

Di nav kûreyê bûte qizmîşî bû (3)
Ji ber herra wê can çurutmîşî bû

Serapa wekî cemreyek narê geş
Dil û sîne û can Heyûla û leş

Di vî haletî min qelem girte dest
Ji çahê zenexdan me yek reşfe xwest

Li ser min vebû perdehayê 'eceb
Di dil pir bû keyf û surûr û tereb

Institut kurde de Paris

Tu seh ke ji min ey hevalê huzûr
Bibêjim ji bo te çi tiştê di hûr

Wuha gote min rawiyê surşirîn:
Ji Kursî ku rabû hebîbê emîn

Li ser şehperê Îsrafîl bû suwar
Bi perwazî çû Îsrafîlê kubar

Di Kursî de bû 'eynê şîn û girîn
Ji nav wan bi rê ket Resûlê emîn

Cemî'ê furuştanê Kursî heme
Di nav wan de bû şîn û bû zemzeme

Sirafîlî çû ew bi teyran gelek
Li nav rahê dîtin hîcab û melek

Bişaret giha setthê 'erşê 'ezîm
Ku teşrîfê kir şahê Beyt û Hettîm

Li 'erşê Xweda nûrî bû qat bi qat
Ku têtin hebîbê kerîm-us'sîfat

Bi "Bîsmîllah" sultanê 'alî meqam
Li 'erşê mezin da qedem wes'selam.

Ji 'erşê Xweda nîne mestir tu tişt
'Ecaîb mezin 'erşê zîba sirişt

Ne ser lê xuya ye ne bin ey 'ezîz
Ji 'erşê bozurgtir nehin hîçî çîz

Bi cuz Xaliqê heq ê perwerdîgar
Nizanit li 'erşê hîsab û şumar



Institut kurde de Paris

Di tewsîfê 'erşê 'ezîm ê Îlah
Ji bo 'eql û fikr û xired nîne rah

Li wî 'erşê pakîze yê etlesî
Bozurgî nedanistiye qet kesî

Welê her wekî min ji rawî xeber
Bihîstî bi îsnad û neql û eser

Bibêjim li 'erşê hinik wesfetê
Ku mehrûm nemînim ji vê dewletê

Bizan ey 'ezîzim bi wesf û şumar
Li 'erşê mezin pa ye şeşsed hezar

Ji yek pa ye ta an dîger payeyê
Ji salê 'edîde heye mayeê

Ji yek qaîme ta dîger qaîme
Bizan sed hezar sal e ew daîme

Welê der rîwayet heye ixtîlaf
Ji be'zê ruwatan heye bê guzaf

Ku mabeynê du pa ye 'erşê 'ula
Şumarî nizanin tu xelqê Xwuda

Di beynê du pa ye heye der şumar
Ji yaqût û durr belde du sed hezar

Hemî beldeyê pur ji qesr û qusûr
Mûweşşeh, muzeyyen bi enwa'ê nûr

Ji sefê melaîk tijî leb bi leb
Hemî hey-et û şikl û sûret 'eceb

Institut kurde de Paris

Bi tesbîh û zikrê Xwedayî gelek
Dikin zemzeme cumleyî ew melek

Bi zarî li ber babê Mewla mudam
Sufûfê furuştan dikêşin qîyam

Heçî bête cum'e cema'et gelek
Di'ayê bi xufran dikin ew melek

Di nav sefê quddûsiyan şehriyar
Bi çav ket yekî qudsiyê nûrîdar

'Ezîmuş'şikil bû bi hey-etkebîr
Welê maye bê perr, zelîl û feqîr

Nebûn ecnîhe ew melek hîçî hîç
Di nav qudsiyan maye dilpîçî pîç

Dema ew giha nezdê sultan, melek
Bi zarî kete xakîpayeş gelek

Tezelzul zzuhûr kir di xakê qedem
Kî: -Ey şahê Lewlakî, Beyt û Herem

- Şefa'et ke bo min kesê pur webal
Ku Mewla kerem kit li min perr û bal

- Xwedayê kerîmê 'ezîz î qedîr (4)
Birûyande ez new cenahê feqîr

- Ku teyran bikim nav surûş û melek
Temaşa bikim çende çerx û felek

- Ji sinfê furuştan im ez ey Resûl
Ji bê perr û balî, feqîr im, melûl



Institut kurde de Paris

- Ji ecsamê 'ulwî lettîfim eman
Dibit ku bi îhsana şahê zeman

- Luttuf kit li min Xaliqê layezal
Ji nû ve bidit min hinik perr û bal!

Ji Qudsî sual kir şehê ummetê:
- çi hal e? temam bêje min qisetê!

- Der înca çira bê perr î, ey mele?
Me bê perr nedîne melek der felek!

- Bibêje! çira nîne te perr û bal?
Şefa'et ji bo xwe bigêre helal!

Cewab da Furuşte ji bo şehriyar
Li Peyxemberê heq ê perwerdîgar

Kî: -Ey padîşahê xewas û 'ewam
Cenahê me şeşsed hezar bûn temam

- Ji Mewla rîca kir me ba xewf û bîmŞ
Temaşa bikim cumle 'erşê 'ezîm

- Ku ruxset bidit Xaliqê layenam
Murûrê bikim ez di 'erşê temam

- Xweda gote min: "Tu nikarî yeqîn
Li 'erşim temaşa bikî în çunîn"

- Me dîsa rîca kir ji PerwerdîgarŞ
Cenahan bide min tu şeşsed hezar

- Du şeşsed hezar perrê min bû temam
Ji nav sefê cumle melek bûm qîyam

Institut kurde de Paris

- Bi cewlan û teyran ketim bê hîsab
Li dor 'erşê sahibnîqab û hîcab

- Heta xetm-î bû salê pêncî hezar
Temaşa li dor 'erşê Perwerdîgar

- Me pirsî ji wî Xaliqê bê niyaz
Kî: "Ey alimê aşîkara û raz

Di perr de me yarayê cewlan nema
Ji 'erşê çi min qeti' kirye, Xweda?"

- Xîtab amed ez hezretê Kirdîgar:
"Eger perr bidim te du şeşsed hezar

Bi teyran biçî hinde salê dîger
Ji pa ye heta pa ye ey mu'teber

Nikarî bibînî ji 'erşê mezin
Ne rah e ji bo qudsî û îns û cin!"

- Ji paş ev xîtaba şehê layenam
Ji min têk sitendin perrê min temam

- Konûn xakê mî bû semet der qedem
Kî, ey yumnê sultan ê 'alî'elem (5)

- Kerem kit Xweda perr û balê feqîr
Di nav qudsiyan ez nemînim heqîr!

Yekê secde bir şahê bettha zemîn
Ji Mewla rîca kir bi zar û enîn

Ku: "Ya Reb ricayê dikim ez gelek
Ku dîsan bidî bal û perrê Melek!"

Institut kurde de Paris

Xweda gotê: "K-ey serwerê xas û 'am
Li te ew bidit deh selat û selam

Ji nû ez bidim bal û perreş kubar
Wekî şiklê wî dîse şeşsed hezar!"

Mûbarek serê xwe hilanî Resûl
Muferreh ku bû de'weta wî qebûl

Emir kir ji bo ew Melek der zeman
"Du'a min qebûl bû di hezret çunan

Welê lazime deh selat û selam
Bibêjî li ser şahê 'alîmeqam!"

Melek ew zeman deh selatê mezin
Vexwendin li sultanê însan û cin

Di ew dem perrê wî hêşîn kir Xwuda
Ji yumna selatan li şahê huda

Bişaret giha nav melaîk heme
Di nav wan de bû şahî û demdeme

Kî ez yumna şahê zemîn û melek
Vebû babê rehmet li cinsê melek.

Eya Rûhiyê pir gunah ê feqîr
Binêre li qedrê Resûlê kebîr

Li erd û li esman bi yumna Resûl
Dibit tewbeya cumle cinsan qebûl

Metirse ji hinde gunahê mezin
Eya bed'emel, pîstirê îns û cin

Institut kurde de Paris

Bikêşe ji nav hinde dil çendî ah
Li babê Xwedayê xefûr ê îlah

Bibêje "mi tewbe Îlahî temam
Li dergahê te xaliqê layenam"

Ku Mewla nedit te ceza û cefa
Di rojê heşir te bidit Mustefa

Bi yumna selatan Xweda da Melek
Ewan hinde ecnîheyê pur, gelek

Li rûhê Muhemmed hezaran hezar
Bide tu selat û selamê kubar

Dibîtin Xweda te di rojê qiyam
Bidit xatirê van selat û selam.

Bide saqiya abê ateşnîşan
Ku serxweş bibim ez di wext û zeman

Vegêrrim li ser qiseta xameyê
Ku înşa bikim mexseda Nameyê

Ji pes ew bişaret ku ket nav melek
Surûşan bi Ehmed muferreh gelek

Furuştanê 'erşê hemî sef bi sef
Ziyaret kirin şahê sahibşeref

Bi kerrûbiyan cumle ket sewt û deng
Lîsanê muxalif, luxet rengereng

Hemûçkan selat û selam bê qiyas
Vexwendin li ser şahê nûrînlîbas

Institut kurde de Paris

Ku sultan li 'erşan 'elem berfiraşt
Şonîdem kî ne'leyn-î der payê raşt

Henuz fikrê kir şahê 'alî 'elem
Ku ne'lê mûbarek heye der qedem

Edeb kir hebîbî li 'erşê Xweda
Niyet kir ku ne'lan derînit ji pa

Nîda hatê ez hezreta bê niyaz
Kî: "Ey fexrê 'alem, şehê serfîraz

Ji payê meke ne'lê xwe tu cuda
Bi ne'lan kerem ke li 'erşê Xweda

Bi ne'lan kerem ke li 'erşê mezin
Muşerref bi ne'let bibit 'erşê min

Tu ne'lan megêre cuda ey helîm
Bi ne'lê mûşerref ke 'erşê 'ezîm

Ji mêj 'erşî muştaq e ey muhterem
Teberruk bibit ew bi xakê qedem

Bila 'erşê min ne'lîbûsê te bit
Mûşerref bi xakê nî'alê te bit

Xeraman bi ne'lê be ser 'erşê pak
Ku 'erşim bi ne'let bibit 'etrînak!"

Nîda çun kî hate Resûlê Xwuda
Negêrra ji pa ne'lê nazik cuda

Bi ne'lan ve meşya li ser 'erşê Heq
Şehînşahê erdan û heftem tebeq

Gelek fexrê kir 'erş bi jêrê nî'al
Bi xakê qedem 'erşê naz ê delal

Li 'erşê Xweda zêde tesîrî bû
Ji enwarê ne'leynê tenwîrî bû.

Bibîn ey birader tu feddla hebîb
Beyan kim ji bo te kelamek 'ecîbŞ

Ku feddla Resûlê Xweda goşî kî
Hemî fikrê 'alem feramûşî kî

çu Mûsa b'nî 'Îmran sûyê Ttûrê çû
Bi qesda qebes lem'eyê nûrê çû

Bi ne'lê xwe ve çû sûyê kohê Ttûr
Bikit îstîla ew ji tîrêjê nûr

Nîda hatê ez hezreta zatê Reb:
Kî: "Mûsa b'nî 'Îmran edeb ke, edeb!

Nî'alê xwe deyne li Wadî Yemîn
Qedemxwas were Ttûrîseyna bibîn

Ku payê te ez Ttûrîseynayê pak
Mûşerref bibîtin li ser rûyê xak

Mûbarek, mûşerref bibîtin qedem
Li ser Ttûrîseynayê min la cerem!"

Bizane Kelîm ne'lê xwe în çunîn
Ji lingê xwe danî li Wadî Yemîn

Bi xwasî meşî Ttûrîseyna Kelîm
Bi emrê Xwedayê 'ezîz ê kerîm

Institut Kurde de Paris

Nikarî bi ne'lan biçit ew ebed
Neda ruxseta wî Xwedayê semed

Welêkin nehêla ku sultanê dîn
Li 'erşan cuda kit nî'alê şêrîn

Ku da 'erşê Rehman tedarek bibit
Bi ne'lê Resûlî mûbarek bibit

Binêrin li fezla Resûlê emîn
Kî Mûsa çunan bûd, û sultan çunîn?

çira em ditirsin ji mewca gunah?
Şefî'ê me ye ev hebîbê Îlah!

Bi vê rutbe û cahê pur îhtîşam
Ku pişta me ye şahê 'alîmeqam

Giha merteb û pur meqamê belend
Ji wî jêr de ma enbiya çende çend

Şefa'et ji bo ummeta pur gunah
Li wî qesdê bû çû di Mî'racê rah

Xweda ew mezin kir li ser kaînat
Li ser rûhê wî sed hezaran selat

Me destê xwe da damenê Mustefa
Şefa'et bikit ew di rojê ceza

Gelek fexrîdar im bi zatê mezin
Ewî padîşahê hemî îns û cin

Şefa'et bikit Rûhiyê dilbiderd
Evê pur gunehkarê ruxzerdê zerd

Institut Kurde de Paris

Ji bo Şemsiddîn ew di rojê qîyam
Şefa'et bikit Ehmedê nîkînam

Çira Ebdurrehman ditirsî çunan?
Tu yî ummeta fexrê herdu cîhan!

Xweda te di ew rojê heşr û qîyam
Bibexşit şefî'ê Resûlê enam

Xwedaya 'emel min nehin hîçî hîç
Mu'ezzeb nekî min di rojê besîc

Me tehqîqî zanî ji rawî kelam
Evan lefz û asar û neqlê temam

Ku şahê cîhan padîşahê qewî
Li ser setthê 'erşê ku bû mustewî

Temaşa dema kir li erkanê 'erş
Bi çav dîtî qendîlekê nûrî, geş

Çi qendîleke rengîdar û bi nûr
Gelek berqê nûrîn dibin jê zuhûr

Mu'elleq bi yek silsilê nûrîdar
Muweşşeh, mûzeyyen, mûnewwer, kubar

Ji enwarê qendîla pak î temîz
Seraser mûnewwer wî 'erşê 'ezîz

Sual kir Muhemmed ji wî Îsrefîl
Kî: -Ey yarê rahim di 'erşê Celîl

- Çi qendîl e ev cama nûrîn 'eyan
Mu'elleq bi zencîrê nûrîn çunan?

Institut kurde de Paris

- çira hinde pur nûr e ev cama pak
Ku jê 'erşî bû rewşen û tabînak?

Cewab da kî: -Ey padîşahê rusul
Bizane evê cama nûrîn çu gul

- Cih û meskenê nûra te ey 'ezîz
Bi tehqîqê ew cama pak î temîz

- Berî xelqeta 'alemê pur sinîn
Di qendîlê de nûra şahê emîn

- Bi tesbîhê Mewla dikir îştîxal
Mûqîm jê dibû berqê nûr îştî'al

- Ji tesîra wê hemnişînê kerîm
Heman nûrîdar bûye camê 'ezîm!

Ji be'zê ruwatan mi zanî eser
Ku rûhê ewî Ehmedê ba xeber

Dema munfessil bit ji cismê 'ezîz
Dê bit musteqir ew di camê temîz

Welê be'zê kubarê sahibhuner
Dibin munkirê ev xeber serteser

Dibêjin "Bi rûh û cesed ve temam
Mûqîm e di qebrê, Resûlê enam!

çiku întîzar e ji bo ummetê
Di qebrê muqîm e heta sa'etê

Ku rabit ji qebrê hebîbê kubar
Xelas kit gunehkarê ummet ji nar

Institut kurde de Paris

Ku bigrit di jêrê lîwaya mezin
Hemûçkan ewî şahê însan û cin

Bi hev re biçin hezreta Kirdîgar
Ku têkde şefa'et bikit wan ji nar!"

Welê muznibê Rûhiyê musteham
Evî qewlê sanî bizane temam

çira? çunkî pir sûc û zenb im, zemîm
Nikarim biçim pêş Xwedayê kerîm

Meger pêşrewê min feqîrê hezîn
Muhemmed bitin ew Resûlê emîn

Ji rawî mi zanî bi neqla sutûr
Qemer mîsitaned zi xurşêdê nûr

Heman şemsê 'alem ji 'erşê muhab
Dikêşit hemî berq û enwar û tab

Welê 'erşê Mewla ji qendîla cam
Muzeyyen bi emwa'ê nûr e temam

Heman cismê qendîla pakî qebûl
Mûnewwer ji nûra Muhemmed Resûl

'Eyan bû ku serçeşmeyê nûrîha
Bi yekser ji nûra ruxê Mustefa

Dîger kir temaşa li 'erşê muhîb
Bi çav dî xorosek muneqqeş 'ecîb

Heçî lewn û rengê Xweda çêkirî
Li ser yek perrê wî muheyya kirî

Institut kurde de Paris

Mûresse' bi enwa'ê yaqût û durr
Mukellel bi cewher bi lûlûyê pur

Ewî dîkê sahibniqûş ê delal
Mûnewwer bi nûra şehê zilcelal

Mûqîm e li ser yek mînare belend
Li ser 'erşê Mewla ewî bê gezend

Bi xilqet 'ezîm e qewî ew xoros
Ji wî têtî dengê ezan şubhê kos

Dema ew bixwûnit ezanê li 'erş
Dikit hukmê sewta wî ta jêrê ferş

Ku bêtin ji wî sewt û dengê mezin
Heçî qismê dîka li erdan hebin

Dixwînin ewan cumle azan temam
Di wextê sehergeh û der subh û şam

Wuha gotî goyendeyê 'erş û ferş:
- Xweda navê wî daniye "Dîkê 'Erş"

Me seh kir ji rawî bi asarê saf
Ewî naqilî nikte dan bê xîlaf:

"Xweda çun wucûd kir ji kenza 'edem
Ewî 'erşê zîba yê pur muhteşem

Bozurgtir ji xwe qet nedî hîçî çîz
Bi xwe îftîxar kir wî 'erşê 'ezîz

(Bi vê 'izzma sûret, bi vê hey-etê
Ji min nîne mestir di xilqîyyetê)"

Institut kurde de Paris

Dema îftîxar kir bi teswîrê xwe
'Eceb ma ji enwar û tesîrê xwe

Xweda xelqî kir marekî pir muhîb
Li xelqîyet û sûretê pir 'ecîb

Evî marî hinde bi hukm û eser
Wucûd kir Xweda ew ji yek pare zer

Serê wî bi hijmarê seb'în e elf
Di her yek serî çêkirin hinde dev

Di heryek femî el sine şêst hezar
Bi van el sinan têkde tesbîhîdar

Ji xeyrî Xwedayê ku ew xelqî kir
Kesî xilzzê ew marî te'rîf nekir

Xelek da li dor 'erşê Heq heftê car
Serê wî li ser dûvê wî bû qerar

Ji bo 'erşî re go bi nutq û beyan:
"Wekî luqmeyek te bixim bin ziman?"

Ku'erşê Xweda dî li dor xwe helek
Ji wê fexra xwe bû peşîman gelek

Yekê qitre baran ji ebrê çekîd (6)
Xecilşud çû penhayê der ba bedîd

Gelek tewbe kir 'erşê zîba nihad
Li ber dergehê wî Xwedayê 'îbad

Kî: -Ey Reb, peşîman im ez îftîxar
Ji sûcê xwe min tewbe ye sed hezar

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·
Institut kurde de Paris

- Mûqîrr im bi hukmê te ey zelcelal
Xwedanqudret î, bê şerîk û heval!

Bi vê qudreta pir eya Kirdîgar
'Efû ke evî Rûhiyê zenbîdar

Bide xatirê wî Resûlê bi heq
Ku birye ji cumle resûlan sebeq

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

---

1- "Iksîr" navê dermanekî ye, ku zêrê xam safî dike.

2- "Me dil bûte ye" dilê me ew firaq e, ku zêr tê de tê helandin.

3- "Qizmîş" bêjeyeke Tirkî ye. Rastiya bêjeyê "kizmiş" e, bi mana qelandin û qijilandin e. "çurutmîş" jî Tirkî ye. Rastiya wê "çurutmuş" e, bi mana rizî û petiyayî ye.

4- Mana vê nivmalikê weha ye: Da ku ji nû ve perrên min feqîrî şîn bike.

5- Konûn: vêgav, evçax, niha.

Xak: xwelî, ax. Lê di malikê de bi mana "bêbiha", "wenda" û "jar" jî tê.

Semet, bi mana lirêçûna biguman bi aliyê tiştekî ve ye.

Yumn: bereket, zêdayî, alîkarî.

6- Ev malik di çapa Amedî de weha ye:

"Yekê qitre baran zi ebrê çikîd
Xecilşud çû pehnayê derya bedîd"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 33

## (1)
## BENDÊ SALIS WE SELASÛN
## DER NIŞESTENÊ RESÛLÊ XWEDA
## BER REFREFÊ TÎZREW WE TEŞRÎF
## BÛRDEN
## BI CAYÊ KÎ CAY NEBÛD
## YANÎ MEQAMÊ LAMEKAN

Institut kurde de Paris

Were saqî em taze kin 'işretê
Bi hukmê meyê zêde kin dehşetê

Li ser min giran bûne dîsan elem
Bi eqdahê mey def'î ke barê xem

Bide badeya taze ya xweşguwar
Ku ehşayê min key bikit şubhê nar

Were saqiya da ji bo badeyê
Bidim te evê xerqe û sebheyê

Lebaleb ke wextê xubûqê qedeh
Vebin min li dil dîse babê fereh

Ji min kêm meke şerbeta badeyê
Neşim hemlê kim barê seccadeyê

Me seccade û xerqe û teylesan
Kirin rehnê bade di dêrê moxan

Ne 'eql û xired min ne mal û meta'
Li min fikre ev badeya pur şu'a'

Hezîn im ji hîcrana yara şepal
Şikeste dilê min ne qîl û ne qal

Bide kaseyê pur şeraba 'etîq
Bi hukmê meyê bit zebanim fetîq

Birêjim ji hukmê qedeh çend kelam
Bi şubhê 'elem rabe nav xas û 'am

Bide saqiya abê ateşxîsal
Futûh bit li ser dil me babê kemal

Lehîbsaz e der dil evî narê xem
Bike muntefî tu bi yek camê Cem

Bide badeyê, xem bibit muxtefî
Hinik narê hesret bibit muntefî

Were saqiya rastî bê tab im ez
Qewî xemzede bê xwir û xwab im ez

Institut kurde de Paris

Bide camê da îstîrahet bikim
Bi dil ez li 'alem siyahet bikim

Hela qet neşim carekê der xiyal
Deraxûşî kim dîlbera pur şepal

Şêrîn be dihanim ji cama şerab
Xiyal kim demek yara 'alîcenab

Ku wenda bikim cumle fikrê cîhan
Li ber min vebî perdeya Lamekan

Bibêjim ji nêv hindî qelbê hezîn
Hinik şi'r û ebyatê pak ê şêrîn

Tu zewqa me pur ke bi cama mudam
Ku zeqwa te pur kim ji şi'r û kelam

Bide saqiya mey ku perwazî kim
Tu guh de ku şi'rê 'eceb sazî kim

Nezim kim kelamê nefîs ê çu durr
Eger tu bidî min hinik camê pur

Me serxweş ke ey saqiyê bezma yar
Xefîf ke hinik derdê 'işqa xedar

Evê 'işqa ateşmîsal î şewat
Ji min qetî' kir cumle îsmê heyat

Bide saqiya badeya pur futûh
Di cismê me dîsan bike nefxê rûh

Heyatek li min bexşî ke tu be nû
Ku sergermî bim ez ji îhsana tu

Institut kurde de Paris

Bidim destê xwe xameya pur xeber
Birêjim dema wê çu xwûna heder

Mufessel bikim xelweta Lamekan
Heçî min bihîstî, bibêjim 'eyan

Kerem ke were saqiya bê fitûr
Lebaleb ke camê şeraba bi nûr

Bide min ku qelbê xwe pê key bikim
Evî cismê bê can bi wê hey bikim

Dihanim şêrîn be bi vê şerbetê
Li bezma kelamê bikim xizmetê

Bi quwet bikêşim serê xwe şerab
Nezim kim bi elfazê şêrîn kîtab

Ji rawî neqil kim kelamê 'ecîb
Heçî bûye îhsan li zatê hebîb:

Ku hindek 'ecaîb li 'erşê mezin
Bi çav ket Muhemmed şehê îns û cin

Emir kir ji bo Îsrefîlê kubar
Ewî Mustefayê qewî ixtîyar:

- Were Îsrefîla biçin em li rah
Biborin ji vî 'erşê pak ê Îlah!

Cewab da Sirafîlî bo Mustefa
Kî: -Ey padîşahê serîr ê wefa

- Nema neyruwê perrê min bême jor
Kerem ke ji 'erşê Xweda tu bibor

Institut kurde de Paris

- Ferater ji 'erşê nehin ruxsetim
Li vir mam, di perr de nema taqetim!

Resûlê Xweda ma melûl û hezîn:
- çira min bi tenha dihêlî çunîn?

- Biçim kê derê ey exê Israfîl?
Mehêle bi tenha li rah û sebîl!

- Ne hemcinsê min, ne heval û bira!
Ji hemrahiyê min dimînî, çira?

Sirafîlî gotê: -Eya ba xeber
Dikim xizmeta te bi çeşm û bi ser

- Welêkin bi zatê Xweda min qesem
Nikarim bi pêş de biçim yek qedem

- Ji ber şûleya nûra zatê Celîl
Disûzit seraser perrê Isrefîl!

Teheyyur gelek ma Resûlê 'ezîz
Nizanî biçit kû ji 'erşê temîz

Xweda xelq-î kir ew nefes refrefek
Bi qudret ji nûrê gerrand eşrefek

Ewê Refrefa ku bi nîşan bûyî
Bi xilqet li ser şiklê teyran bûyî

Li ser hey-et û şiklê murx û sefîd
Xweda çêkir ew Refrefa muste'îd

Dibêjin hinik rawiyê qiseyê:
"Ku ew Refrefa, şubhê seccadeyê

Institut Kurde de Paris

Bi teşbîhê seccadeya sade nûr
Wucûd kir Xweda Refrefa bê qusûr"

Welêkin ji be'zê ruwatan bizan
Ku ew Refrefa şubhê textê rewan

çu texterewanek mukellel delal
Ji nûrê wucûd kir şehê bê zewal

Welêkin ne meqsûd e ev ixtîlaf
Ne lazim dirêj kim kelamê şîfaf

Xwedayê ku ew xelq-î kir ew zeman
'Elîmtir bi hey-et bi sûret çunan

Muheqqeq Xweda xelq-î kir der huzûr
Ewê Refrefa tîzîrew bê futûr

Heta wê demê nehtibû xilqetê
Xweda yî wucûd kir di wê saetê

Welê em nizanin beyan kim kelam
Di şiklê ewê Refrefê bît'temam

Welê meyla min evqeder pê heye
Ku ew Refrefa, şubhê secade ye

Me'elqise, ew Ehmedê namîdar
Bi emrê Xweda bû li Refref suwar

Ssu'ûd kir ji 'erşê bi qesda huzûr
Muhemmed li ser Refrefa sade nûr

Li 'erşê Xweda zêde bû îştîyaq
Girînek 'eceb kir ji ber îftîraq

Institut kurde de Paris

Tezelzul kete cîsmê 'erşê 'ezîm
Qedem jê hilanê Resûlê kerîm

Serafîl û cumle melek tev girîn
Ji ber fîrqeta wî hemî bûn hezîn

Bi perwazî çû Refrefa nazîdar
Suwar e li wê padîşahê kubar

Bi yek "Turfet-îl 'eyn"î salê 'edîd
Dikir qet'î ew Refrefa muste'îd

Hezaran merahil di yek terfeyê
Diborin bi perwazê seccadeyê

Gelek perdeha û nîqab û hîcab
Vehêlan bi paş de ewê bê hîsab

Li ber her hîcabek melek bê 'eded
Vewestan bi emrê Xwedayê semed

Ewan rûhê qudsî bi hev re temam
Qedem bûse dan şahê Beyt û Meqam

Ji wan çendî perdan ku borî hebîb
Giha çend bîharê kebîr û 'ecîb

Hinik surx û hin kesk û hindek beyaz
Ser û bin ne me'lûm e, dûr in, diraz

Bizurgê li wan behr û deryayê kûr
Nizanin çi kes xeyrî Rebê xefûr

Hinik Behrê Qudret, hinik Me'rîfet
Hinik behr û deryayê pur Merhemet

Institut kurde de Paris

Ttewîl in 'erîz in 'emîq in gelek
Welê xalî ez cumle îns û melek

Me'elqise, sultanê herdu cîhan
Bi Refref giha perdeya Lamekan

Li wê perdeyek bû muresse' bi durr
Bi yaqût û elmas û ecnasê pur

Ji nûr bû ewê perdeya pur kebîr
Bizurgî dizane semî'ê besîr

Welêkin li wê lewn û rengek nebû
Li ber perdeyê sewt û dengek nebû

Ne însan ne cin ne melek ne perî
Nebûn hîçî nik perdeya enwerî

Bi emrê Xweda ew hîcaba 'ezîm
Hilat ew ji ber Mustefayê kerîm

Duxûl bû Muhemmed werayê hîcab
Bi "Bîsmîllah" ew şahê nûrînnîqab

Di paş perdeyê de fedda Lamekan
'Eyan bû li ber çeşmê şahê cîhan!

çi ye Lamekan? ez bibêjim delal
Di te'rîfa wê de zebanê me lal

Cihê ku ne cî bit, çisan ez kelam
Bibêjim di tewsîfa wê de temam?

Welêkin qeder taqeta şa'irî
Beyan kim kelamê ku min seh kirî

Institut kurde de Paris

Wuha gotî wî şahê 'alîcenab:
- Dema ez duxûl bûm werayê Hîcab

- Mekanek mi dî ku mekan tê nebû
Meh û sal û hîn û zeman tê nebû

- Ne sar e, ne germ e, ne rûz e, ne şeb
Ne jêr e, ne jor e, ne rast e, ne çep

- Ne erd û ne esman, ne paş û ne pêş
Ne tarî, ne ronî, ne qews û ne xwêş

- Ne yekşenbe ye, ne duşenbe çunan
Ne sêşenbe, ne çarişenbe bizan

- Ne pencşenbe ye hem ne cum'e yeqîn
Ne sebt e, ne mah e, ne sal e çunîn

- Ne kesk e, ne sor e, ne zerd e, ne reş
Munezzeh ji rengan, ne xill e, ne xeş

- Ne şîn û sufîde, ne sewt e, ne deng!
Wuha tu bizan xalî ez cumle reng

Bi vî terzî ye Lamekan, la mekan
Teheyyur di wî de 'uqûlê giran

Eger tê de peyda buya yek ji van
çira navê wê em dibên "Lamekan"?

Li tehqîqa wê em binêrin yeqîn
Dê bit hîre lê aqilê dûrebîn

Nîhayet Xweda zane tehqîqa wê
Ne qenc e bikin zêde tedqîqa wê

Institut kurde de Paris

Bi cuz Rebê Ekber nehin hîçî kes
Li ew der ne mislê ttenîna meges

Ne hedd e ji bo hîçî îns û melek
Ku bên wê derê, qet meke reyb û şek

Welê ruxset e bo Resûlê cîhan
Ku hazir bitin xelweta Lamekan

Ku der xelweta Xaliqê layenam
Bibêje ji bo wî re sirr û kelam

Nebit hîçî kes hazirê suhbetê
Ku sirran birêjin di nav xelwetê

çiku 'adetê mehbeta dositan
Ev e der cemî'ê mekan û zeman

Ku meclis ji exyarê xalî bitin
Henuz suhbeta wan kemalî bitin

Nihayet li rûh û cesed bû hulûl
Ewî padîşahê bi 'izz û qebûl

Bi rûh û cesed ve şehê îns û can
Muheqqeq giha xelweta Lamekan

Nebî haşe munkir ji bo ev kelam
Nebêjî ku "Ehmed dî ye der menam"

çiku be'zê munkir dibêjin çunan:
"Muhemmed bi xewnê çûye Lamekan"

Welêkin muheqqeq bizane çunîn
Şiyarî çûye Lamekanê yeqîn

Institut kurde de Paris

Ne xewn û xiyal e, sehîh e, sehîh
Bi yeqze çûye Lamekan ew melîh

Hinik munkirê dî dibêjin wuha:
"Ku bû munselix rûhê wî bê riya

Ne tevlî cesed, belkî tenha bi rûh
Giha Lamekan" Ehmedê ba futûh

Welêkin betal in evan cumleşan
Yeqîn ke ku sultanê herdu cîhan

Bi rûh û cesed ve giha xelwetê
Muheqqeq bizane tu xasiyetê.

çira? çunkî eqwalê van munkiran
Evan nakesanê bi cehla giran

Li ser gotinê feylesûfan bîna
Dikin van kelamê bi cehl û 'îna

Dibêjin "Mehal e bi rûh û cesed
Biçit asîmanan" hebîbê Semed

Li ser ze'mê wan, çunkîŞ cismê giran
Nikarin qîyame biçin asîman!

Heçî cismê siqle ku tê de heye
Muqîm talibê merkez û nuqte ye

çisan dê biçit ber hewa ey fulan?
Mehal e li nik ze'mê wan cahilan!

Were seh ke ey munkirê bê edeb
Ji Rûhî cewabek bi keyf û tereb

Institut kurde de Paris

Bibêjim cewabek 'ezîz û delal
Ku ezmanê têk munkiran bîte lal

Bi 'eqlî, bi neqlê, bi fexr û bi naz
Bikim def'ê van cumleyê î'tîraz

Bi 'eqlî dibêjim evê gotinê
Heçî mustemi' bin bi can guh dinê

Eger çi di hikmet heye bî xefa
Ku cîsmê seqîl naçe jor û hewa

Welêkin bi tteb'ê xwe cismê seqîl
Nikarin biçit ber hewa bîd'delîl

Heçî feylesûfî, nikarin 'eyan
Bibin munkirê qisriyê bê guman

Teherruk bi qisrî heye nik hekîm
Nikarin xefî kin vî eslê 'emîm

Dibêjin: "Eger çî Resûlê Xweda
Bi tteb'ê xwe naçit bi sûyê hewa

Welê qudreta Xaliqê bê heval
Bi qisrî kişand bir semayan delal

Neçûye bi tteb'ê xwe ta Lamekan
Xweda ew bire wan dera bê guman

Wekî yek hecer merdê sahib quwa
Bi quwwet hilavêjitin ber hewa

Teherruk dikit ew hecer bê elem
Bi qisrî bi sûyê hewa lacerem!"

Institut Kurde de Paris

Qiyas ke 'urûca şehê ba xeber
Bi emrê Xweda hem li cismê hecer

Çira dê mehal bit 'urûca Resûl
Bi rûh û cesed ve bi hukmê 'uqûl?

Welê ger bi neqlê bibêjim cewab
Di îsbata Mi'raca 'alîcenab:

Dibêjim ku ew Xaliq-il 'alemîn
Li ser mimkînatan qedîr e yeqîn

Heçî şey-ê mumkin bitin der wucûd
Bi wî qadir e padîşahê Wedûd

Ji bo wî nehin hîçî mani' ebed
Ku ef'alê wî men'î kin bê 'eded

Heçî şey-ê Mewla îrade bikit
Ku mumkin bitin mutleqa dê bibit

Nehin mumteni' ev 'urûca Resûl
Bi wê qudreta pur Xweda kir wusûl

Ji xeyrî Xweda û şerîkê Xweda
Bizan mumkin e cumleyê masîwa

'Ûrûc jî ku bû ferdekî mumkînat
Bi wê qudreta Xaliqê kaînat

Ji Ke'ba muşerref bi rûh û cesed
Heta Lamekan çû bi emrê Semed

Ku îsbatî bû ev bi neql û 'eqil
Bikin dîse ez qisseya xwe neqil.

Institut kurde de Paris

Binoşim şerabek ji destê nîgar
Nezim kim gelek beytê bê ixtîyar

Hinik xem li ser min sivik bin bi cam
Ji ehwalê Ehmed bibêjim kelam:

Ku çû xelweta Lamekan ew hebîb
Xwe zanî di wê 'alemê de xerîb

Li etraf-ê fikrî, çi kes wî nedî
Seraser bûye xerqê şerm û fedî

Li wî hinde şerm û fedî bû 'eyan
Heman bûye xerqê 'ereq ew zeman

Li wî zêde bû hinde şerm û heya
Nekir ferqê ser ew nefes wî ji pa

Zeban lal-î bû ew zeman der huzûr
Li wî zêde bûn sed hezaran futûr

Ehed hat û Ehmed ji xwe mehwî bû
Ji xewf û heya, dehş û bêsehwî bû

Ehed hat û Ehmed li meydan nema
çu perwaneya şem'ê efxan nema (2)

Ji Ehmed "Ehed" ma û rabûye "m"îm
Li wê "m"îmê bûbû hîcabek 'ezîm

çu ew perde rabû bi emrê Semed
Ji Ehmed "Ehed" ma, "Ehed" her Ehed

Di vê gotinê qet nekî reyb û şek
Di wê mehwî bû ew zeman maye yek

Institut kurde de Paris

Muhemmed çu bû xerqê nûrê çunan
Ne 'eql û xired ma, ne nutq û zeban

Di behra teheyyur gelek xewtte da
Ji xewf û heya 'eql û daniş nema

Di wê mewzi'ê ku ne "heyse" ne "eyn"
Ne ca û mekan e, ne cewher, ne 'eyn

Ewî Mustefayê bi 'izz û qebûl
Demek bê zeban ma, û lal û melûl

Ku bû munqetti' ew ji hissan heme
Bi dûr ket ji mecmû'ê însan heme

Li wî wehşetek peyde bû nagîhan
Di xewf û di wehşet de ma bê zeban

Di wî haletî de Resûlê bi nûr
Bihîstî bi goşê xwe dengek ji dûr

Welêkin ji dengê Ebî Bekrê yar
Wuha hate goşê hebîbê kubar

Kî: "Qif ya Muhemmed" Xwedayê 'ezîz
Dibêjit ji bo xwe selatek temîz

Kî: "Subhane, subhane zatê mezin
Sebiq ye li ser qehra min, rehma min"

Ji paş ev sselata 'ezîzê delal
Ku bîz'zatî xwend Xaliqê zulcelal

Wuha go Xweda bo Resûlê bi heq:
"Were udnû mînnî eya xeyrê xelq!"

Institut kurde de Paris

Bi nêzîkê wî ve meşî Mustefa
Şehê textê mesnedgehê îssttîfa

Mûqîm gote wî "Ûdnû mînnî" temam
Heta çû giha Xaliqê layenam

Wekî hate gotin di Qur'an weha:
"Bi qabê du qewsan giha nik Xweda"

Bi qasê meyanê du burwan yeqîn
Giha nik Xweda ew Resûlê emîn

Welêkin me seh kir ji rawî kelam:
Ku bêkeyfî bû ew wussûla temam

Neşim ez li vê der bikim dîqqetê
Beyan kim kelamê di vê wessletê

Ne ba alet û 'ind û heys û mekan
Giha nik Xweda şahê herdu cîhan

Xweda gotî bo şahê vê ummetê:
"Fetih ke dihanê xwe vê saetê"

Hebîbê Xweda yê bi 'izz û bi naz
Xumûdd kir 'uyûn û dihanê xwe baz

Yekî qitre qetrî ji lutfa xefî
Wuqû' bû di femmê Nebiyê sefî

Ji berfê gelek serdîtir bû yeqîn
Ji şekker bi çend merteba bû şêrîn

Dema kefte femmê Resûlê bi nûr
Ewê qitre ez behrê lutfa Xefûr

Institut kurde de Paris

Ji wî mehwî bû cumle xewf û heya
Ne wehşet, ne dehşet ebed wî nema

Wuha lezzetek da dihanê şêrîn
Ku kefte tereb rûhê Seyîd yeqîn

Bizane 'ulûmê ewil, axiran
Ji îns û melaîk ji peyxemberan

We hem cumle 'ilmê ku mexzûn bûyî
Heta wê demê nik wî meknûn bûyî

Hemî dane Ehmed di wê saetê
Ku kefte dihen nuqteya qudretê

Dirêj kir yedê qudreta xwe Xweda
Niha nav milê seyidê pêşîwa

Wuha gotî wî muqtedayê 'îbad
Kî: "Ehsen te berd-el yedî fîl fuad"

Vebû nuqtê şêrîn li sultanê dîn
Rijandin kelamê çu durr ê semîn

Ji ewel ve durrê "Tehîyyat"ê soft
Bi îlhama Heq wî "Tehîyyat"ê got

Heta wî temam kir Tehîyyatê xwe
Xweda pes li wî kir hedîyatê xwe

Bi gofta "Selamun 'Eleyk ey Nebî
Ji vê hezreta min neyî ecnebî"

Resûlî ku dî ev selama Xwuda
Li ser wî xelatek qewî bê buha

Institut kurde de Paris

'Ûmûm kir, neku xasî bit ev selam
Bi vî terzî kir 'erzê hezret kelam:

"Li ser min bitin ev selama semîn
Û hem ser 'îbadê te yê salihîn"

Ji paş ev selam û kelamê kubar
Bi çavê serê xwe Xweda dî du car!

Ev e î'tîqada me îslamiyanŞ
Resûlê Xweda dî bi çavan 'eyan

Bi zahir, bi yeqze, bi rûh û cesed
Bi çav dî Muhemmed Xwedayê semed.

Welê be'zê mezheb heye bê essil
Ku "Ev dîtina wî, bi qelb û bi dil"

Welêkin mûheqqeq li nik ehlê heq:
"Bi çav dîtiye Xaliqê cumle xelq

Eger çend bi çavan Xweda dîtiye
Welêkin heqîqet nizanî çi ye!"

Ji ewpaş Muhemmed Resûlê 'ezîz
Dihen fethî kir wî bi medhê temîz

Kî: "Ey padîşahê bi qudretkebîr
Xenî ez heşem w-ez wezîr û debîr

Heçî şukr û hemd û sipasî hene
Hemî layiqê zatê pak ê te ne

Tu şahînşehê muttleq î ser şehan
Tu yî xaliqê têk bizurg û kuhan

Institut kurde de Paris

Bi nisbet wucûda te cumle 'edîm
Hemî xurd û esxer, tu şahê 'ezzîm

Ji bo cumle 'alem tu yî rehnumûn
Te 'alem wucûd kir bi yek "kaf û nûn"

Xwedanhukmê muttleq tu yî ey Xweda
Li nik te, mulûk û şehînşeh geda

Tu yî wacibê şahê textê qidem
Sîwayê te yeksan wucûd û 'edem

Eger cumle 'alem nebin der wucûd
Yekî zerre kem nakin ez hest û bûd

We ger sed hezar 'alemê dî temam
Wucûd kî tu ey Xaliqê layenam

Yekî zerre mulkê te nakin zîyad
Tu xellaq û rezzaqê cumle 'îbad!"

Xwedayî bi wî re ku tekrîmê kir
Bi teşrîfa "Lewlake" te'zzîmê kir

Wuha gotî bo Ehmedê muhteşem
Kî: "Lewlake, lewlake ey muhterem

Netînan wucûdê me 'erş û sema
Digel kursî û Sîdret-îl Munteha

Hemî îns û cin û melek serteser
Ji bo te me xelqandin ey mu'teber

Eger tu nebûya, me lewh û qelem
Netînan wucûdê ji kenza 'edem

Institut kurde de Paris

Bihişt û cehennem me anîn wucûd
Bi vê qudretê min kerîmê Wedûd

Ku etba'ê te kim di cennet muqîm
Bidim duşmenê te 'ezabê elîm

Me hinde wucûd kir evî xelqê pur
Ssedef têk ji bo te, di nav de tu durr

Tu yî meqseda min ji cumle wucûd
Tu yî 'illetê xaîle-z hest û bûd

Li ser enbiya û rusul cumleşan
Tu şahînşehê muttleq î ba nîşan

Ji nûra cemala te xurşîd û meh
Bi ddew û bi nûr in eya padîşeh

Ji bo min şukur ke bi cehr û nîhan
Me tu ixtîyar kir ji herdu cîhan

Melek der felek newbedarê te ne
Bi canê xwe xizmetguzarê te ne

Hemî enbiya û resûlê berî
Ku bûn layiqê taca peyxemberî

Ji asarê nûra te ew bûn bi nûr
Li ser wan vebû babê feth û surûr

Evê hinde 'izzet ku min daye te
Neda min ji bo hîçî kes pêşê te

Heta înqîradd bête dewra zeman
Nedîm hinde 'izzet çi kes der cîhan

Institut kurde de Paris

Li dîwana min pur li pêş î, eya
Hebîbim Muhemmed şehê bê riya

Heçî tabi'ê te di heşr û qîyam
Gelek rûsipî ne, eya nîkînam

Tu peyxemberê heqq î bê reyb û şek
Tu  sultanê peyxemberan têk yezek

Me Mûsa bire Ttûrîseyna 'eyan
Welê Ttûrê te, mesneda Lamekan

Yeqîn ke hemî enbiya û rusul
Bi feddla te bû de'weta wan qebûl

Bi cahê te wan kir tewessul yeqîn
Du'a wan dihezret qebûl bû çunîn!"

Xwedaya bi cahê Resûlê kebîr
'Efû kî ji Rûhî xetayê xetîr

Setir ke gunahim bi setra cemîl
Bi xefrîne min mucrimî ey Celîl

Şefa'et bike qismetim ey Xweda
Di wê rûzê dildoz ê heşr û ceza

Bi vî xibsê ef'al û xulqê zemîm
Dizanim beî'd im ji baxê neî'm

Bi ev rûsiyahî û zenbê giran
Heqîq im ji bo narê dûzex 'eyan

Me defter gelek reş kirin ah û wah!
Ji van xibsê ef'al û zenb û gunah

Institut kurde de Paris

Digel van gunahê min ê bê 'eded
Di dest min nema hîçî huccet ebed

Nuha ez dizanim cihê xwe yeqîn
Di nav narê dûzex 'ezabê muhîn

Welê hêviya min Muhemmed Resûl
Şefa'et bibit der heqê min qebûl

Ewî zatê pur muhterem bê guman
Ku çû nik Xweda xelweta Lamekan

çi nuqsan dibit der meqamê ewî
Şefa'et bikit Rûhiyê Axtepî?

Xelas kit ji çenkê 'ezabê Îlah
Minê bed'emel, mucrimê rûsiyah

Eger çi gunehkar û zar im melûl
Yekî kelbê zar im li babê Resûl

Bide îstîxwanek ji xwanê kerem
Ji bo vî seyê muntezir, pur elem

Ûmîd e ji te şahê herdu cîhan
Nekî der seyê xwe ji ber asîtan

Ne tteb'e ji bo bendedaran ebed
Jibîr kin kîlabê xwe yê bê meded

Me nisyan meke ey şehê heft tebeq
Di suhbet li nik zatê Mewlayê heq

Bi îhsan bibêje "Eya Rebê min
Bide xatirê min evî kelbê min

Institut kurde de Paris

Mu'ezzeb meke Rûhiyê Axtepî
Bi rehmet 'efû ke gunahê di wî"

Du'a te qebûl e di wê hezretê
Yeqîn dê li min kit Xweda rehmetê

Were dîsa ser qisseyê ey qelem
Neqil kim rîwayet ne bîş û ne kem

Ji paş ev kelamê ku Rebbê celîl
Beyan kir ji bo Mustefayê cemîl

Emir kir ji bo fexrê 'alîsîmat
Kî: "Ey zubdeyê cumleyê kaînat

Li nik min gelek abê rûyet heye
Bixwaze heçî arezûyet heye

Heçî der dilê te hebîtin kelam
Bibêje, ji bo te bidim ez temam

Tu yî Mustefa û tu yî Ehmed im
Li te tu tteleb kî, li min ez bidim!"

Ku sultanê dîn ew qeder fezlê dî
Ji îhsana Mewla gelek bezlê dî

Ji keyf û fereh wechê wî şûle da
Rîca kir kî: "Ey zatê pak î Xweda

Tu zanî eya padîşahê lettîf
Ku ev ummeta min qelîl in, zeîf

Nikarin hemil kin 'ezabê giran
Bide xatirê min gunahê di wan

Institut kurde de Paris

Eger dê li ser min bikî nî'metê
Bide min şefa'et ji bo ummetê

Şefa'et bikim ez di rojê hîsab
Ku ummet xelas bin ji nar û 'ezab!"

Xwedayî ku dî ev kelamê Resûl
Rîca wî li dergahê xwe kir qebûl

Li ser wî vegêra cewabek 'ezîm
Kî: "Ey fexrê 'alem, nebiyê kerîm

Ku hinde ricadarê ummet dikî
'Efû kim heçî çun şefa'et bikî

Di rojê qiyamet rîca ke ewan
Bidim xatirê te gunahê di wan

Şefa'et li te, emr û ferman li min
Tu mehder bike, lutf û îhsan ji min

Tu hinde 'ezîz î di vê hezretê
Mûheqqeq li te ez bikim xel'etê

Şefa'et ji bo ummet û zenbê wan
Me bexşî ji bo te mûheqqeq bizan

çu tu ekrem î ser cemî'ê resûl
Ji têk ummetan ummeta te qebûl

Xunuk ew kesanê ji kufrê berî
Ku bûn tabi'ê çun te peyxemberî

Evê cenneta pur ji îhsan hemî
Me çêkir tijî hûr û xîlman hemî

Institut kurde de Paris

Bi texssîssî bo Ehmed û ummetê
Me hinde keramet dida cennetê

Bi te'mîmî xeyrê te û peyrewan
Ji bo ummeta cumle peyxemberan

Ji min bêje ummet vî nutqê kerîm
(Xwe hifz kin ji vî nar û pêtê cehîm)

Cehennem bizane ji bo kafiran
Me çêkir digel ev 'ezabê giran

çira ummeta te xwe têxin 'ezab?
Bi ta'et xwe hifz kin ji nar û 'îqab

Heçî min ji bo duşminan çêkirî
Hezar new'ê qehr û xezeb lê kirî

Evan dositanê min ê ba surûr
Bibêje (ji dûzex biçin dûredûr)!"

Muhemmed ku dî ev kelamê Xweda
Li wî xewf û tirsek 'eyan bû hema

Bi nalîdî der hezretê Kirdîgar
Şonîdem ji rawî kî hefta dîyar

Wuha gotî sultanê herdu cîhan
'Elemdarê iqlîmê axirzeman

Kî: "Ey Îzedê bê şerîk û heval
Xwedayê bi heq, dawerê zulcelal

Bike hifza ummet ku ferdek ji wan
Nekin îrtîkaba çu zenb û xetan

Institut kurde de Paris

Mehêle ku yek ummeta min tu car
Gunahan bikin mexfî û aşîkar

Ku da neçne dûzex kesek ummetê
Nebînin di nav ateşê, zehmetî!"

Îlahî wuha gotî bo Mustefa
Kî: "Ey menbe'ê behra sidq û sefa

Dikarim bikim hifza ummet hemî
Ku esla nekin fê'l û zenbê redî

Welê ev hemî rehmet û lutfa min
Tijî xizneya xeyb û genca mezin

Ji erd û semayan, ji 'erşê 'ezîm
Ji lewh û qelem, kursiyê musteqîm

Gelek pirtir e rehmeta bê qiyas
Gelek xizne memlû ne, nabin xelas

çikim ez bi hinde evê rehmetê
Eger ez nedim muznibê ummetê?

Ku 'isyan nekin ummeta Mustefa
Dimînit evê rehma bê întîha

Bi çi serfê kim rehmetê ey hebîb
Eger ez nedim mucrimê dilkebîb?"

Ji paş ev bişaret ku seh kir Resûl
Ji wî re gelek kir senayê qebûl

Kî: "El emru wel kîbriyaû ledeyk
Fe la uhssî Rebbî senaen 'eleyk" (3)

Institut kurde de Paris

Sual kir ewî Ehmedê tacîdar
Ji wî Rebbê bêçûn ê perwerdigar:

"Evê cem'a ku peyrewanê min e
Li nik te çi mîqdarî 'izet hene?"

Xweda go: "Eya Ehmedê muhterem
Evê ummeta te bizan lacerem

Gelek çêtir in ez cemî'ê umem
Ku tu rehberê wan î ey muhterem

Ji wan ummetanê ku borîn gelek
'Ezîztir li nik min çu erd û felek

Yekî ummeta te ji ehlê 'ezab
Sedê ummeta dî ji ehlê sewab

Evî muznibî nadim ez bê guman
Ji alê mehebbet bi wan her sedan

Ku hinde ji wan hezdikim ey Resûl
Li nik hezreta min 'ezîz in, qebûl

Di Qur'an wuha hate gotin kelam:
(Ku ev ummeta, xeyrê ummet temam)

Bizan ummeta te xwedannî'met in
Ji min sahibê penc-ê xasiyet in

YEK' AN: kî min pir neda sîm û zer
Ji bo ummeta te eya mu'teber

Ku cuz-î bibîtin hîsab û kelam
Di wê rûzê dildoz ê heşr û qîyam

Institut kurde de Paris

Heçî pir bitin zêr û malê cîhan
Ewan dê bibînin hîsaba giran

Li dunya ku bê mal û kemdewlet in
Li axret sibikbar û bê zehmet in

DÛWEM: xisletê wan ev e der cîhan
Me pir zulm û settwet nedaye ewan

Ku mexrûrî bin ew bi hukm û bi zor
Ji kîbr û ji nexwet gelek biçne jor

Mebada ku ew padîşahî bikin
çu min paşê de'wa xwedayî bikin

Wekî padîşahê zemanê qedîm
Ku mexrûr dibûn ew bi hukmê 'ezîm

Bi settwet dema ew dibûn padîşah
Dibûn murtekîb hinde zenb û gunah

Qewî serxweşê camê nexwet dibûn
Teleb de'wiyê xaliqîyyet dibûn

Me hifz kir heçî tabi' û ummet in
Ji vê qebhetê, çunkî kêmtaqet in

SIYEM: 'umrê wan min nekirye ttewîl
Ku bin barê 'isyan nemînin zelîl

çiku sahibê sal û 'umrê diraz
Di nav narê 'isyan dibin cangudaz

Dikin kesba zenban û terka limêj
Bi hukmê ewan sal û 'umrê dirêj

Institut Kurde de Paris

Welê sahibê 'umrê kûtah û kin
Xefîf in ji hemla gunahê mezin

Evê ummeta, 'umrê wan in qesîr
Ku mewt û lîqayê nekin ew jibîr

Tefekkur bikin daîma qebr û mewt
Ku e'malê xeyrî li wan nebne fewt

çIHAREM: ev e ey hebîbê cîhan
Me derxistî ummet di axirzeman

Eger çi bi weqt û zeman axir in
Bizane ku ew fazil û faxir in

Me axir deranî evê ummetê
Ku jêrê zemînê nekin zehmetê

Qiyamet ku nezdîkê wan bit gelek
Nemînin di bin xakê sîre gelek

Ku aciz nebin zîrê xak û turab
Ji bo wan re zû bêtî heşr û hîsab

Bizane ev e xaseyê PENCEMÎN:
Ji bo ummeta te, eya şahê dîn

Eger yek ji wan pur gunehkarî bit
Di bin barê 'isyan de piştxwarî bit

Bi salek berî mewta xwe tewbe kit
Peşîman bibit, terkê ew hewbe kit

'Efû kim ewan zenbê wî serteser
Bidim wî ji cennet mekan û meqer

Institut kurde de Paris

Ev e ni'metê min li ser Ûmmetê
Ji bo wan bidim ev qeder rehmetê!"

Ku sultanê dîn sehkirin ev kelam
Niyaz kir li ber Xaliqê layenam

Kî: "Ey Rebbê pak î munezzeh ji 'eyb
Tu yî 'alimê aşîkara û xeyb

Evê ummeta min zeîf in, feqîr
Ji bo wan re salek dibînim kesîr

Ji wan re heye nefs û şeytanê dûn
Ditirsim di 'isyan bibin sernigûn

Jibîr kin xwe der zenb û 'isyanê pîs
Bibin peyrewê nefsa zar î xebîs

Nekin tewbe der muddetê salikê
Tevî zenb û 'isyan biçin çalikê

Bide xatirê min evê ummetê
Ji wan re bike kêm hinik muddetê!"

Xweda go: "Bi yek mahê pêş ez 'ecel
Bikin tewbe ez fê'l û zenbê dexel

'Efû kim gunahê ewî bê qiyas
Ji narê cehennem bidim wî xelas

Ji bo qedrê te ey Resûlê 'ezîz
Cihê wan bidim der bihişta temîz!"

Bi nalîdê Ehmed di wê hezretê:
"Bike şefqe ya Reb li ser ummetê



Institut kurde de Paris

Mehek zehf e bo tewbeyê wan eman!
Xefîf ke li wan muddetê pur giran!"

"çira?", "çinkî xeflet heye der kemîn
Ji bo her kesî nefs û şeytan le'în

Ditirsim di xeflet di ttûlê emel
Bimînin heta wextê mahê 'ecel

Nekin tewbe ez fê'lê pîs ê nufûr
Digel zenb û 'isyan biçin qebrê kûr!"

Xweda gotî: "Ey Ehmedê ixtîyar
Ji bo ummeta te heçî zenbîdar

Bidim muddetê wan bi yek hefteyê
Di pêşê 'ecel ger bikin tewbeyê

Bidim xatirê te ewê mucrimî
'Efû kim bi rehmet gunaheş hemî!"

Wuha gotî wî Ehmedê çavbelek
Kî: "Yek hefte muddet ji wan re gelek

Rehim ke li ser ummeta pur feqîr
Ji bo wan re muddet bike tu qesîr!"

Xweda gotê: "Yek rojê pêş ez 'ecel
Bikin tewbe û terka xibsê 'emel

Ji bo te biborim di 'isyanê wî
'Efû kim hemî xetta, nisyanê wî!"

Nebî dîse nalî li ber Zilcelal:
"Rehim ke li ser ummeta bê mecal

Institut kurde de Paris

Pirr e muddetê rojekê ey Xweda
Ji bo wan re şeytan û nefs û hewa

Gelek xalib in zêde xeflet heye
Xefîf ke li wan çun te rehmet heye!"

Xweda gotê: "Yek lehzeyê pêşî merg
Bikin tewbe ew ba dil û qelb û cerg

Bibexşim gunahê di wî bît'temam
Bidim meskenê wî di daris'selam

Xelas kim ji narê cehennem ewî
Nekêşim 'îqab û 'ezabê bi wî!"

Şehê sedrê dîn Ehmedê pêşîwa
Bi zarî niyaz kir li babê Xweda:

"Pirr e lehzeyek muddetê tewbeyê
Ditirsim ji xeflet di nav hewbeyê

Jibîr kin ji zenban nebin tewbedar
Bimînin di zenb û xeta zarezar!"

Xweda gote wî: "Ey Muhemmed Resûl
Di vê hezretê gotinê te qebûl

Bişaret ji bo te eya Mustefa
Eya me'dena hilm û sidq û sefa

Eger ummeta te gelek 'umr û sal
Telef kin di 'isyan û zenb û webal

Nekin tewbe ta weqtê mewt û 'ecel
Ji nisyan û xeflet ji ttûlê emel

Institut kurde de Paris

Peşîman bibin wê demê ser gunah
Bikin tewbe ba nale û zar û ah

Ji xiclet ruxê wî ku ehmer bitin
Qebûl kim ku (ma la yuxerxer) bitin (4)

Heta rûhê wî nehtiye helqa wî
Zîyade nebûye gelek qelqa wî

Eger tewbe kit ew ji zenbê xetîr
'Efû kim gunah û xetayê kesîr

Heta rûhê wî bête ser sîneyê
Ji bo wî heye muddeta tewbeyê

Di wî haletî ger peşîman bitin
Li ser wî ji min lutf û îhsan bitin

Qebûl kim ewê tewbeya wî yeqîn
Nedim wî 'ezabê şedîd û muhîn

Di Fîrdewsa e'la bidim wî qerar
Ji bo xatirê seyyîdê burdîbar

Welê can ku çû helq û der mewtê bû
Li wî muddetê tewbeyê fewtî bû

Biçit qebra xwe tevlî zenbê zemîm
Dê bit musteheqqê 'ezabê cehîm!"

Muhemmed ku dî ni'meta bê giran
Bi hemd û sena wî fetihkir dihan:

"Xwedaya ji bo te sena û şukur
Ji bo min nehêla xiyal û fikir

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·
Institut kurde de Paris

Rehet bû dilê min ji ber ummetê
Dizanim li wan dê bikî rehmetê

Welêkin gunehkarê bê sewt û deng
Ku tevlî gunahan biçit qebra teng

Dilê min bi ser wî ve ma, ey Xweda
Ku haleş çi bî rojê heşr û ceza?

Ewan zenb û 'isyanê wî bê qiyas
Ji çengê 'uqûbet çisan bit xelas?

Niyaz im ev e ey Xwedayê kebîr:
Şefa'et bikî van gunahê kesîr!

Eger ferdekî ummeta min hezîn
Bîla tewbe biçye di zîrê zemîn

Di roja qiyamet ku xizmet bikim
Bide xatirim çun şefa'et bikim!"

Ji wî re wuha go Reb-ul 'Alemîn
Kî: "Ey serwer û Seyîd-ul Murselîn

Li te mujde bîtin di vê hezretê
Şefa'et me da te ji bo ummetê

Heçî vê re peyda bitin zereyek
Ji îman û îslamê yek nuqteyek

Bila zenbê wî pur bitin bê fesal
Bi mislê sema û zemîn û cîbal

Dema bête heşrê feqîr û melûl
Şefa'et bikim derheqê wî qebûl

Institut kurde de Paris

Ji bo wan re ev rehmeta min bes e
Şefa'et to ta der peyê her kes e!"

Muhemmed ku seh kir evan mujdeha
Evan ni'metê bê qiyas ê Xweda

Gelek bû muferreh ji eltafê Reb
Dihan fethî kir wî bi terz û edeb

Senayek wusan kir ji bo Kirdîgar
Ku waqi' nebû ser dilê kes tu car

Gelek hemd û şukr û sena kir ewî
Resûlî ji bo zatê bêçûn ê wî

Ji paş ev senayê ku gotin delal
Sual kir bi zarî kî: "Ey zulcelal

Di roja ku esman di yek kef bikî
Zemînê hemî qa'ê sef-sef bikî

Ku yanî di rojê qîyam û hîsab
Ku hazir bin ehlê sewab û 'îqab

Yekî ummeta min ku bê tewbe bit
Gelek zenbîdar û xwedanhewbe bit

Şefa'et nebit bo ewî bêkesî
Ji bo wî nebit hîçî efxanresî

çi ye halê wî ey Xwedayê Kerîm
Di wê rûzê dildoz î pur xewf û bîm?"

Xwedayî cewab da ji bo rehberî
Kî: "Ey şahê ewrengê peyxemberî



Institut kurde de Paris

Bizan heft hezar sal e ev mesele
Ku berdaye nav qudsiyan welwele

Heye ixtîlafek li sethê felek
Di nav cumle quddûsiyan û melek

Wuha gotiye Mîkeîlê delal:
(Telef kit kesek der guneh şêst-î sal

Nekit fikrê mewt û hîsab û qebir
Li ser zenb û 'isyan bikêşit sebir

Netirsit ji qehr û 'ezabê Xweda
Cesûr bit li ef'al û zenbê rida

Nekit tewbe û qet peşîman nebit
Nebit muntebîh da ji 'isyan vebit

Ji xeflet li dunya nekit tewbeyê
Digel ev şeqawet biçit hufreyê

Bi teşbîhê cîfe bibîtin mirar
Bîla tewbe daxil bitin qebrê zar

çisan 'efwê kit wî Xwedayê kerîm?
Mehal e li nik cumle 'eqlê selîm!

Mehal e ku ew mucrimê rûsiyah
Bibit mezherê lutf û 'efwa Îlah!

Ku îlla cihê wî di ateş bitin
Sebeb ew guneh rûyê wî reş bitin)

Welê hamilê Wehya min Cibreîl
Wuha da cewabek ji bo Mîkeîl:

Institut kurde de Paris

(Mebêje evê gotinê hanihan
Xwedayê ku hinde rehîm e 'eyan

Kesê ku di ef'alê 'isyan bibit
Welêkin ewî zerre îman hebit

Bi van fi'lê pîs û xetayê nufûr
Wefat kit biçit qebra tarî yû kûr

Di heşrê ku rabit gelek dilbikul
Şefa'et nebîtin ji şahê Rusul

Xwedayê 'ezîzê qedîr î kerîm
Eger ew bi rehma xwe ya pir 'emîm

'Efû kit ewî bendeyê rûsiyah
çi nuqsan dibit der kemalê Îlah?

Gelek mumkin e wî feqîrê zemîm
'Efû kit Xweda ew bi rehma 'emîm

Bi lutf û kerem wî bibit cennetê
Ji dûzex reha kit bi vê rehmetê)

Li esman sebeb hellê ev mes-ele
Melaîk hemî bûne du qafîle

Dibêjin hinik gotinê Mîkaîl!
Welê taximek mailê Cibreîl!

Temam heft hezar sal e borî li wan
Ku ev ixtîlaf e di nav wan, bizan

Me hêja nekirye beyan û wuddûh
Ku heqqî di destê kî ye ba futûh!

Institut kurde de Paris

Were ey Muhemmed bibe tu hekem
Ji bo van furuştan bi litf û kerem

Beyan ke tu jî ictîhada mezin
Bide fetwê ey muftiyê şer'a min

Di ev mes-ele hukmê hakim çi ye?
Bibêje ku heqqî di destê kî ye?

Rihet ke dilê van furuşt û melek
Bila bes bikin ixtîlafê gelek

Bi hukmê te cumle rizayê didin
Bike fesla wan, ey hebîbê mezin!"

Institut kurde de Paris

Muhemmed ku dî ev kelam û beyan
Fetih kir ewî femmê gewherfeşan

Kî: "Ey 'alimê aşîkara û raz
Xwedawendê mutleq şehê bêniyaz

Ev e hukmê min ey Xwedayê celîl:
Ku heqqî di destê exê Cibreîl

Ji bo yek feqîrî ku îhsan bibit
Ji rehma Xwedayî çi nuqsan dibit?

Ku yek bendeyê bêmecal ê feqîr
Bimînit di bin barê zenb ê kesîr

çi mehzûr e ger Xaliqê zulcelal
Bibexşit ewan cumle zenb û webal?

Ev e ictîhada me ey pur kerem
Bibexşî ewê muznibê pur elem

Gelek fezl û îhsan e, nîne mehal
Ku îhsan kî ser muznibê bêmecal

Ne nuqsan dibit mulkê te, ne ziyad
Li nik min ev e mutleqê ictîhad!"

Xweda gote wî şahê Beyt û Herem
Ku: "Hukmê te heqq e bizan lacerem

Şehînşah im ez, rehm û lutfa me 'am
'Efû kim eger zenbîdaran temam

Gelek layiqê kîbriyaya min e
Nebêjim ku ev dost e, ya duşmin e!"

Institut kurde de Paris

Heqî ket yedê Cibreîlê kubar
çiku husnîzen kir bi Rebbê xefar

Wuha emrî kirye Xwedayê mezin:
"Ena 'înde zennî 'îbadî" bi min (5)

Hezar şukr û hemd û sena bo Xweda
Heye husnîzennim bi Rebbim wuha.

Eger çendî ez mucrim im pur gunah
Welêkin umîda me rehma Îlah

Ji Rûhê 'efû kit gunahê mezin
Sitir kit bi lutfa xwe zenbê di min

Me mehrûm nekîtin ji xwanê kerem
Bide xatirê şahê Beyt û Herem

Izin dit ji bo Ehmedê tacîdar
Şefa'et bikit Rûhiyê zenbîdar

Ji paş ev sual û cewabê wuha
Emir kir Xwedayî ji bo Mustefa:

"Me ferz kir li ser ummeta serfîraz
Şeb û rûzê pencahî wextê nemaz

'Îbadet bikin ew ji min re mudam
Şeb û rûzê pêncî limêjan temam!"

Muhemmed ku seh kir evî emrê wî
Xeberdanê Mûsa ketin fikrê wî

Li esmanê sadis ku jê kir rîca
"Ji bo ummeta xwe bike iltîca

Tu ehkamê şer'ê sivik telbe ke
Bila barê wan zehf û sengîn neke"

Ku hat fikra wî ev tekellum temam
Rîca kir li ber Xaliqê layenam

Ku: "Ya Reb evê ummeta min zeîf
Dixwazim ji bo wan re şer'ê xefîf

Ku ferz kî li ser wan tu pence selat
Ditirsim li ser wan bibîtin fewat

Tekasul bikin ew ji ferza nemaz
Di 'isyan û zenban bibin cangudaz

Ji ser wan xefîf ke hinik barê wan
Ku terka selatan nebit karê wan

Ku ew zêde 'ussat û mucrim nebin
Ku em jî fedîkar û şermî nebin!"

Xweda wextê dî ev nîyaza Resûl
Ji bo xatirê wî gerrandî qebûl

Ji bo ummeta wî neda te'b û renc
Ji van ferzê wan kem kirin bîst û penc:

Ji bo min re ta'et ku daîm bikin
Bila bîst û penc ferzî qaîm bikin!"

Li ser Mustefa riqqetek bû 'eyan
Bi efxan û zarî fetih kir dihan:

"Evan barê wan jî giran e Xweda
Megêrre ji bo wan bihane Xweda

Me hêvî ku texfîfê kî ferzê wan
Ji wan re tu dîsan bide neqsê wan!"

Ji wan deh furûzê di jî Kirdîgar
Hilanî ji bo Ehmedê tacîdar

Tehemmul nekir panzideh ferzê wî
Bi zarî niyazê xwe kir 'erzê wî:

"Xwedaya nikarin eda kin evan
Li ser wan evan emr-î dîsan diran

Bide xatirê min hinek dî selat
Ditirsim li ser wan qeza û fewat!"

Xweda pêncê dî da niyaza Resûl
Ku da ummeta wî nebîtin melûl

Niyaz kir Muhemmed bi ah û rica
Bi eltafê Rebbê xwe kir iltîca:

"Zeîf in evê ummeta min eman
Li wan damene zêde barê giran

Ditirsim ku xafil bibin bêniyaz
Bikin terka 'eşrî furuzê nemaz

Ji te şermîsar û fedîkarî bin
Gunehkar û napak û rûsarî bin!"

Ku Ehmed li Mewla rîca kirye 'erz
Xweda jê re anî li ser pênc-i ferz

Emir kir ji bo şahê sahibnîşan
Ku: "Ev pênc-i ferzim emanet bizan

Institut kurde de Paris

Ji bo xatirê te me pir kir xefîf
Evî barê zî qîmet ê pur şerîf

Welêkin bibêje ji bo ummetê
Li ser ev emanet bikin dîqqetê

Neborin li wan hîçî ferzê selat
çiku min ji cem xwe li wan kir xelat

Kesê van eda kit bi terz û edeb
Li nik min dibit qenc û sahibruteb

Bidim wan ji în'amê xwe ew qeder
Ku waqi' nebûye di qelbê beşer

Li nik hezreta min dê bit serfîraz
Eda kit kesê pênc-i wextê nemaz

Welêkin ku terka emanet bikin
Di van ferzê min de xiyanet bikin

Tekasil bikin der edayê nemaz
Di narê cehennem dê bin cangudaz!"

Xwedaya bi heqê ewî zatê te
Bi heqê cemî'ê sîfatê di te

Evî Ebdurrehmanê 'asî yê pîs
Nedî destê şeytan û nefsa xebîs

Î'anet bike Rûhiyê cangudaz
Neborin li wî hîçî ferzê nemaz

Eger çi me nîne 'emel zeynê xwe
Ku barî eda kim evî deynê xwe



Institut kurde de Paris

Me rûreş nekî ey Xwedayê emîn
Bi terka evan ferzê pak ê şêrîn

Dizanim eger destegîrî nekî
Nikarim eda kim ji ferzan yekî

çiku nefsa min xalib e bê eman
Zeîf im di dest nefsa xwe her zeman

Me mespêre vê nefsa bedfi'lî pîs
Ji destim nebit van furûzê nefîs

Te 'erz kir emanet li esman û erd
Digel ev cîbalê bi ttûl û bi 'erdd

Meni' bûn ji hemla evî barê pak
Ji xewfa ku bin 'asî û şermînak

Ji tirsan newêran emanet hemil
Bikin ew di wan de ne zihn û 'eqil

Me anî evî barê te kir qebûl
Digel ev xeber em zzelûm in, cehûl

Û hem nefs û şeytan musellett li me
Li dor me vewestane wek xet li me

Eger ne bi fezl û bi rehma te bit
Dizanim hîlak dîse para me bit

Welêkin ricadar in em ey Xwuda
Ji bo xatrê şahê textê huda

Eger çi ne erbabê ev nî'met im
Welê rûreş û mucrimek ummet im

Institut kurde de Paris

Bide pêş me rah û terîqa sewab
Mehêle hîlak bim di fê'la xerab.

Muxennî bide destê xwe sazê xwe
Bikêşim li ser xame awazê xwe

Bike goşê min pur ji awazê çeng
Muferreh bike carekê qelbê teng

Dilêm pur ji alamê hîcra nîgar
Li ser min hene new'ê xem bê şumar

Kerem ke muxennî were xelwetê
Tu jî saqiya bîne wê şerbetê

Binoşim ji destê te çend camê mey
Sîma' kim hinek dengê qanûn û ney

Muferreh bibim ez bi tesîra van
Sivik bin li ser min humûmê giran

Jibîr kim hinek cewr û zulma hebîb
Leheb muntefî bit ji qelbê kebîb

Ku dewran bikim wek hubabê meyê
Bidim destê xwe rûsiyah xameyê

Tereb bête qelbim ji saz û ji cam
Bikim hîmmetek ez di nezma kelam

Bi teşmîrê sa'id bikim hîmmetê
Bibêjim beqîye ji vê qisetê:

Ku seh kir evan emrê pak î qebûl
"Semî'na, ette'na" cewab da Resûl:

Institut kurde de Paris

"Qebûl in me ev emrê te ey Xwuda
Welê tu bide wan terîqa huda

Î'anet bike tu ji bo ev emir
Ku mehcûb nebin ew di rojê heşir

Nekî nefs û şeytan tu xalib li wan
Bibe daîma tu muraqîb li wan

Li minŞ ez li ser wan nesîhet bikim
Ji bo wan re behsa emanet bikim

Tu jî 'ewn û tewfîqa xwe bidye wan
Ku şermî nemînin di emrê giran!"

Xweda gote wî Ehmedê tacîdar:
"Me da ummetê cuz-ekî ixtîyar

Ku ew îbtîdayê 'îbadet bikin
Ji min jî, suala î'anet bikin

Bidim wan î'anet li ser ta'etê
Li ser wan bikim zêde vê rehmetê!"

Sena kir ji bo Rebê xwe Mustefa
Kî: "Ey padîşahê sitayiş tu ra

Ji mi'marê kaxê rîwayet emin"
Sîma' kir evan neqlê pak ê mezin:

Di Xelwetsera Lamekanê Xweda
Bi hijmar xeberdan digel Mustefa

Xeberdan digel Ehmedê şehriyar
Ji rawî me zanî newed der hezar (6)

Institut kurde de Paris

Kirin sê qisim ev kelamê bi 'ed
Ji bo Mustefa wî Xwedayê semed

Ku her yek ji wan qismî bû sih hezar
Wuha pê emir kir Xwedayê xefar:

"Ji wan sih hezar rahê şer'a mubîn
Beyan ke ji bo mumin û kafirîn

Ji bo cumle cin û cemî'ê beşer
Bibêje evan sih hezaran xeber!"

çiku dînê îslam û rahê sewab
Evan sih hezar in bi nessa kîtab

Hedîs û şerî'et bi wê rastî bû
'Eceb dînê kufrê ji wan kastî bû

Heçî kefte rahê evê şer'a qenc
Li herdu cîhan wî nekêşa tu renc

Ku Qur'an û sunnet bi wê nattiq in
Hemî şer' û ehkamê wê Xaliq in

Welê ger kesek munherîf bit ji rah
Di kufr û di 'isyan de, ma rûsiyah

Bizane esasê li îslam û dîn
Evê rahê şer'a şerîf e, mubîn

Bi wê dîn û îman û îslamê nas-
Dikin cumle mumin ji cin û ji nas

Ji mîzana şer'ê eger dirhemek
Bibit muxrifê xisletê merdumek

Institut kurde de Paris

Eger çendî teyran bikin ser hewa
Suwar bit çu keştî li ser sethê ma

Mebe mu'teqid bo ewê sextekar
Bizane ku kezzab e ew zenbîdar

'Emel lazim e bête şer'a şerîf
Ku maqûlî bit nik Xwedayê lettîf

Xweda gote wî Ehmedê ixtîyar:
"Ji herkes re bêje evan sih hezar

Ji bo cumleyê mumin û kafiran
Bibêje evan şer' û hukmê giran

Heçî guh dinê, peyrewanê te ne
Heçî guh nedanê, bizan duşmen e!"

Welê sih hezarê dîger Kirdîgar
Ji bo wî Resûlê xwe da ixtîyar:

"Heçî te divê, bêje wan ev kelam
Heçî tu dixwazî bike îktîtam

Hinek jê terîqet hinek dî yeqîn
Heqîqet bizane eya şahê dîn

Heçî merdê qelbê te lê mutmein
Bibîtin, bibêje evan sirrê min

Terîqet, heqîqet çiku kûr in ew
Ji 'eql û xired cumleşan dûr in ew

Kesê qabilîyet nebit bê hîsab
Mebêje evan sirrê 'alîcenab!"

Institut kurde de Paris

Şerî'et çu deryayê ez abê pur
Terîqet sefîne heqîqet çu durr

Kesê cewherê ev heqîqet bivê
Ji qe'ra bîharê şerî'et bivê

Nikarin evê cewhera pur ji nûr
Derînit ji qe'ra evê behra kûr

Ku îlla sefîna terîqet mu'în
Bibîtin ji bo cewhera pur semîn

çiku kes di deryaya şer'ê şerîf
Nikarin biborin bi 'eqlê sexîf

Meger ew suwar bin li ateşgemî
Ku deryaya şer'ê bibînin hemî

Ji qe'ra evê behra safî, şêrîn
Derînin gelek cewherê pur semîn

Şerî'et, terîqet, heqîqet temam
Bizan bêyî hev nabin ey nîkînam

Wuha min bihîstî ji rawî xeberŞ
Ku ev sih hezar gotinê pur eser

Muhemmed j'bo duwazde eshabê xwe
Beyan kir evan sirrê portabê xwe

Ji bo wan re jî go hebîbê kerîm:
"Vî sirrî ketim kin ji merdê leîm"

Ewan jî belav kir li ser ev esil:
Ji bo şexsê qîmetşunas û ehil.

Institut kurde de Paris

Welê ev wesiyet temamî nema
Nuha ketye destê kesê naseza

Terîqet niha bûye yek damê seyd
Ku pê malê dunya bikin bend û qeyd

Welêkin Xweda pê dizane yeqîn
'Elîm e bi ehwalê cehr û nehîn

Bila ew li dunya bikin ev kezab
Li axret ji bo Reb çi bêjin cewab?

çi lazim ji bo me eya Şemsuddîn
Ku tehrîrê kin halê wan în çunîn?

Tu bispêre hukmê Xweda îşê wan
Ku roja qiyamet ke teftêşê wan.

çu tu merdumek şa'ir î Rûhiya
çi lazim dikî hinde qellaşiya?

Tecessus çi lazim ji bo te li xelq
Mufewwez ke van îşê wan tu bi heq

Li vî sin'etê xwe binêre mudam
Bibore di meqsûdê şi'r û kelam

Ku nîne di destê te şey-ek 'emel
çira sin'etê merduman kî dexel?

Bixwaze tu saqî û saz û serab
Li ser keyfê wan bîne nezmê kîtab

Ji meşriq heta mexribê 'alemî
Eger serteser tar û mar bit hemî

Institut kurde de Paris

Xesara te nabit, tu yek şa'ir î
Feqîr û neçarê derê Qadir î

Ji muswedde û xame pê ve tu car
Digel saqî û sazibend û nîgar

Mepirse li şey-ek ne pîş û ne kem
Wegerne dilê xwe dikî pur elem

Were ey qelem ser siyaqa ewil
Tu jî saqiya bîne cama çu gul

Bikin îbtîda em bi meqsûda xwe
Birêjin di meydan de mewcûda xwe.

Me pêşî beyan kir bi şewq û bi keyf
Xeberdan bi Ehmed re tis'în e elf (7)

Me sittîne elfîn beyan kir xeber
Ji wan cumle ma sih hezarê dîger

Evan sih hezarê ku maye nehîn
Neda hîçî ruxset ji bo şahê dîn

Ku bo kes bibêjit evan sirrê wî
Nehêla bibêjit evan durrê wî

Ku îlla di mabeyna Reb û Resûl
Bimînin evan sirrê pak ê qebûl

Evan cumle sirr, ê Nubûwwet bizan
Ji esrarê peyxemberî ne heman

Ne hedd e ji bo qudsî û îns û cin
Ku seh kin evan sirrê kûr ê mezin



Institut kurde de Paris

Ev e merteba "Lî mee'llahî" heq
Zemanek ku tê da nehin hîçî xelq

Ji van sirrê wî hîçî ageh nehin
Ku îlla hemî xasê Şahînşeh in

Ji xeyrê Muhemmed şehê ba wefa
Nikarin bibêjin tu xelqê Xweda

Nikarin sîma' kin vî sirrê Kerîm
Ku îlla xwedawendê xulqê 'ezîm

Nihan man evan cumle esrareha
Heta wextê roja hîsab û ceza

Bi cuz qelbê Ehmed ewê pur wesî'
Nikarin hilînin vî sirrê bedî'

Xezîna evan sirrê meknûn ê pak
Bizan qelbê Ehmed ewê tabînak

Nîhatey nizanin çi kes ew çi ye
Di mabeyna Reb û Resûlê wî ye

Ev e 'adetê dositîya temam
Ku mexfî ji bo hev bibêjin kelam

Evî sih hezarê ku mestûre bûn
Bi cuz Mustefa hîçî ageh nebûn

Nehatin beyan û wuddûhê ebed
Nehêla ku bêjit Hebîbî, Semed

Wusan mane mexzûn di nav qelbê wî
Evan sirrê ku gotinê Rebê wî



Institut kurde de Paris

Ji paş ev kelamê bi 'edd û şumar
Xweda daye ruxset ji bo şehriyar

Îcazet ji bo Mustefa da Kerîm
Kî: "Ey şahê Beyt û Meqam û Hettîm

Kerem ke here cayê xwe ruxset e
Ji bo te bese ev qeder nî'met e!"

Di vê 'ewdetê de bizan ey heval
Heye ixtîlafa ruwatan delal

Welê ez beyan kim bi keyf û tereb
Evê ixtîlafê bi terzek 'eceb

Li be'zê ruwatan heye ev kelam:
Ku Ehmed şehînşahê 'alîmeqam

Dema goşî kir wî îcazet ji Reb
Ewî secdeyek bir bi terz û edeb

Di secde gelek zikr û tesbîheha
Vexwendin ji bo Rebbê erd û sema

Wekî ser hilanî ji wê secdeyê
Xwe dî ew nefes daxilê hucreyê

Bi yek "Terfet-ul 'Eynî" ez Lamekan
Giha Mekkeyê, cayê xwe bê guman!

Welê yek rîwayet heye pur sehîh
Di vê 'ewdeta padîşahê melîh:

Ji vir ve çewan çûye ser heft ttîbaq
Bi 'eynî, rucû' jî li ser ev sîyaq

Institut Kurde de Paris

Ji Mekke heta erdê Qudsa şerîf
Li pişta Boraqa 'ezîz a nezîf

Ji Qudsê heta asîmanê ewil
Bilind bû li ser Nerdewanê çu gul

Ji esman heta Sîdret-îl Munteha
Digel dûzex û cennetê her wuha

Li ser şehperê Cibreîlê delal
'Ûrûc kir ewî şahê sahibcemal

Ji Sîdre li ser şehperê Mîkeîl
Siwar bû ewî padîşahê cemîl

Heta cayê Mîkalê pur muhteşem
Li ser şehperê wî diçû bê elem

Ji wê pê ve şahînşehê îns û cin
Li ser şehperê Îsrefîlê mezin

'Ûrûc kir heta setthê 'erşê Xwuda
Ewî rehberê rahê heqq û huda

Ji ewpaş nema taqeta Isrefîl
Bi qudret Xwedayê kerîm ê celîl

Li Refref suwar kir heta Lamekan
Ewî şahê Lewlak ê sahibnîşan

Îcazet ku derket ji Rebê xefûr
Ji bo 'ewdeta Seyîdê sade nûr!

Bi vê terz û tertîbê min kir beyan
Heta Mekkeyê hatî şahê cîhan.

Institut kurde de Paris

Esehê rîwayet ev e bê guman
Li nik me hemûçkan bi neql û beyan

Ji Qudsê dema ew bi rê ket temam
Berê xwe ku da Mekkeya pur meram

Li reh dîtî sultanê sahib edeb
Li Rewhayê yek karîwanê 'Ereb

Vexwar kaseyek abê ew karîwan
Ku da bit 'elamet ji bo munkiran

Heta Mekkeyê cumle seffê melek
Bi teşyî'ê wî Ehmedê çavbelek

Bi tesbîh û tehlîl birin cayê wî
Hemûçkan zîyaret kirin payê wî

Hemî dest û pê bûse dan bît'temam
Li wî dan hezaran selat û selam

Evan cumle quddûsiyan "elwîda'"
Kirin bo Resûlê bi nûr û şu'a'

Gelek zarî û nale kirne zuhûr
Li pêş Ehmedê tacîdar ê bi nûr

Kî: -Ey serwerê Seyyîd-îl Murselîn
Me bigre di nav ummetê ey, emîn!

- Ji ummet hisab ke me quddûsiyan
Şefa'et bike cumle subbûhiyan!

Ji paş ev niyaza ku wan cumleşan
Bi zarî kirin 'erzê xizmet çunan

Institut kurde de Paris

Bi paş de vegeryan cemî'ê melek
Belavbûne her kes li setthê felek

Nezer kir hebîbî, ku pur şermî bûŞ
Ku hêja cihê newma wî germ-î bû!

Xwedaya bi heqê evî padîşah
Ku te daye wî Nerdewana sema

Bi heqê evê xelweta muhterem
Ku xas e ji bo şahê Beyt û Herem

Bi heqqê evan cumle esrarê te
Tenê zane sultanê muxtarê te

Bi heqqê hemî enbiya û resûl
Xusûsa bi heqqê hebîbê qebûl

Bi heqqê ewê xelweta Lamekan
Ku layîq e encaq ji bo şahê can

Bi nûra ruxê Mustefayê kerîm
Bi heqqê ewan cumle xulqê 'ezîm

Evî Rûhiyê mucrim ê dilkebab
'Efû kî bi rehma xwe ya bê hîsab

Li ser min gunahê mezin wek cîbal
Hezar new'ê qubh û zunûb û webal

Gelek muznib im, rûreş im, rûsiyah
Xerîq im di nav mewcê behra gunah

Digel hinde zenb û xetayê di pîs
Digel hinde 'isyan û fi'lê xebîs



Institut kurde de Paris

çisan bêm huzûra te ey Kirdîgar?
'Efû ke bi rehmet minê zenbîdar!

Mepirse ji min roja heşr û hîsab
çiku ez nizanim bibêjim cewab

Setir ke li ser min hemî zenbê min
Bi rehma xwe ya pir, eya Rebê min

Me rûreş meke roja heşr û qîyam
Li nav ehlê mehşer bi zenbê heram

Kîtabim bide destê rastê, eman!
'Efû ke ji min cumle zenbê giran

Ji te pê ve kî min heye ey Kerîm
'Efû kit ji min van gunahê zemîm?

Bilind kim yedê xwe bi sidq û sefa
Bibêjim bi heqqê ewî Mustefa

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

Institut kurde de Paris

---

1- Ev Benda 33'yan, di derheqê rûniştina (siwarbûn) Pêxemberê Xweda li Refrefa sivikbez û keremkirina wî bi Lamekanê ve ye.

2- "Ehed" xeysetnavekî Xwedê ye. "Ehmed" navekî Mihemed Pêxember e. Îcar çaxê ku M.Pêxember çû Mi'racê û ket hizûra Xwedê, pir fihêt kir. Hingê ji navê wî (Ehmed) tîpa "m" rabû, navê wî ma "Ehed" yanî bitenê. Tunebê ewçax tîpa "m" dibe mîna perdeyekê di navbera wî û Xwedê de. Lê piştre Xwedê (Ehed) nûra xwe lê eşkera dike, ew û Pêxember (Ehed) xwe bixwe tenê dimînin û bi hev re dipeyivin.

3- Mana vê malika bi zimanê Erebî, weha ye: Ferman û mezinatî li nik te ne. Ez nikarim pesnê te bihejmêrim!

4- "Ma lem yuxerxer" yanî heta ku xirexira berî mirinê çênebe.

5- "Ena 'înde zennî 'îbadî" yanî ez li gorî gumankirina koleyên xwe me. Amac ji vê Hedîsa Qudsiye ev e, ku Xwedê gotiye: Koleyên min bi çi çavî li min binêrin, ez jî dê bi wî çavî li wan binêrim.

6- "Newed der hezar" yanî not hezar (90,000).

7- "Tis'îne elf" yanî not hezar (90.000).

Di malika piştî vê de:

"Sittîne elfîn" yanî şêst hezar (60.000).

"Sih hezar" 30.000.

Ev jimara li jor, ew e ku Xweda li Lamekanê ji Mihemed Pêxember re 90.000 hezar bêje gotine. Ji wan sih hezar bêje, pêwendiyên bi Şerî'etê ve ne û Pêxember ew ji her kesî re gotine. Sih hezar, pêwendiyên bi "Terîqet"ê ve ne. Pêxember tenê ew ji kesên bi îtbar re gotine. Dibêjin ku wî ew sih hezar bêje, tenê ji duwazdeh sehabiyên xwe re gotine. Lê sih hezar bêjeyên din, pê re mane û dê roja qîyametê bêne eşkerakirin.

Institut kurde de Paris

# BEŞ 34

## (1)
## BENDÊ RABI' WE SELASÛN
## DER XEBERGOFTENÊ RESÛLÎ
## BA MÎDADAN
## EZ MÎ'RACÊ ŞEBANE
## BI ÎSLAM Û KÛFAR KÎ MÛSEDDÎQAN
## TESDÎQKERDEN

'Imaretkunê kaxê vê Nameyê
Neqişbendê eywanê vê Qiseyê

Ewê sseyrefiyê di kanê xeber
Guhersencê bazarê lefz û eser

Bi vî terzî tezyînê da qisetê
Wuha daye min gewhera hîkmetê

Bi yendaxtê terhê esasê suxen
Welê terhekî mehkem û mutemen

Institut kurde de Paris

Muselsel heta nezdê min ev kelam
Serê silsile nik sehabê kîram

Ruwatan wuha kir rîwayet yeqîn
Ji ehwalê Mî'raca şahê emîn:

Ku bû munqezî ew siyahiyê şeb
Sufîdî bi derket çu camê Heleb

Bi perwazî çû zaxê şeb nabedîd
Xeram bû di afaqê bazê sefîd

Veda murxê bam sewt û dengê 'eyan
Ji xeytê sipî xeytê reş bû beyan

Ji gulbangê "Ya hey û ya zelcelal"
Ewî deşt û sehra tijî kir Bîlal

Resûlê mueyyed bi 'izz û meqam
Beyan kir ji bo Ûmmîhanê kelam: (2)

"Ku îmşen Xweda ez birim erdê Şam
Ji wê ez birim asîmanan temam

Suwar bûm li ser yek boraqa temîz
Birim ta bi Qudsa kerîm û 'ezîz

Cemî'ê sufûfê nebî û resûl
Me dîtin di wê meclisa pur qebûl

Me dîtin gelek sun' û nexşê xerîb
Temaşa me kir cumle 'erşê 'ecîb

Digel heft tebeq asîman û ne'îm
Digel Sîdret-ul Munteha û cehîm

Institut kurde de Paris

Me dîtin di cennet de ehlê sewab
Di dûzex mi dîn cumle sefê 'ezab

Melaîk ji 'edd û hîsaban birûn
Mi dîtin ji Mewla re têk 'abîdûn

Temaşa di lahûtê e'la mi kir (3)
Li min babê îhsan Xwedayî vekir

Birim cayekî qet ne ca bû ebed
Li wê der nebû xeyrî zatê Semed

'Ecaîb, xe'raîb mi dîtin gelek
Ji new'ê furuştan li sethê felek

Di zerfê şevek hinde eşya mi dîn
Vegeryam bi hukmê Reb-îl'alemên

Xweda emrê kirye ji bo min temam
Ji Mî'raca xwe ez bibêjim kelam

Ji bo mumin û kafiran serteser
Beyan kim vê Mî'raca sahibeser

Ku her kes ji bo xwe bikin 'îbretê
Nebin munkirê vê hemî qudretê

Bizanin ku xellaqê kewn û mekan
Berî ye ji zidd û şerîkan çunan!"

Subuk Ûmmîhanê beyan kir niyaz
Kî: -Ey Seyidê rehberê serfîraz

- Evan gotinê te hemî rasitin
Heqq in cumle ew bê kem û kasitin

Institut kurde de Paris

- Welê min rica ye ji payê Resûl
Ketim ke evî sirrê pak ê qebûl

- çiku 'eqlê nasan gelek fatir in
Ji derka umûrê wuha qasir in

- Ditirsim be'îd bêt ji 'eqlê kufar
Bibin munkirê van durrê şahîwar

- Bibêjin xeberdanê pur bê furûx
Bikin hemlê van rasitan ser durûx

- Eger çi ku heqq in kelamê di te
Ditirsim ku pismam û eqwamê te

- Museddiq nebin ew bi Mî'raca pak
Ji ber kufra wan tu bibî derdînak

- Welê guh bide min eya îbnî 'emm
Ji bo xwe ziyade meke hinde xem

- Ji bo çendê eshabeyê pur emîn
Birêje evan durrê zêde semîn

- Welêkin ji kuffarê bê dîn î pîs
Veşêre vê Mî'raca qenc î nefîs

- Ditirsin ku ev kafirê bê furûx
Bidin nisbeta te li kîzb û durûx

- Û hem îhtîmala ku be'zê sehab
Bibin munkirê ev xeber bê hîsab

- Xulase, negotin ji Mî'raca nûr
ji gotin gelek çêtir e bê qusûr!



Institut kurde de Paris

Cewab da ji bo Ûmmîhanê Resûl
Kî: -Ey bintî 'emmî, bi 'izz û qebûl

- Bizane ku "Labudde" qewl û xeber
Bibêjim di Mî'raca sahibeser

- Wuha emrê min kirye Rebê 'ezîm
'Ûmûmen bibêjim vî sirrê kerîm

- Heçî mumin e dê museddiq bibin
Heçî kafir e namuwafiq bibin

- Li min lazim û wacib e bê guman
Temamen bibêjim vî sirrê giran

- Nikarim veşêrim umûrê Xwuda
Yeqîn dê beyan kim terîqê huda

- Museddiq, mukezzib ji hev ferq ê bin
Ku ferqeş ji mexrib heta şerqê bin!

Pes angahê ew Seyidê tacîdar
Meşî sûyê Mescîd bi 'izz û weqar

Giha ewsetê Mescîda enwerî
Ji Mî'racê dûşîn xeber dest kirî

Sela da kî: -"Ya eyyuhel hazîrûn"
Heçî mustemi' mumin û kafîrûn

- Bizanin hemî ev kelamê metîn
Ku îmşeb giha nik me Ruh-ul Emîn

- Suwar bûm li ser yek boraqê temam
Bi emrê Xweda ez birim erdê Şam



Institut kurde de Paris

- Li ser wê Boraqa 'ezîz a zerîf
Birim ta bi Mescîd di Qudsa şerîf

- Mi dîtin hemî enbiyayê Celîl
Digel ceddê xwe Îbrehîmê Xelîl

- Ji ewpaş bi Mî'raca nûrîn heta
Tebeqhayê esman bi emrê Xweda

- Sufûfê furuştan ji qismê melek
Li ser sethê esman me dîtin gelek

- Bihişt û cehennem mi dîtin heme
Digel zikr û tesbîhê bû zemzeme

- Cehennem tijî ehlê zenb û kufur
Di cennet hemî ehlê dîn û şukur

- Digel Sîdre û Kursiyê pir delal
Digel cumle 'erşê şehê bê zewal

- Me dîtin bi van herdu çavê serî
Ewan nexş û sun'ê 'eceb enwerî

- Ji wê ez birim xelweta Lamekan
Li wê der nebû ca û wext û zeman

- Ji bo min gelek sirr û razê mezin
Beyan kir bi îhsana xwe Rebê min

- Vegeryame dîsan di ew şev temam
Di zerfê şevek çûm û hatim Meqam

- Bi tesdiqî her kes bikin gotinê
Bi sem'ê qebûlî hemî guh dinê!

Institut kurde de Paris

Ji Mî'raca Ehmed di nav Mekkeyê
Xeber eşkera bû di vê qiseyê

Zuhûr bû evê qiseta pur bi naz
Di Mekke beyan bû hemî sirr û raz.

Ji ewel şeqiyê le'în ê xebîs
Ebû Cehlê cahil kufurbazê pîs

Dema seh kir ev gotina pur giran
Bi te'cîlî hat nezdê şahê cîhan

Wuha gotî wî: -Ey Muhemmed emin
Bihîstin ji te çendî tiştê mezin

- Tu rastî dibêjî "şevê dî bi şeb
Tu çûyî heta Şam bi keyf û tereb?

Tu dîsan vegeryayî ew şev temam
Gihiştî Hîcazê ji ser heddê Şam?"

"Ne'em" gotê sultanê sahibdelîl:
- Şebê barîhe çûme Quds-il Xelîl

- Bi emrê Xweda Cibreîlê emîn
Nuzûl bû ji esman li rûyê zemîn

- Ji erdê Hîcazê heta mulkê Şam
Birim wî bi sed 'izzet û îhtîram

- Li wê der mi dîtin gelek sirr û raz
Vegeryam û dîsan gihîştim Hîcaz!

çu wî kafirê le'netî yê şeqî
Bi goşê xwe seh kir vî sirrê xefî



Institut kurde de Paris

Qiyamet hilavêtî destarê xwe
Hilanîn hemî perde estarê xwe

Bi şin'et diraz kir zebanê heram:
- Li kê der Hîcaz û li kû mulkê Şam?

- Werin ey senadîqê qewmê 'Ereb
Bi goşê xwe seh kin durûxê 'eceb!

- Ji xakê Hîcazê heta erdê Şam
Hemî hûn dizanin ku mahek temam

- Di zerfê şevek qet ne maqûl e ev
Biçit mulkê Şam û rucû' kit bi şev

- Bibînin evê gotina bê firûx
Bizanin hemî vê hedîsa durûx

- Ji vir ta bi Şamê ku yek mah e rah
Biçit û rucû' kit mehal e, tebah!

Pes angahî rabû bi sed mekrî çû
Sûyê yarê sadiq Ebî Bekrî çû

Ji Bo Bekrî ra go şeqiyyê le'în
- Were gotinê sahibê xwe bibîn

- çi elfazê bê mana tîne zuhûr
Dibêje xeberdanê ez 'eqlî dûr

- Ji bo min niha gotiye der Meqam
"Ku îmşeb ji Mekke çûye erdê Şam

Ji wê dîse hatî heta Mekkeyê"
- Were, guh bide vê 'eceb qisseyê!



Institut kurde de Paris

Cewab da Ebû Bekrê Siddîq ê yar
Ewê "Saniyesneyn"ê xarê kubar:

- Heçî ew bibêje, hemî rasitin
Temamî heq in, bê kem û kasitin

- Ji vê zêdetir î'tîqadim heye
Li eqwalê wî î'tîmadim heye

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

- Eger gotibin ev kelamê kubar
Museddiq dibim ez bi wî sed hezar

- Ne tenha heta Şam û Qudsa Xelîl
Ku belkî heta 'erşê Rebê Celîl

Institut kurde de Paris

- Ji 'erşan heta xelweta Lamekan
Biçit hem rucû' kit di wext û zeman

- Ne dûr e ji hukmê Resûlê 'Ereb
Bi nisbet meqamê wî nîne 'eceb

- çira? çunkî Cibrîlî ba perr û bal
Ji ser Sîdret-ul Muntehayê delal

- Nuzûlê dikit ew di yek lehzeyê
Bi perwazî têtin heta Mekkeyê

- Ji bo wî re Wehy û xeberdanê pur
Ji Mewla dibêjit bi teşbîhê durr

- Ji bo wî dikit her dem exbarê xeyb
Li nik me hemûçkan bîla şek û reyb

- çira hinde bê dîn î ey Bo Cehil?
'Înadê dikî tu bi kufr û cehil!

- Dizanim ku îman û dînet niye
Yeqînim ev e, ku yeqînet niye

- Ji kufrê bese rû bigêre, eya
Ebû Cehlê sahibşeqa, bê heya!

Wuha gotê Bo Cehlê kamilxerî:
"'Ecaîb tu mexrûrê ev saherî!"

Pes angahî Siddîqê ekber delal
Meşî hezreta Ehmedê pur cemal

Bi sed sidq û sê sed sefa amed ew
Sûyê xizmetê Mustefa amed ew

Nebî wextê dîtî Ebû Bekrê yar
Bi lutf û kerem gote wî aşîkar:

- Were ey Ebû Bekrê yar ê şefîq
Di tengî, feraxê mudam tu refîq

- Ji bo te beyan kim bi 'izz û bi naz
Li te eşkera kim hemî sirr û raz:

- Bizane ku ev leyl e Rûh-ul Emîn
Nuzûl bû li min j'asîmanê berîn

- Boraqek ji cennet deranî delal
Suwar bûm bi emrê Şehê Zulcelal

- Bi rê ketme ez xakê Beyt-ul Heram
Digel cem'ê quddûsiyan ta bi Şam

- Ji wê nerdewanek Xweda kir zuhûr
Diçû asîmanan ji wê berqê nûr

Institut kurde de Paris

- Li ser wê bilind bûm heta heft tebeq
'Ecaîb me dîtin ji asarê Heq

- Guzeştem ji heft encumûnê felek
Ji Rûh-ul Emîn û cemî'ê melek

- Temaşa me kir 'erşê zîba nîhad
Bi emrê xwedawendê cumle 'îbad

- Bihûrtim ji wî 'erşê xayet 'ezîm
Heta hezreta qudsî Rebê Kerîm

- Me dîtin 'ecaîb ji hukmê Kerîm
Gelek sun' û asar û neqşê 'ezîm

- Gelek sirr û razê çu durrê semîn
Di xelwet ji min re beyan kir Kerîm

- Gihîştim mekanek ebed ca nebû
Li wê ab û xak, ateş û ba nebû

- Ji qismê melaîk ji cinn û beşer
Nebûn hîçî der xelweta mu'teber

- Di wê xelweta xalî ez kaînat
Tecellî me dîtin ji zat û sîfat

- Şerayi' Xweda dan ji bo me bi naz
Li me ferzî kir penc-i weqtê nemaz

- Hemî dînê me rastî kir ew Kerîm
Li ser min kirin ni'metê pur 'emîm

- Di yek lehze dîsan vegeryam temam
Di ev şev heta xakê Beyt-îl Heram!



Institut kurde de Paris

çiqas gotinê Ehmedê tacîdar
Beyan kir ji bo wî Ebû Bekrê yar

Hemî gotinê wî bi dil kir qebûl
Li ser hev digo: -Qed sedeqte-y Resûl

- Evan cumle heqq in yeqînim heye
Sedeqte ku îman û dînim heye

- Bi hişyarî tiştê te dîtin temam
Me îşev hemî dîtine der menam

- Di xewna xwe min cumle dîtin yeqîn
Heçî dî bi yeqze Şehînşahê dîn!

Resûlê Xweda gote Bo Bekrê yar:
- Ku îsmê te "Siddîq e" ey bextiyar

- Muqeddem ji cumle sehabê di min
Te tesdîqê kir ev kelamê mezin!

Ji pes ew Ebû Cehlê bê î'tîqad
Giha be'zê sendîdê ehlê fesad

Cemi' bûne ew der Hettîma nefîs
Ji wan yek 'Edê Îbnî Met'im xebîs

Yekê dî Welîdê bi kufr û te'eb
Ku "Îbnu Muxeyre" dibêjin leqeb

Û hem Eswed-ubnî Muxeyre le'în
Digel wî Ebû Cehlê napak ê dîn

Û hem xeyrê wan jî kubarê Qureyş
Serekdarê qewman xwedanheşm û ceyş

Institut kurde de Paris

Tebayî hemî çûne nik Mustefa
Ewî şahê ewreng ê sidq û sefa

Culûs wan kirin nezdê Sultan temam
Hemûçkan teleb kir ji isra kelam:

- Ji bo me bibêje heçî te dîye
Şebê barîhe qisseta te çi ye?

"Ne'em" gotî Sultanê 'alîmeqam:
- Şevê dî bi şev çûme ta xakê Şam

- Me dîn enbiya û resûlê bi heq
Ji pes çûme balayê heftem tebeq!

Hemî wî beyan kir ji bo kafiran
Heçî dîtiye wî ji hukmê giran

Ebû Cehlê mel'ûn ê dilwajîgûn
Wuha gotî wî rûreşê sernugûn:

- Li ser wechê înkar û îstîhzeyê
Beyan ke li me Mescîd-îl Eqseyê!

Resûlê Xweda fexrê 'alîneseb
Di wê saetê kefte fikr û tereb

Şedîd bû gelek kerbê wî ew zeman
Ku kerbê wî carê nebûye çunan

çiku wî nekirbû li Mescîd nezer
Bi dîqqet ku ew hifzî kit serteser

Ji ber xulxula seffê quddûsiyan
Ji ferha liyaqa ewan enbiyan



Institut kurde de Paris

Nezer wî nekirbû li Qudsê temam
Mufessel ku bêjit xîtab û kelam!

Xweda emrî kir mirxê Sîdremekan:
"Here zû bigîje Resûlê cîhan

Hilîne ji ber Mescîd-îl Eqseyê
Bi perrê  xwe têk mani' û perdeyê

Ku da perdehayê mezin ref'i bin
Ku huccet ji dest kafiran qet'i bin!"

Sivik Cibreîlê emîn ew zeman
Hilanîne perde ji Qudsê çunan

Ku sultanê dîn Ehmedê hûşiyar
Nezer lê dikir yek bi yek aşîkar

Ji Bo Cehlî re got Resûlê 'ezîz:
- Bixwaze tu salix ji Qudsê temîz

- Ji kê der dixwazî ku salix bidim
Ji Mescîd nîşanê muxalif bidim?

Vegêra cewabek li sultanê dîn
Ebû Cehlê rûreş xebîsê le'în:

- Bibêje heta Qudsê çend menzil in?
Hemû em dizanin, ne pê cahil in!

- Û her yek menazil li kîjan meqam
çi nam in, ewan jî beyan ke temam?

- Sutûnhayê wê Mescidê yek bi yek
Beyan ke bi hijmarê bê reyb û şek?

Institut kurde de Paris

- Bibêje ku çend bab-î tê da hene?
çiku cumle eşya di zihna me ne!

- Beyan ke ji eywan û hewşê xîtab
Ji pehn û dirêjî bide tu cewab?

Heçî wan sual kir yekayek temam
Di ewsafê wê de beyan kir kelam

Xweda çun ji ber wî hilanî hîcab
Ji zanîna wan zêde wî da cewab

Teheyyur gelek man ji ev mu'cîze
Veman der wehel wek xerê 'acîze

Heçî gotî wî padîşahê melîh
Hemûçkan bi hev re digotin "sehîh"

Ebû Cehlî dîsan ji bo îmtîham
Kelamek ji kufra xwe berda meyan

Wuha gotî bo Seyyîdê tacîdar:
- Bike halê karwanê me aşîkar

- çûye karîwanê me ta şehrê Şam
Ji ehwalê wan bêje me çend kelam

- Xeber ger bibêjî ji ew karîwan
Dikarim bipirsim ji sersarê wan!

Wuha gotî Peyxemberê serfîraz:
- Li Rewha me dî Karîwanê Hîcaz

- Hemî keftibûn pusterê rahetê
Ji cama xewê cumle der dehşetê

Institut kurde de Paris

- Hemî raketî bûn kesê Karîwan
Di hişyar û yeqze nebû kes ji wan

- Yekî kûzeyê pur ji abê zelal
Li nik re-sê yek karîwanê delal

- Hilanî me xwar abê Kûze temam
Xeber jê nebû sahîbeş der menam

- Şiyar bû ku ew merdê ez xwabî xwe
Yedê xwe dirêj kir ji bo abê xwe

- Temaşa dema kir ku Kûze tehî
Sual kir ji hemrah û eshabê wî:

"Evê abê min kî vexwarî heme?
Beyan kin evî sirrê mexfî li me!"

- Hevalan hemî gotine wî xeber:
"Ji ab û ji kûze me nedye xeber!"

- Teheyyur gelek man di fikr û xiyal
Xeber qet nezanîn ji abê zelal!

Ewî kafirê dilsiyeh Bo Cehil
Sual kir ji wî Mustefayê ehil:

- Eger rast te dîne kesê Karîwan
Bibêje çi wextî ku tên xak û man?

- Nîşanê di wan bêje me yek bi yek?
Ku da tê de em qet nekin reyb û şek!

Muhemmed fetih kir dihanê 'ezîz
Verêtin suxen şubhê durrê temîz

Institut kurde de Paris

Wuha gote wan kafiranê şeqî:
- Ku xurşîdê îro tulû'ê bikî

- Di ewel tulû'a bi şewq û bi nûr
Serê Karîwanî dê bîtin zuhûr

- Ku zahir bibîtin serê Karîwan
Yekî naqe exber di dest sarîwan

- Dikêşit li pêşrew qutarê deve
Nîşanek bi sihet bizane ev e

- Li ser pişta wê uştura exberî
çewalê ku xerwarê wî lêkirî

- Xirarek ji wan ebleq û yek siyah
Bibin muntezir hûn binêrin li rah

- Ku xurşîdê 'alem tulu' kit bi naz
Beyan dê bibit Karîwanê Hîcaz!

Me seh kir ku Bo Cehlê pîs ê sutûh
Du merdum şiyandin ewî ser du kûh

Ku tehqîqê kin vî kelamê bi nûr
Ku kengê dê bîtin tulû' û zuhûr.

Xweda gote Cibrîlê sahibhuner:
"Ji bo gotina Ehmedê namuwer

Xwe bighîne xurşîdê 'alem 'ecîl
Perrê xwe bide ber, eya Cibreîl

Mehêle tulû'î bit şemsê cîhan
Heta derkevit ewwelê Karîwan!"



Institut kurde de Paris

Di Burcê de ma afîtaba bi nûr
Heta ewwelê Karîwan bû zuhûr

Yekî gotî: "Wellahî, ev afîtab
Bi derket ji re-sê cebel bê hîcab"

Dîger gotî: "Wellahî, ev Karîwan
Bi derket li pêş wan e sersarê wan

Di dest Sarê wan naqeyea exber e
Xirarek reş û yek belek der ber e"

Sehîh bûn hemî gotinjê Mustefa
Ewê me'dena sidq û kanê wefa.

Ku pirsîn ji ehlê tîcaret delal
Ji ehwalê ew kûz û abê zelal!

Cewab da: -Belê abê me berze bû
Me şerbik hilanî ku av tê nebû

- Hevalê di me cumle sewgendê xwar
"Bi vê abê te em nebûn 'ilmîdar"

Ji van mu'cîzatê qewî zahîre
Ji van qewl û asarê purfaxîre

Veman der teheyyur ewan nakesan
Hemûçkan sukût kir wekî exresan.

Wuha gotine zatê Peyxemberî:
"Tu merdek 'eceb qabil û sahir î"

Welêkin heçî ehlê îslam û dîn
Li wan zêde bû î'tîqad û yeqîn



Institut Kurde de Paris

Bi quwwet gelek hatî îmanê wan
Li herdu cîhan zêde bû şanê wan.

Me seh kir ji rawî ku be'zê sehab
Ji tesdîqa Mî'raca 'alîcenab

Tehawunkirin kefte dil wan şikek
Li wan peyde bû reyb û şek endikek

Te'eccub kirin, merdumek leylekê
Biçit Şam û bêtin di vê endikê!

Welêkin ku dîn ev hemî mu'cîzat
Kirin terkê van xetre û weswesat

Peşîman-î bûn ew ji van gotinan
Bi tesdîqê çûn nezdê şahê cîhan

Kirin tewbe wan merduman ba edeb
Vegeryan ji wê î'tîqada 'eceb

'Ûmûm ehlê dîn kirne tesdîqa tam
Bi Mî'raca Ehmed 'eleyhîs'selam

Û hem kafiran wextê tehqîqê kir
Ji wan pir bi Mî'racê tesdîqê kir

Gelek hatine dinê îslam heman
Muqîr bûn bi Peyxemberî ew zeman:

- Qebûl in me ev şer' û ehkamê dîn
Didin şahidiya Nubûwwet çunîn

- Yek e ew Xwedayê ku îhsan kirî
Bi peyxemberî tu bi nîşan kirî



Institut kurde de Paris

- Birî erdê Şam û semayan hemî
Vegeryayî erdê Hîcazê demî!

Bi yumna cemala Muhemmed Resûl
Gelek kafiran dînê me kir qebûl

Welê ekserî man muddirrê 'înad
Heqîqê cehennem "we bî-sel mîhad"

Ji fesadî û cahilî, kafirî
Didan nisbeta wî bi bal sahirî

Heta wan sual kir ji ruhbanê Şam
Ewan rahibê ku di Mescid Meqam

Wuha kir kîtabet Ebû Cehlê dûn
Kîtabek ji bo rahibê 'abîdûn:

- Ku merdek ji cinsê me ehlê Ereb
Dibêjit li nav me kelamek 'eceb

- Dikit îddî'ayê ku "Peyxember im
Bi min bawerî kin, ku ez rehber im"

- Dibêjit ku: "Ev dînê we batil e
Heçî lê biçit ehmeq e, cahil e!"

- Hela van bihêlin, kelamek 'ecîb
Li nav me derêxistiye pur xerîb

- Dbêjit "Şevek çûme ta erdê Şam
Rucû' bûme dîsan li Beyt-il Heram!"

- Gelek enbiya û resûlê kubar
Hemî dîtine, goyiya bê şumar!



Institut kurde de Paris

- Ji wê çûye goya sema û bihişt
Li ew der gelek dîtine tişt û mişt

- Di vê gotinê em qewî şubhe ne
Li cem we ji van gotinan çi hene?

- Eger hûn dizanin ji van şey-ekê
Beyan kin ji bo me ji wan cuz-ekê

- Li nik me yeqîn e ku ehlê 'ulûm
Tijî ne ji ruhbanê ew merzê bûm

- Beyan kin li me, heq e yan kizb e ew?
Hela sahir e, yan ji nik Reb e ew?

Ewan rahibê Mescîd-ul Eqseyê
Ku bûn mutteli' ew li vê qiseyê

Bi vî terzî wan da cewaba Qureyş
Kî: -Ey serweranê xwedanhukm û ceyş

- Bizanin Şebê Bîst û Heftê Receb
Li ser 'adetê xwe bi keyf û tereb

- Ewan rahîbanê ku dîqqet dikin
Di vê Mescida pakî xizmet dikin

- Helestan ku bigrin derê Mescidê
Li ser 'adetê xwe bi emrê Xwedê

- Derê Meşrîqê bûye asê gelek
Di girtin nehat ew Derî çun felek

- Me çend cehdê kir se'yî bê feyde bû
Ewî babê taze muxelleq nebû

Institut kurde de Paris

- Me ustad û necarî anîn temam
Li wî bûne sa'î hemî xas û 'am

- Muhessel futûh ma ewî babê pak
Di girtin nehat qapiyê 'etrînak

- Me kir terka wî her wehe ma kuşad
Bi teqdîra wî Rebê cumle 'îbad

- Me zanî ku hikmet di qapî heye
Hemî cehd û se'ya me bê feyde ye

- Di subhê ku hatin derê Mescidê
Ji halê bi şev me eser lê nedî

- Me zanî Xweda kirye emrek zuhûr
Ji 'isyana wî papiyê sade nûr

- Li ber dergehî çun me danî nezer
Ji şopa piyê dabeyek lê eser

- çi dabe? ne wek dabeyê ev cîhan!
Ji asarê payeş me zanî heman

- Ji ehcarê qapî kevirkî 'ezîz
Me lê dî nîşan suqbeyek pur temîz

- Ji cuhra ewî sengê pak î kubar
'Eyan bû nîşanek ji rebtê dewar

- Wehem sexreyek dî li hewşê hebû
Kebîr û zerîf û giranwezne bû

- Dibînin ku rabûye sûyê hewa
Mu'elleq di cewwê zemîn û sema

Institut kurde de Paris

- Heta vê demê her wuha bê gezend
Bi mîqdarê yek qama însan belend

- Me zanî ku tiştek Xweda kir 'eyan
Me tesdîqê kir hukmê Xaliq çunan

- Eger ew recûl der Hîcaza nezîf
Dibêjit ku "ez çûme Qudsa şerîf"

- Ji bo we mu'erref dikit Mescidê
Yeqîn kin resûl e bi emrê Xwedê

- Li pêş wî mebin qabil û hember e
Bizanin ku sultan û peyxember e!

Mufessel ku ev gotina isreyî
Ji ruhbanê wê Mescid-îl Eqseyê

Giha cumle sendîd û qewmê kufar
Nekirne qebûl ev durrê şahîwar

Veman her wusan ew li ser kufra pîs
Ewan le'netiyê ji kufra xebîs

Welê ehlê îman muferreh temam
Ji ber ev xeberdanê ruhbanê Şam

Li wan zêde bû dîn û îman gelek
Bi îxlasî borîn ji qismê melek

Ji vir pê ve Mî'racî bû aşîkar
Zelîl û teres mane qewmê kufar

Ji xawer heta baxeter serteser
Ji Mî'raca Ehmed belavbû xeber

Institut kurde de Paris

Ji Mi'raca sultan xelas bû kelam
Li ser wî hezran selat û selam.

Şukur bo Xwedayê kerîmus'sîfat
Ku bûm mu'teqîd bo heme mu'cîzat

Bi van mu'cîzatan qewî bawer im
Bi îxlasa xwe kelbê Peyxember im

Heçî aniye wî Resûlê mezin
Ji sûyê ewî Xaliqê îns û cin

Eger çi mufessel we ger mucmel in
Hemî şer' û ehkamê pur efddel in

Bi cumle me îman heye, mûqîn im
Bi ezman muqîrr im, bi dil mumin in

Ela ey Reûlê bi heq, rahîber
Li nik hezreta Rebê min mu'teber

Dizanim li pêş î diwê hezretê
Ji bo Ebdurrehman bike riqqetê

Şefa'et bike min zelîlê zebûn
Ku der narê dûzex nebim sernugûn

Eger destegîrî nekî ey hebîb
Mekanim se'îr e di pêt û lehîb

Ji 'isyan me defter gelek reş kirin
Bi wan rûh û can pur muşewweş kirin

Li min cem'î bûne guneh wek cîbal
Ji barê guneh bûme şubhê hîlal

Institut kurde de Paris

Feqîr im, hezîn im, zelîl im gelek
Gunahê di min çûne çerxa felek

Tu rehmet ke ser min eya Mustefa
Mehêle tu Rûhî di cewr û cefa

Qewî rûreş im, muznib im, sifrîyed
Li etrafê min zenbê min bûne sed

Teheyyur gelek mame ender xeta
Li ser min veke babê littf û 'eta

'Emel nîne der destê min zerreyek
Nemaye sipî defterim nuqteyek

Bi xeflet me 'umrê xwe kir telf û fewt
Nizanim çewa can bidim halê mewt

çi halî bibînim di wê qebra kûr?
çi ezyet bikêşim ji dest mar û mûr?

Cewaba Nekîrî digel Munkerî
çi bêjim di wê xaneya bê derî?

Dema Nefxa Sûrê bibit der qiyam
Bi çi rûreşî bim ji qebrê qiyam?

çewan dê murûrê bikim ser Cisir
Bi ev zenbîdarî kemalê xusir?

Dema biçme ber wezna e'malê xwe
Siyehrû û şermendê ef'alê xwe

Dizanim ku wezna minê bed'emel
Giran bit ji şerran û fi'lê dexel

Institut kurde de Paris

Xweda çun me bînit hîsaba gunah
Bi vî xibsê ef'al û rûyê siyah

çi bêjim ji bo wî Xwedayê kebîr
Cewabek evan sûc û zenbê kesîr?

Nîhayet di destê me ma rehmetek
Ji zatê Xweda ew bikit ni'metek

Bişîne meded Ehmedê pur cemal
Zemanê ku bê helqê rûhê delal

Bi wî haletê nez'a rûhê şêrîn
Bişîne meded Xatem-el Murselîn

Ku rewhaniyê Mustefa bit 'eyan
Li ber balgehê min bibîtin beyan (4)

Bikîtin hifiz dîn û îmana min
Ji îxwayê ev nefs û şeytanê min

Nekin selbê îmana min ew xebîs
Bi cahê Resûlê li 'alem reîs

Eger çi me nîne 'emel biçme jor
Neçim barî bê nûra îman di gor

Hifiz ke Xwedaya di wê qebra kûr
Evî laşê murdarî ez mar û mûr

Di weqta suala ewan qasida
Bide min tu nuqtek sewab ey Xweda

Cewaba ewan ez bidim qenc û pak
Ku da ez nebim rûreş û derdinak



Institut kurde de Paris

Ji nûra Muhemmed Resûlê mezin
Di wê zulmetê hilke şem'ek li min

Meke ey Xwedayê bi heq muttesif
Di qebrê de eddla'ê min muxtelif

Xwedaya bi heqê Resûlê kubar
Bikî qebra min rewşen û nûrîdar

Mekêşe bi Rûhî 'ezabê qebir
Li ser vî 'ezabî mi nîne sebir

Di weqtê qîyamet ku bit Nefxê Sûr
Di jêrê lîwaya Resûlê bi nûr

Heşir ke evî Şemsiddînê feqîr
Di çengê 'ezabê meke min esîr

Di zumra Resûl û di zumra sehab
Heşir ke minê mucrim ê dilkebab

Li ser wê Sîrata bi kerb û keder
Wekî "Barqa Xattif" bide min gezer

Mepirse li mîzana e'malê min
Veşêre sicîla di ef'alê min

Mi riswa û rûreş meke el eman
Di nav ehlê mehşer bi zenbê giran

Eger tu bipirsî sual û hîsab
Vemam ez bi teşbîhê xer der xîlab

Nizanim çi bêjim cewaba gunah
Dizanim ku sifr-îl yed im, rûsiyah

Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Mi şermî meke nav refîq û heval
Bi ef'alê napak û zenb û webal

Bide xatirê Seyidê esfiya
Evan zenb û 'isyanê şubhê çiya

Du firqe ku bin ehlê mehşer kebîr
Ferîqek di cennet yekê der se'îr

Bi zatê xwe kî ey Xwedayê mezin
Terîqa cehennem mede pêşê min

Bi heqqê şehê Yesrîb û Mekkeyê
Digel 'asiyan min meşîn dojeyê

Eger çi ku ne derxurê nî'met im
Ne erbabê ev nî'meta cennet im

Welê rehmeta te kesîr e 'emîm
Eger min neşînî 'ezabê cehîm

Ji bo min feqîrî bibî desregîr
Terîqa bihiştê bidî ber feqîr

Digel zumreya Ehmedê ixtîyar
Bişînî bihiştê qewî nazîdar

Ji rehma te nuqsan çi bit ey Îlah
Ku nî'met bidî Rûhiyê rûsiyah?

Eger ne ku mehdda şefa'et bitin
Ji zatê Xweda lutf û rehmet bitin

çewan dê xelas bim ji cenga 'ezab
Tevî van gunahê qewî bê hîsab?

Institut kurde de Paris

Ku nîne ebed zerreyek fi'lê qenc
Di ta'atê Mewla nekêşaye renc

Telef kir di xeflet me 'umrê 'ezîz
Ji fi'lê me şeytan nifûr e, gezîz

Eger çi ku şeytan dikir rehberî
Ji bo min bi zenbê qewî esxerî

Ji bo ehlê 'isyan ku serdefter im
Bi sêsed kebîre nuha rehber im

Bi vî terzî xerq im di behra gunah
Bi cuz rehmeta Heq nehin min penah

Nehin min wesîle bi xeyrî rica
Bi rehma Xweda min kirî îltîca

Di destim de tewhîda zatê Xwuda
Digel baweriya bi şahê huda

Heye şukr-ulîllah ku ez muslim im
Welêkin qewî 'asî û mucrim im

Eger çendî 'asî me bê ta'et im
Şukur bo Xweda ez ji vê ummet im

Nehin min tu melce, feqîr im, melûl
Bi xeyrî şefa'et ji zatê Resûl

Musulman im û mumin im, bê şek im
Ji 'ussatê vê ummetê ez yek im

Heye min umîdek ji heddê zîyad
Ji eltafê Ehmed Resûlê 'îbad

Institut kurde de Paris

Şefa'et bikit min feqîrê hezîn
Di roja heşir Seyîd-il Murselîn

Di roja qiyamet ku ehlê selah
Bi naz in, bi tta'at û fi'lê felah

Qewî muflis im, rûreş im, purgunah
Dizanim bi rehmet 'emîma Îlah

Digel hubb û 'işqa Muhemmed Resûl
Digel hubba cumle sehabê qebûl

Li dunya, li axret di dest Şemsiddîn
Nehin xeyrî rehm û mehebbet yeqîn

Ela ey Resûlê bi qewlê sedîd
Yekî kelbê zar im li bab û wessîd

çu wî kelbê Eshabê Kehf û reqîm
Digel xubsê eslê necaset zemîm

Bi hubba ewan sakinê Kehf û Xar
Xweda lê kirin ni'metê bê şumar

Sehîh e ku ew dê biçit cennetê
Ji bo hubba ehlê selahîyyetê

Be'îd e ji eltafê te ey Nebî
Fîda xakê payê te ummî, ebî

Ku biçme cehennem digel ev xeber
Ji hubba te der dil heye pur eser

Ne wek kelbê Eshabê Kehf im yeqîn
Qewî mumin im, mûqîn im, ehlê dîn

Institut kurde de Paris

Eger çi ji xubsa gunahim xebîs
Welê min hene gotinê pir nefîs

Di wesfê te de ey Resûlê Îlah
Ku pê xeslê kim cumle xubsê gunah

Ji bo te bese mertebe Rûhiya
Ku meddah î bo serwerê enbiya

çikî tu bi dunya û cah û neşeb?
çikî tu bi e'mam û qewm û neseb?

Bi deryûze û parsekî çun geda
Medihxwan veweste li babê huda

Ne teb' e ji bo kanê cûd û sexa
Ku mehrûm bikin medhîxwanê geda

Eya Seyidê serwerê cuz û kul
Şehê dîn û sultanê cem'a rusul

Cesaret me kir zêde terka edeb
Ji ewsafê te ey me'alî ruteb

Me anîne nezmê hinik şi'rê qenc
Me vê ra qewî dîtiye te'b û renc

Ne te medhê kim ez bi elfazê xwe
Welêkin dikim 'erzê exrazê xwe

Eger min qusûr kir bi nabexredî
Me avêt ji ber xwe heya û fedî

Qewî ye dilê min bi eltafê te
Rehîm e qewî ew dilê saf ê te

Institut Kurde de Paris

Bibore di 'eyb û qusûrim temam
Bi rehma xwe ey Seyîdê xas û 'am

Ji min medhetê şahê 'alîcenab
çira û fitîl e li pêş afîtab

Bi mehcûbiyet ez qeti' kim kelam
Bikim ahî ber babê Reb-îl enam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar.

---

1- Beşa 34 an, di derheqê xeberdana Pêxember a di sibeya şeva Mî'racê de, ji kafir û misilman û dostan re ye.

2- Ûmmîhan, keça Ebûtalibê mamê Pêxember e. Navê wê yê rast, Faxîte ye.

3- Lahût: 'Alema îlahî ya xeybê.

4- Ev nívmalik di çapa Qoxî de weya ye:
"Ku rehxaniyê Mustefa bit 'eyan"

Institut kurde de Paris

# BEŞ 35

## BENDÊ XAMIS WE SELASÛN*

## DER Î'TÎZAR Û XATÎMEÊ KÎTAB

Institut kurde de Paris

Bi îsmê Xwedayê 'ezîz ê kerîm
Bi hemdê ewî zîlcelalê 'ezîm

Digel pur selat û selamê mezin
Li ser Ehmedê seyidê îns û cin

Li ser al û etba' û sehban heme
Bikim îbtîdayî evê xatîme.

Were saqiya bîne esbabê xwe
Tu sergermî ke dîse eshabê xwe

Lebaleb ke dîsan tu eqdahê me
Ziyade bike keyf û efrahê me

Were saqiyê bezma dîlber were
Bikin 'işretek axirê deftere

Derîn saxer û satekînî û cam
Bike muntezem taximek bît'temam

Birêje qedeh badeya hukmîdar
Ji vî 'eqlê xwe bûme zar û nezar

Li îbnî sehabî bi terz û edeb (1)
Nikah kin bi qanûnê bint-îl 'ineb

Di nav wan dema çêbitin ev wîfaq
Bidim 'eqlê xwe der buhayê sîdaq

Ji derdan nema 'uzwekî min sehîh
Ji min hiş bibe da bibim musterîh

Me seh kir ji qewlê tebîban yeqîn
Tebîbanê haziq digotin emîn:

Dema leşkerê xwe bikîtin hucûm
Li ser kîşwerê dil bi seffê humûm

Nehin xeyrî bade tu feryadîres
Ku leşker bikit şubhetê xar û xes

Yeqîn ke eya saqiyê nazîdar
Li ser dil vewestane xem bê şumar

Ji her çar teref top û cebxaneyê
Helek bestine dora vê qel'eyê

Me nîne kesek bête îmdada me
Wekî şêrê merdan di feryada me

Nehin qabilîyet ku bigrim sîlah
Li meydan bikim cengê da bim felah

Me îmdad e pîrê muxanê mezin
Ji meyxaneyê bête feryada min

Institut kurde de Paris

Digel satekîn û surahîyê mey
Ewan yadîgaranê Kawûs û Key

Belav kit ji ser min evan leşkeran
Şikestî bikit cumleyê 'eskeran

Dizanim eger ne şeraba 'etîq
Me derxit ji qe'ra vê behra 'emîq

Hilak bûm di deryayê behra keder
Perîşan e halim ji ah û keser

Di erdê de man herdu pa ez girîn
Ji hukmê şerabê bide min kenîn

Me wenda ye dîlber, cîgersûz im ez
Bi ah û bi efxan û dildoz im ez

Ewê nazika nazenîn a şepal
Ji min dûr e ew dîlbera çevxezal

Bi heqqê ewan zulf û xalê nîgar
Bi heqqê ewê bejn û bala kubar

Peyapey bide abê meyxaneyê
Tesellî bide dil ji peymaneyê

Ji xummê mezin bîne abê 'etîq
Birrêje di nav satekînê 'etîq

Binoşim li şewqa nîgara şêrîn
Muferreh bibit qelbê zar ê hezîn

Bide saqiya badeya pertewî
Ku her cameyek Taca Keyxusrewî

Institut kurde de Paris

Ku îro li textê mehebbet şeh im
Ji esrarê 'işqê hemî ageh im

Ne heyf e evî qelbê sade ji nûr
Bimînit di qe'rê bîharê di kûr?

Werîn saxerê çun gemî muhteşem
Bi keştî xelas bim ji deryayê xem

Bi hîcrana dîlber nema min quwa
Di narê muhebbet de cîsmim hewa

Vekuj ateşê dil bi abê şerab
Ku hêj nenwe xak ev wucûda bi tab

Eger destegîrim nebî tu bi cam
Ji hîcran nema taqetim wes'selam

Yeqîn ke di nav ateş e qelbê min
Ziyade demadem evî kerbê min

Eger çi ku yarim heye çun perî
Welê dûr e ez çeşmê min yekserî

Bi wesla hebîbê ku nabim fereh
Çikim saqiya ger nenoşim qedeh?

Yeqînim ev eŞ ger nenoşim şerab
Dibim ez ji ber ateşê dilkebab

Bide saqiya camê lebrîzê mey
Bike qelbê mecrûh ê min dax û key

Werîn banûwê kuncê meyxaneyê
Ewê doxtê zer nûrê kaşaneyê

Institut kurde de Paris

Ku pê sebra dil bêt bedel yara min
Xefîf bin hinik derd û efkarê min

Were saqiya axirê meclis e
Hinik saxeran bîne îcar bes e

Me ev deftera xwe giyand axir e
Were cam û eqdahê me dagire

Binoşim qedeh "be'de kullî hîsab"
Ku da xetmê kim nezma şêrîn kîtab

Were saqiya bezma me bû temam
Fecir da ji meclis bikin em qiyam

Wekî xwe dilê pur bi tab û bi teb
Ji bo reşfê eqdah e her teşneleb

Tu sîrabî ke vî dilê pir elem
Bi abê surahî di van camê Cem

Bixwîne du'ayê qedeh yek demê
Ji hizreş li derdim bide merhemê

Bide gerdena saxerê qulqule
Ku vêra binalim wekî bulbul e

XulaseŞ meqêrre tehî cama min
Muselsel bide subhê min şamê min

Bide saqiya bigre mexmûrîmest
Ku ez bûme bêşubhe badeperet

Ku badeperest im bide aşîkar
Evê badeya tazerû ya kubar

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Bide min ku surxî 'eyan bit li rû
çiku ze'feranî me wek tarê mû

Fîraqa ewê dîlbera nazenîn
Ji min bir evî rûhê pak ê şêrîn

Evî cismê min maye bê rûh û can
Teheyyur di deryaya 'işqa giran

Bi heqê xwe kî saqiya bîne cam
Ji nû berde cismê me rûhek temam

Bide min heyatek ji hukmê şerab
Wegerne yeqîn bûme xak û turab

Were saqiya 'umrê min bû xelas
Li 'umrê me deyne ji nû ve esas

Bi te'cîlî bîne tu rritlê giran
Tedaruk bikim mameddayê zeman

"Qum îmla lîye-l ke-se fes'subhu lah
We qed înqeddel'leylu wed'dîku ssah" (2)

Xesil ke ji ednasî qelbê hezîn
Bi eqdahê wê badeya nazenîn

Bide saqiya bigrî bint-îl kerem
Me bîne wucûdê ku bûme 'edem (3)

Bide badeya taze ya mustettab
Ku şeyxê herem ew dikîtin şebab (4)

Menêre li zuhhadê zahir perest
Nizanin bi ehwalê 'uşşaqî mest



Institut kurde de Paris

Bibêje ji bo zahidê dilnifûr
Ku Rebim 'efuw e, kerîm e, xefûr

Rehîm e Xwedayê me ser muzniban
Were saqiya deng bide mutriban

Me 'umrê xwe serf kir di qîl û di qal
Were saqiya zû ku teng e mecal

Bide saqiya xemrê wek Selsebîl
"Lî tehd-îl fuade, lî ehdes'sebîl"

Denes girtî zihnim ji 'ilmê rusûm
Li ser min giran bûne barê humûm

Xusûsa nîgara me bûye be'îd
Di vî halê hîcrana zor î şedîd

Ku îhsan nekî ser minê dilbikul
Bi wê saxera badeya şubhê gul

Muheqqeq bike dê fena bim yeqîn
Ji ber hîcra vê dîlbera nazenîn

Were saqiya qet'î ke me'newî
Evan cumle xem û hemê dunyewî

Ku qelbê me bit rewşen û nûrîdar
Li min sirrê 'alem bibin aşîkar

Li ser min 'eyan bin deqaîq ji xeyb
Ku saf bit dilê min ji neqs û ji 'eyb

Bide badeyek ateşî ey nedîm
Ku ihya dikit 'ezmehayê remîm



Institut kurde de Paris

Qerîb e ku ev meclisa me temam
Bibit, qet'î bit şi'r û beyt û kelam

Tu jî qet'î ke saqiya bê fitûr
Ji min van hemî derd û ahê di kûr

Emir ke ji bo mutribê nexmedar
Ku nexme bikêşit wekî mûsîqar

Li ahengê nay û li awazê 'ûd
Bibêjit ji bo me meqam û surûd

Muxennî, muxennî, muxennî eman
Bi tab û teb e ev dilê natuwan

Demek sazî ke 'ûd û qanûn bi lez
Dilê pur elem dîse bî çerx û bez

Bizan axirê meclisê bû qerîb
Dikim qet'ê kim van kelamê 'ecîb

Wîda' kim ji bo mehber û xameyê
Ji destê xwe deynim vê musweddeyê

Xetim ke tu jî meclisa şa'iran
Bi rast û Hîcaz û Seba, Isfehan

Bide îstîrahe ji bo qelbê min
Vekuj be'zekî ateşê kerbê min

Ji 'uşşaq û sîgah û Newroza pak
Xetim ke tu jê meclisa 'etrînak

Muxennî dilê min dikit zariyê
Bi ah im li ser vê emekdariyê



Institut kurde de Paris

Min û xameyê pir emek dîtine
Gelek zewq û keyf û henek dîtine

Di vê axirê em dikin el wîda'
Ji bo xameya pir bi nûr û şua'

Muxennî muferreh ke qelbim birûd
Evê meclisa me bike pur surûd

Muxennî bibêje demek nexmeyê
Tu jî saqiya bîne wê badeyê

Bidim çendî bûse li bint-îl 'ineb
Bi van sazê te qelbê min bî tereb

Bi awazê saz û bi cama şerab
'Imaret bikin enderûnê xerab

Hezîn e dilê min ji ber firqetê
Ferehkî bide min ji wê şerbetê

Muxennî keremke hilîn sazê xwe
Li ser min bike eşkera razê xwe

Ku teskîn bibin em bi dengê neyê
Dîmaxê tijî kin ji xemr û meyê

Dema bête fikra me wextê wîsal
Wîsala ewê nazika çavxezal

Eger çendî dûr im ji yara kerîm
Dibit ku bi saz û bi cama qedîm

Teselî hinik bête dil ez fîraq
Xefîf bin evan barê "malayuttaq"

Institut kurde de Paris

Muferreh bibin em di vê axirê
Bi keyf û fereh xetmî kin defterê

çiqas ez difikrim li halê cîhan
Neyar e ji bo 'aşiq û şa'iran

Difikrim di mabeyna erd û sema
Esasê hemûçkan li ba û hewa

Evê kunbeda lacîwerdî felek
Lebaleb ji rîh û hewa ye gelek

Ku madem hewa ye cîhan serteser
Xonok merdumê serkeş î mu'teber

Nebû mubtela ew bi vî pîrê pîs
Nebû şehwerê ev 'ecûzê xebîs

Nekêşa bi beyhûde renc û cefa
Nekir wî esasek li sethê hewa

Serîrê Suleyman ku ser bad-î çû
Binêre çewan mehw û berbadî bû

Kuca Gêyo, Kawûs û Cemşîd û Key?
Kuca namîdaranê ser xeylê hey?

Kuca Rostem û Newrez û Erdehan?
Kuca Behmen û Zal û Noşîrewan?

Kuca namîdaranê ba tebl û kûs?
çi Şapûr û Goderz û Gurgîn û ttûs!

Kuca Adem û Nûh û Hûd û Şu'eyb
Resûlanê yekreng û bê neqs û 'eyb?

Institut kurde de Paris

Kuca enbiya û resûlê berî
Ku bûn derxurê taca peyxemberî?

Hemî çûn û nayê ji wan qet xeber
Di zîrê zemîn cumle girtin meqer

Me nîne ji wan 'ilm û ageh 'ceb
Bi huzn in gelo yan bi keyf û tereb?

Ji bo me qelawuz bizan zahiban
Li me muntezir mane wek raqiban

Nema bêne nik me heçî çûne pêş
Emê biçne nik wan bi derd û bi êş

çi hal e ji rengê nuqûşê cîhan
Dibêjin ji bo me bi nutq û zeban?

Mebin xerre "ya eyyuhel xafîlûn"
Bi vê dewra eflakê serwajîgûn

Nuwazeş gelek daye şah û wezîr
Tene'um gelek daye axa û mîr

Nîhayet ji bo wan nekir wê wefa
Bi sed zarî û te'b û cewr û cefa

Bi tîxê xezeb ew birîndar kirin
Temam terkî dan û bi zarî mirin

Ji paş çendî rojan ji mergê di wan
Here ey birader di nav qebrê wan

Di halê ewan tu bifikre bi dil
Bibîn halê wan cumleşan jêrê gil

Institut kurde de Paris

Ne sultan xwedantac û tomar û text
Ne derwêşê muflis kefen nîne sext

Bi pênc rûzê be'd ez wefatê heme
Musawî dibin cîsm û zatê heme

Ev e axirê vê cîhanê yeqîn
Ji bo her kesî zehr e der engebîn

Bi kes re wefa nîne, xeddar e, dûn
Evê tersê dewran semaê nugûn

çu ev bit nîhayet wefaya felek
Bi şimşîrê xedrê qetil kir gelek

Xweşa aşiqî mulketê şa'irî
Ji mewcûd û me'dûmê herdu berî

Ji mulkê qena'et nehin qencîtir
Fenayê qebûl nake ev gencî pir

Li textê qena'et ku bî padîşa
Hemî şah û sultan li nik te geda

Bi dil destî berde ji ev bê wefa
Ku hubbê cîhan re-sê kullê xeta

Li Qafê qena'et wekî Şemsiddîn
Tu sîmurxî be seyra 'alem bibîn

Ne wek qertelê pîs ê mirdarîxwar
Herîs be li ser vê cîhana xedar

Wefa nîne dunya ji bo hîçî kes
Mede î'tîmada xwe ser yek nefes



Institut kurde de Paris

Xususa ji bo qismê ehlê edeb
Bi qehr û bi xedr e, bi kîn û te'eb

Heçî merdumê 'alim ê şa'ir e
Bi kîn e, di heqqê wî ev sahir e

Heçî merdumê ehlê 'ilm û edîb
Di nêv ehlê dunya seraser xerîb

Li ser keyfa wan nake dewran felek
Di vê namuradê hezîn in gelek

Zemîn û sema du kevir asiya
Di mabeyna wan gendum in Rûhiya

çewan ehlê fezl û beyan û kîtab
Xelas bin ji nav du hecer asiyab

Bi te'n û bi cerh in hemî faddilan
Ji ezmanê pîs ê evan cahilan

Xwedayê me teqdîrê kirye wuha:
Ku ew qencê feddl in hesed ejdeha

Dibin hifzê ev 'ilm û feddlê di wan
Bi van cahilê hasid ê sergiran

Xerîb in heçî ehlê 'ilm û edeb
Xerîban nehin hîçî keyf û tereb

Tereb nîne der qelbê sahibdilan
Fereh nîne der batinê kamilan

çisan keyf û ferh û tereb bête dil
Heçî ku ji cewra felek qelbîkul?

Institut kurde de Paris

Bi cerh e dilê ehlê fezl û kemal
Ji ber zihnê teşwîş û fikr û xeyal

Eger çi felek yara na sadiq e
Xusûsa ji bo zumreya 'aşiq e

Li ser 'aşiqan zêde ye kerb û kîn
Didit qelbê wan hinde cerh û birîn

Dikit wan mukedder bi hicra hebîb
Bi narê fîraqê dilê wan kebîb

Ji ber tarê mû gah dibin tarîmû
Ji surxiyê rû gah dibin zerdîrû

Ji tîr û kemanê muje ebruwan
Vewestane leşker li her çar suwan

Li dil gah dibarin elem muttessil
Dikin mulkê dil xirbe û muddmehil

Gehî têne dil eskerê xem bi sef
Dibestin wekî helqe her çar teref

Nehin mexrecê 'aşiqê bê eman
Ji van cewr û zulmê muqîm ê zeman

Xusûsa ji destê reqîbê nekes
Dilê me 'uşaqan wekî xar û xes

Reqîbê ku teşbîhê îblîs in ew
Xwedanmekr û tezwîr û teblîs in ew

Siyehkar û nalayîq û rûreş in
Hecerqelb û xennas û dilpirxeş in



Institut Kurde de Paris

Şerîk in li me 'aşiqan ew 'ezab
Ji cewrê di wan têkde xanexerab

Wekî cism û saye welêkin xerîb
çu melzûm û lazim 'uşaq û reqîb

Heçî 'aşiq in daîma dilbirîn
Ji destê reqîbanê napak ê dîn

Eger rehm-î bêt qelbê dîlber demê
Li cerhê feqîran bikit merhemê

Dibin muntezir ew reqîbê xebîs
Bi sed dîde qellaşê fettan ê pîs

Ku 'aşiq negîjin muradek tu car
Qewî murteqîb da nebin kamîdar

çi hal e nizanim di dewrê zeman
Nehin îstîrahet ji bo bêdilan

Ne nî'metxurê xwanê wesla hebîb
Ne rahet ji cewr û cefayê reqîb

Ji destê ecanib bi tte'n û melam
Ji cewra zeman bê murad û meram

Bi jan in, bi êş in, bi derd in qewî
Zeîfhal û bêtab û zerd in qewî

Hezîn in, feqîr in nehin ferh û keyf
Elemkeş çu bulbul di fesla xureyf

Ev e halê me 'aşiqan her zeman
Li dunya nehin hîçî rehmet eman

Institut kurde de Paris

Biçin kê derê em ji cewra felek?
çi hal e dibînin ji dewra felek?

çira hinde em zar û bê sahib in?
çira hinde pir 'azil û 'atib in?

Felek bo me hinde xedar e, çira?
Cîhan bo me hinde neyar e, çira?

Ji bo 'aşiqan bo çi hinde qetîl?
çira me disûzit bi zeyt û fetîl!

Bi vî narê hirman çira bêkesan
Disûzit bi teşbîhê xar û xesan

Eman ey felek bes bike serkeşî
Bese hinde nakamî û naxweşî

Nema em tehemul dikin cewra te
Bi kamê me carek nebû dewra te

Bitirse ji ahê me der subhegah
Bi yek şûle ateş bikin te tebah

Hedim kin evê qesra te pur meşîd
Bi van şîşeyê ahê tîz ê hedîd

Ne vala ye qelbê 'uşaqê hezîn
çu 'ummanê zuxar û qulzem yeqîn

Eger çi bi zahir perîşan in em
Welêkin di battin de sultan in em

Xwedanleşker in em bi ceyş û heşem
Hemî eskerê me sufûfê di xem

Institut kurde de Paris

Hezer ke ji hukmê me ey heft tebeq
Te yekser bikim xwîn bi şubhê şeqeq

Ji bo 'aşiqan cumle xeddar î tu
Muqîmî neyar û siyehkar î tu

Xusûsa ji bo Rûhiyê Axtepî
Ziyade bi kerb î, bi kîn î, çep î

Ne heyf e ku vî tûtiyê pur delal
Bihêlî tû bê nuttqê şêrîn ê lal?

Neda te muradek ji bo min tu car
Bi te nakim ez hîçî hîç î'tîbar

Evî şahê kîşwergehê şa'irî
Evî serwerê mulketê sahirî

Meke ey felek hinde zar û zelîl
Bi hicra hebîbê meke min 'elîl

Ez im Ebdurrehmanê sahibhuner
Şehînşahê mulkê suxen serteser

Xwedanfezl û sihr û kelam û edeb
Şehê şa'irê Kurd û Rom û 'Ereb

'Elemdarê iqlîmê şi'r im temam
Mufewwedd ji bo min re nezm û kelam

Ku bigrim di destê xwe rumhê qelem
Ji nezmê li 'alem bilind kim 'elem

Bikêşim zebanek wekî Zulfeqar
Li meydan vewestim bi tebl û niqar

Institut Kurde de Paris

Heçî ehlê fezl û neqaret yeqîn
Qebûl kin hemî beyreqa Şemsuddîn

çikim ez bi mulkê cîhana tebah
Ji bo hîmmet im xercê yek rûz e rah

Ji fikra xwe min kanê hinde guher
Diye, her guher têk cîhan serteser

Evî teb'ê min bulbulê dengîxweş
Di vê çîmenê muxniyê rengîxweş

Hemî wext û ezman dikîtin nefîr
Eger çend esîrê qefes bit feqîr

Ji bo 'eqdê ezmanê têk şa'iran
'Eceb nusxe ye ev kelamê giran

Heçî wextê ez bême nutqa delal
Zebanê hemûçkan dibit qet' û lal

çi wextê dilêranê şi'r û beyan
Zebit kin cîhan şubhetê pehlewan

Sefaram e dîsan di nav wan heme
Xwedanheşmet û şewket û demdeme

Evê xameya min wekî ejder e
Ji bo genca me'nî ku pur gewher e

Ji femmê ewê ejdera nûrî, beyt
Muşe'şe' dibîtin wekî pêt û zeyt

Eger bême de'wa riyaset bikim
Bi fexrîye de'wa keramet bikim



Institut kurde de Paris

Ji tesîra enwarê vê xameyê
Beyan kim gelek xarîq-ul 'adeyê

Muqîr dê bibin cin û îns û perî
Bi hukmê emin şa'ir û sahirî

Mîdada devê xameya şubhê mar (5)
Ji yaran re tiryaq e, zehrê neyar

Keramet bese ev ji bo nezmê min
Nikarin tu şa'ir ku bin rezmê min

Bi vî terzî şêrîn e ev şi'rê min
Wuha hulw e ev şekkerê fikrê min

Heçî ku bixwînin ji qelbê kebab
Wekî şehdê şêrîn dibîtin lî'ab

Dibin mest û serxweş cemî'ê melek
Hemû ew li sethê refî' ê felek

Eger saqiyê teb'ê min bête bezm
Birêjit qedeh badeyê şi'r û nezm

Xewasek 'ecêb im bi fikrê deqîq
Ji qe'ra bîharê qerîha 'emîq

Deranîne min cewherê me'niyan
Ku her cewherek têk bi mulkê cîhan

Evê nusxeyê wezn û eş'arê min
Evan wufqê ebyat û guftarê min

Eger têketa dest hekîman berî
Dikir hirzê der'ê li Eskenderî (6)

Institut kurde de Paris

Weger peyde bûya li nik Qeyseran
Mutterez dikir wan li tacê seran (7)

Zemanê xwe, ustadê nezmawer im
Ji bo şa'iran cumle serdefter im

Kelamê di min qîmeta cewherî
Şikêna di dukkanê têk cewherî

Bi muştê evî fikrê xwe min şikand
Derê gencê me'nî hemî darijand

Dibînim hemî kes di nezmim 'emîm
Demê Îsewî û 'Esayê Kelîm (8)

Ne wek xameyê min çu ttûttî hene
Ne wek bikrê fikrim çu mestûre ne

Ne mislê kelamê me qend û şeker
Ne wek nezmê min şehdê şêrîn eser

Evan xemzeyê xame yê min temam
Bi şoxî dikin muftetin xas û 'am

Ji xame birêjim mîdada çu mişk
Yeqîn 'enberê ter dibit pîs û xişk

Ji nexşê evê xameya nazenîn (9)
Xecil bûne Erjeng û Manî li çîn

Eger ez birêjim kelaman ji dil
Xecil dê bibin şoxê çîn û çigil (10)

Bihayê durrê gotinê Şemsiddîn
Evê dewra dinya nizane yeqîn

Institut kurde de Paris

çiku ev cîhana bi mekr û te'eb
Qewî munkir e ehlê fezl û edeb

Eger çi dilêranê şi'r û beyan
Hene pur bi ze'ma xwe têkde fulan

Welê dîse xesmefkenê şa'iran
Bizan Rûhî ye her bi gurzê giran

Mesîhê dem im ez di nezma selîs
Ku îhya dikim sed nifûsê nefîs (11)

Hezar çeşme abê heyata neqî
Di vê zulmeta xameya min xefî

Ez im yeke tazê di vê 'erseyê
Di destê xwe bigrim dema xameyê

'Eceb zelzele têne qebrê ewan
Nesîhê ku borîn qedîmê zeman

Eger biçne Şîrazê şi'rê bi naz (12)
Li ser qebra Se'dî dibîtin tiraz

çu ustadê şi'r û xezel Hafiz e
Di şi'rê me'anî 'eceb hafiz e

Welê Hafizê wext im ez bê xîlaf
Nehêla ji bo şa'iran min mesaf

Şeh im ez li textê kelam û beyan
Di bin hukmê min şa'iranê zeman

Du sed wek Ferezdeq Eb-ul Behterî
Hezar Esme'î, Nabî û Exterî (13)

Institut kurde de Paris

Di fitraka min tên xeraman temam
Dema ez suwar bim li rexşê kelam

Gelek Rûdekî, 'Escud û 'Enserî
çu Firdewsî û Newres û Emwerî (14)

Ji sifra kelamê min in rêzeçîn
Ji ser heddê Rom ta bi iqlîmê çîn

Hîlalî û Xaqanî û Bo Newas (15)
Kirin jêrê destê xwe min bê qiyas

Ku bigrim di destê xwe ez xameyê
Bi heybet bigêrim li ser nameyê

Qelem reşherêz bit bi xemra cinan
Hemî ehlê 'esrim ji îns û ji can

Ji tesîra sehbayê min mestî bin
Hemî walih û dehş û bindestî bin

Xulase, di îro ez im şehriyar
Di iqlîmê şi'r û xezel tacîdar

Serê goşeyê taca min bê xîlaf
Li ber çerxa xurşîda nûrîn şîfaf

Eger çi ku de'wa riyaset dikim
Li şi'r û kelam ez siyaset dikim

Li nik min nehin de'weyê bê delîl
Hemî gotinê min bi şert û kefîl

Huner min ji şuhret ziyade heye
'Ettayek xusûs e ji Rebê me ye

Institut kurde de Paris

Ne wek teblê ku sewtê 'alî bitin
Welê daxileş boş û xalî bitin

Kesê şubhe kit vî kelamê di min
Bira bête pêş ew digel encumin

Bikin îmtîhanim "Mehek" bête pêş
Ku cumle bibin mubtela û dilêş

Kî ye ew bibit munkirê sihra min
Bikit herfegîrî li vê fikra min?

Ji bo pehlewanê suxen, essela!
Kî ye bête cengim? Ena-bnu cela!

Qelem kaxez û hibrê ehlê kelam
Ji bo tecrîba min mehek in temam

Nebit mu'teqid ger hesûdek nekes
Wekî sewtê re'd û tenînê meges

Heçî new'ê şi'r û belaxet hebî
Bikin îmtîhan Rûhiyê Axtepî!

Ez im Heyderê Sefder ê namîdar
Qelem rumh û ezmanê min Zulfiqar

Di ewel hucûmê ku bim sefê ceng
Li fursanê me'nî dikim 'irse teng

Li de'wa me şahid kelamê di min
Ji şi'ra me peyda meqamê di min

Bese Rûhiya hinde laf û gezaf
Bese hinde kizb û durûx û xîlaf

Institut kurde de Paris

Bese zêdekarî cesaret bese!
Bese şermisarî xesaret bese!

Bese hinde fexrîye terkê edeb
Bese hinde qelaşî ey bul'eceb!

Bese terkê ke nazî û îftîxar
Dirêj ke yedê xwe ji bo î'tîzar

Bixwaze tu 'uzrê xwe j'ehlê kerem
Ku ew perdepûş in, refî'-il hîmem

Ela ey xwedanwendê fezl û belax
Ji bo ehlê dunya şemal û çirax

Heçî ku nezer kin li ebyatê min
Mebin herfegîrê xurafatê min

Bizanim ku mest im ji cama fîraq
Ji hîcran li min heml e "malayuttaq"

Ji hîcrana dîlber qewî serxweş im
Ne zihn e, ne fikr e 'eceb bêhiş im

Li ser serxweşan nîne 'uzr û melam
Dibêjin heçî tête dev wam kelam

Ji vî narê 'işqê ku ez herqî bûm
Di deryayê dem'an ku ez xerqî bûm

Herîq im, xerîq im di yek saetê
Muqîm ez dikêşim evê zehmetê

Ku nuqsaniya min bibîtin 'eyan
Ku xermuhreyê min bibîtin beyan

Institut kurde de Paris

Rica min bizarî ji ehlê kerem
Ev e der hemî saet û hîn û dem

Ku nebne li min şa'irî herfegîr
Bi deryûze me, sail im, pir feqîr

Ne cewherfiroş im di dukanê xwe
Muqîrr im bi xermuhreyê kanê xwe

Ne sahib tefennûn, ne ehlê kemal
Ne gerdenkeşê şi'r û bestê meqal

Ne zurra' im ez, xûşeçîn im yeqîn
Ne sahib kemalat û lefzê şêrîn

Ne perwerde me ber lebê cûyebar
Wuha ristime ez li çol û beyar

Qusûr ger hebîtin di şi'rê mi da
Futûr ger zuhûr bin di fikrê mi da

Li min megrin ey sahibê fezl û hûş
Ku ehlê huner kamil in, perdepûş

Ne metbû' û şêrîn e lefz û eda
Çiku sirf-î kurmancî ye naseza

Dizanim ne layiqê fexr û qebûl
Hemî kurdî ye, zêdekar e, fuzûl

Me umîd e ez nuktedanê di hûr
Qebûl kin bi fezla xwe tevlî qusûr

Eger herçî naqis derînim bi 'ed
Divêtin ku hemwan bikim mehw û red



Institut kurde de Paris

Bi sed hîlesazî û 'icza gelek
Me telfîqê kir tevde çend reşbelek

Ji kurmanciyê çend xeber naliyaq
Me pevxistî bê caşenî û mezaq

Lezet ger nebîtin di nav meyweyan
'Etter ger nebîtin di nav naqeyan

Me me'zûrî bigrin ku kurmancî ye
Ji kurmancî encex wuha hatiye

Nîhayet ku meqbûlî bit ev meta'
Bi zarî dikim besttê kefê xera'

Dikim hêvî û sailî ez muqîm
Ku van çendî elfazê "Rewdinne'îm"

Qebûl kin ji bo xatirê Mustefa
Li Rûhî nedin derbê te'n û cefa

Ji van qesdê min nîne 'erzê huner
Welê da li dunya bimînit eser

Ku Turk û Ecem qet nebên carekê
"Nehin kurdî şa'ir di misra'ekê!"

Bizanin ku şa'ir ji Kurdan hene
Ji 'uşşaqê Turk û Ecem zêde ne!

Welê bêxwedan in nehin me reîs
Ku meqbûl-î bin nik wî şi'rê selî

Me jî ger hebuya xwedanek çunîn
Guhernas û qîmetşunas û emîn

Institut kurde de Paris

Ji Kurdan gelek şa'irê sihrîdar
Bi nexme dihatin wekî mûsîqar

Welê çun me dîtin ku em bêkes in
Ji bêçaregî kes bi me nahesin!

Me anî qeti' kir kelamê metîn
Me xame hilanî ji nezmê şêrîn

Niye mexsedim ew fezîle bitin
Welê da ji bo min wesîle bitin

Bibit wasîta rehmeta Mustefa
Ji bo Rûhiyê pur bi cewr û cefa

Şefa'et bikit Şemsiddînê xirab
Di rojê sewab û 'îqab û hîsab

Wegerne ezê rûreşê fil'ê pîs
Vemam zar û şermendê nefsa xebî

Îlahî bi heqê wî zatê xwe kî
Îlahî bi heqê sîfatê xwe kî

Bi sûza dilê Mustefayê kubar
Bi abê ewan dîdeyê nazîdar

Xwedaya bi esrarê peyxemberî
Xwedaya bi ehwalê wî rehberî

Xwedaya bi vî dînê îslam ê heq
Xwedaya bi sultanê şanzdeh tebeq

Xwedaya bi tesdîqa Siddîqê yar
Bi Farûqî ew 'Ûmerê aşîkar



Institut kurde de Paris

Bi şerm û heya zatê 'Ûsmanê pak
Bi Kerrariyê Heyderê hewlînak

Bi sûzê dilê zehrîxurde Hesen
Ji textê emaret peyabû 'elem

Bi heqê demê naheq ê Kerbela
Bi lebteşneyê wan di kerb û bela

Bi heqê hemî ehlê Beyta Resûl
Bi wan tahirê zatê pak ê qebûl

Bi heqê cemî'ê sehabê kubar
Bi heqê ewan meş'elê nûrîdar

Bi tesfiyeyê qelbê sahibdilan
Bi tehliyeyê batinê kamilan

Bi efxanê pîranê arasîte
Bi sidqê cuwananê nûxasîte

Bi tekbîrê xuzzatê şimşîrîzen
Ku kufarê duşmen li nik wan çu zen

Bi "lebbeyk"ê huccatê Beyt-îl Heram
Bi Rukn û bi Zemzem, Hettîm û Meqam

Bi 'ilmê hemî 'alimanê 'ezîz
Bi sûzê dilê ewliyayê temîz

Bi ta'atê şeyxîzê şebzendedar
Ku ew der hizûr in bi leyl û nehar

Bi qedrê şebabê qewî tewbedar
Cuwananê wek Rûhî dilextiyar

Institut kurde de Paris

Bi heqê sehabê ku Bedrîye ne
Li 'edda rusul sêsed û sêzde ne

Bi heqê hemî enbiya û rusul
Ji Adem heta Mustefayê çu gul

Bi heqê cemî'ê Suhûf hem Kîtab
Ji esman te nazil kirin ser turab

Bi ta'atê pîranê xelwenuşîn
Bi xempuştiyê zatê 'ezletguzîn

Bi heqê ruxê hezretê Neqşebend
Ewê destegîrê kesê mustemend

Bi 'ilmê Îmam Şafi'îyê himam
Bi Nu'man, bi Malik, bi Ehmed temam

Bi cumle îmam û telamîzê wan
Bi cumle ruwat û guherrîzê wan

Bi dûdê dilê 'aşiqanê hezîn
Bi ahê sehergahê wan dilbirîn

Bi deryayê çeşmê ewan 'aşiqan
Bi 'ehd û wefayê ewan sadiqan

Bi nalînê cengahê wan rûz û şeb
Bi xwûnxurdenê wan bi cerg û kezeb

Xwedaya bi îstîxneyê dîlberan
Bi naz û delalîyê wan esmeran

çiraxê yeqînî li rahê feqîr
Bi rehmet bigir ey Xwedayê qedîr

Institut kurde de Paris

Ji 'ilmê me bighîne 'eyn-el yeqîn
Bi dîdarê xwe şa ke qelbê hezîn

Mehû ke ji min vê wucûda hîcab
Hilîne ji ber min tu perde w nîqab

Hifiz ke tu îmana pak î nefîs
Di axirnefes de ji Iblîsê pîs

Bi îhsana xwe rehmê ke tu li me
Bi husnê xetim ke li min xatîme

Di wê werteya hewla axirnefes
Bi rehm û kerem be tu feryadîres

Kucan têkevit nez' û hukqûm û fewt
Cesed bête ser pusterê merg û mewt

Zeîf bin hemî dest û pa û quwa
Wida' kin ji hev mefselê bê newa

Melekmewtî hazir bitin ber serim
Biseknit wî şeytanê dûn hemberim

Mebeste dihanim di wê werteyê
Ji qewlê heq û gotina şehdeyê

Zebanim tu berde di wê saetê
Ku îqrarê kim ez bi wehdanetê

Ku qewlê şehadet bi îman bidim
Şehadet di dev de heman can bidim

Bişîn ber serim 'alimek 'ilmîdar
Bi Qur'an û Yasîn û 'ilmê kubar

Institut kurde de Paris

Ku Qur'an û Yasîn kelamê qedîm
Sîma' kim di wê werteya xewf û bîn

Ji şer'a muteher megêre berim
Meke munherîf tu ji qîble berim

Ji ser cadeya pak a şer'a Nebî
Meke munherîf Rûhiyê Axtepî

Bide tewbe bo min di halê heyat
Li ser tewbeyê min bibe der memat

Bi Qur'an û îman bibe qebrê min
Bi Qur'an û îman bide sebrê min

Li dunya ji Qur'an bide min huzûr
Di qebrim ji Qur'an bide şem' û nûr

Dema min wedi' kin di qe'ra lehed
Dimînim ez û rehma Rebê ehed

Hemî dost û ehbab û qewm û heval
Tenê min dihêlin, hemî têne mal

Dimînim rehînê 'emel bin turan
Hezar wayêweyla li halê xerab

Bi tenha di wê qebra tarîk û kûr
Dimînim di nav leşkerê mar û mûr

Nizanim çi kim ez di wê merqedê
Di destim tenê maye rehma Xwedê

Nehin wê demê hîçî feryadîres
Ne qewm û ne îxwan ne ehbab û kes

Institut kurde de Paris

Îlahî tu Rûhî mu'ezzeb nekî
Di qebrê digel min bi rehma xwe kî

Ku bê kes bimînim di bin xakê sar
Tu yî dîsa ser bêkesan rehmîdar

Di wê xewf û ehwalê Yewm-il Qîyam
Di zumra Muhemmed eleyhîs'selam

Heşir ke minê mucrim ê bed'emel
Bibore di van zenbê pîs ê dexel

Mepirse li zenb û hîsabê di min
Bide destê rastê kîtabê di min

Bide xatirê Mustefayê Resûl
Evî Ebdirrehmanê zar ê melûl

'Efû ke bi eltafê xwe bît'temam
Hemî zenb û sûcê di min wes'selam

Digel zumreya Ehmedê tacîdar
Bişîne heta cenneta nazîdar

Ku rahet bibim ez di wê nî'metê
Bi saya Muhemmed biçim cennetê

Eger çi li ser min guneh bûne bar
Mi tewbe di her saetê sed hezar

Mi tewbe Îlahî ji fi'lê di pîs
Mi tewbe Îlahî ji zenbê xebîs

Mi tewbe Îlahî ji zenb û gunah
Mi tewbe Îlahî ji fi'lê tebah

Institut kurde de Paris

Mi tewbe Îlahî ji ev zalimî
Mi tewbe Îlahî ji zenban hemî

Mi tewbe ji napakî û bed'emel
Mi tewbe ji ef'al û zenbê dexel

Mi tewbe ji 'isyan û bê emriya
Mi tewbe ji zenbê mîsalê çiya

Mi tewbe Îlahî ji terka edeb
Mi tewbe Îlahî ji zulm û te'eb

Mi tewbe Îlahî ji kîzb û xîlaf
Mi tewbe Îlahî ji laf û guzaf

Mi tewbe ji zenbê ku nûsî qelem
Li ser min feqîrê di dil de elem

Mi tewbe ji zenbê bikim îqtîraf
Binûsit li ser min qelem bê xîlaf

Qebûl ke Îlahî tu vê tewbeyê
Mehû ke ji min cumleyê hewbeyê!

Were ey qelem bes ke neqqaşiyan
Bese qet'i ke hinde qellaşiyan

Verêtin te hinde kelam û xeber
Ki ye ku qebûl kit ji te ev qeder?

Ji enwa'ê me'nî te anî mezad
Welê sûka malê te bûye kesad

Xerîdar-î nîne ji bo cewheran
Ketin ber piya cewherê defteran

Institut kurde de Paris

Buha nake ev malê me vê demê
Nema qîmetê şi'rê der 'alemê

Qewî teng e meydana me şa'iran
Kesad hate bazara me sahiran

Ku madem ev e halê dewra zeman
Nema rûmeta şi'r û nezma giran

Qeti' ke eya xameya bawefa
Tu "Rewdinne'îm"ê bi zewq û sefa

Me dî wextê nabit furuxt û rewac
Evî malê zerbeft û libsê dîbac

Me anî qeti' kir kelamê 'eceb
Ji tarîxê Hicrî di salê "xeşeb" (16)

Di roja mubarek di nav hefteyê
Di 'Îda hemî muminan Cum'eyê

Di selxê Rebî'-il Ewel, mahê sal
Ji mahê Ereb ew hîsabê delal

Di vê sal û mahê mubarek nejad
Mubarek be ya Reb li cumle 'îbad

Rehet bûye payê evê xameyê
Ji qet'a bewadîyê vê Nameyê

Ji şurba mîdadê ku bêtabî bû
Ji mehber devê xame sîrabî bû

Wîda' kir ji muswedde û defterê
Me qapax-î danî li ser mehberê

Institut kurde de Paris

Temaşa heçî kin li şi'rê feqîr
Ji ed'îyeyê xwe mekin min jibîr

Bibêjin: "Îlahî tu vî şa'irî
Nesûzî di nav dûzex û agirî!"

Ji bo nazim û katib û naziran
Ji bo qarî yû sami' û haziran

Ji bo da û babê di me cumleşan
Ji bo 'alimanê bi 'izz û nîşan

Ji bo cumleyê salih û salîhe
Ji bo Rûhiyê jar-î el fatîhe!

Bi "Bîsmîllah" bû îbtîdayê kelam
Bi "Hemdîllah" dîsan bikim ixtîtam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar!

---

1- Îbnî sehab: Kurê ewr. Di zimanê Erebî de, navê avê nêr e. Îcar hozanî ew bi "kurê ewr" navdar kiriye.
Bint-il 'Îneb: Keça tirî. Amac jê, bade ye.
2- Mana vê malikê weha ye:
Rabe qedeha min tije bike, sibe zelal bû.
Wa dîkan jî bang da û şev kuta bû.
3- Bint-îl Kurem: Keça rez, ku tirî ye.
4- Şeyxê Herem: Kalê ketî.
Şebab: Xort.
5- Ev nîvmalik di çapa Qoxî de weha ye:
"Ji pan re çu tiryaq e, zehrê neyar" Lê diyar e, ku şaş e.
6- Eskender: Îskenderê Mezin e, ku bi "Zîlqerneyn" (Xwediyê du qiloçan) hatiye naskirin. Ew, li Makedonyayê ji

Institut kurde de Paris

diya xwe re çêbûye û li Babîlê jî miriye. Îskender, piştî bavê xwe Filibs rabûye ser text û di çaxê Dara de Împeretoriya Firsê vegirtiye. Berî Zayinê 324-356.

7- Qeyser: Bernavkekî tevakî bû ji milûkên Romê re. Kî dibû milûk, ew bernavik bi navê wî ve dihate zeliqandin.

8- Îsewî: Xeysetnav e ji wan kesan re, ku peyrewên Îsa Pêxember in.

'Esayê Kelîm: "'Esa": gopal. "Kelîm" kesê ku dipeyive. 'Esayê Kelîm, bernavkê Mûsa Pêxember e, ji ber ku ew li ser çiyayê Tûrîsînayê bi Xwedê re peyivîbû.

9- Erjeng û Manî: Manî di tarîxa 215-276 ê Zayînê de jiyaye. Erjeng jî, navê pirtûka wî ye. Ew, bi destê Behramê kurê Hurmuz hatiye kuştin. Bavê Manî, ji Hemedanê ye û diya wî ji azbata milûkên Eşkanî ye. Manî li Babîlê hatiye dinê û doza pêxemberîtiyê kiriye, gotiye ku: "Ez, ew Ferqlît im ku Îsa Pêxember behsa wî kiriye." Manî, navê rêçika (mezheb) xwe daniye "Manewî". Wî du rêç danîne. 1- RONAHÎ, 2- TARÎTÎ. Kurdên Yezîdî jî di ola xwe de nêzî rêçika wî ne. Namî, tertîba teswîra Çînê daxistiye ya Farisî û wêneyên şeytanan, yên milyaketan çêkirine. Ji xeynî vî Namî, Namiyekî çînê jî yê wênevan ê menşûr heye.

10- çigil: Navê bajarekî ye li Tirkistanê.

11- Mesîhê dem: Îsa Pêxemberê demê (zeman). Amac ji vê ev e, ku hozanê me Şêx Evdirehmanê Axtepî, xwe pê şûfandiye.

12- Se'dê Şîrazî: Navê wî Şêx Musluhuddîn e. Ew di navbera salên 1193-1291 de jiye. Herweha ew nivîskar û helbestvanekî Îranî yê herî menşûr e. Şîrazî, li bajarê Şîraz hatiye dinê û di "Nîzamiya Bexdad"ê de xwendiye. Ew, peyrewê (mirîd) Şêx Evdilqadirê Gêlanî bû. Niha du pirtûkên wî yên helbestan hene. Navê yekê "Gulîstan" e û ya din jî "Bostan" e.

Hafizê Şîrazî: Navê wî Şemseddîn Muhemmed e, li Şîrazê hatiye dinê û di nav salên 1320-1389 de jiye. Ew, hozanekî mûzîkê yê Farisan e. Bi piranî helbestên wî, li ser evînê û evîndariyê ne. Niha pirtûkeke wî bi navê "Dîwana Hafiz" heye.

13- Frezdeq: Navê wî Hemamê kurê Xalibê Temînî ye û li Besrayê hatiye dinê. Ew di nav salên 641-732 yên Zayînê de jiye. Hozanekî ji dema Emewiyan e. Niha dîwaneke wî ya helbestan û pirtûkeke wî ya bi navê "Tenqîdên Cerîr û Ferezdeq" (Lihevrexnekirina Cerîr û Ferezdeq)

Institut kurde de Paris

heye.

Ebul Behterî û Esme'î jî, du hozanên Ereb in.

Nabî: Navê wî Ûsiv e, li Rihayê (Ûrfa) hatiye dinê û li Stenbolê miriye. Ew, di nav salên 1622-1712 de jiye. Pirtûkeke wî bi navê "Tuhfet-ul Heremeyn" û dîwaneke wî ya helbestan heye. Mixabin ev jî yek ji wan Kurdan e, ku bi ziman û qelema biyanî pirtûk nivîsîne û bi zimanê xwe yê netewî nenivîsiye.

14- Rûdekî: Navê wî Ebdullah Cehferê kurê Mihemed e, li Benca nêzê Rûdeka Semerqendê hatiye dinê û di 940 î de jî li wir miriye. Ew hozanekî Faris bû, gelek di civata Nesrê Samanî de jî maye. Niha du pirtûkên wî hene. Yek bi navê "Qiseta Kulîlet û Dumnet" e, navê ya din jî "Qiseta Sendabat" e.

'Ûnsirî: Navê wî, Ebû Qasim Hesen e. Di 431 (1038-Zayîn) ê de miriye. Ew, bi 'Ûnsirê Bexlî dihate naskirin. Herweha hozanekî Îranî bû û di civata Mehmûd Xeznewî de mezin bûye. Niha du pirtûkên wî hene. Yek bi navê "Mesnewî Wamiq û Ezra" ye, navê ya di jî "Xusro û Şêrîn" e.

Fîrdewsî: Navê wî Ebû Qasim Mensûrê kurê Hesenê Tewsî ye. Ew di nav salên 329-411 (940-1020) an de jiye. Herweha hozanekî Îranî bû û xwediyê "Şehname"yê ye. Ew nêzî 30 salî li ser vê pirtûkê şixulîye û li dor 50-60 hezarî tê de beyt hene.

Newres: Navê wî Ebdurrezaqê Kerkûkî ye. Di 1762 an de li Bursayê miriye. Eslê wî Kurd e û li Kerkûkê hatiye dinê. Ew bi navê "Newresiya Kevnare" tê nasîn. Wî li Stenbolê mamostetî û qazîtî kiriye. Niha dîwaneke wî bi zimanê Tirkî û Farisî heye.

Enwerî: Navê wî Sadullah Efendî ye, li Trabzûnê hatiye dinê û di nav salên 1733-1793 an de jiye. Herweha wî ji 1769 hetanî 1791 ê dîrokvaniya sazûmana Dewleta Osmanî jî kiriye.

15- Xaqanî: Bi navê Xaqanî du kes hene:

a) Xaqaniyê Şêrwanî Efdeluddîn Îbrahîm Heqaîq e. Ew sala 1106 an li Xenca hatiye dinê û sala 1200 î jî li Tebrîzê miriye. Herweha hozanekê Îranî bû û pirtûkeke wî bi navê "Tuhfet-ul Îraqîyyîn" heye.

b) Xaqanî, hozanekî Tirk e. Li nîvê diduyan ji Sedsala 16 an jiye. Pirtûkeke wî bi navê "Hilyeyê Şerîf" (Xişrê Pîroz) heye.

Bû Newas: Navê wî Hesenê kurê Hanî ye. Ew di 714 an de li Ehwazê hatiye dinê û di 757 an de jî miriye. Pirtûkeke wî bi navê "Dîwan"



Institut kurde de Paris

ku li ser şerabê nivîsiye, heye.

16- "Ji tarîxê Hicrî di salê Xeşeb": Şêx Evdirehmanê Axtepî bi vê nîvmalikê, tarîxa kutakirina Rewdneîmê diyar kiriye. çewa ku jê eşkera tê zanîn, wî di sala "Xeşeb" de dawî lê aniye. Îcar tîpên ku di bêjeya "xeşeb" de hene, li gorî hesabê Ebcedê ev reqemên li jê derdikevin: Tîpa "X = غ ": 1000, tîpa "Ş = ش ": 300 û tîpa "B = ب ": 2. Yanî tarîxa 1302 yê Hicrî dike. Ev tarîx beramberî ya Zayînê, dike 1884. Îcar eger şaşiyek di vê tarîxê de çênebûbe, helbestvanê nemir di 1884 an de dawî li pirtûka xwe aniye (Binêre li çapa Amedî, rûpel: 524, şerha bi zimanê Erebî).

Institut kurde de Paris

(Ev Pesinbêja -Medhiye- li jêr ji aliyê Şêx Mihemed Can ve, li ser Rewdne'îma kekê wî Şêx Evdirehmanê Axtepî hatiye nivîsîn. Îcar nivîsendeyê berêz Amedî, çaxê ku li ser Rewdneîmê şerheke bi zimanê Erebî nivîsîye û tevî şerha xwe pirtûkê daye çapkirin, vê Pesinbêjeya Şêx M.Can jî di dawiya wê de çap kiriye. Lê Pesinbêj, di çapa Qoxî de tune. Me jî ew Pesinbêj ji tîpên Erebî wergerande tîpên Latênî û li vir da çapkirin. W)

## (PESINBÊJEYA–MEDHIYE–ŞÊX MIHEMED CAN LI SER REWDNEÎMA KEKÊ WÎ ŞÊX EVDIREHMAN-w)

Bîsmîllahî el rehmanî el rehîm
Hemdê bê hed bo Xwedawendê kerîm

Sed tehîyat û selat û sed selam
Ser Resûl û al û eshaban temam

Paşê Bîsmîllah û hemd û teslîye
Guh bidin herçî ku ev nezm dîtiye

Nezmekî bê hed letîf e, hem delal
Der şemaîl nîne hemta û mîsal

Nezim kirye Şemsedînê Axtepî
Der şemail û di Mî'raca Nebî

Institut kurde de Paris

Danîye îsmê ewê "Rewdinne'îm"
Ev hediye daye wî Rebê kerîm

Ger bibêjim wesfê nazim Şemsedîn
Qet nehin şubhê wî der ruyê zemîn

Ne bi 'ilm û ne kelam û ne edeb
Nîne hemtayê wî der Rom û Ereb

Rûhî ye lê ruhê min der an û hîn
Ebdurehman "Rûhî" ye, hem Şemsedîn

Şemsê tehqîqê di nav ehlê 'ulûm
Alimê wextê li etrafeş nucûm

Xaseta der vî 'ulûmê şa'irî
Qabilê sihr e beyan û mahirî

Xame ger bigre bide nezn û nîzam
Şubhetê durr dane dirjîne kelam

Nîne wek wî ne niha û ne berî
Nabe qabil 'Escudî û 'Ûnsurî

Aniye nezm ev kîtaba nazenîn
Çêtir e ez durr û yaqût û semîn

Lê ji wê her beytekî şêrînkelam
Ew dihêje mulkê alem bit'temam

Musteheq e bê nivîsandin bi nûr
Der bihiştê ser ruxê wîldan û hûr

Ev kelam der vî zemanî mûciz in
Cumle însan ez şebîheş aciz in

Institut kurde de Paris

Şubhetê şemsê ku bê nisfê nehar
Ruhniya wê daye dinya çarkenar

Wehbî ye ev, nabe ba eql û huner
Misrek hêja mulkê alem serteser

Rewdde ye, maê wê şubhê Selsebîl
Baxîban qenc e ku bîtin Cibreîl

Lê ji wê her bend û feslek bêguman
Rewddeyek Ridwan e bêşubhe bizan

Şubhetê Tûba ye bê qîl û xeber
Beyt û elfazin wekî xûssn û semer

Qenc e her beytek ji vê durdaneyê
Bê nivîsandin li bergê Sîdreyê

Cibreîl bîtin muderis der felek
Vê bi dersî bêje bo cumle melek

çend hebin qismê melek der asîman
Subh û êvaran bikin wurdê zeban

Ne mubalexe dikim belkî kêm in
çunkî medhê şahê fexrê alem in

Behsa Mî'raca Muhemmed Mustefa
Hem şemailê şahê sahibwefa

Hingî tê de bû mukerer îsmê Şah
Nik me pir meqbûltir e ez şems û mah

çendî bo RÛHÎ hebin zenbê giran
Ev necat e bo wî bê reyb û guman

Institut kurde de Paris

Zenbê alem deynî alîkî şehîn
Vê jî deynî aliyê dî în çunîn

Zenbê wî rabin hewa teşbîhê per
Ev dimîne her li erdê wek hecer

Ev necat e bo wî RÛHÎ ba yeqîn
Hinde tê de medhî kir Şahê Emîn

Ger nebin nazim ji fi'lan yek sewab
Ev xelas e bo wî ez cumle 'ezab

Hinde tê de medhê Fexrulmurselîn
Bû bera'et ev ji boyî Şemsedîn

Xakî tû bigrî li halê xwe xerab
Dê biçî texlîs bî ez herşr û hîsab

Nîne der destê te yek e'malê qenc
Tu biçî derbas dibî ez cumle renc

Qet nehin e'malê te ey bê edeb
Hêviya xwe tu mebre ez rehma Reb

Ger nekit rehmê li te şahê Wedûd
Dê bibî tehqîq di dûzex nar û dûd

Tu Muhemed Can 'efû kî ey Xwuda
Ez Hebîbê xwe meke xakî cuda

Xakiya tarîxa Nazma mu'teber
Hatî der cewher ji deryayê huner.

Institut kurde de Paris

(Şêx M.Can terîxa nivîsandina vê berhema xwe, di malika dawî, rêza paşî de li gorî hesabê Ebcedê (Cemel) nivîsiye. Me jî ew tîpên di Elîfba Erebî de, ku bi hesabê Ebcedê dibin reqem, tevî reqemên wan li jêr nivîsîn:

ه : h : 5
ا : a : 1
ت : t : 400
د : d : 4
ر : r : 200
ج : c : 3
و : w : 6
ه : h : 5
ر : r : 200
ژ : z : j : 7
د : d : 4
ر : r : 200
ى : y : 10
ا : a : 1
ا : a : 1
ه : h : 5
ن : n : 50
ر : r : 200

Civana van reqemên li jor, dike 1302. Îcar eger ev tarîx hicrî be, dike 1884 ên mîladî.



Institut kurde de Paris

# NAVEROK


Bendê Ewel Der Mebhesê Besmele ....................................12
Bendê Sanî Der Mebhesê Hemdê Xweda ....................................16
Bendê Salis Der Tewhîdê Barî we Îmanê Bi Wacîbat ....................20
Bendê Rabi' Der Mebhesê Selat û Selam ....................................27
Bendê Xamis Der Sebebê Nezmê Kîtab ....................................37
Bendê Sadis Der Telebê Îmdad Ez Saqî we Muxennî ....................45
Bendê Sabi' Der Beyanê Eşkalê Fexrê Alemê ....................................58
Bendê Samin
Der Beyanê Xatemê Nubûwwet Ber Ketfê Resûlê Xweda ......81
Bendê Tasi'
Der Beyanê Xîdab û Kuhl û Duhnê Resûlê Xweda ....................86
Bendê 'Aşir Der Beyanê Lîbasê Resûlê Xweda ....................................90
Bendê Hadî 'Eşer
Der Sîfetê Xuff û Ne'lê Resûlê Xweda ....................................94
Bendê Sanî 'Eşer
Der Sîfetê Enguşteriyê Resûlê Xweda ....................................97
Bendê Salis 'Eşer Der Sîfetê Seyfê Resûlê Xweda ....................102
Bendê Rabi' 'Eşer
Der Sîfetê Nanê û We çîzê Kî Bi Nanê Mîxwured ....................112
Bendê Xamis 'Eşer
Der Sîfetê Fîraş Kî Ber An Mîxwabit ....................................116
16- Bendê Sadis 'Eşer
Der Sîfetê Kelam û Suxenguftenê Resûlê Xweda ....................119
17- Bendê Sabi' 'Eşer
Der Sîfetê Xwabkerdenê Resûlê Kîbriya ....................................122
Bendê Samin 'Eşer Der Sîfetê Îbadetê Resûlê Xweda ............125
Bendê Tasi' 'Eşer Der Beyanê Exlaqê Resûlê Xweda ............129
Bendê 'Işrîn Der Beyanê Heyaya Resûlê Xweda ....................132
Bendê Îhda we 'Işrîn Di Beyanê Nesebê Resûlê Xweda.........134


Institut kurde de Paris

Bendê Sanî we 'Işrîn
Der Îbtîdaa Mî'raca Resûlê Xweda ....................................141
Bendê Salis we 'Işrîn Der Beyanê Eşyayê Kî Der
Rahê Bedîd Kî Ez Alema Berzex Temsîlpêşê û Amed ..........160
Bendê Rabi' we 'Işrîn
Der Dixûlê Resûl Bi Mescidê Eqsa ......................................174
Bendê Xamis we 'Işrîn Der 'Ûrûcê Resûl Bi Asîman .............182
Bendê Sadis we 'Işrîn
Der Dîdenê Resûlî Bi 'Izraîlî Ra .............................................198
Bendê Sabi' we 'Işrîn
Der Dîdenê Resûl Malikê Dûzex Ra .......................................206
28- Bendê Samin we 'Işrîn
Der Reftenê Resûl Bi Beytîl Me'mûra Asîman .......................217
Bendê Tasi' we 'Işrîn
Der Nişistenê Resûl Ber Şehperê Cibrîl
we Reften Bi Bihiştê Berîn we Herçî Muşahede Kerd........... 221
Bendê Ecnebî
Der Mersiyeyê Şehzadegan Hesen we Huseyn .......................235
Bazgeşten Bi Qiseyê Pêşîn .....................................................240
Bendê Selasûn Der Reftenê Resûl
Be Sîdret-ul Munteha we Berter Ez An ..................................262
Bendê Hadî we Selasûn Der Reftenê Resûl Bi Kursî .............282
Bendê Sanî we Selasûn
Der Reftenê Resûl Bi 'Erşê 'Ezîm ..........................................285
Bendê Salis we Selasûn Der Nişestenê Resûlê Xweda
Ber Refrefê Tîzrew we Teşrîf Burden Bi Cayê
Ke Cay Nebûd, Yanî Meqamê Lamekan .................................306
Bendê Rabi' we Selasûn Der Xebergoftenê Resûl
Ba Mîdadan Ez Mî'racê Şebane Bi Islam û Kufar
Kî Museddîqan Tesdîqkerden ..................................................364
Bendê Xamis we Selasûn Der Î'tîzar û Xatîmeê Kîtab...........396
Pesinbêjeya (Medhiye) Şêx Mihemed Can
Li Ser Rewdneîma Kekê Wî Şêx Evdirehman .........................434

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

......

Muneqqed, muneqqa kelamê selîs
Nezim kim di silkê çu durrê nefîs

Binêrin li şi'ran heçî zaniye
çi terkîbekî serfê kurmancî ye

Ji kurmanciya xwe me anî nîzam
Mu'ella û şêrîn û efseh kelam

Ji kurmanciyê zêde şêrîn niye
Welêkin xerîdarî çendîn niye

Eger min bidîta xerîdarî qet
Rewan dê me bikra bi teşbîhê şet

Me kêşa eziyet evan çendî rûz
Ji Kurdî kîtabek bi saz û bi sûz

Ku da Turk û Faris nebêjin tu car
"Nebûn Kurdî nîşanê işqa xedar"

Wereng şairê Kurd ê şêrînkelam
Hene, şi'rê wan zêde ehsennîzan

Welêkin te'essub nemaye li me
Ji vê, Turk û Faris cudaye li me

Me ev çendî lefzê şêrîn çêkirin
Zebanê di Tirkan me pê jêkirin

Were saqiya axirê meclis e
Hinik saxeran bîne îcar bese

Me ev deftera xwe giyand axir e
Were cam û eqdahê me dagire

......
Felek bo me hinde xedar e, çira?
Cîhan bo me hinde neyar e, çira?
......

(Şêx Evdirehmanê Axtepî)

Institut kurde de Paris